



ZANÎNGEHA BÎNGOLÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û EDEBIYATA KURDÎ

GIREYÊN DARİŞTINÊ
DI BERHEMÊN KLASÎK ÊN KURMANCÎYA JORÎN DA

Amadekar

Ahmet SEYARÎ

TEZA DOKTORAYÊ

Şewirmendê Tezê

Prof. Dr. Murat AKTAŞ

Bîngol-2023



T.C. BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE EDEBİYATI ANABİLİM DALI

YUKARI KURMANÇANIN KLASİK ESERLERİNDE
YAPIM EKLERİ

Hazırlayan

Ahmet SEYARİ

DOKTORA TEZİ

Tez Danışmanı

Prof. Dr. Murat AKTAŞ

Bingöl-2023

NAVEROK

NAVEROK	I
BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ	VI
ONAY	VII
KURTE	VIII
ÖZET	IX
ABSTRACT	X
PÊŞGOTIN	XI
KURTEPEYV	XII
DESTPÊK	1
1. Mijara Xebatê û Sînorên Wê.....	1
2. Armanc û Hîpoteza Xebatê	3
3. Teorî, Rêbaz û Teknîka Xebatê.....	4
4. Xebatên Berî Niha yên li ser Mijarê	7

BEŞA YEKEM

TEORÎ, RÊBAZ Û TEKNÎKÊN ZIMANNASÎYÊ Û MORFEM

1.1. Zimannasî	9
1.1.1. Destpêka Xebatên li ser Zimannasîyê	10
1.1.2. Destpêka Zimannasîya Modern	12
1.1.2.1. Ferdînannd Saussure û Sîstema Nimîneyan.....	13
1.1.4. Şaxên Sereke yên Zimannasîyê	14
1.1.4.1. Dengnasî (Phonology)	15
1.1.4.2. Morfolojî (Morphology)	15
1.1.4.3. Ristesazî (Syntax)	16
1.1.4.4. Manenasî (Semantique)	17
1.1.4.5. Ferhengnasî (Lexicology)	17
1.1.4.6. Navdêrnasî (Onomastics).....	18
1.1.4.7. Zimannasîya Metnî (Textlinguistics).....	18
1.1.4.8. Zimannasîya Civakî (Sociolinguistics).....	18
1.1.4.9. Zaravanasî (Dialectology).....	19
1.1.5. Rêbazên Zimannasîyê.....	20
1.1.5.1. Rebaza Dîyakronîk	20
1.1.5.2. Rêbaza Senkronîk	21
1.1.6. Teknîkên Zimannasîyê	22
1.1.6.1. Teknîka Teşeparêz	22
1.1.6.2. Teknîka Kargîn	23
1.2. Morfem.....	25
1.2.1. Morfemên Bendî (Bound Morphemes)	26

1.2.1.1. Morfemên Kêşanê (Inflection Morphemes)	26
1.2.1.2. Morfemên Dariştinê (Derivational Morpheme).....	27
1.2.1.2.1. Pêşgirên Dariştinê	28
1.2.1.2.2. Paşgirên Dariştinê	28
1.2.1.2.3. Navgirên Dariştinê	29
1.2.2. Morfemên Serbixwe (Free Morphemes)	29
1.2.2.1. Morfemên Rêzimanî (Grammatical Morphemes).....	30
1.2.2.2. Morfemên Ferhengî (Lexical Morphemes).....	30
1.2.2.2.1. Peyvên Sade (Simple Words)	31
1.2.2.2.2. Peyvên Kompleks (Complex Words).....	31
1.2.2.2.2.1. Peyvên Dariştî	32
1.2.2.2.2.2. Peyvên Pêkhatî (Compound Words)	32
1.2.2.2.3. Peyvsazî û Rêbazên Wê	32
1.3.2.2.3.1. Dariştin (Derivation)	34
1.3.2.2.3.2. Pêkhatin (Compounding)	35
1.3.2.2.3.3. Guhastin (Conversion)	36
1.3.2.2.3.5. Wergirtin (Borrowing)	37
1.3.2.2.3.6. Wergerandin (Translation)	38
1.3.2.2.3.7. Qusandin (Clipping)	38
1.3.2.2.3.8. Paşvesazî (Backformation).....	39
1.3.2.2.3.9. Têkilkirin (Blending).....	39
1.3.2.2.3.10. Sernavî (Acronym).....	40

BEŞA DUYEM

PÊŞGIRÊN DARIŞTINÊ

2.1. Ba-	41
2.1.1. Livandin û Zivirandin.....	42
2.2. Ber-.....	42
2.2.1. Azadkirin û Birina ber bi Jêr ve	43
2.2.3. Handan û Cehda ji bo Êrîşê	44
2.2.4. Terikandin û Jêgerîn	44
2.2.5. Destpêkirin	45
2.2.6. Êrîşa bi Çekê	45
2.3. Bi-.....	46
2.3.1. Xûy û Xislet.....	47
2.3.2. Rewş û Taybetî	47
2.3.3. Teşe û Taybetiyên Dîtbar	48
2.3.4. Xwedîtî	49
2.4. Bê-	49
2.4.1. Rewş û Taybetî	50
2.4.2. Payeya Qîmetdarî û Pîrbûnê	51
2.4.3. Pêknehatina Kar û Tevgerê	52

2.5. Da-.....	53
2.5.1. Xurtkirin û Kirpandina Maneyê	53
2.5.2. Îşxalkirin û Ketina Nava Cihekî	54
2.5.3. Liva ber bi Jêr ve û Bicihkirina di Nav Tiştêkî da	55
2.5.4. Navê Kar û Tevgerê.....	56
2.6. Hil-	57
2.6.1. Bilindkirin û Dûrxistin	57
2.6.2. Gurbûn û Geşbûn.....	59
2.6.3. Rabûn ji Nişka ve û Çûna ber bi jor ve	60
2.6.4. Wergirtina Tiştêkî û Şîyan	60
2.6.5. Rahiştin, Bertekdayîn û Xurtkirina Maneyê.....	61
2.7. Ne-.....	62
2.7.1. Xûy û Tevger	63
2.7.2. Nîşandana Rewşa Guherbar	64
2.7.3. Nebûna Karîn û Şîyanê.....	65
2.8. Ra-	65
2.8.1. Hilbûna ji Cih	66
2.8.2. Bilindkirina Tiştêkî û Belavbûna Deng	66
2.8.3. Razan an jî Hişyarbûna ji Xewê	67
2.8.4. Destpêkirina Rûdanekê û Peywirdarkirina Kesekî.....	68
2.8.5. Saxbûn û Hatina bi ser Hişê Xwe ve	69
2.8.6. Xurtkirina Maneyê û Şîyan	70
2.9. Rû-.....	70
2.9.1. Tegera ber bi Jêr ve (Sit)	71
2.9.2. Derbaskirina Demê (Stay)	72
2.10. Ve-.....	72
2.10.1. Hilanîna Tiştêkî ji ser Deverekê	73
2.10.2. Dûrxistin û Qewirandin	73
2.10.3. Kolan û Vekirin	74
2.10.4. Peydabûn û Belavbûna Ronîyê.....	75
2.10.5. Girêdan û Belavbûn	75
2.10.6. Vekirina Derî, Rê û Sîneyê.....	76
2.10.7. Vebûna Tiştên Quflekîrî û Hûnandî	77
2.10.8. Berdewamî û Dubarebûn	78
2.10.9. Tefandina Agir û Kuştina Mirovekî	79
2.10.10. Sekinîn û Amadebûn	79
2.10.11. Wergirtina Vexurekan	80
2.10.12. Destpêkirin	81
2.10.13. Bang û Dawet	82
2.11. Wer-.....	82
2.11.1. Avêtin, Ketin û Têdan	83
2.11.2. Zivirîn, Nihêrtin û Arastebûn	84
2.11.3. Lixwekirina Cil û Bergan	85

BEŞA SÊYEM
PAŞGIRÊN DARIŞTINÊ

3.1. -A	86
3.1.1. Taybetî û Xislet	87
3.2. -An	87
3.2.1. Cih û War	88
3.3. -And	88
3.3.1. Têperkirina Karan.....	89
3.4. -Ane.....	90
3.4.1. Wesfandina Navdêran	90
3.4.2. Wesfandina Tevgerê	91
3.5. -Anî	92
3.5.1. Nişandana Taybetîyên Şênber	92
3.5.2. Ravekirin û Wesfandin	93
3.5.3. Nişandana Awayê Liv û Tevgerê	94
3.6. -Ar	95
3.6.1. Wesfandin/Şibandin	95
3.6.2. Navê Amûr û Alavan.....	96
3.7. -Çî.....	97
3.7.1. Navdêrên Biker û Pîşe	97
3.8. -Dar	98
3.8.1. Rewş û Xwedîbûn	99
3.8.2. Nişandana Taybetîyeke Domdar	100
3.8.3. Xwedîbûna Tişteki Şênber	101
3.8.4. Pîşe û Pisporî	101
3.9. -E.....	102
3.9.1. Nişandana Rewş û Taybetîyê	103
3.9.2. Navên Cih û Heyberan	104
3.10. -Ek.....	104
3.10.1. Navdêrên Biker û Navê Tiştan	105
3.11. -Ende	106
3.11.1. Bikerê Kar û Tevgerê.....	106
3.11.2. Xwedîbûna Taybetîyeke Domdar û Demborî.....	107
3.12. -Eve/ve	107
3.12.1. Dubarebûna Kar û Tevgerê	108
3.13. -Geh.....	109
3.13.1. Destnîşankirina Cih	110
3.13.2. Destnîşankirina Demê	111
3.14. -Gîn	112
3.14.1. Nişandana Rewş û Taybetîyê	112
3.15. -Ik.....	113

3.15.1. Nişandana Taybetîya Teverê û Kesana	113
3.16. -In	114
3.16.1. Sazkirina Raderê.....	115
3.17. -Istan.....	116
3.17.1. Cih û War	116
3.18. -Î (yî-hî-wî-tî)	117
3.18.1. Sazkirina Parengê (Participle)	118
3.18.2. Nişandana Taybetîya Razber	119
3.18.3. Şibandîn û Jêçêbûn	120
3.18.4. Mensûbîyeta Dîn, Ziman û Devokekê.....	121
3.18.5. Mensûbîyeta Cih û Welat	122
3.19. -În	123
3.19.1. Şibandîn û Jêçêbûn	124
3.19.2. Nişandana Taybetîyên Dîtbarî û Rewşê	125
3.19.3. Nişandana Cih û Hêlê.....	125
3.19.4. Têperkirina Karan.....	126
3.20. -Van/Wan	127
3.20.1. Pîşe, Parastin û Pêkanîna Karekî	127
3.21. War/Wer.....	128
3.21.1. Nişandana Rewş û Taybetîyê	129
3.21.2. Nişandana Xûy û Xisletê	130
3.22. -Yar	131
3.22.1. Rewş û Xwedîtî	131
ENCAM.....	133
ÇAVKANÎ.....	137
PÊVEK.....	148
1. Rêjeya Pêşgirên Dariştinê	148
2. Rêjeya Paşgirên Dariştinê	149
3. Îndeksa Pêşgirên Dariştinê	150
4. Îndeksa Paşgirên Dariştinê	157
5. Têgihên Zimannasîyê	171

BİLİMSEL ETİK BİLDİRİMİ

Doktora tezi olarak hazırladığım “*GIREYÊN DARIŞTINÊ DI BERHEMÊN KLASÎK ÊN KURMANCÎYA JORÎN DA*” adlı çalışmanın öneri aşamasından sonuçlanmasına kadar geçen süreçte bilimsel etiğe ve akademik kurallara özenle uyduğumu, tez içindeki tüm bilgileri bilimsel ahlak ve gelenek çerçevesinde elde ettiğimi, tez yazım kurallarına uygun olarak hazırladığım bu çalışmamda doğrudan veya dolaylı olarak yaptığım her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve yararlandığım eserlerin kaynakçada gösterilenlerden oluştuğunu beyan ederim.

Ahmet SEYARÎ

07/09/2023

KURTE

Mijara vê xebatê gireyên dariştinê ye. Dariştin yek ji rêbaz û pêvajoya peyvsazîyê ye ku bi rêya gireyên dariştinê pêk tê. Di vê pêvajoyê da gireyên dariştinê (morfemên bendî yên dariştinê) li peyvan (morfemên serbixwe) zêde dibin û peyveke nû saz dikin.

Xebat ji aliyê dîyalektê ve bi kurmancîya jorîn û ji aliyê korpusê ve bi berhemên edebîyata klasîk hatiye sînorkirin. Ev berhem, ji *Dîwana Melayê Cizîrî*, çar menzûmeyên Feqîyê Teyran (*Şêx Sen'an, Bersisê 'Abid, Zembîlfiroş, Şerê Dimdim*) û Mesnewîya *Mem û Zînê* ya Ehmedê Xanî pêk tên. Tê hêvîkirin ku bi xêra analîza gireyên dariştinê yên van metnan hem taybetîyên ziman ên serdema van metnan bên nasîn hem jî ev lêkolîn ji bo xebatên bê yên di warê dariştina peyvan da bibe alîkar. Di xebatê da rêbaza zimannasîya şayesî û teknîka analîzê ya kargîn hatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê jî di analîza gireyan da peywend li ber çavan hatiye girtin.

Ev xebat, ji destpêkek û sê beşan pêk tê. Di destpêkê da, derheqê mijar, sînor û armanca xebatê da agahî hatine dayîn û giringî, teorî û teknîkên xebatê hatine destnîşankirin. Beşa yekem derheqê bingeha teorîk a xebatê da ye. Di vê beşê da di warê teorî, rêbaz û teknîkên zimannasîyê da agahî hatine dayîn û taybetî û cureyên morfeman hatine vegotin. Di beşa duyem da pêşgirên dariştinê û di beşa sêyem da jî paşgirên dariştinê ji aliyê semantîk ve hatine kategorîzekirin û ji aliyê morfolojîk, morfosentaktîk û morfosemantîk ve hatine analîzkirin.

Di encama xebatê da 11 pêşgirên dariştinê û 22 paşgirên dariştinê hatine tesbîtkirin. Analîza pêşgirên dariştinê di 49 kategorîyan semantîk da û ya paşgirên dariştinê di 40 kategorîyên semantîk da hatiye kirin. Bi tevahî 284 peyvên ku bi pêşgiran û 536 peyvên ku bi paşgiran saz bûne hatine tesbîtkirin. Lîsteya van peyvan û grafîkên ku rêjeya gireyên dariştinê nîşan didin di pêveka xebatê da hatine dayîn.

Peyvên Sereke: Peyvsazî, dariştin, gireyên dariştinê, pêşgirên dariştinê, paşgirên dariştinê, kurmancîya jorîn. berhemên klasîk.

ÖZET

Bu çalışmanın konusu türetme ekleridir. Türetme, yapım ekleriyle gerçekleşen kelime türetme tekniği ve süreçlerinden biridir. Bu teknik ile yapım ekleri (bağlı türetme biçim birimler) kelimelere (bağımsız biçim birimlere) eklenerek yeni bir kelime türetilmektedir.

Çalışma, lehçe olarak Yukarı Kurmançça ve korpus olarak da Klasik Kürt Edebiyatı'nın ilk eserleriyle sınırlandırılmıştır. Bu eserler Melayê Cizîrî'nin Dîvanı, Feqîyê Teyran'ın dört manzumesi (Şêx Sen'an, Bersisê Abid, Zembîlfiroş, Şerê Dimdim) ve Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn adlı mesnevisinden oluşmaktadır. Bu eserlerde yer alan türetme eklerinin analizleriyle hem bu eserlerin yazıldığı dönemin dil özelliklerinin aydınlatılması hem de gelecekte bu alanda yapılacak çalışmalara katkı sunulması amaçlanmaktadır. Çalışma betimsel dil bilim yöntemi ve işlevsel dil bilim analiz tekniğiyle yapılmıştır. Bundan dolayı ekler analiz edilirken biçimin yanında bağlam da göz önünde bulundurulmuştur.

Bu çalışma giriş ve üç bölümden oluşmaktadır. Girişte çalışmanın konusu, sınırları ve amacı hakkında bilgi verilmiştir ve çalışmanın dayandığı teori ile teknik ve çalışmanın önemi belirtilmiştir. Birinci bölüm çalışmanın teorik alt yapısı hakkında olup bu bölümde dil bilim teorileri, yöntem ve teknikleri ile morfemlerin özellikleri ve çeşitleri hakkında bilgi verilmiştir. İkinci bölümde türetme ön ekleri ve üçüncü bölümde ise türetme son ekleri semantik açıdan kategorilendirilmiş olup morfolojik, morfosentaktik ve morfosemantik açıdan analiz edilmiştir.

Çalışmanın sonucunda 11 tane türetme ön eki ve 22 tane türetme son eki tespit edilmiştir. Türetme ön eklerin analizi 49, türetme son eklerin analizi ise 40 semantik kategoride yapılmıştır. Toplam olarak ön eklerle türetilen 284 ve son eklerle türetilen 536 türemiş kelime tespit edilmiştir. Bu kelimeler ve türetme eklerinin istatistiksel oranlarını gösteren grafikler çalışmanın ekinde indeks olarak verilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Kelime yapımı, türetme, türetme ekleri, türetme ön ekleri, türetme son ekleri, Yukarı Kurmançça, klasik eserler.

ABSTRACT

The scope of this study is derivational morphemes. Derivation is one of the word building techniques and processes that occur with derivational suffixes. With this technique, a new word is derived by adding derivational suffixes (derivational bound morphemes) to words (free morphemes).

The study is limited to Upper Kurmanji as a dialect and the first works of Classical Kurdish Literature as a corpus. These works consist of Melayê Cizîrî's *Dîvan*, Feqîyê Teyran's four narrative poems (*Şêx Sen'an*, *Bersisê Abid*, *Zembîlfiroş*, *Şerê Dimdim*) and Ehmedê Xanî's mesnevi entitled *Mem û Zîn*. By analyzing the derivational morphemes in these works, it is aimed to both elucidate the linguistic features of the period in which these works were written and to contribute to future studies in this field. The study was conducted with descriptive linguistics method and functional linguistics analysis technique. Therefore, when analyzing the affixes, context as well as form was taken into consideration.

This study consists of an introduction and three parts. In the introduction, information about the scope, limits and purpose of the study is given, and the theory and technique on which the study is based and the importance of the study are stated. The first chapter is about the theoretical background of the study, and in this chapter information is given about linguistic theories, methods and techniques, and the properties and types of morphemes. In the second section, derivational prefixes and in the third section, derivational suffixes were categorized semantically and analyzed in terms of morphology, morphosyntactic and morphosemantics.

As a result of the study, 11 derivational prefixes and 22 derivational suffixes were detected. The analysis of derivational prefixes was made in 49 semantic categories, and the analysis of derivational suffixes was made in 40 semantic categories. In total, 284 derived words derived from prefixes and 536 derived words derived from suffixes were detected.

Keywords: Word-formation, derivation, derivation prefixes, derivation suffixes, Upper Kurmanji, classical works.

PÊŞGOTIN

Bi pêvajoya demê ra şert û mercên jîyanê diguherin û li gorî atmosfera dem û dewranê ev guherîn di gelek warên jîyanê da xwe didin der. Ji ber ku ziman jî wekî hebûneke zindî ya jîyanê ye ji vê guherînê para xwe werdigire û di vê pêvajoyê da pêdivîya ziman bi peyvên nû çêdibe. Ev peyv an di encama têkilîyên dîrokî, erdnîgarî, civakî û dînî da ji zimanên din tî wergirtin an jî li gor derfeta ziman ji nû ve tî sazkin. Gelek rêbaz û awayên sazkirina peyvên hene ku yek ji van jî dariştin e. Di zimanê kurdî da gelek çarvan bi rêya dariştinê û her wiha gireyên dariştinê peyvên nû saz dibin. Ev gireyên dariştinê ji pêşgir û paşgiran pêk tî.

Di vê çarçoveyê da ev xebat li ser gireyên dariştinê yî kurmancîya jorîn hatiye kirin. Ji bo metnên xebatê berhemên edebîyata klasîk hatine hilbijartin. Sebebê hilbijartina van metnan ew e ku ev metin, ji gelek alîyan ve taybetîya ziman a serdema ku tî da hatine nivîsîn nîşan didin. Ji ber ku di vî warî da berhemên *Melayê Cizîrî*, *Feqîyê Teyran* û *Ehmedê Xanî* di tradîsyona edebîyata kurmancîya jorîn da wekî destpêk in û ji aliyê sîstem û bikaranînê ve taybetîya ziman a serdema xwe nîşan didin wekî metnên xebatê berhemên wan hatine hilbijartin. Eger ev berhem baş bî şayesîn dê taybetî û bikaranîna kurmancî ya di warê dariştina peyvên da jî baştir bî famkin.

Ev tez herçiqas xebateke şexsî be jî di amadekirina wê da ked û piştgirîya gelek kesan heye. Serê pêşî ji ber ku di hemû pêvajoya xebatê da alîkarîya min kir ez spasîya şewirmendê xwe birêz Prof. Dr. Murat AKTAŞ dikim. Bi taybetî di warê metodolojîya zanistî da bêyî piştgirî û alîkarîya wî ev xebat nedî şerf. Herwiha di nivîsîn û kemîlîna xebatê da gelek feydaya endamên din ên lijneya tezê giha min. Dr. Hemin Omer AHMAD di warê rêbaz û teknîka tezê da û bi taybet ji di warê bidestxistina çavkanîyên soranî da gelekî alîkarîya kir. Wekî din bi xêra rexne û pêşnîyazên Doç. Dr. Mehmet Emin PURÇAK, Dr. Zafer AÇAR, Doç. Dr. Hayrullah ACAR û Doç. Dr. Ahmet GEMİ gelek kêmasîyên tezê hatin temamkin. Ez spasîyên xwe pêşkêşî hemîyan dikim, mala ava be.

Ahmet SEYARÎ

Enqere-2023

KURTEPEYV

Amd.	Amadekar
Bz.	Berî Zayînê
Ed.	Edîtor
Wer.	Werger
Yd.	Yên din

DESTPÊK

Xebatên zanistî li ser pirsan ava dibin û bi armanca çareserkirina pirsgirekan tîn kirin. Lewra jî di destpêk û pêvajoya wan da ji bo sînora û taybetîyên xebatê zelal bibin divê hin pirs bîn kirin. Ev pirs ji “çî?”, “çima?” û “çawa?”yê pêk tîn ku mirov dikare van bi kurtasî wekî “3Ç”yan formulîze bike. Ji van pirsan a “çî”yê mijar, çarçove û sînorên xebatê îfade dike. Pirs a “çima?”yê jî sebebê hilbijartina mijara xebatê û armanca wê destnîşan dike. Herî dawî jî pirs a “çawa?”yê jî teorî, rebaz û teknîka xebatê îfade dike.

1. Mijara Xebatê û Sînorên Wê

Mijara vê xebatê peyvsazî ye. Xebat ji alîyê mijar, korpus û dîyalektê ve hatiye sînordarkirin û tenê li ser gireyên peyvsaz hûr dibe. Ji bo vê xebatê wekî korpus *Dîwana Melayê Cîzîrî*¹, menzûmeyên Feqîyê Teyran² û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî³ hatine hilbijartin û xebat bi gireyên dariştinê yê kurmançîya jorîn⁴ hatiye sînordarkirin. Peyvsazî mijareke berfireh e û gelek rêbazên wê hene. Ev rêbazên wê di binbeşa bi navê “peyvsazî û rêbazên wê” da hatiye vegotin. Lê di vê xebatê da tenê peyvên ku gireyên dariştinê wergirtine hatine analîzkirin. Lewra peyvên ku bi wan rêbazên din ên peyvsazîyê saz bûne li derveyî xebatê dimînin. Ji ber ku di kurmançîya jorîn da gireyên dariştinê ji pêşgir û paşgirên pêk tîn xebat bi pêşgir û paşgirên dariştinê hatiye sînordarkirin. Di sazûna hin peyvên da sînorê dariştinê û pêkhatinê pir ne zelal e. Lewra ku hin morfemên serbixwe (peyv) bi pêvajoya demê ra vê erka xwe wînda dikin û wekî morfemên bendî tevdiqerin. Mîna “peyva ‘*pana/nobedar*’yê ku bi pêvajoya demê ra bûye

¹ Navê wî Ehmed e lê bi nasnavê Melayê Cîzîrî navdar bûye. Li bajarê Cîzîrê hatiye dinyayê (Zivingî, 2013: 17). Derheqê sedsala ku tê jîyayê nêrînê cuda hene lê di nav wan da ya ku zêdetir nêzî rastîyê ye sedsala 16. û 17. e. Helbest û menzûmeyên wî wekî dîwan gihane roja me. *Dîwana* wî di tarîxa edebîyata kurdî da yekem dîwan e ku bi awayekî murettib hatiye nivîsîn (Adak, 2015: 218).

² Navî wî yê rastîn Muhammed e, Feqî wekî mexles bi kar anîye. Li gorî agahîyên ku ji helbestên tîn derxistin, Feqîyê Teyran di sedsalên 16. û 17. da jîyayê (Yıldırım, 2014: 16). Feqî ji bajarê Miksê ye ku niha dikeve nav sînorên wîlayeta Wanê (Karadeniz, 2021: 9). Berhemên Feqî ji çar menzûmeyan (Şêxê Senan, Bersisê ‘Abid, Zembîlîroş û Şerê Dimdim) û helbestên wî yê curbicur pêk tîn (Adak, 2015: 238).

³ Ehmedê Xanî di 17. û 18. da jîyayê. Malbata wî mensûbê eşîreta Xanî ye. Malbata Xanî ji Hekarîyê koçî Bazîdê kiriye û Xanî li vir çêbûye (Yıldırım, 2014: 13). Berhemên wî ji “*Nûbihara Biçûkan* (1683)”, “*Eqîdeya Îmanê* (1687)” û mesnewîya wî ya bi navê “*Mem û Zînê* (1695)” û hin helbestên wî yê ku piştî wêfata wî hatine berhevkirin pêk tîn (Tek, 2018: 7).

⁴ Ev dîyalekt wekî kurdîya bakurî jî tê binavkirin û devokên “behdînî”, “torî”, “serhedî”, “botî”, “rojawayî”, “koçgirî”, “xorasanî”dikevin navê (Khalid, 2019: 10). Kurdên di nav sînorên dewleta Tirkîyeyê (ji xeynî herêmên dimilî), surîye, herêmên ku dikavin nav sînorê Sovyeta kevin, Mûsil û li Îranê û bakurê eyaleta Xorasanê da bi vê dîyalektê diaxivin (Hassanpour, 1997: 80,81). Kurdên ku bi vê dîyalektê diaxivin li Turkîyeyê (teqriben 10 heta 15 milyon), li Sûriyê (teqriben 2 milyon), li Iraqê (1 heta 1.5 milyon) û li Îranê (teqriben milyonek) û li Ermenîstan û welatên derûdora wê (teqriben 500,000 heta 1 milyon) dijîn (Sheyhollisami, 2020: 86).

‘-wan/-van’”û niha wekî paşgira dariştinê li kar e. Ji ber ku xebat bi rêbaza zimannasîyê ya hevdem hatiye kirin di analîzê da guherîna morfeman a dîrokî li ber çavan nehatiye girtin. Eger morfemek di metnên xebatê da ji alîyê morfosemantîk ve ne wekî peyv, wekî gireyekê hatibe bikaranîn di kategoriya morfema bendî ya dariştinê da hatiye pejirandin û hatiye analîzkirin.

Ji alîyê naverokê ve ji xeynî destpêk, encam û pêvekê xebatê ji sê beşan pêk tê. Beşa yekem ji agahîyên teorîk ên li ser xebatê pêk tê. Di vê beşê da pênaseya zimannasîyê hatiye kirin, taybetîyên wê hatine vegotin û di çarçoveya destpêka xebatên zimannasîya modern da behsa Saussure û sîstema wî ya nimîneyan hatiye kirin û derheqê şaxên sereke yên zimannasîyê, rêbaz û teknîkên wê da agahî hatine dayîn. Herwiha di vê beşê da taybetîyên morfeman hatine vegotin û derheqê cureyên wan da agahî hatine dayîn. Beşa duyem li ser pêşgirên dariştinê û ya sêyem li ser paşgirên dariştinê ye. Di van beşan da ji bo her pêşgir û her paşgirê binbeşek hatiye terxankirin. Di van binbeşan da pêşî derheqê gireya dariştinê da agahî hatine dayîn û taybetîyên wê hatine vegotin û paşî jî di binbeşên cuda da peyvên ku bi vê gireyê saz bûne ji alîyê morfolojîk, morfosentaktîk û morfosemantîk ve hatine analîzkirin.

Ev tez ne xebateke filolojîk û rêzimanî ye belkî xebateke zimannasî ye. Herçiqaq materyala lêkolînê ya van dîsiplînan yek be jî bi taybetî ji alîyê armanc û rêbaza xebatê ve ev her du war ji hev cu

da ne. Mesela “Fîlolojî li ser dîroka ziman binyada wî ya rojane û berhemên edebî yên ku bi wî zimanî hatine nivîsîn lêkolînê dike. Armanca wê ya sereke ya şirovekirina metnan e” (Bayrav, 1998a: 13; Kuram, 2018: 23). Xebatên pêşî yên zimannasî û filolojîyê têkel in û di van xebatan da bêhtir alîyê filolojîk derdikeve pêş, lê piştî bi pêşketina zimannasîya modern sînorên van dîsiplînan ji hev vediqete û zimannasî wekî warekî taybet derdikeve holê û di xebatên zimannasîyêda êdî ji şirovekirina metnan bêhtir ravekirin û şayesandina yekeyên ziman tên kirin.

Warê din yê ku bi zimannasîyê ra tê tevlihevkerin rêziman e. Rêziman hemû agahîyên axêverê zimanekî yên derheqê yeke û rêbazên wî zimanî da îfade dikin. “Armanca sereke ya rêzimanê ew e ku rê û rêbazên sîstema rêzimanê dîyar bike û axêveran hînê van rêbazan bike” (Aydın, 2014: 21).

“Rêzimana rêzikparêz (prescriptive grammar) ne şayesî û şiroveker belkî fermanker e. Armanca vê rêzimanê ne ew e ku taybetî û rêbazên ziman vebêje û bide famkirin. Ew dixwaze bide zanîn ku di bikaranîna ziman da divê mirov kîjan rêzikan tetbîq bike” (Fromkin û yd., 2011: 14-15).

Yanî ev rêziman hin rêzikan derdixe holê ku awayê bikaranîna ziman a rast û şaş ji hev vediqetîne. Lêbelê di zimannasîya modern da şayes esas e. Ev şayes, li ser sîstemên ziman û tekilîya di navbera yekeyên ziman da tê kirin. Di zimannasîya modern da taybetîyên bikaranîna ziman wekî “*rast*” û “*şaş*” nayên nirxandin tene rewşa heyî tê şirovekirin. Lêbelê wekî ku Saussure jî dibêje rêziman bi taybetî jî rêzimana klasîk, rêzikparêz e ji delva ku çavdêrîya dîyardeyan bike xwe mecbûr dibîne ku rêbazan deyne (1998: 130) lêbelê di zimannasîya modern da rêbazdanîn, giştîkirin û darizîn tune ye (Bayrav, 1998b: 28; Rifat, 2019: 24).

“Gelek xabatên serê pêşî yên li ser ziman ku yewnanan kiribûn û paşî frensîyan berdewam kiribûn li ser bingeha zanista mentikê bûn. Ji ber vê yekê jî feydeya wan rasterast nedigihê aliyê ziman yê zanistî. Tenê armanca wan ew bû ku rastî û şaşiyên bikaranîna ziman destnîşan bikin” (Saussure, 1998: 27),

Digel vê yekê xala sereke ya zimannasîya modern aliyê wê yê “şayesandinê” ye. Lewra li gorî vê dîsîplînê peywira sereke ya zimannasekî ew e ku li ser sîstema ziman çavdêrî û lêkolînê bike û taybetîyên wî destnîşan bike. Di vê merheleyê da di lêkolînên zimannasîyê da gotin û nirxandinên wekî “ev ziman dewlemend e, qels e, baş e, ne baş, xweş e, nexweş e, ” tune ne. Wekî li jor jî hat gotin karê zimannas tenê tesbîtîkirin û şayesandin e. Di lêkolînên ziman da divê lêkolîner xwe ji hestên ecibînê, fikr û nêrînên sibjektîf û pêşdarazîyên civakî dûr bixe. Di van lêkolînan da divê lêkolîner rêbazên sîstematîk bi kar bîne û bi awayekî objektîf û bêalî tevbigere.

2. Armanca û Hîpoteza Xebatê

Di kurmancîya jorîn da, di gelek warên jîyanê da pêdivî bi dariştina peyvên nû heye û ji bo dariştina peyvên nû xebatên şexsî yan jî lijneyî tên kirin. Tê hêvîkirin ku bi saya vê xebatê taybetîyên morfolojîk, morfosentaktîk û morfosemantîk ên gireyên dariştinê bên famkirin. Di piranîya xebatên li ser peyvsazîya kurdî da gireyên dariştinê bi nêrîneke giştî hatine vekolan û analîza wan ne bi rêbaza kargîn, bi rêbaza teşeyî hatiye kirin⁵. Di vê çarçoveyê da armanca vê xebatê şayesandina taybetîyên kurmancîya jorîn a

⁵ Tenê di xebata Mistefa û Ferhadî (2022), Mihemed (2022) û ya Geyik (2018) da dema pêşgir hatine dayîn ji metnên edebî nimûne hatine wergirtin û di hin cihan da peywend jî li ber çavan hatiye giritin lê ji ber ku

sedsala 16. û 17. e. Ji ber ku xebat bi rêbaza senkronîk a zimannasîyê hatiye kirin bi demê hatiye sînardarkirin.

Hîpoteza xebatê ev e: Gireyên dariştinê yê ku di metnê xebatê da derbas dibin ji alîyê morfosemantîk ve xwedîyê erkên cuda ne û ev erka wan li gorî peywenda metnê diguhere. Eger ev fonksîyon bên tesbîtkirin, kategorîzekirin û analîzkirin ev xebat dikare ji wan xebatan ra bibe alîkar ku bi awayekî şexsî yan jî lijneyî li ser dariştina peyvan tên kirin. Di vê çarçoveyê da xebat li ser van pirsan ava dibe:

- Di metnên klasîk ên kurmancîya jorîn da kîjan gireyên dariştinê hene û kîjan peyv bi van gireyan saz bûne?
- Peyvên ku bi gireyên dariştinê saz dibin di kîjan kategorîyên semantîk da ne?
- Gireyên dariştinê li ser peyvê her car eynî erka morfolojîk û semantîk pêk tînin an gelo li gorî rewşa peyvê ya morfosemantîk û peywenda wê maneyên cuda li peyvê bar dikin?
- Gireyên dariştinê ji alîyê morfolojîk û semantîk ve xwedîyê erkeke tenê ne yan pîrfonksîyonel in?

3. Teorî, Rêbaz û Teknîka Xebatê

Ev xebat bi metoda zimannasîya senkronîk (*synchronic linguistics*) û bi teknîka analîzê ya zimannasîya kargîn hatiye kirin. Di rêbaza modela senkronîk da lêkolîn li ser sîstem û binyada ziman tê kirin û ev rêbaz bêhtir li ser têkilîya di navbera yekeyên ziman da hûr dibe. Di çarçoveya metoda zimannasîya kargîn da jî li rex binyad û teşeyê rewş, peywend jî li ber çavan hatiye girtin. Ji ber ku ev xebat xwe dispêre rêbaza kargîn, gireyên peyvsaz li gorî peywendîya wan a di nav hevoksazîyê da û têkilîya wan a bi wan hêmanên din ra hatine analîzkirin. Jixwe ji ber ku xebat li ser teknîka kargîn ava bûye di analîza gireyên peyvsaz da, pêwendîya van gireyan bi hêmanên din ên di nav sentaksê da li ber çavan hatiye girtin.

Ji ber ku di xebatê da metoda zimannasîya senkronîk hatiye şopandin, di demeke dîyar da tenê şayesa sîstema ziman hatiye kirin û xebat ji alîyê demê ve bi sedsalên 16. û 17. û bi berhemên sê wêjevanan hatiye sînardarkirin. Xebat li ser guherîna ziman a dîrokî

ev xebat wekî meqale hatine nivîsîn zêde ne berfireh in û di wan da behsa gelek gireyên dariştinê nehatiye kirin.

hûr nabe. Ji ber ku ew dikeve warê zimannasîya dîrokî û teknîka dîyakronîk dixwaze. Di vê xebataê da tenê di tesbîtkirina etîmolojîya yekeyên maneyî da carinan gire hatine nirxandin û maneya wan hatiye vegotin, lê bi şêwazeke dîyakronîk pêvajoyê û guherîna peyv û gireyan nehatiye ravekirin. Tenê gire û peyv ji aliyê morfolojîk, morfosentaktîk û morfosemantîk ve hatine analîzkirin. Ji ber ku xebat ne bi rêbaza zimannasîyê ya rêzîkparêz hatiye kirin taybetî û bikaranînên ziman ji aliyê rastî û şaşîyan ve nehatine nirxandin. Herwiha ji ber ku ne xebateke rêzîmanî ye jî ji bo çêkirina peyvan rêbazek nehatiye pêşniyazkirin. Tenê xebat hewl dide ku şayesandina û analîza rewş û bikaranîna ziman bike. Ji ber ku teknîka zimannasîya kargîn hatiye bikaranîn tenê binyad û teşe li ber çavan nehatiye girtin herwiha nirxandin di çarçoveya peywir û peywenda yekeyên ziman da jî hatiye kirin. Ji ber vê yekê jî peyv bi serê xwe li gorî cureyan nehatine kategorîzekirin berevajî wê, peyv li gorî peywira xwe ya di nav metnê da hatine dabeşkirin.

Rêbaz û teknîk ji xeynî rêbaza xebatê ji bo hîlbijartina nimûneyan jî diyarker. Yozgat vê taybetîyê wiha destnîşan dike:

“Di teknîka teşeparêz da lêkolîner, nimûneyên xwe di çarçoveya bîryara axêverê zimanê zikmakî (native speaker judgements) da bixwe dinivîse û dema pêdivî bi hêçandina van nimûneyan çêbibe teknîka pirsyariya bîryara rêzîmanîyê (gramatical judgement survey) bi kar tîne û bi rêya pirsên ji axêverê ziman, analîzan dike. Ev nimûneyên lêkolîner wekî hevokên ku li ser maseyê hatine nivîsîn tînin binavkirin. Lêbelê di teknîka kargîn da rewş cuda ye. Di vê teknîka da lêkolîner li ser metnên rastîn, axaftinên rojane, qunciknivîsên rojnameyan û nûçe yan jî metnên edebî dixebite” (Yozgat, 2018: 70-71).

Di vê xebatê da analîza peyvan a ji aliyê semantîk ve li gorî rêbaza nimûnesazîyê hatiye kirin yanî zêdebûna gireyan çî guherîn di têkilîya hêmana nimûner (signifier) û nimandî (signified) da pêk anîye ew hatiye analîzkirin. Ev analîz li gorî sê krîteran hatine kirin: Krîtera morfolojîk (morphological criteria), krîtera semantîk (semantic criteria) û krîtera morfosentaktîk (morphosyntactic criteria). Analîza ku bi vî awayî erk û fonksiyona morfeman a di nav hevokê da li ber çavan digire analîza morfosentaktîk e. “Morfosentaks temsîliyeta morfolojîk a sentaksî jî îfade dike. Lewra jî digel maneya peyvê ya ferhengî rolên wê yê din jî derdikevin pêş” (Marif, 2014: 234). Di analîza morfolojîk da morfem tenê ji aliyê teşeyî ve tînin ravekirin, lê di analîza morfosentaktîk da erka morfeman li gorî erk û peywendê tê ravekirin. Ji bo ku cure, peywir û fonksiyonên

gireyan baş bên famkirin tenê zanîna taybetîyên morfolojîk têrê nake, divê rol û peywenda peyvê ya di nav risteyê da jî bê zanîn.

Du fonksîyonên sereke yê yekeyên ziman hene: fonksîyona erkî û fonksîyona maneyî. “Erk û mane têkildarî hev in, lê ne heman tişt in. Erk bicihanîna peywirekê ye, lê mane, ew tişt e ku di encama vê peywirê da di hiş da peyda dibe” (Varol, 2022: 274). Mane di heman demê da ew têgih an jî fikr û raman e ku hest, heyber an jî pêwendîyekê dinimîne. Naveroka ku tê nimandin hêmanek ji pêvajoya pêkhatina nimineyê (sign) ye (Rifat, 2013: 5). Fonksîyona erkî li gorî maneyê tengtir e. Lewra ev fonksîyon taybetmendîyeke sînordar nîşan dide, lê ya maneyî digel maneya peyvê ya sereke û yekem li gorî peywendê carinan gelek maneyên din jî nîşan dide (Akçataş û Varol, 2021: 415). Ev taybetmendî di heman demê da fonksîyona morfolojîk û ya morfosemantîk jî îfade dike. Fonksîyona morfolojîk ew fonksîyona rêzimanî ye ku binyada yekeyên ziman a teşeyî îfade dike, lê fonksîyona morfosemantîk ew erk e ku bi rêya yekeyên ziman maneyekê li morfeman bar dike. Bi gotineke din ew pêwendîya semantîk e ku di navbera peyvê û morfema dariştinê da bi erka maneguhêrîyê li kar e. “Fonksîyona morfolojîk dîyar û sînordar e, lê ya morfosemantîk berfireh û muxleq e” (Varol, 2022: 276). Morfosemantîk di heman demê da “dîsîplineke zimannasî û şaxeke manenasîyê ye ku wê erka maneyî vedikole ku bi rêya gireyan li peyvan bar bûye” (Akçataş û Varol, 2021: 413).

Di vê çarçoveyê da di vê xebatê da pêşî peyvên dariştî ku gireyên peyvsaz girtine hatine tesbîtkirin û ev gire li gorî fonksîyona wan hatine dabeşkirin. Piştra peyvên ku bi van gireyan saz bûne hatine komkirin û ji her komê hin peyv hatine analîzkirin. Pêşî taybetîya peyvê ya morfolojîk hatiye gotin û piştre jî taybetîya wê ya morfosentaktîk li ber çavan hatiye girtin û ji aliyê semantîk ve maneya ku gireya peyvsaz li peyvê zêde kiriye hatiye analîzkirin. Ji ber ku xenatê bi rêbaza kargîn hatiye kirin peyv bi serê xwe nehatine dayîn. Peyvên nimûne di nava metnê da hatine destnîşankirin û di nimûneyan da ji bo destnîşankirina peywenda peyvê, beyta ku peyv tê da derbas dibe hatiye nivîsîn. Peyvên mayî ku analîza wan nehatiye kirin jî di dawîya xebatê da wekî îndeks hatine dayîn.

4. Xebatên Berî Niha yên li ser Mijarê

Heta niha di gelek pirtûkên rêzimana kurdî da derheqê peyvsazîya kurdî û herwiha gireyên dariştinê da agahî hatine dayîn. Di vî warî da xebata yekem a ku bi berfirehî li ser vê mijarê sekinîye xebata Bedirxan û Lescot (2004) e. Wekî din jî berhemên ku rasterast li ser peyvsazîya kurdî jî hatine nivîsîn hene. Hinek ji van xebatan rasterast bi dariştinê sînordar in û hinek ji wan jî bi giştî li ser peyvsazîya kurdî ne û ev xebat di çarçoveya vekolîna rêbazên peyvsazîyê da li ser dariştina peyvan û herwiha gireyên dariştinê hatine kirin.

Di vê çarçoveyê da li ser peyvsazîya kurmancîya jorîn hin xebat hatine kirin. Di vî warî da xebata herî berfireh a Muhammed (2016a) e ku bi navê “*Peyvsazî di Zimanê Kurdî de*” hatiye kirin. Di vê xebatê da hemû rêbazên peyvsazîyê û herwiha wekî rêbazeke peyvsazîyê rêbaza dariştinê jî hatiye vegotin û ravekirin. Xebata din a ku di warê dariştina peyvan da hatiye kirin pirtûka Tîgrîs (2011) e ku bi navê “*Pêşkî û Parkî*” hatiye kirin. Tîgrîs di vê xebata xwe da cih daye gireyên dariştinê yên kurmancîya jorîn û digel agahîyeke kurt listeya peyvên dariştî daye. Ji xeynî van xebatan hin tez jî di vî warî da da hatine nivîsîn. Yek ji van, tezeke mastirê ye ku bi navê “*Peyvsazî di Kurmancî de: Nêrîneke Giştî*” (Delikaya, 2016: 42) hatiye kirin. Delikaya di vê xebata xwe da rêbazên peyvsazîyê dane nasîn û derheqê gireyên dariştinê da agahî dane. Xebata din a di vî warî da teza bi navê “*Rolê Girekan di Polguherîna Peyvan da*” ye (Ebdilqadir, 2016). Ev xebat bi kurmancîya jorîn û devoka behdînan hatiye sînorkirin û tê da erka morfemên dariştinê yên cureguhêr hatiye nivîsîn. Wekî din hin meqale jî di warê peyvsazî û dariştinê da hatine nivîsîn. Di vî warî da meqaleya bi navê “*Dahûrînek li ser Parkîtên Kurmancî*” (Farqînî, 1996) û ya din jî “*Dariştina Awayê Peyvan*” e (Farqînî, 2011). Meqaleya din ya ku di vî warî da hatiye nivîsîn xebata bi navê “*Bikaranîna Rengdêrên Kurmancî di Helbestên Melayê Cizîrî de*” ye (Geyik, 2018).

Li ser peyvsazîya kurdî bi soranî jî berî niha hin xebat hatine kirin. Yek ji van xebatan a (Rehîmî, 2008) ye ku bi navê “*Binemekanî Wişesazî û Wişeronî le zimanê kurdî*” hatiye kirin. Di vê berhemê da di warê peyvsazîya kurdîya “*feylî*”, “*kelhurî*” û “*kirmanşanî*” da agahî hatine dayîn. Di warê peyvsazîya kurdî da xebatek ji aliyê Usman (2015) ve wekî teza mastirê bi navê “*Morfolojiyayî Dariştinî Wişe le Zarî Hewramî û Kurdî Nawerast*” da li Zankoya Selahedînê hatiye kirin. Ji xeynî van xebatan di vî warî da gelek meqale jî di kovaran da hatine weşandin. Yek ji van xebatan ya Mistefa û

Ferhadî (2022) ya ku bi navê “*Be Berhemî Morfemî Bendî Wişedarêjekan le Şirekanî Şêrko Bêkes da*” hatiye kirin. Di vê xebatê da morfemên dariştinê yên di helbestên *Şêrko Bêkes da* hatine analîzkirin û îstatîstikên wan hatine dayîn. Xebata din a di vî warî da xebata Mihemed û Birzo (2022) ye. Di vê xebatê da proseya peyvsazîyê hatiye vekolan û keresteyên xebatê ji devoka Xaneqînê hatine hilibijartin.

Ji xeynî van berheman, du xebatên li ser dariştina peyvên dimilkî (zazakî) hatine nivîsîn. Yek ji van, tezeke bi navê “*Zazakî de Derheqê Awanî û Antişî yê karî ser Yew Cîgerayîş*” e (Demîr, 2015). Ev xebat li ser taybetîyên karan hatiye kirin, lê binbeşeke wê jî li ser pêşgirên dariştinê ye ku karan saz dikin. Xebata din a di vî warî da bi navê “*Li Gor Çêbûna Xwe Bêjeyên Kirmanckî (Zazakî)*” (Malmisanij û Mosa, 2016) hatiye kirin û tê da derheqê peyvên dariştî û pêkhatî yên zazakî da agahî hatine dayîn û hevbeşî û cudahîya bêjeyên kirmanckî û kurmanckî hatine destnîşankirin.

BEŞA YEKEM

TEORÎ, RÊBAZ Û TEKNÎKÊN ZIMANNASÎYÊ Û MORFEM

1.1. Zimannasî

Zimannasî ew warê zanistî ye ku bi awayekî sistematîk li gorî hin rêbazan li ser hemû alîyên ziman lêkolînê dike. Ev lêkolîn hem li ser destpêk û zayîna zimanan hem jî li ser taybetîyên wan ên giştî û guherînên ziman tê kirin. Armanca sereke ya zimannasîyê ne tesbîtkirina rastî yan jî şaşîyên ziman e. Armanca û peywira zimannasîyê ya sereke şayesîna taybetîyên ziman e. Di vê çarçoveyê da “zimannasî bi awayekî raveker û şayesî tevdiqere û bi vê taybetîya xwe ji rêzimana rêzikparêz, fermanker, gerdîşî û ji filolojîyê vediqete (Vardar, Güz, Huber, Senemoğlu û Öztokat, 2007: 73).

Ji ber ku materyala zimannasîyê ya lêkolînê ziman e ji bo zimannasî û ekolên wê baş bîn famkirin lazim e pênaseya ziman bê kirin. Ziman wekî materyaleke zimannasîyê heta niha ji alîyê gelek zimannasan ve hatiye pênasekirin. Saussure ku wekî avakerê zimannasîya modern tê zanîn ziman wekî pergalekê dibîne ku ji nimûneyan pêk tê. Li gorî Saussure her yek ji van nimûneyan xwedîyê maneyên cuda ne. Ziman xwedîyê sistemeke piralî û pêşketî ye ku fikr, hest û daxwazî bi rêya hêman û rêbazên wî tînen veguhastin. Herwiha ev taybetîyên ku bi ziman tînen veguhastin ji alîyê mane û deng ve di nav civakê da xwedîyê kodên hevpar in (1998) û di navbera hêmanên sistema ziman da yekpareyîyek heye û ev hêman ji bo pêkanîna armançê tînen cem hev.

Ev sistema sembolan a ziman bi awayekî keyfî⁶ têkildarî wê tiştê ye ku di heman demê da taybetîya xwe nîşan dide (Dessales, Picq û Victorri, 2018: 15). Ev nêrîna ku ziman wekî sistemekê dibîne cudahîyê dixê navbera ziman û gotinê. Di vê sistemê da ziman û gotin eynî tiştî îfade nakin. Di şirovekirin û pênaseya ziman da Saussure balê dikişîne ser vê taybetîyê û “*ziman*” û “*gotin*”ê ji hev cuda dike. Li gorî wî “*ziman*” (langue) qabilîyeta mirov a axaftinê ye, lê “*gotin*” ew tişt e ku mirov îfade dike û vediguhezîne. Yanî “*ziman*” hem navgîna gotinê ye hem jî encama wê ye. Ziman di heman demê da wekî ferhengê ye ku kopyaya wê bi hemû endamên civakê ra peyda dibe. Lê “*gotin*” ne tiştê civakî ye, li gorî îradeya mirov a şexsî pêk tê û sazkirineke demborî ye (1998: 50-51).

⁶ Keyfîbûna ziman konsensusa di navbera axêverên ziman da îfade dike.

Wekî din pênaseyên ziman hem di çarçoveya fonksîyonên wî yê cuda da hem jî li gorî rêbaz, teknîk û teorîyên cuda yê zimannasîyê diguherin. Zimannasîya ku li ser alîyên ziman ên fonksîyonel radiweste ziman wekî wasîteya raman û tevgerê û amûreke giring ya ragihîne dibîne (Butler, 2003: 2). Li gorî zimannasîya veguhêra hilberîner (generative transformational linguistic) ziman pergaleke wisa ye ku peyv û rêbazên wê sînordar in (Fromkin û yê din, 2011: 58), lê bi hêmanên wê mirov dikare bi hejmareke bêsînor hevokan saz bike. Zimannasîya binyadparêz (structure linguistic) ziman wekî sistema nimîneyan dibîne ku li ser lihevkerîna ava bûye (Toklu, 2009: 14). Zimannasîya ku di warê zimannasîya civakî da dixebitin alîyê ziman ê civakî derdixin pêş û li gorî wan divê ziman li gorî têkilîyên civakî, performans û bikaranîna wî ya di pratîkê da bê terîfîkirin (Holmes, 2013). Saussure vê taybetîya ziman wekî kodên neteweyekî yê hevpar dibîne ku li ser konsensûsa civakî ava bûye (1998). Marouzeau û Lalande pergala nimîneyan (sign) a ku di pêvajoya ragihîne da karîgerîyê dike wekî ziman bi nav dikin. (Kıran, 1996: 78). Ji alîyê erk û kargîrîyê ve fonksîyonên ziman ên siyasî, civakî û binyadî hene. Ji alîyê binyadî ve ziman ew yekbûn û tevahîya sisteman e ku tê da hêmanên maneyî û nimîne hene. Ji alîyê civakî ve ziman navgîna esasî ye ku çanda civakê ji bo nifşên dahatûyê vediguhezîne û ji alîyê siyasî ve jî hêmana karîger a hilgir û veguhêzera çanda neteweyî (Yaylagül, 2007: 58). Lewra rengvedana taybetîyên civakekê yê wekî jîyan, kevneşopî, bîrdozî, felsefeya jîyanî, bawerîyê û tesîrên wan ên li ser zanist, teknîk û hunerê, xwe di ziman da didin der (Aksan, 2015: 13). Di heman demê da ziman ji bo peydabûna fikr û ramanê dibe navgîn û amûr. Lewra fikr û ramanên mirov bi xêra gotin û hevokan derdikevin holê û dîyar dibin (Ahanov, 2021: 43).

1.1.1. Destpêka Xebatên li ser Zimannasîyê

Berî destpêka zimannasîya modern li ser ziman gelek xebat hatine kirin. Xebatên pêşî yê li ser ziman bêhtir bi armancên dînî dihatin kirin. Lewra xebatên ku di serdemên pêşî da hatine kirin ji bo famkirin û veguheztina metnên dînî bûn (Aksan, 2015: 16). Hin jî van xebatan jî ne bi armanca nasîna ziman, bêhtir di çarçoveya xebatên felsefî, retorîk, mentiq, derûnnasî, pedagojî, helbest û hunerê da hatine kirin (Savaş, 2017: 11). Li Mezopotamyaya kevin zimanê sumerî hebû. Ev ziman di dema akadîyan da jî wekî zimanê wan yê dînî û edebî berdewam kir. Mesela wekî ku Aydın dibêje:

“Li Hindistanê jî metnên dînî yê Hindûîzmê bi sanskirîtî bûn û bi guherîna demê ra êdî ev metin baş nedihatî famkirin û xebatên li vir ên li ser ziman bi armanca famkirina van metnan hatin kirin. Armanca van xebatan ew bû ku metnên dînî yê bi navê *Weda* baş bî famkirin. Yek ji van xebatan jî berhema *Yeska* ye. *Yeska* ev xebata xwe ya bi navê *Nîrûkta* di sedsala 7. (Bz.) da nivîsî. Di vê pirtûkê da li rex şiroveyên metnên dînî agahîyên li ser cureyên peyvên cih digirtin” (Aydın, 2014: 23).

Wekî din bi armanca hînkirina zimanê sanskirîtî li Hindistanê hin xebat hatin kirin. “Di vî warî da xebata yekem bi navê *Astadhyayî* ye. Ev, yekem xebata zanistî ya derheqê zimanên Hind-Ewropî ye” (Fischer, 2010: 138). Di sedsala 4. (Bz.) da *Arîsto* xebatên *Platon* ên li ser ziman hinekî din bi pêş xistin. Dengên ziman bi navê dengdêr, nîvdengdêr û bêdeng kirin sê beş. Herwiha kategorîyên rêzimanî wekî navdêr, kar, daçek û rewş dîyar kirin (Yaylagül, 2007: 74).

Bi taybetî di xwendîngeha yewnanan a Îskenderîyeyê da gelek xebatên ziman hatin kirin. Di sedsalên 3. û 2. (Bz.) da di vê xwendîngehê da gelek xebatên rêziman hatin kirin (Aksan, 2015: 18). Xebatên serdema Yewnana Antîk bêhtir di warê etîmolojî û lehçezanîyê da bûn û li ser zimanê yewnanî û latînî dihatin kirin lêbelê di serdema navîn da ev xebat li ser zimanên erebî û îbranî berdewam kirin. Bi taybetî di vê serdemê da xebatên sentaksî dest pê kirin (Yozgat, 2018: 33). Piştî yewnanan ji aliyê romayîyan ve li ser ziman xebat hatin kirin. Tradîsyona xebatên romayîyan berdewamîya xebatên yewnanan in. Jixwe di hin çavkanîyan da ev tradîsyon, wekî grekoromen tê binavkirin (Savaş, 2017: 16). Jixwe di serdema navîn da zimanê latînî li hemû Ewropayê wekî zimanê nivîskî dihat bikaranîn û di heman demê da wekî zimanê biyanî dihat hînkirin. Lewra jî bi armanca hêskirina hînkirina zimanê latînî pirtûkên rêzimanê hatin nivîsîn. Piştî demekê wan zimanên din ên herêmî bala kesên ronakbîr kişand û bi vî awayî pirtûkên rêzimanê yê van zimanan jî hatin nivîsîn (Savaş, 2017: 18). Xebatên li ser ziman ên li Ewropayê bi taybetî piştî destpêka serdema modern û destpêka keşfê erdnîgarîyê zêde bûn û rengêkî nû wergirtin. Di vê serdemê da kaşif, rêvebirên mêtinker, seyah, misyoner û bazirganên ku li cih û warên nû rastî zimanên nû dihatin agahîyên derheqê wan zimanan da wekî rapor ji derdorên zanistî yê Ewropayê ra şandin û li ser bîngeha van agahîyan xebatên danberhevî yê li ser van zimanan dest pê kirin (Savaş, 2017: 20).

Gelek caran xebatên zimannasî, rêzimanî û filolojîk di heman kategorîyê da tên dîtin. Herçiqas materyala lêkolînê ya van dîsîplînan yek be jî bi taybetî ji aliyê armanc û

rêbaza xebatê ve ev têgih ji hev cuda dibin. “Yek ji van warên ku gelek caran wekî zimannasîyê tê dîtin filolojî ye. Filolojî li ser dîroka ziman binyada wî ya rojane û berhemên edebî yên ku bi wî zimanî hatine nivîsîn lêkolînê dike” (Kuram, 2018: 23). Armanca sereke ya filolojîyê şirovekirina metnan e (Bayrav, 1998: 13-14). Xebatên pêşî yên zimannasî û filolojîyê têkel in û di van xebatan da bêhtir aliyê filolojîk derdikeve pêş, lê piştî bi pêşketina zimannasîya modern sînoren van dîsîplînan ji hev veqetîya û zimannasî wekî warekî taybet derdiket pêş. Di van xebatan da êdî ji şirovekirina metnan bêhtir ravekirin û şayesandina yekeyên ziman hatin kirin.

Warê din yê ku bi zimannasîyê ra tê tevlihevkerin rêziman e. Rêziman hemû agahîyên axêverê zimanekî îfade dikin ku derheqê yeke û rêbazên wî zimanî da ne. Di vê çarçoveyê da “armanca sereke ya rêzimanê ew e ku rê û rêbazên sîstema ziman dîyar bike û axêveran hînî van rêbazên ziman bike” (Aydın, 2014: 21). Bi taybetî rêzimana rêzikparêz (prescriptive grammar) ne şayesî û şiroveker belkî fermanker e. Armanca wê ne ew e ku taybetî û rêbazên ziman vebêje û bide famkirin, ew dixwaze bide zanîn ku di bikaranîna ziman da divê mirov kîjan rêzikan tetbîq bike (Fromkin û yd., 2011: 14-15).

1.1.2. Destpêka Zimannasîya Modern

Xebatên li ser ziman ên serdema navîn bêhtir di çarçoveya zimannasîya pedagojîk, zimannasîya felsefî û berawirdî û zimannasîya dîrokî da dihatin kirin. Saussure van xebatan wekî sê serdemên cuda dinirxîne. Xebatên serdema duyem ku di xwendîngeha Îskenderîyeyê da dest pê kiribûn filolojîk bûn. Di van xebatan da, rexneya metnan û berawirdkirina wan derdikete pêş. Di serdema sêyem da, êdî rêzimana berawirdî derdikeve pêş û bi taybetî li ser bîngeha zimanên hind-ewropî gelek xebatên kirin (1998: 27-30). Zimannasîyê, ançex di sedsala 20. da bi rêbazên xwe yên taybet, bi teorîyên xwe yên raveker statûyeke zanistî bi dest xist (Kıran, 1996: 28). Lewra di serê vê sedsalê da, di zimannasîyê da, gelek pêşketin pêk hatin û van pêşketinan, rê li ber destpêkirin û geşedana zimannasîya modern vekir. Bi xêra van xebatan nêrîna binyadparêz derket pêş. Pêşengîya van xebatan jî zimannasê Swîsrî *Ferdinand Saussure* (1857-1913) kir. Ji ber vê yekê jî Saussure wekî avakerê zimannasîya modern û pêşengê zimannasîya binyadger tê dîtin.

1.1.2.1. Ferdînannd Saussure û Sîstema Nimîneyan

Saussure di navbera salên 1907-1911an li zanîngeha Cinîvê (Geneva) dersên zimannasîya giştî didan û bi xêra van dersan di warê zimannasîyê da rêyekê nû vebû. “Nîşeyên Saussure yê dersan ji alîyê xwendekarên wî ve bi navê ‘*Course Da Linguistique generale*’ (Dersên Zimannasîya Giştî) hatin çapkirin” (Harris, 2001: 118). Bi van dersan wî li ser gelek zimannasên piştî xwe û ekolên zimannasîyê tesîrek pêk anî. Di warê zimannasîya civakî da *Meillet* û *Sommerfelt*, di warê şêwaznasîyê da *Bally*, di warê zimannasîya kargîn da *Martinet*, ji ekola Pragê *Karçevskî*, *Trubetzkoy* û *Jakobson* di warê manenasîyê da *Ulmann* û *Prieto* herwiha *Bloomfiel*, *Hjelmslev* û ekola glossematik û *Chomsky* di bin bandora wî da mane”(Senemoğlu, 2012: 271).

Saussure bi sîstema xwe ya nimînenasîyê, da zanîn ku ziman ne ji lîsteya peyv û têgihan pêk tê, ew ji yekpareyeke nimîneyan pêk tê ku di navbera wan da peywendîyeke xurt heye (Aksan, 2006: 2). Nimîne ew cure teşe, amûr û dîyarde ne ku ji xeynî xwe cihê tiştêkî din digirin yanî ji bilî xwe tiştêkî din temsîl dikin û dinimînin. Nimîne di dirûvê tiştên wekî peyv, îmaj, deng, jest an jî amûrên din da tîrî fîdekirin. Nimîne amûrên derbirîna maneyan in. Lewra hest, fikir û raman, agahî û çî tiştên ku bi mirovên din ra bîr parvekirin bi rêya nimîneyan tîrî fîdekirin. Ji ber vê yekê jî nimîne bi hemû zanistan ra tîkildar e. (Yaylagül, 2007: 11-12). Dîsîplîna zanistî ku li ser nimîneyan lêkolînê dike nimînenasî ye. Nimînenasî şayesîna sîstemên nimîneyan dike, peywenda di navbera van sîsteman da tesbîr dike û maneya wan îfade dike. Nimînenasî warekî berfireh e û gelek alîyên wê hene. Zimanê mirovan jî ji sîstema nimîneyan pêk tê û bi vî alîyê xwe dikeve warê nimînenasîyê. Di navbera nimîneyên din û yê ziman da ji gelek alîyan ve cudahî hene. Ahanov vî cudahîyê wiha îfade dike: Ziman ne tenê mane, fikr û ramanan radigihîne di heman demê da hest û meylên mirov, nêrînen mirov û rewşa derûnasîya mirov jî radigihîne ku ev taybetî di wan sîstemên din ên nimîneyan da tune ye (2021: 63). Saussure ziman dişîbîne kaxezekê ku rûyekê wê fikr û rûyekî wê jî deng îfade dike û dema rûpelek bê qetandin alîyê din jî pê ra diqete (Saussure, 1998: 169). Di nimîneyan da jî alîyekî kaxezê hêmana nimînerê û yê din hêmana nimînekirî ye û her du alî nikarin ji hev biqetin. Têkilîya di navbera hêmana nimîneker û ya nimînekirî da ne sirûştî belkî civakî ye û li ser konsensûsê ava bûye. Saussure vî têkilîyê di navbera hêmana nîşanker û nîşankirî da wekî têkilîya bêsebeb bi nav dike û wiha dibêje: “Wekî nimîne di navbera tîgîha “*bira*” û wî dengî da ku wê nîşan dide (*b-i-r-a*) tu pêwendîyeke binyadî tune ye”

(1998: 111). Pêwendîya di navbera wan da bi temamî li ser lihevkirina (consensus) civakî ava bûye. Jixwe ziman awayekî peyman û lihevkerinê ye. Eger li ser nimîneyekê lihevkerinek pêk hatibe êdî taybetîya wê ya zatî ne giring e. Li gorî Saussure taybetîya bêsebebbûna nimîneyên ziman di heman demê da wan ji sembolan jî vediqetîne. Bervajî nimîneyên ziman, di navbera hêmana nimîneker û nimînekirî ya sembolan da têkilîyek heye û ev têkilî ne bêsebeb e” (1998: 113).

Taybetîyeke din a nimîneyan guherîn û neguherîna wan e. Gelo du taybetîyên dijberî hev çawa heman têgihê terif dikin. Saussure vê rewşê wekî “*hîlbijartina mecbûrî*” bi nav dîke. Li gorî wî herçiqas nimîneker jî alîyê dîyarkirin û nimînekirina têgihêkê ve encama hîlbijartineke azad be ji alîyê hîlbijartina civakî ve ne azad e. Di vê meseleyê da raya civakê nayê pirsîn û nimînekera ku ziman ew jî xwe ra hîlbijartîye nikare bê guherandin. Ev rewşa ku wekî dijberîyekê xuya dîke wekî “*hîlbijartina mecbûrî*” tê binavkirin (1998: 116). Herçiqas dem berdewamîya ziman nîşan bide jî taybetîyeke wî ya din jî heye ku bi neguherîna ziman ra wekî dijberîyekê xuya dîke. Ev taybetî jî ew e ku nimîneyên ziman, carinan zû carinan dereng, bi demê ra diguherin. Ji ber vê yeke jî mirov dikare bibêje ku nimîneyên ziman hem “*guherbar*” hem jî “*neguherbar*” in (Saussure, 1998: 120).

1.1.4. Şaxên Sereke yên Zimannasîyê

Di lêkolînên zimannasîyê da piştî têkilîdanîna bi wan dîsîplînên din ra hin şaxên zimannasîyê peyda bûne. Di hemû şaxan da materyala hevpar a lêkolînê ziman e lêbelê li gorî çarçove û hêla ziman a ku lêkolîn li serê tê kirin her şaxek xwedîyê taybetîyên cuda ye. Di lêkolînên zimannasîyê da ji bo her warê xebatê şaxezanistêke cuda heye. Di dabeşbûna van şaxan da di navbera zimannasan da bi temamî lihevkerinek tune ye. Lêbelê li ser hin şaxên sereke yên wekî “*dengnasî*”, “*morfolojî*”, “*ristesazî*”, “*manenasî*”, “*ferhengnasî*”, “*navdêrnasî*”, “*zimannasîya metnî*” û “*zimannasîya civakî*” konsensûsek çêbûye. “Peywira sereke ya ziman veguhastina bîr, mebest û maneyê ye. Mane jî di asta ziman da ji piçûktirîn pêkhatêya ziman yanî ji morfemê dest pê dîke û ber bi jor ve diçe ta digihîje risteyê û diçe derveyî risteyê”(Emîn, 2011: 19)

1.1.4.1. Dengnasî (Phonology)

Dengnasî ew şaxezanist e ku li ser taybetîya dengan û erk û fonksiyonên wan lêkolînê dike (Hayes, 2009). Gelek caran dengnasî (phonology) û dengsazî (phonetics) li cihê hev tèn bikaranîn herçiqas ji hêla warê lêkolînê ve alîyên wan ên hevpar hebin jî ji gelek alîyan ve ji hev cuda ne. Saussure cudahîya di navbera her du têgihan da wiha tîne ziman: Fonolojî zanistekê dîrokî ye û li ser veguherînan dixebite, lê fonetîk li derveyî sînorê demê ye. Ji ber ku dirkandin û asta wê ya vegotinê tu carî naguhere fonetîk beşeke sereke ya zimannasîyê ye, lê fonolojî şaxeke wê ya alîkar e (Saussure, 1998: 68). Di vê çarçoveyê da mirov dikare bibêje ku dengnasî dibe du beş: fonetîk, “*dengnasîya giştî*” û fonolojî, “*dengnasîya erkdar*” îfade dike. Fonolojî li ser erka dengan ya di nava ziman da radiweste (Aksan, 2015a: 26) yanî fonolojî bêhtir bi alîyê xwe yê erkdarîyê ve derdikeve pêş. Lêbelê “fonetîk ji wê beşa zimannasîyê ra tê gotin ku li ser fizîkîya zarkirina dengan dixebite, anku derûya her dengê ji rexê dev, lêv, diran, zengelorê hwd. ve dîyar dike (Mahmoud, 2017: 31). Fonetîk erka dengan li ber çavan nagire bêhtir bi gotinê (parole) ra têkildar e û yekeya herî piçûk ku lêkolînê li serê dike deng (phone) e. Dengnasîya erkdar an jî fonolojî li ser erkên dengan lêkolînê dike, dengan li gorî têkilîya risteyî dabeş dike û guh nade wan dengên akustîkî ku ne xwedîyê taybetîya maneguhêr in. Yekeya herî piçûk ku li serê dixebite yekedeng (phoneme) e (Toklu, 2009: 37). Di zanista dengnasîyê da fonem ew dengên manecudaker (distinctive feature) in. Wekî nimûne di peyvên “*dar*”, “*bar*”, “*kar*”ê da dengên “*d, b, f*”yê fonem in. Lewra bi van dengan maneya peyvê diguhere. Lê dengên ku ne di maneyê da tenê di bilêvkirinê da cuda dibin şewedeng (allophone) in. “Li gorî zarê wan mirovên ku dipeyivin, weku: dengê ‘*p*’ya sert di peyva ‘*penîr*’ da û dengê ‘*p*’ya asayî ya di heman peyvê da yan jî di encama şewexaftineke takekesî da derkeve, weku: mar û me’r, an hişk û ‘işk’” (Mahmoud, 2017: 34).

1.1.4.2. Morfolojî (Morphology)

Morfolojî jî ew şaxezanista zimannasîyê ye ku li ser rayek û gireyan û peywirên wan hûr dibe û bi taybetî li ser pêkhatin û binyada peyvê lêkolînê dike (Mihêddîn, 2013: 19). Ev şaxezanist di warê fonksiyonê da wekî morfolojîya dariştinê (derivation morphology) û morfolojîya kêşanê (inflection morphology) (Uzun, 2006: 46) û di warê cureyî da jî wekî morfolojîya navdêrî (nominal morphology) û morfolojîya karî (verbal morphology) dabeş dibe. “Hemû guherînen teşeyî yên di peyvê da dibin mijara

morfolojîyê bi taybetî morfolojî li ser binyada peyv an dixebite û analîza morfeman dike” (Binkert, 2004: 85; Matthews, 2002: 2). Di xebatên berê yê rêzimana klasîk da xebat bêhtir li ser pirsgerêkên têkildarî teşeyê yê wekî peywira gireyan û taybetîyên ziman ên dariştin û kêşanê dihatin kirin. Lê belê xebatên zimannasîya binyadger ziman wekî sîstem û binyadekê dibînin. Ji ber vê yekê jî di van xebatan da peyv û risteyên ku bi hev ra têkildar in ne cuda cuda li gorî peywend û têkilîya wan a bi hev ra tê lêkolînkirin (Aksan, 2015a: 29). Herwiha di van xebatên li ser binyada hindurîn ya pêkhatina yekeyên maneyî û taybetîyên wan ên wekî dariştin, hejmar, zayend, dem, kes û rewşê di çarçoveya morfolojîya sentaksî (morphosyntactic) da lêkolîn tên kirin (Vardar û yd., 2002: 41).

1.1.4.3. Ristesazî (Syntax)

Yek ji şaxên zimannasîyê jî ristesazî ye. Ristesazî (syntax) ew şaxezanista zimannasîyê ye ku li ser hevok û risteyan, sazûna wan û cureyên wan lêkolînê dike. Di pêkhatina ragihînê da di navbera yekeyên ziman da pêwendîyek pêk tê. Ristesazî wekî dîsîplîneke zimannasîyê li ser têkilîya di navbera hêmanên ziman da hûr dibe û honaka wan şirove û destnîşan dike û “bala xwe dide ka çawa û li pey kîjan rêzikan morfem, peyv, firaz û hevok li gel hev risteyan pêk tînin” (Komîsyon, 2022). “Di xebatên kevin ên zimannasîyê da lêkolîn bêhtir di asta peyv an da dihatin kirin û xebatên di warê ristesazî û semantîkê da hindik bûn (Toklu, 2009: 74.) Di zimannasîya modern da bi taybetî piştî xebata Noam Chomsky giringîya ristesazîyê bêhtir derket pêş. Chomsky bi xebata xwe ya bi navê “*Syntactic Structure*” teorîya xwe ya hilberînî-veguherînî (generative-transformational) di vî warî da rêyeke nû vekir. Ev teorî li ser bingeha zimannasîya binyadger bi pêş ket. Ev dîsîplîna zimannasîyê jî ber ku ziman wekî sîstemekê qebûl dike bala xwe dide rêz û peywenda peyv an (Aksan, 2015a: 30).

Di fonksiyona ziman a ragihînê da du erkên têkildarî hev derdikevin pêş: Yek ji van warê ferhengê ye ku asta peyvê îfade dike ya din jî pêkhatina gotinekê ye ku dikeve warê ristesazîyê. Herwiha du aliyên ristesazîyê jî hene: Alîyek lêkolîna li ser peywend û têkilîya hevokan ya di nav derbirînê da û ya din lêkolîna li ser awayê gotinê îfade dike (Perrot, 2006: 130-131). Ji vê yekê jî diyar dibe ku ristesazî bêhtir têkildarî gotinê ye.

1.1.4.4. Manenasî (Semantique)

Manenasî, bi navê xwe yê din semantîk xwe digihîne peyva yewnanî ya “*semaino*” yanî barbûna maneyekê ya li tiştêkî. Semantîk (semantique) tê maneya têkildarbûna maneyê yanî tiştê bi maneyê ra têkildar (Aydın, 2014: 93). Manenasî li ser alîyê ziman yê fikrî û pêwendîyê hûr dibe ku di navbera deng û fikir da pêk tê.

Di çarçoveya nimînenasîyê da jî manenasî bala xwe dide ser hêmana nimandî (signfiel) ya di sîstema nimîneyan (sign) da û bi vî awayî hêmana nimandî pênase dike (Günay, 2004: 197). Di xebatên ziman ên Hinda Berê û Yewnanistana Berê da hin mijarên têkildarî manenasîyê hene lêbelê peydabûna manenasîyê ya wekî dîsîplîneke zimannasîyê û xebatên rasterast ên li ser vê mijarê piştî nîveka yekem a sedsala 19. dest pê kirine (Aksan, 2015c: 139-140). Di van salên dawîn da xebatên di warê manenasîyê da yê pragmatîk (pragmatics) cihekî taybet digirin. Herwiha dîsîplînên zimannasîyê yê wekî zimannasîya metnî, teorîyên gotarê (discourse theories) nimînenasî, şêwaznasî (stylistics) ji gelek alîyan ve têkildarî lêkolînên manenasîyê ne ku di vî warî da xebatên hevpar dikin (Aksan, 2006: 19).

1.1.4.5. Ferhengnasî (Lexicology)

Ferheng yekeyên ferhengî yen di zimanekî da pênase dike û wan ji alîyê rêzimanê û erka wan ve şirove dike. Di ziman da ferheng warekî vekirî û bêsinor îfade dike. Ji ber ku bi peydabûn û lêzêdebûna her yekeye manecudaker (distinctive feature) dikare dewlemendtir bibe (Günay, 2004: 28). Ferhengnasî (lexicology) binbeşeke zimannasîyê ye ku li ser van yekeyên ferhengî lêkolînê dike. Ev disîplîn li ser wan hêmanan lêkolînê dike ku di kêşan û sazkirina peyvan da cih digirin. Herwiha lêkolîna li ser peyv û komepeyvên wekî biwêj, gotinên pêşîyan û firazên peyvan ên din dikeve warê ferhengnasîyê (Korkmaz, 1992: 100). Warê din yê ku têkildarî peyvan e, ferhengnasî û ferhengnasî ye. Ev her du şax gelek caran li cihê hev tînin bikaranîn, lê ya rast herdu du tiştên ji hev ji hev cuda ne. Ferhengnasî lêkolîna li ser taybetî û sîstema yekeyên ferhengî ye, lê ferhengnasî yan jî ferhengnivîsî (lexicography) warekî zimannasîya pêkarî (applied linguistics) ye û bi karê sazkirin û amadekirina ferhengan ra mijûl dibe.

1.1.4.6. Navdêrnasî (Onomastics)

Navdêrnasî, ew dîsîplîna zimannasîyê ye ku li ser dîrok, pêşketin, çavkanî û pêvajoya navdêran û rewşa wan a sosyolojîk, çandî, belavbûn û awayê bikaranîna wan lêkolînê dike (Keskin, 2021: 55). Navdêrnasî bi taybetî bersiva vê pirsan dide: Mirov çawa navan li heyber û kesan dike û di vî warî da çi cudahî di navbera zimanan da hene?

Armanca navdêrnasîyê ew e ku taybetiyên morfolojîk, semantîk û tîpolojîk ên navdêran derxe holê (Şakar, 2021: 377). Herwiha ev disîplîn li ser maneya navdêran a ferhengî û têgihî radiweste, têkilîya wan şirove dike û ji aliyê etîmolojîk ve wan vedikole. Navdêrnasî dîsîplîneke berfireh e. Lewra jî “hemû xebatên li ser navên candaran, tiştan, têgihên şênber dikevin çarçoveya xebatên navdêrnasîyê (Şenel, 2015: 125). Herwiha navên kesan, navên cihan, navên deşt û çiyayan, navên derya, gol û rûbaran dibin mijara navdêrnasîyê û di bin bineşaxên curbicur da, di van waran da, lêkolînên tînin kirin (Sakaoğlu, 2017).

1.1.4.7. Zimannasîya Metnî (Textlinguistics)

Zimannasîya metnî, ew şaxa zimannasîyê ye ku li ser binyada metnê, erka wê û pêwendîya di navbera hêmanên wê da lêkolînê dike. Ev şaxezanist di encama xebatên zimannasîya modern da peyda bûye û bi pêş ketiye. “Zimannasîya metnî ji aliyê erkdarî û ragihîne ve li ser metnan lêkolînê dike û metnan ji hêla sîstemên ziman ve analîz dike” (İmer, Kocaman, Özsoy, 2011: 190). Li gorî vê dîsîplînê maneya ku di metnê da tê derbirîn di peyv û hevokê da nayê îfadekirin (İbiş, 2020: 470). Ji ber ku metin, ji tevahîya risteyan mezintir e ku metnê pêk tînin (İmer, Kocaman, Özsoy, 2011: 190). Armanca sereke ya zimannasîya metnî ew e ku bi alîkarîya amraz û hêmanên metnê xwe bigihîne agahî û maneyên kûr. Lewra li gorî vê dîsîplînê mane şexsîyeta metnê û metin ji şexsîyeta ziman pêk tîne (İbiş, 2020: 470).

1.1.4.8. Zimannasîya Civakî (Sociolinguistics)

Zimannasîya civakî, ew şaxezanist e ku li ser têkilîya navbera dîyardeyên ziman û dîyardeyên civakî lêkolînê dike û tesîra wan dîyardeyan tesbît dike. Zimannasîya civakî di lêkolînên xwe da pozîsyona civakî ya axêver û ya guhdar, rewşa wan a ragihîne û cureya gotara wan li ber çavan digire (Vardar û yd., 2002: 196). Ev şaxezanist bi taybetî

li ser aliyê binyada derveyî ya zimanan hûr dibe û guherînên civakî, dîrokî, zimanî yên ku tesîrê li ser gotarê dikin vedikole (Aydın, 2014: 161).

Saussure hebûna ziman bi konsensûs û lihevkerinê ve girêdide ku di navbera endamên civakê da pêk tê. Her wiha hebûna ziman li ser vê peymanê (convention) teşe digire. Ev nêrîna Saussure ji bo pêşketina zimannasîya civakî bûye bingeh. Di vê çarçoveyê da lêkolînên zimannasîya civakî pêşî li Emerîkayê dest pê kirin û piştê li ser bingeha torîya *Bernstein a Kêmasîyê* bi pêş ketin. Bi xêra xebatên lêkolînerên wekî *Oevermann, Robinson, Hawkins* di salên 1970 û 1980yî da ev şaxezanist di qada navneteweyî da berbelav bû (Güven, 2012: 55).

1.1.4.9. Zaravanasî (Dialectology)

Şaxeke din a zimannasîyê jî zaravanasî (dialectology) ye. Zarava (dialect) awayên cuda yên axaftina zimanekî ne ku li herêm an jî welatên cuda derdikevin pêş. Zaravanasî jî ew binbeşa zimannasîyê ye ku li ser van zaravayan lêkolînê dike (Aksan, 2015a: 142). “Di lîteratura akademîk, pênaseya binbeşên ziman ên cografîk da li gorî ziman û xusûsiyetên wan cudahî hene. Di îngilîzî da dîyalekt hem di wateya zaravayê da hem jî di wateya devokê da bi kar tê” (Açar, 2019: 21).

Kategorîzekirina ziman û zaravayan gelek caran dibe cihê nîqaşê. Cudahîya ziman û zaravayan li gorî têgihîştina ji hev a axêverên wî zimanî yan jî zaravayî ye. Lêbelê li gorî pratîkên heyî ev kategorîzekirin gelek caran tê bînpêkirin û bi giştî di vê dabeşkerinê da pîvanên civakî û polîtîk derdikevin pêş (Özgen û Koşaner, 2019: 20). Mesela axêverên zimanên swêdî, danîmarkî û norwecî ji hev fam dikin, lê ev her sê jî wekî sê zimanên cuda tên pejirandin. Herwiha gelek axêverên zaravayên çînî ji hev fam nakin, lê dîsa jî ev ziman, ne wekî zimanên cuda wekî zaravayan tên qebûlkerin (König, 1991: 66). Peywira esasî ya zaravanasîyê tesbîta taybetîyên zaravayan e. Ji ber ku di zimannasîyê da û herwiha di binbeşa wê ya zaravanasîyê da karê esasî şaxezandî (descriptive) e; ne rêzikdanî an jî rêzikparêzî (prescriptive) ye.

1.1.5. Rêbazên Zimannasîyê

Zimannasî dîsîplîneke zanistî ye, ji ber vê yekê jî lêkolînên ku di vî warî da tên kirin li gorî hin rêbazan pêk tên. Lê dibe ku di pêvajoya demê da di van rêbazan da guherîn pêk bên. “Di sedsala 19. da lêkolînên di warê zimannasîya dîrokî û berawirdî da serdest bûn. Piştî hin zimannas ji vê tradîsyonê veqetîyan û berê xwe dan wan lêkolînên ku bi rêbaza hevdemî li ser hemû hêlên ziman tên kirin” (Perrot, 2006: 115). Saussure di dersen xwe yê zimannasîyê da bi berfirehî behsa rêbaza dîrokî û hevdemî dike û cudahîyên di navbera wan da destnîşan dike (1998: 139-152). Di rêbaza senkronîk da rewşên ziman ên di demeke dîyar da û di ya dîyakronîk da guherînên ziman ên di pêvajoya dîrokî da derdikevin pêş (Lass, 1997: 9-10).

Hilbijartina rêbazekê ji van, hinekî jî bi warê lêkolînê ra têkildar e. Mesela bi taybetî di lêkolînên etîmolojîk da divê rêbaza dîyakronîk bê bikaranîn. Lewra divê guherînên peyvan ên fonolojîk û semantîk ku di pêvajoya dîrokî da pêk hatine bên tesbîtkirin. Lê lêkolînên ku bi armanca tesbîtkirina rewş û dîyardeyên ziman tên kirin bi rêbaza senkronîk tên kirin. Saussure pîvana tercîha rêbazê bi vî awayî tîne ziman:

“Rewşên ziman di nav demê da ne wekî xalekê sabit in; her yek ji van rewş û taybetîyên wekî maweyên demê ne ku carinan kurt û carinan dirêj in. Ev heyam dibe ku deh sal, sed sal an jî bi qasî nîfşekê dom bike. Di pêvajoya guherînê da dibe ku hin taybetîyên ziman gelekî biguherin û hinek ji wan wekî xwe bimînin. Hingî bivê nevê divê lêkolînên li ser zimanê ku guherîye bi rêbaza dîyakronîk û yê li ser zimanê ku ku neguherîye bi rêbaza senkronîk bên kirin” (1998: 154).

Herwiha ji alîyê rêzê ve jî pêşî rêbaza senkronîk tê û piştî ya dîyakronîk tê. Ji ber ku di rêbaza dîyakronîk da lêkolîn li ser sîstemên hevdemî tên kirin û ancex piştî lêkolîneke senkronîk qanûnên tekamûlê yê sîstemê dikarin bên famkirin (Rifat, 2019: 27).

1.1.5.1. Rêbaza Dîyakronîk

Di sedsala 19. da di xebatên zimannasîyê da rêbaza dîrokî serdest bû û di vê rêbazê da hêmanên ziman li gorî peydabûn, guherîn û pêşketinê dihatin vekolîn (Ahanov, 2021: 70). Paşî li Fransayê bi xebatên *Michel Breal* (1832- 1915) ên di salên 1870yî da zimannasîya dîrokî û berawirdî bi pêş ket û piştî jî li Elmanyayê Xwendîngeha *Gramerzanên Nû* hat damezirandin. Piştî van xebatan jî *August Leskien* (1840-1916) ve

Hermann Paul (1846-1921) bingeha teorîk a zimannasîya dîrokî danîn. (Kıran, 1996: 43). Zimanzanên Sed sala 20. rêbaza zimannasîya dîrokî di warê zanistî da qels û kêr didîtin. Li gorî wan di lêkolînên ziman da divê guherînên ziman ên dîrokî û guherînên deng û teşeyî bi hûrgilî bîn lêkolînkirin. Ji ber ku tiştê giring ew e ku binyada ziman bi rêbazeke teorîk bê famkirin. (Karaağaç, 2007: 36).

Di rêbaza dîyakronîk da guherînên ziman esas in û wekî Martinet jî tîne ziman “di hemû zimanan da guherînên berdeyam û bînavber hene û zimanê ku niha tê şayesandin jî dibe ku di pêvajoyeke guherînê da be” (1998: 37-38). Guherîna teşeyî ya peyvan bûyereke wisa ye ku tenê di pêvajoya demê da lêkolîn li serê tê kirin û ev guherîn bi awayekî stûnî (perpendicular) pêk tê (Aksan, 2015a: 37). Yanî ev guherîn li gorî serdeman ji demên kevin ber bi demên nû ve pêk tê. Wekî Perrot jî dibêje “Her ziman di her maweya dîroka xwe da di nav tekamûlekê da ye” (2006: 115).

Diyardeyên dîyakronîk xwedîyê wêfên taybet in û guherîna sîstemê bi tesîra wan bûyeran pêk tê. Yanî bi kurtasî bi kîjan awayî be bila bibe diyardeyên senkronîk di nav pergaleke birêkûpêk da ne û ne fermanker in. Dijberî wê yekê di diyardeyên dîyakronîk da tu taybetîyên giştîkirinê peyda nabin, lê digel wê yekê ev taybatî xwe bi zorê xwe bi ziman didin qebûlkirin (Saussure, 1998: 146).

1.1.5.2. Rêbaza Senkronîk

Lêkolînên Senkronîk li ser wan yeke û rewşên ziman pêk tên ku di serdemeke dîyarkirî da ne. Armanca wê rêbazê şirovekirina teşe û sîstema ziman e ku bi demê hatine sînorkirin (Ahanov, 2021: 70). Lêkolîna senkronîk berî her tiştî şayesî ye. Di wê pêvajoyê da bîyê ku guherîna ziman a di pêvajoya demê da li ber çavan bê girtin di nav demeke sînordar û maweyeke kurt da binyad û sîstema ziman tê vekolan.

Lêkolînerekî ku bîyê pêşdarazîyekê li ser zimannasîyê lêkolînê bike berî ku li ser guherîna ziman a di nav pêvajoya demê da raweste divê berê xwe bide rewş û sîstema ziman a heyî. Lêbelê berevajî wê yekê nêzî sed salî xebatên li ser zimanan tenê bi pirsgirêkên tekamil û guherînê sînorkirî bûn (Martinet, 1998: 37). Di serê sed sala 20. da zimannasê navdar *Baudouin da Courtenay*, *F.F. Fortunatow* û *F. da Saussure* bingeha xebatên senkronîk û prensîbên zimannasîya şayesî danîn (Ahanov, 2021: 70). Bi taybetî di wê sed salê da *Saussure* di warê xebatên zimannasîyê da helwesteke nû anî lêkolînên

ziman. Heta serdema *Saussure* li Ewropayê ziman wekî subjeyêke dîrokî dihat dîtîn. Lê bi *Saussure* ra zimannasîya binyadger dest pê kir. Di vê nêrîna zimannasîyê da ziman wekî dîyardeyekê ye ku ji pêvajoya dîroka xwe serbixwe tê qebûlîkirin (Bircan, 2015: 46). Li gorî *Saussure* xebatên di warê rêzimana giştî da jî di heman demê da têkildarî qanûnên senkronîk in. Lewra hemû pêbendîyên di vî warî da tenê dikarin bi şirovekirina rewşên ziman aşkere bibin (*Saussure*, 1998: 129).

Saussure herçiqas wekî rêbazeke lêkolînê behsa rêbaza dîyakronîk bike jî ew bi awayekî aşkere û rasterast tîne ziman ku ji bo lêkolînên ziman rêbaza giring a senkronîk e. Lewra zimanzanekî ku bi rêbaza dîyakronîk bixebite di xebata xwe da ne ziman tenê, xelekên bûyeran ên ku ziman diguherînin jî dibîne (1998: 129). Ev nêrîna *Saussure* ya hevdemî, di heman demê da bû sebeb ku ziman wekî binyad û sîstemekê jî bê dîtîn. Li gorî wî “lêkolînerê ziman ji bo bikare di warê hişmendîya axêveran da serwest bibe divê raborîyê piştguh bike. Lewra mijûlbûna bi dîrok û paşxaneyê ra li ber geşedan û pêşketina fikr û ramanê dibe asteng” (1998: 129).

1.1.6. Teknîkên Zimannasîyê

Piştî sedsala 20. di xebatên zimannasîyê da teknîkên lêkolînê yên teşeparêz û kargîn derketin holê (Yozgat, 2018: 74). Ev teknîk awayê bikaranîna rêbazên xebatê û pratîkên wê îfade dikin û nirxandin û wesfandina ziman li gorî van teknîkan pêk tê. Mesela “li gorî nêrîna kargîn ziman navgîna herî giring a ragihînê ye, lê li gorî nêrîna teşeparêz ziman sîstemek e kompleks a nimîneyan e” (Toklu, 2009: 32). Bi gotina *Leech* teşeparêzî, bi aliyê ziman ê derûnnasîyê ra û kargînî jî bi aliyê ziman ê civakî ra têkildar e. Lewra jî mirov bi temamî nikare bibêje ku ev her du teknîk bi bi temamî li hev nakin. (1980: 16). Jixwe teknîka kargîn tu carî bi temamî taybetîyên teşeyî piştguh nake. Li gorî vê teknîkê teşe ancex digel maneyê dikare bibe xwedîyê nirxekê. Ji ber vê yekê jî divê mane bi peywenda metnê bê bidestxistin.

1.1.6.1. Teknîka Teşeparêz

Rêbaza teşeparêz formalîst e û li ser taybetîyên ziman ên binyadî hûr dibe. Li gorî vê rêbazê ziman xwedîyê binyadeke serbixwe e û ji ber vê yekê jî di lêkolînên ziman da hewce nake peywend li ber çavan bê girtin. Bi gotineke din, di vê rêbazê da divê ji erka

ziman a ragihînê zêdetir bala lêkolîner li ser binyad û teşeyê ziman be (Yozgat, 2018: 42). Armanca lêkolînê teşeparêz şirovekirina taybetiyên ziman ên teşeyî ye. Li gorî vê nêrînê ziman komika risteyan e û fonksiyona wî ya bingehîn diyarkirina fikr û ramanê ye (Aksan, 1993: 194).

Li gorî nêrîna teşeparêz ji ber ku ziman şiyaneke bîyolojîk û hevpar e zimanên li ser rûyê cîhanê jî xwediyê taybetiyên hevpar in (Leech, 1980: 16-17). Herwiha ziman xwediyê binyadeke serbixwe e û di bingeha vê serbixwe iyê da bergeheke sentaksî heye (Aksan, 1993: 193). Sentaksa ziman bi serê xwe ne ji bo ragihînê ye û binyadeke wê ya wiha heye ku dikare ji maneyê veqete (Yozgat, 2018: 62).

Ji xeynî guherîna awayê xebatê di lêkolînê ziman da hilibijartina materyalan jî li gorî teknîka lêkolînê tê diyarkirin. Lêkolînerê ku bi teknîka kargîn dixebite di lêkolîna xwe da li ser wan malzemeyan dixebite ku wî bixwe hilibijartine. Mesela dema lêkolînerê li ser zimanê xwe yê zikmakî lêkolînê bike bi rêbaza axêverê zimanê zikmakî nimûneyan bixwe dinivîse û eger pêdivî hebe wan ji axêverên din ên wî zimanî dipirse û sererast dike. Di vî karî da jî teknîka pirsyariya biryara rêzimanîyê bi kar tîne. Gelek caran ev metin ji aliyê kargînparêzan ve wekî wan hevokên tîn bi navkirin ku li ser maseyê hatine nivîsîn (Yozgat, 2018: 70).

1.1.6.2. Teknîka Kargîn

Ev rêbaz wekî warekî taybet ê zimannasîyê ye û herwiha wekî zimannasîya kargîn jî tê zanîn. Zimannasîya kargîn ew teknîk e ku erka ziman a ragihînê ji bo xebatên xwe yê li ser ziman wekî bingeh qebûl dike. Avakerê zimannasîya kargîn *Andre Martinet* e. Li gorî Martinet hêmaneke ziman ancex di nav peywendêke dîyar da dikare maneyekê wergire (Martinet, 1998: 45). Guiraud vê taybetiyê wiha tîne ziman: “Ziman wekî organîzmayekê ku taybetiyê yekbûnî di xwe da dihewîne. Her hêmaneke wê yekbûnê nîrx û qîmeta xwe, ne tenê ji hebûna xwe werdigire di heman demê da bi taybetî û rewşa xwe ya di nav vê hebûnê da qîmetdar dibe” (1975: 85).

Zimannasîya kargîn, di sentaksê da wekî hêmana bingehîn pêveberê esas digire lewra karê ku di pêvaberê da pêk bê divê rewşeke şênber nîşan bide. Bi vî awayî di derbirînê da pêşî pêveber û dendika ku hêmanên pêveberê pêk tînin tîn tesbîtîkirin û paşî yê mayî tîn tesbîtîkirin (Martinet, 1998: 223). Di vê rêbazê da fonksiyona ziman a

ragihînê derdikeve pêş. Ji ber vê yeke jî “Di vê teknîkê da hemû yekeyên ziman û têkilîyên di navbera wan da li gorî rewşa wan a ragihînê û peywira wan tê şirovekirin û şayesandin (Karaağaç, 2007: 38). “Li gorî teknîka kargîn berî her tiştî ziman navgîna hevkarîgerîya (interaction) civakî ye û fonksiyona wê ya herî berbiçav pêkanîna ragihînê ye” (Aksan, 1993: 193). Ji ber vê yekê jî di lêkolînên zimannasîyê da divê peywend û herwiha derdora civakî ya ku ew ziman tê da tê bikaranîn li ber çavan bê girtin. Çimkî ziman tenê ji binyadên teşeyî pêk nayê. Ew xwedîyê taybetîyeke wisa ye ku li gorî cihê bikaranîn û peywendê dikare bê şirovekirin (Yozgat, 2018: 61).

Wekî li jor jî hat destnîşankirin, di vê teknîkê da ya esas peywend e. “Lewra peywend maneya derbirîn û gotarê dorpeç û maneya metnekê ji peywenda wê dikare bê famkirin” (Hamawand, 2011: 26). Di vê çarçoveyê da zimannasîya peywendparêz, peyvan ne li gorî kategorîya wan a rêzî, li gorî peywir û fonksiyona wan a di nav risteyê da dinirxîne (Börekçi û Tepeli, 2013: 94).

Li gorî rêbaza kargîn naveroka peyvekê bi alîkarîya hêmanên din tê dîyarkirin. Peyv di heman demê da hêmana pergalekê ye, ji ber vê yekê jî tenê ne xwedîyê maneyê ye, di heman demê da xwedîyê nirxekê ye jî (Aydın, 2014: 5). Ji bo vê yekê rêçik û qayîdeyên ziman rasterast nayên çavdêrîkirin; ev taybetî ancex bi saya peywendê dikarin bèn famkirin. Di teknîka kargîn da kategorîyên rêzimanî ji pîvanên maneyê zêdetir ji pîvanên peyvrêzîyê pêk tên û şayesandina kategorîyên rêzimanî û dabeşkirina wan li gorî çar pîvanan tê kirin:

I. Pîvana teşenasîyê: Guherîna hevalnavê li gorî zayendê û neguherîna hevalkaran

II. Pîvana nirxnasîyê: Nirxandina yekeyê jî aliyê taybetiyên maneyê ve

III. Pîvana manenasîyê: Nirxandina encamên tecrûbeyan

IV. Pîvana peyvrêzîyê: Peywendîya di navbera peyvan da” (Karaağaç, 2007: 41).

Teknîka kargîn di ziman da erkê esas digire. Li gorî Leech sê kategorîyên erkê hene: Erka fikrî, erka ragihînê û erka metnî. Di erka fikrî da tecrûbeyên cîhana rastîn û cîhana xeyalî, di ya ragihînê da helwesta axêver û guhdar û di ya metnî da pêşkêşîya peyamê heye (1980: 19).

1.2. Morfem

Morfem hêmanên sîstema ziman ên herî piçûk in û aîdê dirkandina yekem (first articulation) in (Aydın, 2014: 73). Morfem û peyv ne heman tişt in. Dibe ku carinan peyvek ji morfemekê jî pêk bê, lê hin morfem ji peyvê piçûktir in. Yanî her peyv di heman demê da dibe morfem (morfemên serbixwe), lê her morfem ne peyv e. Carinan jî morfem ji gireyan jî pêk tên (morfemên bendî). Ev hêmanên ku wekî teşeyên sîstema ziman xuya dibin li gorî Ahanov (2021: 65) ji têkelbûna deng û maneyê pêk tên. Bloomfield morfeman wekî dendikên peyvan ên binyadî terîf dike ku nikarin dabeşî parçeyên piçûktir bibin bibin. Yanî morfem yekeyên dabeşnebar (uninterruptability) in (1935: 161). Li gorî mane û fonksiyona xwe cureyên morfeman hene. Ji ber ku morfem aîdê sîstema ziman a yekem in û firaz û riste aîdê sîstema ziman a duyem yanî gotinê ne, hin ji wan xwedîyê maneyeke ferhengî û hin ji wan jî xwedîyê maneyeke rêzimanî ne (Guzev, 2010: 45). Morfem jî her wekî fonem û bejêyên ferhengî (lexeme) lekseman sînordar in ne wekî firaz (phrase) û risteyan (sentence) bêsinor in.

Hin morfem herçiqas xwedîyê mane û peywirê jî bin bi deng û şêweyê cuda xwe nîşan didin. Ev cureyên morfeman wekî alomorf (allomorph) tên binavkirin (Brinton, J, Brinton, M.: 90-91; Aydın, 2014: 75). Bi gotineke din alomorf veguhastina hemana morfemê ye ku bi teşeyê cuda pêk tê û heman maneyê bi teşeyê cuda vediguhêze (Plag, 2003: 27; Toklu, 2009: 54). Cureya din a morfeman, morfemên sifir (zero morpheme) in. Ew morfem bi awayekî teşeyî nayên nîşandan (Bloomfield, 1935: 209) û di wan da hêmana nimandî heye, lê ya nimîner tune ye.

Morfem li gori rewşê wekî morfemên serbixwe (free morphemes) û morfemên bendî (bound morphemes) dabeş dibin. Morfemên bendî ji morfemên çemandinê (inflection morphemes) û morfemên dariştinê (derivational morphemes) pêk tên. Herwiha morfemên serbixwe jî ji morfemên rêzimanî û morfemên ferhengî pêk tên. Gelek caran têgihên morfem û gireyan (affix) li cihê hev tên bikaranîn lêbelê her du ne heman tişt in. Lewra morfem ji gireyê berfirehtir e û wê di nav xwe da dihewîne. Yanî morfem hem ji gireyan hem jî ji peyvên sade (simple words) pêk tên. Morfemên bendî gire û morfemên serbest jî peyv in.

1.2.1. Morfemên Bendî (Bound Morphemes)

Morfemên Bendî (bound morphemes) ew morfem in ku bi serê xwe nayên bikaranîn, li morfemên serbixwe zêde dibin. Ji vê pêvajoyê ra giregirtin û ji van morfeman ra jî gire tê gotin. Ev morfem li gorî cihê peyvê ku lê zêde dibin wekî pêşgir, navgir û paşgirê tên binavkirin (Bloomfield, 1935:218; İmer, Kocaman û Özsoy, 2011). Rêza peyvan an di nava risteyan da guherbar (variable) e, lê ji bo rêza morfeman a di nav peyvan da rêzik û bendeyên tund hene. (Bloomfield, 1935: 207) Mesela bi gelemperî gireyên dariştinê berî yê kêşanê tên (Bloomfield, 1935: 222).

Morfemên bendî li gorî peywir û fonksiyona xwe dibin du cure: morfemên çemandinê û morfemên dariştinê. Her du cureyên morfeman jî li rayekan an jî li gewdeyê peyvan (morfemên serbixwe) zêde dibin. Ji aliyê morfolojîk ve di navbera morfolojîya kêşanê û ya dariştinê da cudahî hene û sînorê van her du waran ew qas jî ne zelal e. “Di vî warî da ji aliyê taybetiyên tîpolojîk ve di navbera zimanan da gelek cudahî hene. Mesela cureyeke gireyan ku di zimanekî da wekî yên kêşanê tên zanîn digel ku fonksiyona wan wekî hev e di zimanekî din da wekî yên dariştinê tên binavkirin” (Stekauer, Valera û Körtvelyessy, 2012: 20). Herwiha gelek çaran tayînkirina kategoriya hin morfeman karekî zehmet e û bersiva pirsên derbarê morfemê da yên wekî ka gelo ev morfemeke serbixwe ye, yan ya bendî ye yan jî gelo ev rayek e, gewde ye yan jî gire ye ne hêsan e (Plag, 2003: 71). Carinan jî bi pêvajoya demê ra hin morfemên serbixwe anku peyv ji maneya xwe yan eslî dûr dikevin, diguherin û dikevin formeke rêzimanî. Ji vê rewşê ra rêzimanîbûn (grammaticalization) tê gotin. “Di kurdî da paşgira ‘-van’ê nimûneya vê rewşê ye. Lewra ev paşgir ji peyva ‘*pana*’yê tê ku tê maneya wî kesî ku tiştekî diparêzê û nobedarîya wî dike. Peyva ku îro wekî ‘*şivan*’ tê bikaranîn ji peyva ‘*fşu: pez*’ û ‘*pana: nobedar*’ ê tê” (Şahîn, 2020: 179; Muhammed, 2016b: 391). Lê îro ev morfem tenê bi erka paşgira dariştinê wekî “-van”ê tê û wekî morfemek serbixwe (peyv) nayê bikaranîn.

1.2.1.1. Morfemên Kêşanê (Inflection Morphemes)

Morfemên kêşanê ew morfemên bendî ne ku dema tên ber morfemên serbest pêwendîya wan bi hev ra datînin û di navbera wan da têkilîyekê pêk tînin. Peywira van morfemên di warê zimannasîyê da wekî kêşanê (derivation) tê binavkirin (Ahanov, 2021: 281). Di dariştinê da peyveke nû, morfemeke ferhengî (lexical) tê sazîkirin, lê di kêşanê da varyantên peyvê yên rêzimanê pêk tên û kêşan pevajoeyeke rêzimanî ye ku formên

alternatîf ên peyvê nîşan dide (Hamawand, 2011: 13). Derfeta bikaranîna gireyên kêşanê li gorî yên dariştinê zêdetir e. Lewra ev gire dikarin li hemû cureyên peyvan zêde bibin. Gireyên kêşanê bereksê yên dariştinê bi rayeka peyvê ve bi tamamî nakelijin yanî bi awayekî aşkere dîyar dibe ku ev morfem endameke cuda ye û wekî endameke peyvê ya alîkar tê dîtin (Ahanov, 2021: 282, 284). Herwiha ji aliyê semantîk ve jî di pêvajoya kêşanê (inflation) da wekî di yê dariştinê da mane, cureya peyvê (word class) naguherin “peyv ji aliyê kategoriyên rêzimanî ve tên kodkirin” (Plag, 2003: 14). Ev kategorî taybetiyên wekî zayend, mêjer, tewang û demê ne.

1.2.1.2. Morfemên Dariştinê (Derivational Morpheme)

Morfemên dariştinê ew morfem in ku li yekeyên manedar zêde dibin û li ser mane, cure yan jî hem mane hem cure wan yekeyan tesîrê dikin. Morfemên dariştinê wekî gireyên dariştinê jî tên binavkirin. Lewra morfemên ku bi karê dariştinê radibin gire ne. Ahanov taybetiyên morfemên dariştinê û cudahîya wan ji yên kêşanê destnîşan dike û wiha dibêje: Gireyên dariştinê bereksê yên kêşanê bi heman awa û fonksiyonê nikarin li hemû cureyên peyvan zêde bibin û dema li rayeka peyvê zêde dibin ew û rayek bi hev ve dikelijin û dibin wekî yek heman û ew gire dibe endameke wê peyvê (2021: 282, 284).

Ji ber ku her morfema dariştinê ne li ser maneya rayekê lê li ser maneya dawî ya gewdeya peyvê tesîrê dike du yan jî zêdeyî du morfemên dariştinê di heman demê da li peyveke sade zêde nabin (Turan, 2018: 103). Mesela peyva “*dildarî*”yê hem morfema dariştinê ya “*dar*”ê hem ya “*-î*”yê wergirtiye. Di vê peyvê da paşgira dawî (-î) ne li ser maneya peyva “*dil*”ê belkî li ser maneya peyva “*dildar*”ê tesîr kirîye.

Morfemên dariştinê bi serê xwe nayên bikaranîn li morfemên din zêde dibin. Ev rewşa ziman jî wekî bigirebûnê (affixation) tê binavkirin (Bloomfield, 1935: 218). Ji van, ên ku peyvên nû saz dikin jî gireyên dariştinê ne. Gireyên dariştinê li gorî cihê ku li rayeka peyvê yan jî geydeyê wê zêde dibin sê cure ne: pêşgir, paşgir û navgir. Bigirekirina herî berfireh paşgir e (Uzun, 2006: 35).

Ji van gireyan ên herî berbelav paşgir in û piştî paşgirê jî herî zêde pêşgir tên bikartanîn. Hem paşgir hem jî pêşgir di gelek zimanan da hene û tesîrê li ser kategorîya peyvan dikin yanî dikarin cureya peyvê biguherînin” (Stekauer û yd., 2012: 136). Wekî din jî ev gire di peyvan da li rex maneyê guherînen fonolojîk û kirpandinê (stress) jî pêk

tînin û carinan jî cureya peyvê diguherînin. “Di ziman da rêjeya bikaranîna hemû gireyên dariştinê ne wekî hev e. Hinek ji wan ji yên din bêhtir fonksiyonel in. Ev taybetî wekî berhemdarîyê (productivity) tê binavkirin” (Plag, 2003: 44).

Hinek gire serê pêşî wekî peyv in û di pêvajoya demê da bûne gire (Hatipoğlu, 1974: 331). Yanî morfemeke serbixwe ya ferhengî piştî demekê bi bi peywira rêzimanî hatiye bikaranîn û bûye morfemeke bendî. Ev bûyer di zimannasîyê da wekî rêzimanîbûn (grammaticalisation) tê binavkirin (Demirci, 2008: 132).

1.2.1.2.1. Pêşgirên Dariştinê

Pêşgirên dariştinê ew morfemên bendî ne ku ji bo morfemeke nû saz bikin tîna pêşîya morfemên serbest. “Ev pêvajo di zimannasîyê da wekî bipêşgirebûnê (prefixation) tê binavkirin” (Uzun, 2006: 35). Hin pêşgir tenê maneya peyvê, lê hinek di heman demê da cureya peyvê jî diguherînin.

“Bi rêya pêşgiran bêyî ku peyvek ji kokê ve bê afirandin maneyeke nû li peyva heyî tê zêdekirin. Ev rewş derfetê dide ku têgihên nû bîna sazîkirin û li ferhenga ziman zêde bibin” (Delikaya, 2016: 42). Li gorî Hamawand Întegrasyona (entegration) pêşgir û rayekê ji aliyê çar faktorên ve tê kontrolkirin: Ya yekem karîgerîya pêşgirê ya semantîk û fonolojîk e, ya duyem pabendîbûna pêşgir û serbixwe îbûna rayekê ye û ya sêyem tevgera pêşgirê ye ku rayeka temamker e, lê wekî dîyarkerê profilê tev digere û ya çarem jî rola temsîlîkirina peyvê ye (2011: 55).

1.2.1.2.2. Paşgirên Dariştinê

Yek ji cureyên morfemên dariştinê jî paşgir in. Herçiqas fonksiyon û peywirên cuda yê paşgiran hebin jî rola eslî ya paşgiran sazîkirina peyvan e (Keşanî, 1992: 4). Paşgirên dariştinê ew morfemên bendî ne ku ji bo peyveke nû saz bikin tîna dawîya rayek an jî gewdeyê peyvê (Hamawand, 2011: 121).

Peyvên dariştî (derived words) ku ji rayek û gireyekê pêk tîna ji aliyê semantîk ve ji du alîyan ve tîna analîzîkirin. Di hinekan da maneya peyvê serdest û dîyarker e û di hinekan da jî ne tenê maneya peyva dariştî û rewşa wê ya pragmatîk jî giring û dîyarker e. Yanî maneya peyvê tenê bi fonksiyona rayek û gireyê dîyar dibe (Hamawand, 2011:

122). Dariştina peyv an a bi rêya paşgiran di zimannasîyê da wekî bipaşgirebûn (suffixation) tê binavkirin û di wan zimanan da ku bi bipaşgirebûnê tên dariştin, gireyên ku herî zêde tên bikaranîn paşgir in (Ahanov, 2021: 281 ; Uzun, 2006: 35). Di zimanê kurdî da jî bi heman awayî hejmara paşgirên dariştinê ji ya pêşgirên zêdetir e.

1.2.1.2.3. Navgirên Dariştinê

Yek ji morfemên dariştinê jî navgir e. Navgirên dariştinê di dariştina peyv an da di nava rayeka peyvê da cih digirin. Navgir di zimanên wekî *latînî*, *endonezî* û *tagalî* da hene (Ahanov, 2021: 281). Dariştina peyv an ya bi paşgiran bi vî awayî pêk tê: Gireyeke dariştinê dikeve nava rayeka peyvê û bi zêdebûna vê morfemê peyveke nû tê dariştin. Ji vê pêvajoyê ra binavgirbûn (infixation) tê gotin û di emcama vê bûyerê da carinan maneya peyvê, carinan cureya wê û carinan jî her du bi hev ra diguherin.

Zimannasên kurd jî derbareyê hebûn nebûna navgirê di zimanê kurdî da li ser yek rayê nînin (Ebdilqadir, 2016: 65). Di hin xebatan da peyvsazîya hin karan wekî dariştinê û herwiha binavgirbûnê hatiye binavkirin û peyvên “*xebat*”, “*weşan*”, “*geran*” û “*şewat*”ê wekî peyvên ku bi navgiran saz bûne hatine qebûlkirin (Tan, 2011: 74; Delikaya, 2016: 40; Yilmaz, 2017: 45). Lê dema mirov bala xwe dide van peyv an, dibîne ku ev peyv ne bi giregirtinê belkî bi rêya înfleksiyonê (inflection) yan jî bi înfleksiyona navxweyî (introflection) saz bûne. Her wiha dibe ku di kurmancîyê da jî ev peyv bi tesîra zimanê erebî û bi awayekî analojîk hatibin çêkirin. Lewra di van peyv an da tu gire li rayeka peyvê zêde nebûne û di nava rayeka peyv an da guherîn pêk hatiye û hin deng guherîne. Muhammed jî balê dikişîne ser vê rewşê û destnîşan dike ku di van peyv an da guherîne deng pêk hatiye (2016a: 97).

1.2.2. Morfemên Serbixwe (Free Morphemes)

Morfemên serbixwe, ew morfem in ku bêyî hêmaneke din bi serê xwe dikarin bî bikaranîn (Bloomfield, 1935: 155). Navdêr, kar, hevalnav û hevalkar û herwiha hêmanên xwedîyê fonksiyonên rêzimanê yê wekî daçek, gihanek, baneşan dikevin vê kategorîyê (İmer, Kocaman û Özsoy, 2011: 39). Ev morfem, wekî peyv tên binavkirin. Peyv di zimannasîyê da ew şiklên gotinê ne ku ji yek an zêdetir dangan (herfan) pêk tên û dikarin bi tenê bî gotin an bî nivîsîn (Muhammed, 2016a: 7). Peyv, rêzbûna xweser a yekeyên

maneyî. Ev yeke nikarin ji hev biqetin û ew hêman in ku axêverên siruştî yên ziman wan bi awayekî ferasetî (intuitive) nas dikin. Di zimannasîyê da têgiha ferhengê ew sîstema şênber e ku wekî ferhengeke zihnî (mental lexicon) ye û hemû peyvên ziman û agahîyên aîdê wan destnîşan dike (Bloomfield, 1935: 274; Martinet, 1998: 134). Di zimanekî da ji bo ku rêzbûna denga bikare wekî morfemeke serbixwe yanî peyv bê binavkirin divê bi awayekî sîstematîk û dubareyî be û teşe û naveroka xwe ya têgihî biparêze (Bloomfield, 1935: 178). “Peyv dikarin manedar û bi naverok bin, wekî ‘agir’, ‘hinar’ û ‘muzik’. Lê morfem dibe ku bênaverok bin û wezîfedar bin û hin erk û wezîfeyên rêzimanî pêk bînin. Wekî ‘bi’, ‘ji’ û ‘na’yê (Muhammed, 2016a: 7-8). Morfemên serbixwe dibin du cure: Morfemên rêzimanî û morfemên ferhengî.

1.2.2.1. Morfemên Rêzimanî (Grammatical Morphemes)

Morfemên rêzimanî di navbera morfemên ferhengî (lexical morphemes) da têkilîya sentaksî pêk tînin. Ev morfem bi peywira nimîneyê, hin agahîyên rêzimanî jî hildigirin, lê naveroka wan a maneyî bi gelemperî digel morfemeke ferhengî xwe nîşan dide (Toklu, 2009: 52). Ev morfem, ji bo girêdana têkilîya di navbera morfemên ferhengî da pir zêde tînin bikaranîn, lê hejmara wan li gorî ya morfemên ferhengî pir kême (Martinet, 1998: 138; Toklu, 2009: 53).

1.2.2.2. Morfemên Ferhengî (Lexical Morphemes)

Morfemên ferhengî ew morfem in ku xwedîyê maneyeke ferhengî ne û li gorî kategorîyên ferhengî yan jî cureyî dabeş dibin. Cureyên peyvên ên wekî “navdêr”, “kar”, “hevalnav” û “hevalkar”an wekî peyvên binaverok tînin binavkirin. “Morfemên ferhengî di heman demê da cureyek ji morfemên serbest in. “Ev morfem, ji ber ku di hişê mirov da tiştêkî, resmekî, tevgerêkê, meseleyekê yan jî fikrekê derdixin holê wekî peyvên binaverok tînin senifandin” (Delikaya, 2016: 13-14).

Ev morfem li gorî binyad û sazûna xwe dibin du cure: peyvên sade û peyvên kompleks (complex words). Herwiha du cureyên peyvên kompleks hene: peyvên dariştî û peyvên pêkhatî (compound words).

1.2.2.2.1 Peyvên Sade (Simple Words)

Peyvên sade (simple) ew peyv in ku tu peyvên din li wan zêde nebûne û tu gireyên dariştinê negirtine. Peyvên wekî “*dar*”, “*çiya*”, “*zevî*” û “*gir*”ê nimûneyên peyvên sade ne (Ciwani, 1992: 37). Peyvên sade ji morfemeke tenê ya serbixwe pêk tên û gireyên dariştinê wernegirtine û “peyvên wisan in ku tu beşên wê nikarin jê bînin avêtin. Lewra eger beşek jê bînin avêtin ew peyv bê mane dibe” (Muhammed, 2016a: 8).

Di zimannasîyê da peyvên sade wekî morfemên serbixwe (free morphemes) tên binavkirin. Lewra ev morfem bi serê xwe ne û li rex van morfeman tu morfemên din ên dariştinê tunene. Eger gireyeke kêşanê (pêşgir, navgir, paşgir) li peyveke sade zêde bibe jî ev rewş taybetîya wê ya sadebûnê naguherîne. Lewra gireyên kêşanê, ne morfemên serbest, morfemên bendî (bound morpheme) ne.

1.2.2.2.2. Peyvên Kompleks (Complex Words)

Peyvên kompleks an jî nesade ew peyv in ku ji bêjeyekê û zêdeyîyekê hatine saz kirin, ew zêdeyî dibe ku bêje be an jî gireyeke din be (Amêdî, 2012: 101), lê divê gireya dariştinê ya ku li peyvê zêde dibe tesîr li ser maneya peyvê kiribe. “Ji aliyê morfolojîk ve hêmanên ziman ji bo yekeyên mezintir pêk bînin cem hev û hêmaneke cuda pêk tînin” (Plag, 2003: 179).

Peyvên kompleks dibin du cure: peyvên dariştî û peyvên pêkhatî. Ev her du cureyên peyvên jî di pêvajoya peyvsazîyê da pêk tên û her yek ji van di heman demê da rêbazeke peyvsazîyê îfade dike: peyvsazîya bi dariştinê û peyvsazîya bi pêkhatinê. Ev peyv dikarin ji du yan jî zêdetir peyvên sade pêk bînin an jî ji peyveke sade û yek an çend paşpirtik an pêspirtikan ava bibe. Peyvên aloz (kompleks) parvebar in yanî beşên wan dikarin ji hev bînin cudakirin; yek an jî çend beş jê bînin avêtin û dîsa beşa mayî manedar be (Muhammed, 2016a: 8).

Pêkhatina peyvên li gorî entegrasyonekê çêdibe. “Entegrasyon, pêkhatina hêmanên morfolojîk a li gorî rêza rastekî (linear sequence) û entegrasyona hêmanên piçûk ên ku di binyadeke rêzimanî da tên cem hev li gorî taybetîyên wan ên têkildarî hev e pêk tê (Hamawand, 2011: 3).

1.2.2.2.1. Peyvên Dariştî

Peyvên dariştî ew peyv in ku herî kêr morfemeke dariştinê li wan zêde bûye. Ew peyv bi rêya bigerbûnê (affixation) pêk tên û bi giştî bi rêya pêşgir, navgir û paşgiran saz dibin. “Di pêvajoya dariştinê da pêşgir, navgir û paşgir cuda cuda yan jî bi hev ra li binyada peyvê zêde dibin” (Sarı, 2015: 45). Ev gireyên ku erka dariştina peyvên tînin cih di zimannasîyê da wekî morfemên dariştinê (derivational morpheme) tên binavkirin. Di dariştinê da carinan di maneya peyvê da carinan di cureya wê da carinan jî di her duyan da guherîn çêdibe. Yanî di navbera cureyên peyvên ên wekî kar, navdêr, hevalnav û hevalkaran da veguhêzî çêdibe yan jî piştî ku gireyêke dariştinê digirin bêyî ku cureya peyvê biguhere di maneya wan da guherîn pêk tê.

1.2.2.2.2. Peyvên Pêkhatî (Compound Words)

Peyvên pêkhatî ew peyv in ku ji du yan jî zêdetir morfeman pêk tên. “Di peyvên pêkhatî da her peyv xwedîyê maneyêke serbixwe ye û ev peyv li gorî rêz û rêzikên zimên digihin hev” (Tan, 2011: 63). Peyvên pêkhatî carinan bi alîkarîya dubarebûnê (rengareng, gumgum, palapal) carinan ji du peyvên cuda (bakur, destbira, çavsor) carinan jî ji pêkhatineke zêdeyî du peyvên çêdibe û peyveke nû saz dibe. Mesela peyvên wekî “*devlikên*”, “*berbihev*”, “*binavkirî*” ji sê morfemên serbixwe pêk hatine (Bedirxan û Lescot, 2004: 277-279).

Ev peyv, li gorî cureyê, carinan bi peywira navdêrê carinan jî bi peywira karê tên bikaranîn. “Karên pêkhatî bi karekê û peyveke ku na kar be (navdêr, rengêr, daçek, hevalkar hwd.) saz dibin. Gelek caran maneya peyva ku saz bûye ji maneya peyvên berê bi gelekî cuda ye” (Bedirxan û Lescot, 2004: 182). Navdêrên pêkhatî jî bi pêkhatina navdêr, hevalnav, hevalkar yan jî daçekan saz dibin.

1.2.2.2.3. Peyvsazî û Rêbazên Wê

Peyvsazî (word formation) tê maneya sazkirina peyvên nû. Di hin xebatên kurmancîya jorîn da têgiha peyvsazîyê ji bo morfolojîyê hatiye gotin (Şiwani, 2011; Bakır, 2015; Ebdulfettah, 2018: 113; Tan, 2011: 57) lêbelê morfolojî û peyvsazî ne heman tişt in. Ji ber ku morfolojî, zanîn û lêkolîna li ser morfeman e, lê peyvsazî çêkirin û sazkirina peyvên îfade dike. Herçiqaş peyv beşek ji morfeman bin û her peyveke sade

di heman demê da morfem jî be her morfem ne peyv e. Mesela morfemên bendî yanî gire morfem in lê ne peyv in.

Peyvsazî di zimannasîyê da cihekî taybet digire. Bi taybetî di zimannasîya modern da mijara peyvsazîyê wekî disiplîneke serbixwe cih girtiye û hemû rêbazên di pevajoja çêkirina peyvan da îfade dike (Braun, 2009: 44). Saussure derheqê zimannasîya klasîk da dibêje ku ev rêziman derheqê agahîyên çêkirina peyvan û gelek mijarên din ên ziman da qels e (Saussure, 1998: 130). Lêbelê sînorê di navbera peyvsazî û kêşanê da baş ne dîyar. Gelek caran guherînên wekî zayend, piçûkkirin, mêjer û xuyangê (aspect) di hin zimanan da wekî pevajojeyê peyvsazîyê û di hinan da jî wekî kêşanê tên dîtin (Stekauer, Valera û Körtvelyessy, 2012: 26-28). Herwiha gelek caran peyvsazî û dariştin li cihê hev tên bikaranîn. Lêbelê digel ku dariştin jî rêbazek ji ya peyvsazîyê ye, nayê maneya peyvsazîyê. Lewra peyvsazî ji dariştinê berfirehtir e û ji xeynî dariştinê gelek rêbazên peyvsazîyê yên din jî hene.

Di pevajoja peyvsazîyê da morfemên rêzimanî (gireyên dariştinê) li rayek û gewdeyê peyvan zêde dibin û peyveke nû çêdibe yan jî bi pêkhatina morfemên serbest peyvên nû saz dibin (Toklu, 2009: 60). Gelek rêbazên peyvsazîyê hene û bi taybetî ev rêbaz dikarin wekî rêbazên peyvsazîyê ya bigire û ya bêgire bînin dabêşkirin. Di rêbaza peyvsazîyê ya bigire da li rayek an jî gewdeyê peyvê morfem zêde dibe, lê di peyvsazîya bêgire da di qebareya peyvê da kêmbûn çêdibe. Di rêbaza peyvsazîya bêgire da peyvên heyî di peywendekê cuda da û bi fonksîyoneke cuda tînin bikaranîn û bîyî bûyera dariştin û pêkhatinê peyveke nû çêdibe. Di vê rêbazê da sazûna maneyê jî pêk tê. “Peyvsazî herçiqas pevajojeyê morfolojîk be jî di pêkhatina peyvên nû û sazûna hin cureyên peyvan da alîyên wê yê maneyî û sentaksî derdikevin pêş” (Sarı, 2015: 40). Di çarçoveya morfolojîk da du teorîyên sereke yê di warê sazûna peyvên nû da hene: Yek ji wan, morfolojîya li ser bingeha morfeman (morpheme-based morphology) û ya din morfolojîya li ser bingeha peyvan e (word-based morphology). Di ya yekem da hêmana bingehîn morfem e û di ya duyem da peyv e. Bingeha teorîya ku peyvê esas digire ji aliyê *Aronoff* ve hatiye avêtin. Li gorî vê teorîyê ji ber ku gire ne xwedîyê hebûneke xweser in divê di lêkolînên ziman da peyv esas bînin girtin. (Plag, 2003: 179, 184).

1.3.2.2.3.1. Dariştin (Derivation)

Dariştin pêvajoya morfolojîk e û bi vê pêvajoyê ji peyveke heyî peyveke nû tê sazîkirin. Morfemeke bendî li morfemeke serbixwe zêde dibe. Dariştin di heman demê da pêvajoyeke semantîk e jî. Ji ber ku li rayeka peyvekê yan jî gewdeyê wê gireyek zêde dibe û li ser mane peyvê yan jî cureya wê guherîna pêk tîne û bi vî awayî ji peyveke heyî peyveke nû saz dibe.

Yekeyên ziman bi hev ra di nav girêdan û peywendekê da ne. Ev yeke yan hêmanên dorhêlî ne ku xelesa gotinê pê tînin yan jî rasterast bi wan parçeyan ve girêdayî ne ku van yekeyan pêk tînin. Dariştina peyvan nîşana vê rewşê ye. Wekî nimûne, di peyva “*dil+dar*”ê da ev her du morfem, ne du hêmanin ku ji hev bêeleqe ne; her du hêman bi hev ra û di nav têkilî û peywendekê beramber da biqîmet in. “Di dariştinê da çavkanîyek heye. Lewra ji hêmaneke heyî hêmaneke nû zahir dibe mesela di wan rêbazên din ên peyvsazîyê da çavkanîyêke esas tune ye. Ji ber vê yekê ew rêbazên din nabin dariştin “(Sarı, 2015: 47). Di dariştina peyvan da du fonksiyonên sereke hene: yek jê guherîna maneyê ya din guherîna cureya peyvê (word class) ye. Carinan jî bêtir ku cureyê biguherîne ji aliyê peywira peyvê ve wê diguherîne û tesîra wê li ser bincureyê (sub-ty) peyvê çêdibe (Bauer, 2004: 6). Dibe ku carinan yek ji van peywiran pêk bê yan jî her du bi hev ra. Di erka duyem da fonksiyonên wekî sazîkirina navdêr, hevalnav, kar û hevalkaran pêk tê. Wekî Sebzecioğlu jî destnîşan dike dabeşîkirina cureyên peyvan her car ne hêsan e. Bi taybetî cureyên navdêrî (nominal) di gelek warên bikaranînê da hevpar in. Lewra jî zimannasan ew wekî yên prototîp û yên neprototîp dabeşî kirine. Li gorî vê dabeşîkirinê yên navdêrî: navdêr, cînav, hevalnav û hevalkar û yên din: kar, gihanek, daçek û baneşan in (2017: 297) û yên din jî kar in.

Gelek caran sînorên peyvên dariştî û sade baş ne kifş e. Ji ber ku hin peyv hene ku ji du morfeman pêk hatine lê di pêvajoya demê da hin morfeman forma xwe ya xweser wînda kiriye û di semantîka wan da guherîna çêbûye. Lewra jî her du peyv bûne wekî yek morfemê. Di divê bê zanîn ku ew peyv di zimanê siruştî da bi serê xwe tê bikaranîn an na. Muhammed van peyvan wekî peyvên parvebar û serbixwe bi nav dike û li ser nimûneya peyva “*şivan*”ê wiha şirove dike:

“Tarîxiyên *şivan* peyveke parvebar bû. Bo nimûne, di avestayî da ew bi şiklê ‘*pşupane*’ bû ku ji peyvên ‘*pşu*’ (pez) û ‘*pane*’ (parstin)ê pêk dihat û bi zelalî peyveke aloz û parvebar (pêkhatî) bû. Lê di kurdî da tu peyveke serbixwe bi

şiklê ‘şî’ nîne û tu maneyê nade. Paşgira ‘-van’ê jî nikare bi tenê wekî peyveke serbixwe be. Loma peyva “şivan” di kurdî da êdî peyveke sade û parvenebar e.” (2016a: 10).

Di zimanê îngilîzî da hem pêşgir hem jî paşgir bi hev ra yan jî cuda cuda di dariştina peyvan da tên bikaranîn (Plag, 2003: 11) Di kurmancîya jorîn da jî bi pêşgir û paşgiran peyv tên dariştin. Di zimanên din da jî (wekî tirkî) peyv tenê dikarin bi paşgiran bèn dariştin. Di hin zimanan da navgir jî tên bikaranîn û bi zêdebûna navgiran li rayek an jî gewdeyên peyvan (morfemên serbixwe) peyvên nû tên dariştin.

1.3.2.2.3.2. Pêkhatin (Compounding)

Pêkhatin ew rêbaz e ku du yan jî zêdeyî du peyvan li gorî şêweyeke morfolojîk û sentaktîk li cem hev tên bikaranîn. Ev peyv bi hev ra di nav peywendîyeke semantîk da têgiheke nû pêk tînin (Francis, 2016: 238). Pêkhatin di heman demê da pêvajoyeke morfolojîk e ku ji du yan jî zêdetir morfemên serbest binyadeke kompleks pêk tê û pêkhate ew têgih e ku di encama vê pêvajoyê da pêk tê (Hamawand, 2011: 11). Peyvên ku bi vê rêbazê saz dibin ji lêkdana du yan jî zêdetir morfemên serbixwe ên serbixwe pêk tên; wekî peyvên pêkhatî (compound word) tên binavkirin. (Toklu, 2009: 63). Carinan her yek ji van peyvan cuda, carinan jî bi hev ve tên nivîsîn ku ev rewş bi temamî dikeve mijara konsensûsê (Hamawand, 2011: 201). Di pêvajoya pêkhatinê da ji xeynê guherîna maneyê guherîna erkî jî pêk tê. Bi taybetî jî guherîna sazkirina karan a ji navdêran û ya navdêran ji karan bi rêya pêkhatinê jî çêdibe (Francis, 2016: 240). Di navbera hêmanên peyvên pêkhatî da ji aliyê semantîk ve peywendîyên wekî ravekirin, dabeşkirin û rêzkirinê hene. Di vê pêkhateyê da peyveke sereke (head) heye û ev peyv dibe navenda vê pêkhateyê (Uzun, 2006). Peyvên pêkhatî ku ji bo têgiheke nû saz bikin piştî ku tên cem hev dibin hilgira hevpar a heman peyvê û taybetîyeke homojen werdigirin (Bloomfield, 1935: 227).

Di hin xebatên kurdî da pêkhatin bi maneya dariştinê hatiye bikaranîn û herwiha ji bo peyvên dariştî têgiha peyvên pêkhatî, hatiye vegotin (Tan, 2011: 64). Lêbelê pêkhatin (compounding) ne dariştin e. Ji ber ku di dariştinê da peyvek û morfemeke bendî tên cem hev, lê pêkanîn ew kar e ku çend peyvên cuda yanî morfemên serbest tên cem hev û pêkhateyeke nû saz dikin. Muhammed di xebata xwe ya peyvsazîyê da têgiha pêkhatinê

bi kar tîne û kategorîyên pêkhatina van peyvên dide. Ji van kategorîyên wî yên sereke ev in:

“Serokwezîr (navdêr+navdêr), serêş (navdêr+hevalnav), stranbêj, agirbest (navdêr+kar), jêkirin, lêkirin (daçek+kar), xweşkirin (hevalnav+kar), danûstandin, hatûçû (kar+kar) (2016a: 20-41) wekî di hin nimûneyên jorîn da jî xuya dike piştî pêkhatinê li gel guherîna morfolojîk û morfosenantîk ji aliyê semantîk ve jî guherîn pêk tê. Bloomfield jî di vê çarçoveyê da dibêje ku herçiqas peyvê kategorîya xwe ya rêzimanî biparêzin jî gelek caran hêmaneke peyvê ji maneya xwe dûr dixin” (1935: 227, 232).

Taybetîya peyvên raveker ew e ku tenê dikarin di pêkhatayan da bîn bikaranîn. “Lewra jî gelek caran maneya peyva nû ji yekûna peyvên ku di vê hêmana pêkhatî da cih digirin zêdetir e” (Stekauer, Valera û Körtvelyessy, 2012: 57). Bi taybetî di wan peyvên pêkhatî da ku ji navdêr û navdêran pêk tên rewşa pêkhatayê li gorî argumana peyva sereke, maneya her du peyvên û têkilîya wan ya têgihî dîyar dibe (Plag, 2003: 151). Herçiqas peyvên pêkhatî ji du yan jî zêdetir hêmanan pêk bînin jî her car hêmaneke sereke tê da heye û di semantîka peyvê da rola sereke jî ya vê peyvê ye (Sarı, 2015: 75; Stekauer û yên din, 2012: 75).

Di kurmancîyê da gelek caran peyvên pêkhatî bi xêra navbendan saz dibin. Navbend (interfix) dikevin nebera du peyvên û peyvên pev ra dikelişînin (Delikaya, 2016: 43). Navbendên wekî “-e-”, “-an” vê peywirê bi cih tînin. Bi morfema “-e-”yê peyvên wekî “germegerm”, “zingezing”, “şîregerm”, “tîremar”ê û bi morfema “-an”ê jî peyvên “seranser”, “beranber”ê saz dibin. Herwiha daçeka “bi”yê jî hin caran peywirê neyê navbendê hildigire ser xwe, lê ew “bi” bi serê xwe tê nivîsandin. Nimûne: “Ser bi ser”, “der bi der”, “cur bi cur” (Tan, 2011: 73-74).

1.3.2.2.3.3. Guhastin (Conversion)

Guhastin ew awayê peyvsazîyê ku bi guherîna peywira peyvê cureya wê diguhere. “Di vê rêbazê da bêyî ku guherîneke teşeyî di peyvê da pêk bê peyveke nû saz dibe. Heman forma peyvê dikare bibe kar, hevalnav an jî hevalkar. Yanî di pêvajoya pevguherîna navdêr û karan, hevalnav û karan û cureyên din çêdibe” (Plag, 2003: 107-108; Stekauer û yên din, 2012: 123, 216).

Di guhastinê da tu peyvên nû ji peyva heyî nayên çêkirin. Tenê maneya peyvê û bergeha bikaranîna wê tê berfirehkirin an jî guherandin (Muhammed, 2016a: 17) û ji

morfolojîyê zêdetir pêvajoyeke sentaksî li dar e. Wekî nimûne di kurmancîya jorîn da peyva “*pêşî*”yê dikare hem wekî hevalkar (Ez pêşî hatim.), hem hevalnav (Ez roja pêşî hatim.) hem jî navdêr (Ez li pêşîya malê me.) bê bikaranîn. “Di encama guhastinê da cureya peyvê tê guherîn. Bi gelemperî navdêr dibin kar û kar jî dibin navdêr; ji ber ku peyveke nû çênabe ev rewş ne wekî dariştina peyvan belkî wekî avabûna têgihan tê dîtin” (Sarı, 2015: 66).

Di kurmancîya jorîn da jî hin rayekên hevpar hene ku hem wekî kar hem jî navdêran tên bikaranîn. Wekî nimûne peyvên “*bez*”, “*rev*” û “*ger*”ê rayekên hevpar û di heman demê da bi veguhastinê hem wekî navdêr, hem jî kar tên bikaranîn.

1.3.2.2.3.5. Wergirtin (Borrowing)

Di zimannasîyê da wergirtin tê maneya neqilbûna peyveke ji zimanekî bo zimanekî din. Hemû ziman kêm an jî zêde di bin tesîra zimanekî din da dimînin û jê peyvan digirin, lê li gorî hin şert û mercan rêjeya wan diguhere. “Faktorên wekî nêzbûnê, erdnîgarîyê, guherîna civakî, dîn û teknolojîyê tesîrê li ser pêvajoya wergirtinê dikin. Peyvên ku ji zimanekî derbasî zimanê din dibin carinan taybetîyên xwe yên fonetîkî û binyadî diparêzin carinan jî di wan da guherîn çêdibe” (Paylan, 2015: 124-125; Rehîmî, 2008: 27-28).

Li gorî Haugen wergirtina peyvan divê ne wekî rewşekê belkî wekî pêvajoyekê bê pênasekirin ku di vê pêvajoyê da rewş û taybetîyên wekî wergirtina maneyî (semantic loan), wergirtina wergerî (loan translation), melezî (hybrid) û peyva wergirtî (loanword) hene (Haugen, 2010: 135). Di pêvajoya wergirtinê da zimanê wergir (recipient language) û zimanê jêder (donor language) hene. Zimanê ku peyvê digire zimanê wergir e û yê ku peyv jê tê wergirtin jî zimanê jêder e.

Kurmancîya jorîn ji gelek zimanan peyv wergirtine. Bi taybetî jî piştî têkiliya çandî û civakî ya bi axêverên zimanên wekî erebî, farisî, îngilîzî û tirkî, ji van zimanan gelek peyv derbasî kurmancî bûne.

1.3.2.2.3.6. Wergerandin (Translation)

Wergerandina yekser an jî wergerandina deynkirî (loan translation) çêkirina peyvan ya bi hêmanên xwemalî ye ku li ber modelên zimanekî din tînin çêkirin (Muhammed, 2016a: 159). Li gorî Bloomfield ev awayê sazkirina peyvan wergera deynkirî (loan-translation) yan jî wergera rasterast e. Peyva ku bi vê rêbazê saz bûye wekî peyva denynkirî (loan word) tê binavkirin. Di vê rêbazê da peyvek ji zimanê jêder rasterast derbasî zimanê wergir dibe.

Di kurdî da jî nimûneyên peyvên ku bi vê rêbazê saz bûne hene. Bo nimûne, peyvên wekî “malper”, “zanîngeh”, “parêzgeh”, “makezagon”ê li ber modelên hin zimanên din hatine çêkirin. Malper ji ber peyva îngilîzî ya “home page”ê, xwendîngeh li ber modela erebî ya “medrese”yê, zanîngeh li ber modela farisî ya “danişgeh”ê û makezagon li ber modela tirkî “anayasa”yê hatine saz kirin (Muhammed, 2016a: 159).

1.3.2.2.3.7. Qusandin (Clipping)

Yek ji rêbaza peyvsazîyê jî qusandin e. Qusandin saz kirina peyveke nû ye bi awayê avêtina hin tîpan an jî denga pêk tê. “Qusandin ji aliyê fonolojîk ve bi kêmbûna deng, ji aliyê morfosentaktîk ve bi peywenda peyvê û ji aliyê semantîk ve jî bi maneyê ra têkildar e” (Donka, 2018: 229). Awayên qusandinê yê wekî “birîn”, “kêmbûn” û “pîçûkkirin”ê hene û di hemû rewşan da peyveke dirêj kurttir dibe. Bi vê taybetîya xwe qusandin pêvajoyeke dijberî dariştin û pêkhatinê ye (Francis, 2016: 240). Qusandin, bêhtir di navdêran da pêk tê, lê hindik be jî di hevalnav, kar, hevalkar û daçekan da jî tê dîtîn. Di vê rêbazê da carinan ji paşîya peyvê beşek dikeve (back-clipping) carinan ji pêşîya wê (fore-clipping) carinan jî ji nav peyvê beşek dikeve (median clipping) (Jamet, 2009: 17).

Di vê rêbazê da bi gelemperî ji serê peyvan û dawîya wan hin kîte dikevin ku ji aliyê binyadê ve aloz û pirkîte ne (Sarı, 2015: 47). Qusandin dişibe rêbaza têkilkirinê (blending) lê ne heman tişt e. Lewra di têkilkirinê da di komepeyvekê da hin parçe tînin avêtin û hêmana ku dimîne ji aliyê maneyê ve peywendekê nû pêk tîne, lê di qusandinê da hêmana ku dimîne temsîliyeta maneya tevahîya komepeyvê dike.

1.3.2.2.3.8. Paşvesazî (Backformation)

Paşvesazî, ew rêbaza peyvsazîyê ye ku ji peyvekê parçeyek tê avêtin û peyveke nû tê sazkirin. (Uzun, 2006: 45). Di vê rêbazê da bi taybetî ji dawîya peyvê gireyek tê avêtin û bi awayekî anolojîk peyveke nû saz dibe (Plag, 2003: 37). “Di vê pêvajoyê da peyv gireyê nagire, berovajî vê çend herfên xwe ji dest dide û peyveke nû saz dike ku ji kurtkirina peyveke din pêk tê” (Delikaya, 2016: 58-59).

Paşvesazî û qusandin dişibin hev, lê ne heman tişt in. Di qusandinê da peyv tên kurtkirin lê maneya wan naguhere. Di paşvesazîyê da hem maneya peyvê diguhere û hem jî gelek caran bira wê diguhere. Di paşvesazîyê da paşgirek ji peyvê tê avêtin. Bo nimûne, bi paşvesazîyê peyva “*nivîs*”ê ji peyva nivîsîn an “*hejmar*” ji hejmartinê hatine çêkirin (Muhammed, 2016a: 156).

1.3.2.2.3.9. Têkilkirin (Blending)

Têkilkirin, ew rêbaza peyvsazîyê ye ku bêyî pêvajoyeke morfolojîk bi têkilbûna du yan jî zêdetir rayekan peyvên nû saz dibin. (Roig-Marín, 2021: 33). Di têkilkirinê da rêbaza herî berfireh ew e ku di navbera du peyvên da pêk tê, lê yên ku bi sê peyvên çêdibin jî hene. Ji her peyvê beşek tê wergirtin (deng yan jî kîte) û ev her du hêman di binyada peyvekê da tînin cem hev û maneyek li peyva nû tê barkirin. Maneya ku nû derdikeve, di gelek rewşan da maneya hemû hêmanan di xwe da dihewîne ku peyva tîkel pêk tînin (Sarı, 2015: 52).

Di vê rêbazê da peyv bi tevahî nayên cem hev, ji her peyvekê parçeyek tîkilî hev dibin. Bi vê taybetîya xwe hin alîyên wê dişibin pêkhatin û qusandinê jî. Lê hin cudahî di navbera van rêbazan da hene. Di pêkhatinê da peyvên ku tînin cem hev bi tevahî tînin parastin (Paylan, 2015: 163) û di qusandinê da jî ji nava peyvekê yan jî komepeyvekê hin hêman bi temamî tînin avêtin, lê di têkilkirinê da hemû hêman bi parçeyekî xwe di nav peyva nû da tînin temsîlkirin û xuyakirin.

Di peyvsazîya kurdî û zimanên din da jî ev metod kêr li kar e yan jî qet peyda nabe. Lê vê dawîyê çend nimûneyên balkêş ên tîkel di kurdî da hatine çêkirin. Ji wan ên herî navdar tirkmancî (têkilkirina tirkî û kurmancî) û sormancî (têkilkirina soranî û kurmancî) ne. Mirov dikare herwiha peyva îngilîzî ya “*brunch*”ê (taştêya dereng yan jî

firavîna zû) wekî nimûne bide ku ji têkilkirina “*breakfast*” (taştê) û “*lunch*”ê (firavîn) hatiye çêkirin (Muhammed, 2016a: 15).

1.3.2.2.3.10. Sernavî (Acronym)

Rêbaza sernavîyê ew rêbaza peyvsazîyê ye ku bi gelemperî dengên serî yên du yan jî zêdeyî du peyvan tên cem hev û peyveke nû saz dibe. Ev rêbaz pir dişibe têkilkirinê (Sarı, 2015: 56), lê bêlê bi temamî ne wekî wê ye. Lewra di têkilkirinê da ji her peyvekê beşek tê wergirtin, lê di sernavîyê da tenê dengê pêşî yê peyvan tê wergirtin.

Wekî Muhammed dibêje peyvên ku bi vê rêbazê saz bûne peyvên wisan in ku ji sertîpên navê dezgehekê yan tiştêkî pêk tînin; lê ne herf bi herf, wekî peyvekê tînin gotin. Bo nimûne, peyva “*radar*”ê ji kurtkirina îfadeya inglîzî ya “*radio detection and ranging*”ê saz bûye (2016a: 16). Wekî tê dîtin tîpên pêşî yên peyvên pêkhatî tînin cem hev û wekî peyveke nû tê telafuzkirin û nivîsîn. Di inglîzî da peyvên wekî, “*NATO*”, “*UNESCO*”, “*USA*”yê bi vê rêbazê saz bûne (Plag, 2003: 13) û bi rêbaza wergirtinê bi heman awayî derbasî gelek zimanên din bûne.

Armanaceke vê rêbazê jî pratîkbûn û sivikbûn e. Ji bo ku peyv li bîra mirov bimînin ji devla îfadekirina peyvên pêkhatî yên dirêj, awayê peyvê yê sernavî tê gotin (Sarı, 2015: 59).

BEŞA DUYEM

PÊŞGIRÊN DARIŞTINÊ

Peyvsazî, çêkirin û sazkirina peyvên nû ye û gelek rêbazên wê yên cuda hene. Yek ji wan rêbazan dariştin e. Dariştin bi rêya pêşgir û paşgiran pêk tê. Pêşgir cureyeke morfemên bendî ne. Hin ji wan binaverok û hin ji wan jî bînaverok in. Pêşgirên peyvsaz bi serê xwe ne xwedîyê maneyeke tekûz in, lê piştî ku tîna pêşîya morfeke serbixwe yanî peyveke binaverok û serbixwe maneyeke nû li wê peyvê bar dîkin. “Ev gire carinan jî li rex maneyê tesîrê li ser kategorîya peyvên jî dîkin yanî dikarin cureya peyvê biguherînin” (Stekauer, Valera û Körtvelyessy, 2012: 136). Kurdo derheqê pêşgiran da wiha dibêje: Pêşpirtik digihin navên heyî, bi wan ve dizeliqin û bi vî awayî fikra wan diguherînin û xeberên teze çêdîkin (1981: 23).

Hin pêşgir bi heman teşe û morfolojîya xwe bi awayekî xweser tîna bikaranîn lê di fonksiyon û maneyên cuda da ne. Pêşgirên wekî “*bi-*”, “*bê-*”, “*ne-*”, “*ra-*” û “*ve-*”yê hem wekî morfemên serbest tîna bikaranîn hem jî wekî morfemên bendî tîna bikaranîn. Dema bi awayê xweser tîna wekî daçek tîna bikaranîn û dema bi awayê bendî tîna fonksiyona dariştinê tînin. Morfemên wekî “*jê*”, “*lê*”, “*pê*” jî ber ku bi serê xwe, bi awayekî xweser jî di kurdî da tîna bikaranîn ne gireyên dariştinê ne; peyv (morfemên serbixwe) in. Wekî Ebdulfettah jî dibêje: “Ev peyv ji kurtkirin û pevxistina cînavên nîşandanê û kesîn (vî/vê, wî/wê) û daçekan (bi, ji, li) pêk hatine” (2011: 74).

2.1. Ba-

Pêşgira “*ba-*”yê hem ji aliyê fonksiyona xwe ve hem jî ji aliyê semantikê ve bisînor tîna bikaranîn. Ev pêşgir bi peywira karsazîyê radibe û “bi taybetî maneya badan û lifandinê li rayekên karan bar dîke (Bedirxan û Lescot, 2004: 280). Muhammed di xebata xwe ya li ser peyvsazîya kurdî da dibêje: “Hin pêşgir hene ku dikarin wekî pêşlêker bîna hejmartin, lê guman li ser pêşlêkerîya wan heye; ji ber ku ew tenê li gel yek an du-sê lêkerên xwerû tîna bikaranîn. Yek ji wan pêşlêkeran jî “*ba-*”yê ye.” (Muhammed, 2016a: 101).

Di metnên klasîk da jî ev pêşgir tenê digel kara “*dan*”ê hatiye bikaranîn û maneya livandinê li peyvê zêde kiriye û erka karsazîyê anîye cih. Di karsazîyê da morfemeke bendî li morfeke serbixwe zêde dibe û ji vî morfemê lêkerêk tîna dariştin, ev sazîkirin ji

cureyên cuda pêk tê dibe ku ev morfema serbest hevalnav an jî navdêr be (Hamawand, 2011: 67).

2.1.1. Livandin û Zivirandin

Pêşlêkera “*ba-*”yê dema li hin karan zêde dibe maneyên belavbûnê û vekirina rêyekê ya li ber tiştêkî yan kesekî li kara xwerû zêde dike (Muhammed, 2016a: 106). Di metnên klasîk da ev pêşgir hatiye pêşîya kara “*dan*”ê ya di forma dema borî da û maneyên girêdan, livandin û zivirandinê li vê karê zêde kirine.

(1) a. “*Goşeyê nûnan bi ser badan ji qewsê bê weter/ Mislê engušta nebî sed ser beyandin mahê new*”(Cizîrî, 2019: 228).

b. “*Binê nûnan li ser sadan ku katib koşe lê badan/ Seraser qafi ta qafe rumûza ‘Hikmetu’l-Eyn’ê*” (Cizîrî, 2019: 292).

Di nimûneyên jorîn da bi vê pêşgirê kara “*badan*”ê hatiye dariştin. Ji aliyê morfolojîk ve ev kar ji pêşgira peyvsaz a “*ba-*”yê û kara “*dan*”ê ya di forma dema borî da pêk tê. Wekî Îzoli jî destnîşan dike maneya kara “*badan*”ê ya ferhengî livandina li dora tiştêkî an di maneya xwe ya biwêjî da “*rûjêbadan*” berê xwe ji tiştêkî zivirandin terkkirin, jê xeyidîn e (1992: 41). Di nimûneyên (1a-b)yê da pêşgira “*ba-*”yê hatiye pêşîya kara “*dayîn*”ê û peyva “*badan*”ê hatiye dariştin. Di her du nimûneyan da jî ev pêşgir ji bo bizava çêkirina tîpa “*nûn*”ê hatiye gotin. Ji ber ku di vir da ev kar bi çêkirina qewsê hatiye şibandin maneya livandin û zivirandina ber bi jor ve li karê zêde kiriye.

2.2. Ber-

Morfema “*ber*”ê wekî pêşleker li kara “*berdan*”ê zêde dibe û li ser maneya wê guherînê pêk tîne. Ev morfem wekî peyveke serbixwe jî tê bikaranîn û maneyên wê yên ferhengî gelek in. Di ferhenga Farqînî da di kategorîya peyvê da maneyên wê yên wekî “*berhem*”, “*firehî*”, “*zarok*”, “*cih*”, “*hêl*” û “*kevir*” hene (2005: 119-120). Dema ev pêşgir tê pêşîya kara “*dan*”ê li gorî peywend û kontekstê maneyên cuda lê zêde dike. Muhammed maneyên wê yên wekî “*belavbûn*”, “*belavkirin*”, “*rêlêvekirin*”, “*rizgarkirin*” û “*vêxistina agir*” destnîşan dike (Muhammed, 2016a: 106). Di metnên klasîk da ev pêşlêker tenê di pêşîya kara “*dan*”ê da heye.

Ji alîyê semantîk ve di metnên klasîk da maneyên ku vê pêşgirê li kar zêde kirine di pênc kategorîyan da ne. Li gorî peywenda rêzikên helbestê vê peyvê maneyên azadkirin û birina tiştêkî ber bi jêr ve, handan û cehda ji bo êrîşê, terikandina cihekî, destpêkirina karekî û avêtina çekê, yanî êrîşkirina bi çekê li rayeka karan zêde kirine.

2.2.1. Azadkirin û Birina ber bi Jêr ve

Kara “*berdan*”ê ji alîyê morfolojîk ve di forma dema borî da ye. “*Da-*” pêşgira peyvsaz e û hatiye pêşîya kara “*dan*”ê û ji kara rayeka dema borî kareke nû saz kiriye û erka karsaziyê anîye cih. Di vir da cureyê peyvê neguheriye. Lewra ji karê dîsa kar hatiye dariştin, lê bi vê pêşgirê maneya kar hatiye guherandin.

- (2) a. “*Da Mîr ji wî ra birayî berdet/ Ya ev ser û malê te bi der det*”(Xanî, 2014: 110).
b. “*Dîwane me min perî bi der da/ Ez Dicle me zenberî me berda*” (Xanî, 2014: 110).
c. “*Berde bi mil da xemrîyan/ Badit seher reyhanîyan*” (Cizîrî, 2019: 269).
d. “*Van rehrewên himmetbilind/ Berdane meydanê semend*” (Cizîrî, 2019: 92).

Di nimûneya (2a)yê da peyva “*berdan*”ê maneya azadkirina mirovekî ya ji girtîgehê daye metnê. Lewra di vir da mijar derxistina Mem a ji girtegehê û azadkirina wî ye. Ev mane bi pêşgira “*ber-*”ê li kara “*dan*”ê bar bûye. Di nimûneya (2b)yê da bi vê pêşgirê maneya destûrdayînê li peyvê zêde bûye. Lewra di vir da peyva “*berdan*”ê maneya hilanîn û rakirina tiştêkî ya ji ber avê û serbesthiştinê daye metnê.

“*Zemberî ew bend e ku li pêşîya çemekî tê girêdan û avê li piştê da dipengînin û nahêlin ava wî serbest herre*” (Cîhanî, 2013: 518).

Di nimûneya (2a)yê da jî serbesthiştin hebû, lê ew di maneya derxistina mirovekî ji girtîgehê da ye, lê di vir da bi kara *berdanê* ne azadkirinê, pêşlêvekirin hatiye îfadekirin. Di nimûneya (2c)yê kara dariştî ya “*berdan*”ê bi maneya avêtin û danîna gulîyan a bi ser milan ve hatiye bikaranîn. Lewra di vê malikê da “*xemrî di maneya gulîyên yarê da hatine bikaranîn*” (Zivingî, 2013: 397). Di vir da, ji peywenda maneyê jî tê famkirin ku pêşgira “*ber-*”ê liv û tevgereke ber bi jêrîn ve jî li kara “*dan*”ê zêde kiriye. Lewra karê *berdana xemrîyan* (gulîyan) ya bi ser milan ve ji jor ber bi jêr ve pêk tê. Di nimûneya (2d)yê da kara “*berdan*”ê di maneya serbesthiştinê da hatiye bikaranîn. Lewra

ev peyv di vir da ji bo destnîşankirina karê berdana semendan (hespan) a li meydanê û serbesthiştina wan hatiye bikaranîn

2.2.3. Handan û Cehda ji bo Êrîşê

Di berhemên klasîk da dema ku pêşgira dariştinê ya “ber-”ê li rayeka dema borî ya kara “dan”ê zêde dibe kara “berdan”ê tê dariştin û ev kar di peywenda metnê da maneya handan û cehda ji bo êrîşê dide.

(3) a. “Çawa vekirin te her du ahû/ **Berdane** feqîrî her du cadû” (Xanî, 2014: 164).

Maneyeke ferhengî ya karê berdanê êrîşkirin e. Ev kar ji bo vê maneyê bide bi awayê ‘berdana ser...’ tê bikaranîn (Îzoli, 1992: 52). Di nimûneya (3a)yê da kara “berdan”ê bi pêşgira “ber-” û rayeka kara “dan”ê hatiye dariştin. Di vir da bi kara “berdan”ê handana tiştêkî yan jî kesekî ji bo êrîşkirina deverêkê li metnê zêde bûye. Lewra “her du cadû û her du ahû kîneyet in ji bo îfadekirina her du çavên Zînê” hatine gotin (Cîhanî, 2013: 688).

2.2.4. Terikandin û Jêgerîn

Di metnên klasîk da carinan dema ku pêşgira dariştinê ya “ber-”ê li rayeka kara “dan”ê ya dema borî zêde dibe ji vê rayekê kareke nû saz dike. Ji aliyê semantîk ve jî ev pêşgir maneya terkkirina cihekî, dûrbûna ji tiştêkî yan jî kesekî, qutkirina têkilîyê li rayeka karê bar dike.

(4) a. “Bajêr û kelat û xanî **berdan**/ Teşbîhê bi nijdeyan û cerdan” (Xanî, 2014: 43).

b. “Ew zerre bi wan me daye **berdan**/ Kêşane bi asîman ji erdan (Xanî, 2014: 197).

c. “Dilê bit seyde şahînan/ yeqîn de destî jê **berdin**” (Cizîrî, 2019: 303).

Di nimûneya (4a)yê da peyva dariştî ya “berdan”ê ji bo derketina ji cihekî hatiye bikaranîn. Di vir da vê pêşgirê maneya terikandinê li kara “dan”ê zêde kiriye. Lê ji peywenda beytê tê famkirin ku ev terikandin bi arancekê û bi awayekî demkî pêk tê. Lewra di vir da derketina ji bajar, kelat û xanîyan bi aramancê geşt û seyrane pêk tê. Di nimûneya (4b)yê da jî terikandin heye lê di vir da ev kar bi awayekî domdar hatiye kirin û

bi kara “*berdan*”ê qutkirina têkilîyê ya bi tamamî hatiye îfadekirin. Ji ber ku di vir da tê destnîşankirin ku Mem û Zînê têkilîya xwe ji dinyayê birîye. Di nimûneya (4c)yê da peyva ku bi pêşgira “*ber-*”ê hatiye dariştin di nava biwêjekê da hatiye bikaranîn. Di vir da bi kara dariştî ya “*berdan*”ê terikandin û digel vê jî hêvîqutkirina ji tiştêkî hatiye îfadekirin.

2.2.5. Destpêkirin

Maneyeke din a kara “*berdan*”ê ku di metnên klasîk da derdikeve pêş destpêkirina karekî ye. Di dariştina vê karê da pêşgira “*ber-*”ê dikeve pêşîya kara “*dan*”ê. Dema ev peyva dariştî berî navê kar û tevgerêkê tê, maneya destpêkirina wî karê ku tê kirin li metnê bar dike.

(5) a. “*Dilberê berda girînê/ Hêstirê wê nazenînê*”(Feqî, 2017: 325⁷).

b. “*Dayîn heyirî ji îştîyaqê/ Berda giriyê ji îftiraqê*” (Xanî, 2014: 68).

Di nimûneya (5a)yê û (5b)yê da kara “*berdan*”ê di maneya destpêkirinê da hatiye bikaranîn. Piştî ku pêşgira “*da-*”yê hatiye pêşîya kara “*dan*” ê ev mane li kar hatiye zêdekirin. Kara ku nû hatiye saz kirin ji alîyê cureyê ve neguheriye, lê ji alîyê maneyê ve bi tamamî guheriye û têkilîya wê ya semantîk bi kara “*dan*”ê ra nemaye.

2.2.6. Êrîşa bi Çekê

Kara dariştî ya “*berdan*” ê ji bo avêtin û hilpekandina tiştêkî tê bikaranîn. Di heman demê da ji bo îfadekirina karê xebitandina çekê yan jî pekandina berika çekê yan jî tîra di kevanê da tê gotin.

(6) a. “*Kir şefqe mîr, anîme bîr, berdan mi tîr, kirme esîr*” (Cizîrî, 2019: 151).

b. “*Nûnên ji Yeng berdan xedeng wê pir ji teng şîrînleb e*” (Cizîrî, 2019: 217).

Di her du nimûneyên jorîn da (6a-b), pêşgira “*ber-*”ê li kara “*dan*”ê zêde bûye û vê pêşgirê maneyeke nû daye karê û bi vî awayî ji karekê kareke nû saz kiriye. Bi vê pêşgirê maneya avêtin û hilpekandinê li kara “*dan*”ê hatiye barkirin. Di heman demê da,

⁷ Di vê xebatê da nimûne ji çar menzûmeyên Feqîyê Teyran hatine dayîn. Ji ber ku her çar di heman pirtûkê da cih digirin navê menzûmeyan nehatiye dayîn tenê rûpela wan hatiye nivîsîn. Rûpelên menzûmeyan bi vî awayî ne: Şêx Sen’an:239-336; Bersisê ‘Abid:337-382; Şerê Dimdim: 383-397; Zembîlfiroş: 399-413.

di çarçoveyeke berfireh da vê peyva nû maneya bi qesda êrîşkirinê bikaranîna çekê jî îfade dike. Di nimûneya (6a)yê da kara dariştî (berdan) ji bo avêtina tîrê hatiye bikaranîn. Di nimûneya (6b)yê da jî peyva dariştî di nav îfadeya "...berdan xedeng"ê da derbas dibe. "Xedeng jî di vir da cureyeke tîran e. Lewra "xedeng ew tîr in ku ji dara narewanê çêdibin yanî ew tîrên darîn in" (Alparslan, 2021: 354).

2.3. Bi-

Pêşgira "bi-"yê di eslê xwe daçek e û dema tê pêşîya navan maneyên wan ji gelek alîyan ve tamam dike. Wekî Esen jî destnîşan dike di fonksiyona daçekî da maneyên wekî alav û amûr, li gorî, dabeşbûn û sondê li navan bar dike (2019: 13-14). "Lê ev gire wekî pêşgireke peyvsaz jî li kar e. Dema ku tê ber navdêran hinek peyvên nû çêdike. Bi taybetî ji navdêran hevalnavan saz dike" (Tan, 2011: 68). "Bi vî rengî, pirî caran maneya heyî, heye, xwedî/xwedan an jî maneya paşgira '-dar'ê dide naveroka peyva digel xwe." (Zîlan, 1991: 2). Celadet û Lescot jî fonksiyona wê ya sereke wekî nîşandana hebûna wesf û taybetîyeke tiştekî destnîşan dikin (2004: 280). Pêşgirên bi vî awayî wekî pêşgirên pozîtîf tîr binavkirin. Ev pêşgir tîr pêşîya morfemeke serbest û maneyeke erênî li peyvê zêde dikin (Hamawand, 2011: 57).

Pêşgira "bi-"yê dema dikeve pêşîya navdêran erka dariştina hevalnavan tîne cih. Hevalnavsazî yan jî bi gotineke din hevalnavkirin (adjectivization) çêkirina hevalnavan ji birên din ên peyvan e. Di kurdî da hevalnav dikarin bi alîkarîya gireyan ji navdêran, karan, hejmarnavan, hevalkaran û cînavan bîrên dariştin (Muhammed, 2016a: 44). Di sazkirina hevalnavan da morfemeke bendî ji bo hevalnavekê saz bike li morfemeke serbest zêde dibe û bi vî awayî hevalnaveke nû tê dariştin. Ev morfema serbest dibe ku kar, hevalnav an jî navdêr be (Hamawand, 2011: 137). Ev morfem jî di fonksiyona amrazeke hevalnavî dsa ji hevalnavên heyî hevalnavên nû yên wekî "bihêz", "bicoş" û "binaz"ê saz dike (Baban, 2014: 18).

Di metnên klasîk da pêşgira "bi-"yê di peywira hevalnavê da hatiye bikaranîn. Hevalnavên ku bi vê pêşgirê saz bûne hin jê hevalnavên raveker hin jî hevalnavên tamamker in. "Li ser pozîsyonên sentaktîk di hevokan da, rêngdêrên kurmancîyê bi du awayan rû didin: wekî tamamker (predicate) û wekî raveker" (Güneri, 2017: 24). Hevalnavên tamamker wekî pêveber rewşa bikerê nîşan didin û ji wan ra hevalnavên pêveberî (predicate adjective) jî tê gotin (Bilbil û Oztirk, 2019: 23); lê yên raveker di

nava raveka hevalnavî da taybetîya raveberê modîfiye dikin. Hevalnavên ku bi pêşgira “bi-”yê hatine dariştin hemû ji navdêran saz bûne. Pêşgira “bi-”yê tê pêşîya navdêran û wan dike hevalnav. Hemû nimûneyên peyvên dariştî yên ku bi pêşgira “bi-”yê hatine saz kirin bi fonksiyona saz kirina hevalnavê da hatine bikaranîn.

2.3.1. Xûy û Xislet

Di metnên klasîk da peyvên ku bi pêşgira “bi-”yê hatine dariştin ji aliyê morfolojiya xwe ve ji du morfeman pêk hatine. Morfema pêşî pêgira peyvsaz a “bi-”yê û morfema duyem jî navdêreke xwerû ye. Herwiha vê pêşgirê digel guherîna cureya peyvê (word class) ji aliyê semantîk ve jî maneyên wekî nîşandana xûy û taybetîyeke domdar (continuation), taybetîya rewşeke demkî, dirûv û taybetîyeke dîtbarî, bicihanîna peywirê û xwedîtîya tiştekî li navdêrê bar kiriye.

(7) a. “*Ellah çî zerîf î letîf î çî şepal î/ Qenc î û binaz î û delal î*” (Cizîrî, 2019: 298).

b. “*Dûr bû ji ef’alê bişik/ Ji emred û bikra xweşik*” (Feqî, 2017: 247).

c. “*Ev laîqê dergehê te nîne/ Ev kelb e nehîn di we bikîn e*” (Xanî, 2014: 94).

Di nimûneyên jorîn da di (7a)yê da pêşgira “bi-”yê maneya xwedîbûna taybetî û xisletekê li peyva “naz”ê bar kiriye. Di vir da peyva “binaz”ê kesekî îfade dike ku taybetîya nazdarbûnê pê ra heye û li gorî vê taybetîyê tevdigere. Di nimûneya (7b)yê da jî vê pêşgirê ji navdêra “şik”ê hevalnav “bişik”ê saz kiriye. Ev peyv di peywenda beyta jorîn da hatiye maneya kar û xebatên ku di wan da şik û guman heye. Di nimûneya (7c)yê da peyva dariştî “bikîn” e. Di vê mînakê da jî pêşgira “bi-”yê maneya taybetîyeke şexsî ya bi karakterê mirovekî ra têkildar li navdêra “kîn”ê zêde kiriye. Lewra li vir hevalnava “bikîn”ê xûy û taybetîya Bekir (Beko) nîşan dide. Helbet ev peyv dikare li gorî bikaranîna maneya taybetîyeke demkî jî bide. Mesela dema gotibûna “Beko îro gelekî bikîn e” hingî tevger û taybetîyeke wî ya demkî destnîşan dikir.

2.3.2. Rewş û Taybetî

Pêşgira “bi-”yê dema li navdêran zêde dibe di wan da hem ji aliyê cureyê ve hem ji aliyê maneyê ve guherîna pêk tîne. Bi vî awayî xwedîyê fonksiyoneke morfolojîk û semantîk e. Yek ji kategoriya semantîk ya vê pêşgirê jî ew e ku maneya xwedîtîya

taybetîyekê û hebûneke xusûsîyetekê li navdêran û taybetîyeke wan a ku bi demê sînordar e destnîşan dike. Di metnên klasîk da peyvên ku bi vê pêşgirê hatine dariştin di nav metnê da bi peywira hevalnavên raveker û hevalnavên temamker hatine bikaranîn.

- (8) a. “*Îro ji cemala te dilê min **bibirîn** e/ Ellah çi hebîbî çi tebîbî vekewîne*” (Cizîrî, 2019: 219).
- b. “*Şeytan li şex bû seremêr/ Nişan didit şuxla **bixêr***” (Feqî, 2017: 357).
- c. “*Eşq agir e ten Çiyayê Tûr e/ Dil ew şecera **binar** û nûr e*” (Xanî, 2014: 71).
- d. “*Ew sofîyê b’sewm û selat/ Asê kirî birc û kelat*” (Feqî, 2017: 343).

Di nimûneya (8a)yê da ev pêşgir bi maneya nîşandana hebûna birînê ya di nava dil da hatiye bikaranîn. Li vir ji peywenda rêzikên helbestê tê famkirin ku di vir da ji xwedîbûn û xwedîtîya tiştêkî zêdetir rewşa navdêrê dîyar kiriye û taybetîyeke wê ya demkî destnîşan kiriye. Ev rewş jî “*bibirînbûn*” yanî “*birîndarbûn*” e. Di nimûneya (8b)yê da pêşgira “*bi-*”yê li navdêra “*xêr*”ê hatiye zêdekirin û di vir da vê pêşgirê taybetîyeke şiroveyî û wesfandinê li navdêrê zêde kiriye. Di vir da peyva “*bixêr*” tiştê ku xêr tê da heye destnîşan dike. Di nimûneya (8c)yê da vê carê pêşgira “*bi-*”yê hatiye pêşîya navdêra “*nar*”ê û ji vê navdêrê hevalnava “*binar*” yanî biagir saz kiriye. Di vê peyvê da jî taybetîyeke peyva şecereyê ya nedomdar hatiye wesfandin û bi vê peyvê hebûna di nav tiştêkî din da hatiye destnîşankirin. Di nimûneya (8d)yê da pêşgira “*bi-*”yê li navdêra “*sewm*”ê yanî rojîyê zêde bûye. Di vê mînakê da jî pêşgirê di warê kar û peywirê da taybetîyek destnîşan kiriye. Lewra “*sofîyê bisewm*” ew kes e ku kar û girtina rojîyê tîne cih.

2.3.3. Teşe û Taybetîyên Dîtbar

Peywir û fonksiyoneke din a pêşgira “*bi-*”yê nîşandaneke taybetîya tiştêkî şênber e. Di vê rewşê da ev pêşgira peyvîsaz tê pêşîya navdêreke şênber û wê dike hevalnav. Ev hevalnav bi erka wesfandina şekl û dirûvê peyvekê û taybetîyeke wê ya berbiçav radibe.

- (9) a. “*Bejna şepal demê **bixal**/ Î’rab û dal qewsê hîlal*” (Cizîrî, 2019: 152).
- b. “*Netrik û tayên **birêşî**/ Ê dizêrîn pê ve wêşî*” (Cizîrî, 2019: 93).
- c. “*Cerhê **bixwîn** tîmar kirin/ Dîsa bi şûn ve bar kirin*” (Feqî, 2017: 283).

Di nimûneya (9a)yê da pêşgira “bi-”yê hatiye ber navdêra “xal”ê û bi vê pêşgirê hevalnava dariştî “bixal” saz bûye. Di vir da vê pêşgirê maneya hebûna li ser tiştê li navdêrê bar kiriye. Yanî tiştê ku xal li serê hene. Di Nimûneya (9b)yê da vê pêşgirê hevalnava “birêşî” saz kiriye. Di vir da jî vê pêşgirê şekl û dirûv nîşan daye. Yanî di vir da “birêşî” tê maneya wê tiştê ku di şeklê rêşî da ye. Di nimûneya (9c)yê da vê carê bi vê peyvê hevalnava “bixwîn” hatiye dariştin. Vê hevalnavê digel peyva “birîn”ê raveka hevalnavî ava kiriye. Birîna bixwîn yanî birîna ku xwîn tê da heye îfade dike. Wekî ji her sê nimûneyên jorîn xuya dike digel ku di her sê rewşan da jî rewşeke şênber û xuyayî heye jî dîsa di navbera wan da hin nuansên semantîk hene. Yek hebûna tiştêkî ya li ser cihekî (9a), ya din hebûnba tiştêkî ya nav deverêkê da (9c) ya din jî dirûvê tiştêkî nîşan dide (9b).

2.3.4. Xwedîfî

Pêşgira “bi-”yê dema tê pêşîya navdêrekê maneya xwedîbûnê dide navdêrê. Di metnên klasîk da ji bo nîşandana wesfekê ku rola mirov a civakî yan jî xwedîbûna eşyayekî nîşan dide tê bikaranîn.

(10) a. “Zembîlfiroş lawek rewal bû/ **Bikulfet** û ehlî ‘eyal bû” (Feqî, 2017: 399).

b. “Nesraniya **bizêr** û zeheb/ Zahir bibe cuz’ek rexeb” (Feqî, 2017: 282).

Di nimûneya (10a)yê da ev pêşgir hatiye ber navdêra “kulfet”ê. “Maneya peyva “kulfet”ê ya ferhengî hevser e. (Farqînî, 2005: 1058). Di vê mînakê da jî bi peyva dariştî ya “bikulfetbûnê” di maneya xwe ya teng da xwedîbûna hevserêkê xuya dike, lê di maneya xwe ya fireh da û li gorî peywenda metnê rewşa zewicînê nîşan daye. Yanî “bikulfet” hatiye maneya kesê zewicî. Di nimûneya (10b)yê da pêşgira “bi-”yê rasterast maneya xwedîbûn li navdêra “zêr”ê bar kiriye û hevalnava dariştî ya “bizêr”ê hatiye maneya kesa ku xwedîyê zêran an jî bi zêran xemilî.

2.4. Bê-

Morfema “bê-”yê bi peywira daçekî jî tê bikaranîn lê dema ku tê pêşîya navdêran maneyêke nû li wan bar dike û carinan jî cureya wan diguherîne. Ev morfem awayê neyînîyê ya daçeka “bi-”yê ye. Ji ber vê yekê jî dikeve nav kategorîya pêşgirên neyînîyê

(*negative prefixse*) “pêşgirên neyînîyê ji bo peyveke nû çêbikin tên pêşîya morfemeke serbixwe ya erênî û maneya neyînîyê li wan bar dikin”(Hamawand, 2011: 69) Pêşgira “bê-”yê bi fonksiyona pêşgira peyvsaz, tunebûna taybetî û wesfekê nîşan dide (Bedirxan û Lescot, 2004: 280). Evdîlqadir balê dikişîne ser du fonksiyonên wê: yek jê di warê guherîna cureya peyvê (word class) da ye ku ji navdêran hevalnavan ava dike (bêbext, bêwijdan) û ya din jî diçe ber endamê laşê mirovan û wekî îdyoman tê bikaranîn (bêdev û bêguh) (Evdîlqadir, 2016: 124, 125). Bazidî jî terîfa vê pêşgirê dike û nimûneyên wekî ‘bêar’, ‘bêheya’ û ‘bêhtirs’ dide û dibêje ku ev îfade rewşa tunebûnê nîşan didin (2019: 124).

Herwiha ev morfem wekî di peyvên “bêdest û bêpa” da xuya dike bi fonksiyona dariştina hevalnavan tê bikaranîn (Baban, 2014: 18) û wekî di peyvên “bêşik”, “bêguman”, “bêxem” da jî xuya dike di dariştina hevalkaran da pir aktîf e ku maneya nêrînî yanî berevajîbûnê li peyvê bar dike (Usman, 2015: 65).

2.4.1. Rewş û Taybetî

Du fonksiyonên sereke yên pêşgira “bê-” yê hene: yek jê maneya peyvê diguherîne ya din jî cureya wê diguherîne. Fonksiyona vê pêşgirê ya di warê guherîna cureya peyvê da ew e ku ev pêşgir hevalnavan saz dike. Di metnên klasîk da ev pêşgir tî pêşîya navdêran û ji van navdêran hevalnavan saz dike. Hevalnavên ku bi pêşgira “bê-”yê hatine saz kirin hatine pêşîya navdêrê û hem li ser maneya wê hem jî li ser cureya wê, guherîn pêk anîye. Pêşgira “bê-”yê di gelek kategorîyên semantîk ên din da maneya nebûna tiştekî destnîşan dike Lêbelê ev pêşgir, di hin fonksiyonên dariştinê da bi rola nîşandana taybetî û rewşê radibe. Di klasîkan da peyvên dariştî yên “bêeyb”, “bêsebat”, “bêaqil”, “bêçav” û “bêsewt” di vê kategorîya morfosemantîk da ne. Carinan jî ev pêşgir nebûna tiştekî ya di nav cihêkî yan jî di nav tiştekî da nîşan dide. Di metnên klasîk da peyvên dariştî yên “bêbar” û “bêxar” di vê peywendê da hatine bikaranîn.

- (11) a. “Ew Kamilê **bêeyb** û neqs/ Ne çerxê her new’ek bişexs” (Cizîrî, 2019: 47).
 b. “Çar ummehat in sê nebat/ Her bêqerar in **bêsebat**” (Cizîrî, 2019: 49).
 c. “Ne bi xêr û ne bi ahvil/ Paşî Bersîsê **bêaqil**” (Feqî, 2017: 356).

d. “*Bêtum ’e û bêşerab û bêçav/ Bêmeqsed û bêmirad û bêgav*” (Xanî, 2014: 52).

e. “*Perwanesîfet ku: her bêsewt û hes î tu*” (Cizîrî, 2019: 233).

f. “*Baran ne ji feyzê bit mededkar/ Ew dane dibîte nexlê bêbar*” (Xanî, 2014: 206).

g. “*Bilbilê mecrûhê işqê taqeta xaran nehin/ Dê kulafa rîşê sînê bişkowek bêxarî bit*” (Cizîrî, 2019: 65).

Di nimûneyên jorîn da peyvên dariştî “*bêeyb*” û “*bêsebat*” ji du morfeman pêk hatine. Morfema pêşî, pêgira peyvsaz a “*bê-*”yê û ya din navdêrên sade ya “*eyb*” û “*sebat*” in. Di her du peyvên da jî pêşgira peyvsaz cureya peyvê guherandiye û ji navdêrê, hevalnav saz kiriye. Ji alîyê semantîk ve jî pêşgira “*bê-*”yê hin guherîn di peyvê da pêk anîne û maneyeke nû lê bar kiriye. Di her duyan da jî maneya nebûna taybetîyekê yan jî pêknehatina kar û tevgerekê derketiye pêş. Di nimûneya (11a)yê da navdêra “*eyb*”ê bi pêşgira “*bê-*”yê bûye “*bêeyb*” û di nimûneya (11b)yê da navdêra “*sewt*”ê bûye “*bêsewt*” û ev her du peyv di nav metnê da bi peywira hevalnava temamker hatine bikaranîn. Di nimûneya (11c)yê da pêgira peyvsaz a “*bê-*”yê hatiye pêşîya peyva “*aqil*”ê û ji vê peyvê peyva “*bêaqil*”ê hatiye dariştin. Aqil taybetîyeke mirov e ku cudahiya herî berbiçav e ku wî ji wan candarên din vediqetîne. Ji ber ku di vir da jî peyva “*bêaqil*” ne nebûna aqil e, bikarneanîna wî ye. Di nimûneya (11d)yê da peyva dariştî “*bêçav*” e. Di vir da jî qesd ji vê peyvê ne nebûna çav e belkî pêknehatina peywira wî ya dîtîne ye. Di nimûneya din (11e)yê da vê carê bi pêşgira “*bê-*”yê peyva “*bêsewt*”ê (bêdeng) hatiye dariştin. Di vir da pêknehatina karê axaftîne hatiye destnîşankirin. Lewra taybetî û encama axaftîne deng e û nebûna deng hatiye maneya pêknehatina axaftîne. Di nimûneyên (11f-g)yê da dema “*nexil*” (dar) û bişkov hatine wesfandin ev her du peyvên dariştî hatine bikaranîn. Bi van peyvên ravekên hevalnavî saz bûne. Yek ji van ravekan “*nexlê bêbar*” e ku wan daran îfade dike ku fêkî bi wan ve tune ye. Ya din jî “*bişkovên bêxar*” e û tê maneya wan bişkovan ku sinc û strî bi wan ve tune ne.

2.4.2. Payeya Qîmetdarî û Pirbûnê

Peyvên dariştî yê vê kategorîyê ji alîyê semantîk ve ji du morfeman pêk hatine. Morfema “*bê-*”yê wekî pêşgira dariştîne hatiye ber peyvên sade “*hejmar*” û “*beha*”yê û ji van ravekan peyvên dariştî saz kirine. Di nav metnê da jî ev peyv di peywira hevalnavê

da hatine bikaranîn. Di van peyvên da ji aliyê semantîk ve du taybetiyên sereke derdikevin pêş: Yek jê wesfandina çawanîyê (qualitative) ya din jî wesfandina hejmarî (quantification) ye.

- (12) a. “*Işqa ji nûra Layezal/ Husn û cemala **bêmîsal***” (Cizîrî, 2019: 35).
b. “*Ayîneyê eksê **bêmîsal** e/ Gencîneyê sîrrê bêzewal e*” (Xanî, 2014: 202).
c. “*Wî her zewade kar dikir/ Zîkrê **bêhejmar** dikir*” (Feqî, 2017: 247).
d. “*Da bibit ew zinde vê ra/ Yarê sadiq **bêbuha** ye*” (Cizîrî, 2019: 201).
e. “*Mem jî fikirî di destê Tacdîn/ Elmaseke **bêbuha** û texmîn*” (Xanî, 2014: 53).

Di nimûneyên (12a-b)yê da pêşgira peyvsaz (bê-) maneya qîmetdarîyê li peyva “*mîsal*”ê zêde kiriye. Herwiha di vir da peyva ku hatiye dariştin di peywira hevalnavê da wesfandineke çawanîyê pêk anîye. Di (12c)yê da di peyva “*bêhejmar*”ê da pîrbûn û zêdebûneke madî hatiye tarîfkirin û wesfandineke hejmarî derketiye pêş. Di nimûneyên (12d-e)yê da peyva “*bêbuha*”yê hatiye dariştin. Di vir da peyva “*buha*”yê nirxeke madî destnîşan dike, lê piştî ku pêşgira “*bê-*”yê hatiye pêşîya wê ji aliyê maneyê ve hin guherîn pêk anîne. Di nimûneya (12d)yê da wekî “*yarê sadiq bêbuha ye*” derbas dibe ku peyva dariştî di vir da wekî hevalnaveke temamker cih girtiye. Di vir da “*bêbuha*” ji bo wesfandin û nîşandana nirxên mirovekî hatiye bikaranîn û wesfandineke çawanîyê pêk hatiye. Di nimûneya din da (12e) vê carê “*bêbuha*” di raveka hevalnavî “*elmaseke bêbuha*” da rola wesfandina nirxeke maddî pêk anîye û wekî hevalnaveke wesfî hatiye bikaranîn.

2.4.3. Pêknehatina Kar û Teverê

Pêşgira “*bê-*”yê maneya neyînîyê dide peyvê, lê gelek caran dema li navan bar dibe ne nebûna tiştê ku di vê peyvê da tê îfadekirin pêknehatina karê ku di peyvê da tê îfadekirin, destnîşan dike. Di metnên klasîk da peyvên “*bêcînayet*”, “*bêgav*” û “*bêxab*” di vê kategorîyê da hatine dariştin.

- (13) a. “*Îblîsê feqîr ê **bêcînayet**/ Hindî te hebû digel *înayet**” (Xanî, 2014: 52).
b. “*Bêtum 'e û bêşerab û bêçav/ Bêmeqsed û bêmirad û **bêgav***” (Xanî, 2014: 52).
c. “*Mela zanim ji medhûş î/ Te dil **bêxab** û bê xurde*” (Cizîrî, 2019: 193).

Di nimûneya (13a)yê da pêşgira “bê-”yê hatiye pêşîya navdêra cîneyetê û maneya neyînîyê dayê. Di vir da “cîneyet” yanî tawan û gunehekî îfade dike û di vir da vê pêşgirê maneya kesê ku ev kar nekiribe li peyvê zêde kiriye. Di beyta (13b)yê da, di peyva “bêgav”ê da qesd ne tunebûna “gav”ê ye. Di vir da bêgav di maneya pêknehatina karê avêtina gavê da ye û herwiha di maneya xwe ya mecazî da bêçarebûnê îfade dike. Herwiha di nimûneya (13c)yê da jî ji navdêra “xab/xew”ê hevalnava “bêxab/bêxew”ê hatiye dariştin. Di vir da jî peyva “bêxab”ê navdêra dil wesfandiye, maneya destnîşankirina kesê ku nikare raze li peyvê zêde kiriye.

2.5. Da-

Morfema “da-”yê bi fonksiyona xwe ya dariştinê li rayeka karan zêde dibe. Ev pêşgir “Di soranî û kurdîya başûrî da jî wekî ‘da-’ ye. Eslê wê ji paşdaçeka ‘da’yê tê, wekî *ber bi jêr ve*” (Muhammed, 2016a: 100). Dema li karan zêde dibe maneyên wekî çûna ber bi hêla jêrîn ve, girtina tiştêkî yan jî ketina nav deverêkê li wan bar dike (Bedirxan û Lescot, 2004: 281). “Carinan dema kuy tê pêşîya peyvê maneyên nizm, veger û daketinê dide peyvê” (Tîgrîs, 2011: 18). Yek ji fonksiyona wê jî ew e ku dema tê serê hin karan wan dike karên sazber; herwiha wan ji maneyên wan ên eslî dûr dixe (Bozarlan, 2011: 562).

Pêşgira “da-”yê di metnên klasîk da tê pêşîya karan û maneyên curbicur li wan zêde dike. Ev mane û erkên wê li gorî peywenda metnê diguherin. Di peywenda metnê da hem bi fonksiyona karsazîyê û hem bi ya navdêrsazîyê tê bikaranîn. Di her du rewşan da jî pêşgir li rayeka karê zêde dibe û ji karan dîsa karan saz dike. Ji alîyê morfolojîk ve hem tê pêşîya karên rayeka dema borî hem jî yên rayeka dema niha. Ji alîyê semantîk ve carinan maneya kara ku lê zêde dibe xurt û berfireh dike û carinan jî maneyeke nû lê bar dike.

2.5.1. Xurtkirin û Kirpandina Maneyê

Pêşgira “da-”yê bi erka xwe ya dariştinê carinan li rayekên karên dema borî zêde dibe û di maneya wan da guherînê pêk tîne. Di klasîkan da peyvên “*daberist*” û “*daherist*”ê bi vê pêşgirê saz bûne. Di van peyvên da pêşgira dariştinê ji rayeka karê dîsa kar saz kiriye. Ji alîyê semantîk ve jî maneya kar bi temamî neguherandiye, tenê maneya rayekê xurt kiriye û kirpandiye.

(14) a. “Zengiyan cewşen vebestin pêşberê coqa hebeş/ **Daberistin** yekbi yek çûnberliwayêrastûçep” (Cizîrî, 2019: 62).

b. “Sermest-i û bi dest û têk heristin/ Bû gelte û gelc û **daberistin**” (Xanî, 2014: 90).

c. “Sorgul jixwe da li ser rehist/ Sunbil bixwe pê ve **daherist**” (Xanî, 2019: 35).

d. “Nexla bedena xwe raweşînim/ Vê meyweyê cumle **daweşînim**” (Xanî, 2019: 189).

Di nimûneyên (14a-b)yê da pêşgira “da-”yê di vê karê da payeya êrîşkirinê xurt kiriye. Wekî ku di (14a)yê da dîyar dibe karê ku hatiye kirin bêhtir bişîdet û tund e. Lewra di vir da çûna zengîyan a ber bi lîwayê bi awayekî tund û bi şidet pêk tê. Di beyta (14b)yê da jî paşgira dariştinê maneya xurtkirin û bihêzkirinê daye karê. Lê di vê mînakê da “**daberistin**” ne di maneya êrîşê da ye, maneya çûna du mirovan a ber bi hev ve li metnê zêde kiriye. Lewra di vir da tiştê ku bi “**daberistin**”ê hatiye terîfkirin nêzîkbûna hev a Stî û Tacdîn e û ev kar bihêzbûn û lezgîniyê jî destnîşan dike. Rayeka kara “**herist**”ê di forma dema borî da ye û piştî ku pêgira peyv saz a “da-”yê lê zêde bûye kareke nû saz bûye. Di nimûneya jorîn ya (14c)yê da di peyva “**daherist**”ê da pêşgira “da-”yê heman mane li peyva heristinê zêde kiriye. Di vir da maneya tevgera heristinê yanî şîdeta karê têkelbûnê û bi vê pêşgirê xurt bûye. Di nimûneya (14d)yê da pêşgira “da-”yê li kara “**weşî**”ê zêde bûye. Ev kar tê maneya ketina tiştêkî an kesekî û hejandinê” (Demir, 2021: 57). Di vir da pêşgirê maneya karê bi temamî neguherandiye tenê maneya wê xurt kiriye. Çawa ku di nimûneyên jorîn di (14d)yê da tê dîtîn, bi peyva “**daweşî**”ê karê weşîna mêweyan bi awayekî xurttir hatiye destnîşankirin. Lewra jî di vir da pêşgira “da-”yê fonksiyona xurtkirina maneyê anîye cih.

2.5.2. Îşxalkirin û Ketina Nava Cihêkî

Pêşgira “da-”yê ji aliyê morfolojîk ve dema li rayeka hin karan, yên di dema borî, zêde dibe ji van karan, karên nû saz dike û ji aliyê semantîk ve jî maneya îşxalkirina deverêkê û ketina nava cihêkî li wan bar dike. Di metnên klasîk da peyva “**dagirtin**”ê bi vî awayî hatiye saz kirin.

(15) a. “Asarê şeca ‘etê wî şahî/ **Dagirtî** ji mah ta bi mahî” (Xanî, 2019: 33).

b. “*Awaz û dengê bulbulan/ **Dagirtibû** her çar derav*” (Cizîrî, 2019: 147) .

c. “*Narê keçê **dagirt** hinav/ Dêma ku tê da nûr û tav*” (Feqî, 2017: 264).

Di nimûneyên (15a-b)yê da pêşgira “*da-*”yê hatiye pêşîya kara “*girtin*”ê û ji vê rayekê kara “*dagirtin*”ê hatiye dariştin û ev kar di metnê da bi maneya firehbûn û girtina ser deverekê hatiye bikaranîn. Di vir da pêşgira “*da-*”yê paye û radeya karê girtinê zêde kiriye û maneya wê berfireh kiriye. Di berhemên klasîk da du maneyên sereke yên “*girtin*”ê hene: Zeftkirina tiştêkî ye, ya duyem jî ketina nava tiştêkî yan jî deverekê ye. Di maneya kara “*girtin*”ê da ji alîyê hecmê ve ketina nava cihekî sînardar heye, lê di peyva “*dagirtin*”ê da pêşgira “*da-*”yê dereceya maneyê karê xurttir û berfirehtir kiriye. Di “*girtin*”ê da tiştê ku ji alîyê hecmê ve deverek girtiye bisînor e, lê di dagirtinê da vî tiştî her der dagir û tije kiriye. Di vê nimûneya (15c)yê da peyva “*dagirtin*”ê dîsa di maneya ketina nava tiştêkî da hatiye, lê di vir da êdî digel belavbûnê ji alîyê rêje û hecmê ve zêdebûn jî hatiye destnîşankirin.

2.5.3. Liva ber bi Jêr ve û Bichkirina di Nav Tiştêkî da

Dema ku pêşgira “*da-*”yê li rayekên karên “*ketin/keftin*” û “*anîn/inan*”ê zêde dibe maneya wan diguherîne û ji van rayekan karên nû saz dike. Ji nimûneyan tê famkirin ku ev pêşgir ji alîyê morfolojîk ve hem li rayeka dema borî (ket-) hem li ya dema niha (în-) zêde dibe. Ji alîyê semantîk ve jî maneya liv û tevgera ber bi jêr û ketina nava tiştêkî dide karan.

(16) a. “*Ew baziye bê tor û sil/ **Dakefte** nêv tora qizil*” (Cizîrî, 2019: 145).

b. “*Dilberê palda şibakê/ Sahibê şeml û siwakê/ Qenc bir û anî zikakê/ Cundî ji hespê **daketê***” (Feqî, 2017: 264).

c. *Cewher ji ‘erez ku bû mucerred/ **Dafinine** bûteyê mucedded* (Xanî, 2019: 208).

Di malikên jorîn da, di nimûneyên (16a-b)yê da pêşgira “*da-*”yê ji kara “*ketin/keftin*”ê kara “*daketin/dakeftin*”ê dariştiye. Wekî ku Chyet jî destnîşan dike maneya ferhengî ya “*daketin*”ê hatina ber bi jêr ve ye (2003: 120). Herwiha ev wekî di her du nimûneyan (16a-b)yê da jî dîyar dibe pêşgirê maneya îradeyê jî li karê bar dike. Lewra di vê kara “*ketin*”ê da maneya rûdanekê heye ku bê îradeya biker pêk tê. Lêbelê di kara “*daketin*”ê da maneya hatin û xweberdana ji jor ber bi jêr ve heye û ev kar bi îrade û

rizaya biker pêk tê. Di malika (16a)yê da kara “*daketin/dakeftin*”ê bi maneya xwedanîna erdê ya teyrê baz hatiye vegotin. Li vir tê famkirin ku baz di vir da nakeve erdê, ew xwe bi armanckê berdide erdê. Lewra jî vê pêşgirê di vir da di heman demê da armanc jî li kara “*ketin*”ê zêde kiriye. Di malika (16b)yê da jî heman mane aşkere dibe. Lewra daketina ji ser piştta hesp bi erk û îradeyekê pêk tê. Dema bê gotin ku: “Ew ji ser piştta hesp ket.” tê famkirin ku mirovek bêyî îradeya xwe ji ser piştta hesp hatiye xwarê. Lê ku bê gotin: “Ew ji ser piştta hesp daket” di vir da mirovekî bi îradeya xwe ji ser piştta hesp xwe berdaye xwarê. Di nimûneya (16c)yê da “*da-*” hatiye li ber rayeka kara “*înan/anîn/in*”ê û bi vê pêşgirê kara dariştî yê “*danîn*”ê saz bûye. Ev kar di metnê da wekî “*datînin*”ê derbas dibe. Di vir da amraza dema niha “*di-*” ji hêla deng ve guheriye û bûye “*-t*”. Di helbestên Xanî da devoka Hekarîyê serdest e. Di kurmancîya Hekarîyê da ev taybetî heye. “Qertafa dema niha ya “*di-*”yê, di hin peyvan da dibe “*t-/d-*” û ne bi kar ve, bi hêmana berî xwe ve tê zeliqandin” (Akbaş, 2020: 116). Di peyva “*datînin*”ê da pêşgira “*da-*”yê ketiye pêşîya rayeka dema niha ya karê. Rayeka dema niha ya vê karê “*in-*” e. Di vir da eslê peyvê, “*dadiînim*” e lêbelê pêşgira dema niha “*di-*” guherîye bûye “*t-*”. Ji alîyê semantîk ve rayeka karê tê maneya cihguherîna tiştêkî yan jî mirovekî, lê piştî ku pêşgira peyvsaz a “*da-*”yê ketiye pêşîya wê maneyeke nû lê bar kiriye.

2.5.4. Navê Kar û Tevgerê

Pêşgira “*da-*”yê ji rayeka karan karên nû saz dike, lê gelek caran bi veguhastinê ev kar di konteksta navdêran da tînan bikaranîn. Ev rewş di metnên klasîk da di hin peyvan da derdikeve pêşberî me. Di nimûneyên jorîn da dema ku vê pêşgirê navdêr saz kirine û digel rayeka karê ya dema niha hatiye. Ev rewş wekî îstisnayekê xuya dike. Lewra ev pêşgir di hemû peyvên dariştî yên di klasîkan da bi peywira dariştina karan hatiye bikaranîn. Fonksiyona wê ya navdêrsazîyê tenê di peyva “*daxwaz*”ê da heye. Pêşgira dariştinê ya “*da-*”yê di klasîkan da di hemû nimûneyên din da dikeve pêşîya karên rayeka dema borî. Tenê di peyva “*xwestin*”ê da ku rayeka wê ya dema niha “*xwaz-*” e ev pêşgir tê dîtin û ji karê navdêrekê saz dike. Herwiha Celadet û Lescot, (2004: 278) ji bo peyva “*daxwaz*”ê dibêjin “*da-*” wekî pêşgir e û li dawîya kara “*xwestin*”ê zêde bûye.

(17) a. “*Destê di xwe perwaz kirin/ Wechê di xwe evraz kirin/ Îman ji Heq daxwaz kirin/ Suwar kirin wê saetê*” (Feqî, 2017: 270).

b. “*Bê wech ji min tu bûyî wehşî/ Daxwaz te kir ku min nebexşî*” (Xanî, 2019: 159).

Forma vê karê ya dema borî “*xwest*” û ya dema niha “*xwaz*” e. Di nimûneyên jorîn da (17a-b) pêşgira “*da-*”yê hatiye pêşîya rayeka dema niha ya karê û ev kar bi fonksiyona navdêrî da hatiye bikaranîn. Di her du nimûneyan da jî tê dîtîn ku vê pêşgirê ji aliyê semantîk ve maneya karê neguherandiye, lê cureya karê guherandiye. Çawa ku li jor jî hat destnîşankirin vê pêşgirê ji karê navdêr saz kiriye û bi fonksiyona navdêrsaziyê hatiye bikaranîn.

2.6. Hil-

Morfema “*hil-*”ê bi fonksiyona xwe ya dariştinê li rayeka karan zêde dibe û maneya wê diguherîne; lêbelê ji ber ku ji karan dîsa karan saz dike cureya peyvê naguherîne. Lewma jî ne cureguhêr belkî maneguhêr e. “Bingeha vê pêşgirê digihe protohind-ewropî û maneyên wê yên wekî ‘*bilindbûn*’, ‘*mezinbûn*’ û ‘*gîrbûn*’ê hene” (Muhammed, 2016b: 177). Li gorî Kerim jî ev pêşgir li peyvên kurdî maneyên rakirin, hilgirtin, guherîn û veguhastinê zêde dike (2019: 318). Forma “*hel-*”ê di kurmancîya rojhilatî da heye (bo nimûne li Dihokê). Di soranî û kurdîya başûrî da jî wekî “*hel-*” heye, lê di hin devokên başûrî da bi forma “*el-*”ê û di zazakî da ewekî “*er-*” tê bikaranîn. (Muhammed, 2016a: 100).

Di metnên klasîk da vê pêşgirê peywira dariştina karan anîye cih. Dema hatiye pêşîya karan di forma rayeka dema niha û dema bê da, ji wan karan dîsa kar saz kirine. Herwiha dema ev pêşgir tê pêşîya karên rayeka dema borî yan maneya wan diguherîne yan jî maneya wan xurttir û berfirehtir dike. (Kerim, 2019: 316). Di hin karan da jî cih û aliyê karê ku ber pê tê kirin destnîşan dike. Bedîrxan û Lescot peywira vê gireyê ya giştî wiha terîf kiriye: Ev pêşgir maneya derketin û bilindbûnê dide karan (2004: 281).

2.6.1. Bilindkirin û Dûrxistin

Pêşgira “*hil-*”ê dema li rayeka karên dema borî zêde dibe maneya bilindkirin û dûrxistinê li wan bar dike. Tevgera ku bi vê pêşgirê li karê tê barkirin carinan ber bi jor ve ye carinan jî tevgera asoyî ye. Ev pêşgir maneya pekandin û dûrxistina tişteki yan jî rakirina cil û perdeyê ji ser deverekê li rayeka karê bar dike. Di metnên klasîk da karên

dariştî ku vê maneyê didin di metnên klasîk da bi awayê “*hilavêt*”, “*hilda*”, “*hilînî*” û “*hilawîstin*”ê derbas dibin.

- (18) a. “*Ji mehbûb dûr kirim çerxê Felek wê pir **hilavêtîm**/ Nizanim dê li ku dit min di vê dewran û çerxê da*” (Cizîrî, 2019: 26).
- b. “*Destê qudret ko **hilavêt** ji bejna te niqab/ Bi cemala ceberûtî me neman perde û hicab*” (Cizîrî, 2019: 52).
- c. “*Perdeya xelwê ku **hilda**/ Yengîyek min dî di mil da*” (Cizîrî, 2019: 205).
- d. “*Batini keç wê vexwîni/ Perdeyê j’ber xwe **hilînî*** (Feqî, 2017: 255).
- e. “*Eybê di xêf bûn eşkere/ Hemyan bihîst ew macera/ Bersîs **hilawîstin** beşera/ Hete heddê hilaketê*” (Feqî, 2017: 277).

Di nimûneya (18a)yê da vê pêşgirê maneya dûrxistina ji cih îfade kiriye; ji ber ku kara dariştî ya “*hilavêtinê*” maneya guherîna cih daye. Di kara “*avêtin*”ê da jixwe maneya guherîna cih heye û dema tiştêk tê avêtin ji cihekî ber bi cihekî din ve diçe. Di “*hilavêtinê*” da hem maneya tevgereke ber bi jor ve hem jî îfadeya avêtineke dijwar heye ku ev jî bi pêşgira “*hil-*”ê li karê zêde bûye. Di vê nimûneya (18b)yê da jî ev pêşgir li heman karî zêde bûye. Di vê beytê da piştî zêdebûna pêşgirê maneya karê bi temamî neguherîye, lê ji alîyê semantîk ve maneya cih û alî li karê zêde bûye. Lewra di vir da “*hilavêtin*” bi maneya rakirina tiştêkî ji ser tiştêkî din hatiye bikaranîn; ji ber ku tiştêk derkeve holê û aşkere bibe nîqab yanî peçe û cilik ji ser laş û bedenê hatiye rakirin. Pêşgira “*hil-*”ê wekî di gelek nimûneyên din ên klasîkan da dîyar dibe bizava ber bi jor ve destnîşan dike, lê di nimûneya (18c)yê da ev peyva “*hildan*”ê ji bo rakiran perdeyê ya li ber tiştêkî yan jî kesekî hatiye gotin. Di vir da hildana perdeyê ne bizava ber bi jor ve belkî bizava ber bi alîyekî ve yanî tevgera asoyî (horizontal) daye karê. Lewra di vir da mebest ne hilanîna perdeyê ya ji ser tiştêkî ye; hilanîna ji ber tiştêkî ye. Di nimûneya (18d)yê da kara “*hilandin*”ê tevgereke ber bi jor ve îfade dike. Wekî ku ji peywenda beytê jî dîyar dibe di vir da ev kar ne ji bo perdeya ku ber bi alîyekî ve bê rakirin ji bo perdeya ku ji ser tiştêkî ber bi hêla jor vê bê rakirin derbas hatiye bikaranîn. Lewra di vir da ji bo rakirina perdeyê ji ber rûyê keçê hatiye bikaranîn. Perdeya li ser rû jî li jor girêdayî ye û di rakirina wê da tevgerek heye ku ji jêr ber bi jor ve pêk tê. Di nimûneya(18e)yê da bi vê pêşgirê kara “*hilawîstin*”ê hatiye dariştin. Ev kar wekî peyveke serbixwe di metnên klasîk da derbas nabe. Wekî ku Dehxuda di ferhenga xwe da

destnîşan dike ku ev kar ji “*awîxten*” yanî daleqandinê tê û rayeka wê ya dema niha “*awîsten*” e (1962a: 625). Di nimûneya jorîn a (18a)yê da pêşgira “*hil-*”ê hatiye pêşîya vê karê û maneya ber bi jorîn ve lê zêde kiriye. Herçiqas di peyva “*awîstin*”ê da maneya bilindbûn û bilindkirina tiştekî hebe jî di vir da pêşgira “*hil-*”ê ew mane xurttir kiriye. Lewra wekî tê dîtin peyv hatiye maneya bidarvekirin û îdamkirina kesekî.

2.6.2. Gurbûn û Geşbûn

Di kara “*hilkirin*”ê da pêşgira peyvsaz a “*hil-*”ê hatiye pêşîya rayeka karê ya dema borî (kirin). Di vê peywendê da pêşgira dariştinê maneya peydabûn û zêdebûnê daye rayeka karê. Di metnên klasîk da peyvên dariştî ku bi vê pêşgirê hatine dariştin û vê maneyê didin di metnê da wekî “*hilkir*” û “*hibû*”yê derbas dibin.

(19) a. *Şewqek di ruxê Memi te hilkir/ Qelbê me bi wê te sot û kul kir* (Xanî, 2019: 150).

b. *Ji agir min nefes hibû/ Ji ruxsarê şebefrûzê*⁸ (Cizîrî, 2019: 304).

c. *Şeyxek hebû çaxê ewwil/ Nûra Xwedê hibû ji dil* (Feqî, 2017: 244).

d. *Jinê tendûr hilkir sivik/ Zadek nebû bavê kuçik* (Feqî, 2017: 412).

Di nimûneya (19a)yê da di beyta pêşî da di îfadeya “*Nûrek di rûyê me kir te peyda*”yê da digel ku heman mane hatiye dayîn di vir da derketin û pêkhatina nûrê bi peyva peydabûnê hatiye destnîşankirin. Ji vir jî tê famkirin ku bi peyva “*hilkirin*”ê ji aliyê paye û demê ve maneyeke nû li kara “*kirin*”ê hatiye zêdekirin. Di nimûneya (19b)yê da wekî fûrîna avekê yan jî geşbûna gurîyê agir derketina nefesê hatiye terîfkirin. Herçiqas derketina nefesê bizaveke ber bi jor ve îfade bike jî di vir da tiştê ku hatiye kirpandin dîsa geşbûn, zêdebûn e. Di nimûneya (19c)yê da jî herçiqas di maneya xwe ya rastî da bizaveke ber bi jor hebe jî di eslê xwe da qesd pîrbûna nûrê û hebûna şewata di nav dil da ye. Di nimûneya (19d)yê da kara “*hilkirin*”ê maneya pêxistin û geşkirina agir li beytê zêde kiriye. Di vê karê da bizaveke nerasterast a ji jêr ber bi jor ve heye. Lewra di geşbûna agir da gurî ji jêr ber bi jor ve diçe. Di peyvên din da vê pêşgirê bêhtir maneya ber bi jorbûnê ve dide, lê di vê beytê da pêşgira “*hil-*”ê geşbûn û xurtbûna agir destnîşan dike.

⁸ Ev beyt di muşareeya Cizîrî û Mîr Îmadedîn da derbas dibe û ev aîdê Mîr e.

2.6.3. Rabûn ji Nişka ve û Çûna ber bi jor ve

Pêşgira dariştinê ya “*hil-*”yê di rayeka hin karan da maneya rabûna mirovekî a ji nişka ve û çûna ber bi hêla jorîn ve bar dike. Di metnên klasîk da dema ev pêşgir li rayeka kara “*bûn*” û “*kişîn*”ê zêde dibe, maneya van karan diguherîne. Ji aliyê morfolojîk ve karên ku ev pêşgir li wan zêde dibin carinan di forma dema borî da (bû-) carinan jî di forma dema niha da (kiş-) ne.

(20) a. “*Şeytan bûwe cin taziyek/ Rahîşt di guh da gazîyek/ Lê bûye ta û lerziyek/ Kiç **hilbûwe** ji xefletê*” (Feqî, 2017: 360).

b. “*Dêwê mel’ûn û munafiq ê Xudê rûreş kirî/ Ma bi bala **hilkiştin** ‘aqibet çi bit selab*” (Cizîrî, 2019: 59).

Di nimûneya (20a)yê da pêşgira “*hil-*”ê rabûna ji cih a ji nişka ve li kara “*bûn*” ê zêde kiriye. Di vê karê da bizavek tê derbirîn ku ji jêr ber bi jor ve pêk tê. Lewra hişyarbûn û hatina ser hişê xwe herçiqas tiştekî bi ruh û mêjî ra têkildar be jî bi awayekî fizîkî beden ber bi jor ve hereket dike. Di beytê da jî rewşa keçekê vedibêje ku di nav sekn û bédengîyekê da ye. Dema Şeytan diqîre keç ji nişka ve ji cihê xwe hildipeke û ji rewşekê dikeve rewşeke din. Di nimûneya (20b)yê da bi vê pêşgirê kara dariştî ya “*hilkiştin*”ê saz bûye. Di kara “*kişîn*”ê da maneyên wekî dirêjbûn, hatina tiştekî ya bi erdê ve yan jî anîna tiştekî ya ber bi tiştekî din ve heye.

2.6.4. Wergirtina Tiştekî û Şîyan

Pêşgira dariştinê ya “*hil-*”ê li rayeka karan a dema niha zêde dibe û maneya wan diguherîne. Di metnên klasîk da peyva “*hilgirtin*”ê bi forma xwe ya dema niha wekî “*hildigirin*”ê di vê peywendê da hatiye dariştin. “Maneya ferhengî ya peyva “*girtin*”ê zeftkirin û rahiştina tiştekî yan jî tewqîfkirina mirovekî ye (Farqînî, 2005: 699), lê bi zêdebûna pêşgirê maneya, wergirtina tiştekî yan jî şîyanê li rayeka karan zêde bûye.

(21) a. “*Wê **hildigirin** ji bo dîyarî/ Bê wasite wê dibin dîyarî*” (Xanî, 2019: 206).

b. “*Hûn **hilgirin** û bidin nigînan/ Bednam-i mekin Sitî û Zînan*” (Xanî, 2019: 68).

c. “*Gunah û zuhd û tamat **hilnagirit** xerabat/ Kesê bi vî derî ret divê bikit ri ‘ayet*” (Cizîrî, 2019: 147).

Di nimûneya (21a)yê da ev peyv bi maneya rahiştina tiştêkî şênber hatiye bikaranîn. Ji bo rahiştina gustilê hatiye vegotin. Gustil bi armanca ku wekî dîyarî bê dayîn hatiye wergirtin. Peyva “*hilgirtin*”ê di nimûneya (21b)yê da bi heman maneyê hatiye vegotin. Lewra di vir da jî ev kar bi maneya rahiştina gustilan hatiye bikaranîn. Di nimûneyên din da peyva “*hilgirtin*”ê bi maneya rakirin û kişandina ji erdê ya ber bi jor ve hatiye bikaranîn. Lêbelê di nimûneya (21c)yê da vê peyvê bi awayekî mecazî maneya karîn û pêkanbûnê daye metn. Lewra tê gotin ku meyxane gunehan û zuhda nejidil qebûl nake ji bo yên wiha ne pêkan e ku bikare bikeve meyxaneyê.

2.6.5. Rahiştin, Bertekdayîn û Xurtkirina Maneyê

Di metnên klasîk da pêşgira “*hil-*”ê bi fonksiyonên cuda tê bikaranîn û maneyên cuda li karan bar dike. Di nimûneyên berî niha da vê paşgirê maneyên wekî bilindkirina tiştêkî ya ji erdê, rabûna ser lîngan a mirovekî yan jî hilgirtin û rahiştina tiştêkî şênber li karan zêde dikir. Lê di nimûneyên jêrîn da ev pêşgir bi maneya xwe ya rastîn û bi maneyêke şênber hatiye bikaranîn. Carinan jî dema li rayeka karan zêde dibe maneyên rahiştina tiştêkî, bertekdayîn dide û ya jî maneya karan xurt dike. Carinan jî peyvên ku vê pêşgirê werdigirin di nava komepeyvekê da bi fonksiyona avakirina maneyêke razber û mecazî tînin bikaranîn.

(22) a. “*Êdî nedişên digel xwe bînin/ Belkî nedişên ji cih **hilînin***” (Xanî, 2019: 119).

b. “*Wan pîrs dikirin ku ger bibînin/ Da bo xwe bi merdî dest **hilînin***” (Xanî, 2019: 47).

c. “*Hetta ne bi destê pîrê meyxwer/ Ew **hilkelitin** di xummê ekber*” (Xanî, 2019: 207).

Di nimûneya jorîn a (22a)yê da maneya îfadeya rahiştina barekî daye rayeka karê. Lewra çawa ku ji beytên helbestê tê famkirin rahiştina ajalên ku nêçîra wan hatiye kirin bi karê “*hilîn*”ê hatiye îfadekirin û pîrbûna wan bi vê karê hatiye destnîşankirin. Nexwe em dikarin bibêjin ku di vir da peyva dariştî ya “*hilîn*”ê bi awayê “*hilanîna ji cih*” bi maneya birina eşyayekî ji jêr ber bi jor ve hatiye bikaranîn. Di nimûneya (22b)yê da ev peyva “*hilîn*”ê di nava peyva pêkhatî ya “*desthilanîn*”ê da hatiye û bûye biwêj. Wekî Bozarşan destnîşan dike maneya ferhengî ya vê biwêjê berxwedana li dijî kesekî, hêzekê yan rejimekê ye. Yan jî ev kar mirovekî destnîşan dike ku destê xwe bilind dike û bi wî

awayî dikeve berxwedan û têkoşînê (201 658). Di vê malikê da jî bi vî awayî “*desthılanîn*”ê maneya li hember êrişekê bersivdayîn û di rewşeke dijwar da derketina ji heqê xwe daye metnê. Herçiqas ev mane bi xêra komepeyvê derketibe holê jî di navenda wê da kara “*hilîn*”ê heye. Di nimûneya (22c)yê da pêşgira “*hil-*”ê hatiye pêşîya kara “*kelîn*”ê ya di forma dema niha da. Ev kar tê maneya germbûna heta dereceyekê. Dema tiştêkî ron û avî dikele û heta pîleyekê germ dibe tê da karê pilçînîyê pêk tê û di vê pilçepilçbûnê da tevger û bizaveke ber bi jor pêk tê. Di vir da pêşgira “*hil-*”ê di peyva “*hilkelîn*”ê da payeya karê ku tê kirin xurt kiriye. Lewra di peyva “*hilkelîn*”ê da kelîna ji hedê xwe zêdetir hatiye destnîşankirin.

2.7. Ne-

Morfema “*ne-*”yê maneya neyînî û tunebûnê dide (Bedirxan û Lescot, 2004: 282). Ev morfem hem bi fonksiyona daçeka neyînîyê hem jî wekî pêşgira dariştinê li kar e. Dema ku bi erka daçeka neyînîyê tê bikaranîn wekî morfemeke serbixwe tê bikaranîn û tesîrê li ser hevokê dike. Lê dema ku wekî pêşgireke dariştinê tê û li rayek an jî gewdeya peyvê zêde dibe ji aliyê maneyê ve di peyvê da guherînê pêk tîne. Morfema “*ne-*”yê bi erka dariştinê tê pêşîya navdêr, hevalnav û karan. Pêşgira “*ne-*”yê dema li rayeka dema borî ya karan zêde dibe maneya neyînî li wan bar dike. “Hevalnavên ji rehên demên borî yên karan bi vê gireyê dikarin bên neyînîkirin yanî negatîvkirin (Muhammed, 2016a: 54). Carinan jî ev pêşgir li rayeka karan a dema niha zêde dibe û ji karan hevalnavan saz dike (nezan, nebîn). “Ev hevalnav dîyar dikin ku di demên borî da tiştêk bûye, lê encama wê dikare bigihe dema niha jî” (Muhammed, 2016a: 54).

Di metnên klasîk da pêşgira “*ne-*”yê bi erka sazkirina hevalnavan tê bikaranîn. Dema ev pêşgir li rayeka peyvê zêde dibe ji aliyê mane û cureyê (word class) ve li ser peyvê tesîrekê çêdike. Ev pêşgir li rayeka navdêr, hevalnav û karan zêde dibe û ji wan hevalnavan nû saz dike. Pêşgira “*ne-*”yê tê ber rayeka wan karên ku di forma dema niha da ne. Herwiha ji aliyê semantîk ve hevalnavên ku karên, şîyanê destnîşan dikin bê vê pêşgirê saz dibin.

2.7.1. Xûy û Tevger

Di vê kategorîya semantîk da peyvên “*nemerd*” û “*neçê*” hatine dariştin. Peyva “*nemerd*” ji du morfeman pêk hatiye. Di vir da pêgira peyv saz a “*ne*”yê hatiye pêşîya peyva “*merd*”ê û ev peyva dariştî hatiye saz kirin. Ev peyv hem wekî hevalnav hem jî navdêr tê bikaranîn. Di peyva “*neçê*” da jî ji hevalnavekê hevalnaveke nû hatiye saz kirin. Peyva “*çê*”yê bi serê xwe maneya başbûn û qencbûnê dide. Dema ji bo wesfandina mirovan tê gotin taybetîyeke wan a xisletî nîşan dide û dema ji bo tiştan jî tê gotin, çawanî û hêjayîya wan destnîşan dike.

(23) a. “*Bê hîsab “Miksî” xeber dan/ J’yariya qels û **nemerdan***” (Feqî, 2017: 382).

b. “*Çeşmê di wê horî beçê/ Sofî ji ‘îşqa wê keçê’/ Geryan li dor dêra **neçê**/ Zahir bikin vê huccetê*” (Feqî, 2017: 276).

c. “*Ey dost bi dil be yarê qencan/ Ya qenc bibe **neyarê qencan***” (Xanî, 2014: 94).

Di nimûneya jorîn ya (23a)yê da peyva dariştî ya “*nemerd*”ê biH fonksiyona navdêrê da hatiye bikaranîn. Ji aliyê maneya xwe ve jî di (23a)yê da peyva “*nemerd*” taybetîyeke mirov a domdar destnîşan dike. Pêşgira “*ne-*”yê dema tê pêşîya navdêran taybetîyeke wan a domdar wekî xûy û xisleteke mirov destnîşan dike. Lewra di vir da qelsî û nemerdbûna kesan hatiye bi vê peyvê hatiye destnîşankirin. Li gorî peywenda metnê ev taybetîya ku hatiye destnîşankirin wesfeke mirovan a domdar e. Di nimûneya (23c)yê da pêşgira peyv saz a “*ne-*”yê ketiye pêşîya hevalnava “*çê*”yê û hevalnava “*neçê*” hatiye saz kirin. Herwiha di vir da pêşgirê maneya nebûna taybetîyekê li peyvê bar kiriye û bi erka hevalnavê cih û sazîyek wesfandiye. Di nimûneya (23c)yê da bi vê pêşgirê peyva dariştî ya “*neyar*” saz bûye. Di vê peyvê da piştî ku pêşgira “*ne-*”yê ketiye pêşîya peyva “*yar*”ê rewşa wê dîyar kiriye. Herçiqas ev peyva dariştî ji ber taybetîya xwe ya wesfandinê û nîşandana rewşê wekî hevalnav bê bikaranîn jî di vê mînakê da peyva dariştî bi erka navdêrê hatiye bikaranîn. Lewra ev peyv di nav raveka “*neyarê qencan*” da wekî navdêr hatiye û di pozîsyona raveberê da ye. Ji aliyê semantîk ve jî rewşa têkilîya mirovan û herwiha tevgereke mirov a civakî destnîşan kiriye. Peyva “*yar*”ê di vir da bi maneya xwe ya dost û heval hatiye û peyva dariştî “*neyar*” jî ew kes e ku ji mirov hez nake, başîya mirov naxwaze û herwiha ne dostê mirov e. Yanî di maneya dijmin da hatiye bikaranîn.

2.7.2. Nîşandana Rewşa Guherbar

Peyva “*nexweş*” ji pêşgira peyvsaz a “*ne-*”yê û peyva “*xweş*”ê pêk hatiye. Pêşgira peyvsaz, ji peyva “*xweş*”ê peyveke nû saz kiriye û ev peyv bi erka navdêrê hatiye bikaranîn. Ji alîyê semantîk ve jî peyvên ku hatine dariştin bi taybetî rewşeke guherbar (transitorr states) nîşan didin.

(24) a. “*Bê ji bo neghê dehanî/ Nexweşan ew lê şîfa ye*” (Cizîrî, 2019: 203).

b. “*Kerr û gurî û ermîş û lal/ Ûftade û xelqê betal/ Hindî nexwoş bînane bal/ Safî dibûn ji ‘illetê’*” (Feqî, 2017: 341).

c. “*Mîrim tu dizanî ez nexweş bûm/ Hetta ve duhî qewî nehiş bûm*” (Xanî, 2014: 132).

d. “*Ewçend vexwar ewê nehişyar/ Agahî nema ewî ji guftar*” (Xanî, 2014: 200).

Di nimûneyên (24a-b)yê da jî ji alîyê semantîk ve peyva “*nexweş*” rewşeke mirov a guherbar destnîşan kiriye. Peyva *xweşî* xwedîyê gelek maneyên cuda ye. Li gorî ferhengê maneya peyva “*xweş*” berfireh e û gelek maneyên wê yê cuda hene. Yek ji van maneyan jî başbûn, bisihetbûn û rewşa tenduristîyê ye (Farqînî, 2005: 2065). Di nimûneyên jorîn da jî peyva *xweş* di vê peywendê da ye û pêşgira “*ne-*”yê maneya vê peyvê neyînî kiriye. Lewra jî peyva dariştî “*nexweş*” hatiye maneya tunebûna rewşa başbûn û tenduristbûnê. Dîsa tê famkirin ku ev rewş wekî taybetîyeke mirov a guherbar e û bi xêra pêşgira peyvsaz a “*ne-*”yê ev mane li peyvê zêde bûye. Di nimûneya (24c)yê da peyva dariştî (*nehiş*) ji pêşgira peyvsaz a “*ne-*”yê navdêra “*hiş*” hatiye saz kirin. Di vir da ev pêşgir maneya nebûnê dide. *Nehiş* bêhtir wekî nebûna *hiş* mirov xuya dike. Lê di peywenda metnê da ev peyv ne nebûnê belkî erkeke *hiş* destnîşan dike. Di nimûneya (24d)yê da peyva dariştî “*nehişyar*” e. Vê carê ev pêşgir ji hevalnava “*hişyar*”ê ev peyv saz kiriye. Peyva “*hişyarbûn*”ê wê rewşa mirovekî destnîşan dike ku li ser *hiş* xwe ye yan jî nerazayî ye. Di vê mînakê da, wekî ji peywenda metnê jî dîyar dibe ev peyv maneya kesê ku ne li ser *hiş* xwe ye, yanî serxweş e dide metnê û rewşeke mirov a demborî hatiye destnîşan dike.

2.7.3. Nebûna Karîn û Şiyanê

Yek ji fonksiyona morfosemantîk a pêşgira “ne-”yê ew e ku dema berî rayeka karan tê, ji karan hevalnavan saz dike. Di nimûneyên jêrîn da ev taybetî tê dîtin. Kara “bîn-”ê forma dema niha ya kara “dîtin”ê ye. Di vir da pêşgira peyvsaz a “ne-”yê li rayeka karê zêde bûye û peyveke nû hatiye sazkirin. Vê pêşgirê ji aliyê karîn û şiyanê ve maneya karê tekûz kiriye.

(25) a. “*Rohnîya çehvên **nebînan**/ Murşidê meczûb û dînan*” (Cizîrî, 2019: 210).

b. “*Lê ekserê ‘amiyan **nezan** in/ Nefsa xwe ji bo xwe ra nizanin*” (Xanî, 2014: 202).

Di nimûneya (25a)yê da bi vê pêşgirê peyva “*nebîn*”ê hatiye dariştin. Ev peyv di vir da bi erka hevalnavê peywira wesfandina çavan anîye cih û di fonksiyona hevalnava raveker (attributive) da ye. Di nimûneya (25b)yê da vê carê peyva dariştî (nezan) ji bo wesfandina mirovan hatiye bikaranîn û di nav metnê da, bi peywira hevalnava tamamker (predicate) hatiye bikaranîn. Herwiha ji aliyê semantîk ve pêşgira dariştinê maneya karîn û şiyanê daye rayeka peyvê.

2.8. Ra-

Morfema “ra-”yê di kurmancî da hem wekî pêşgirekê di fonksiyona peyvsazîyê da hem jî wekî paşdaçek tê bikaranîn. Lê ev pêşgir bi fonksiyona gireya dariştinê maneyên hêz, pêşvebirin û pêşxistinê li peyvan bar dike (Tîgrîs, 2011: 25). Ev pêşgir maneya liv û tevgerê dide ku carinan ber bi jor ve û carinan jî ber bi jêr ve pêk tê. Mesela li hin karan “Maneya ber bi jor hîlbûneke şaqulî û kişîn û belavbûneke asoyî bar dike” (Zilan, 2006a: 12). Dema pêşgira “ra”yê li karên sade zêde dibe maneya arastebûna ber bi tiştekî ve, tevgera berzî û stûnîyê (rabû) yan jî nizmîyê (rakêşa) dide wan. Herwiha maneya borîn û bidawîbûna demê û lêhûrbûnê dide rayeka karan (Usman, 2015: 73). Pêşgira “ra-”yê tê pêşîya kara rayeka dema borî û dema niha. Ji aliyê semantîk ve jî maneyên cuda karan lê bar dike. Herçiqas pêşgira “ra-”yê tevgerê ber bi hêla jorîn ve îfade bike jî ev fonksiyona wê li gorî peywendê ji aliyê semantîk ve diguhere û li lêkaran maneyên cuda bar dike.

Di metnên klasîk da ji aliyê morfolojîk ve ev pêşgir karan saz dike. Hem tê pêşîya rayeka karê ya dema borî hem jî ya dema niha û ji aliyê semantîk ve maneyêke nû li

karên ku li wan zêde bûye bar dike. Maneyên wekî hîlbûna ji cih, bilindkirina tiştêkî û belavbûna deng, razan an jî hişyarbûn, destpêkirina rûdanekê û peywirdarkirina kesekî, saxbûn û hatina ser hişê xwe, xurtkirina maneyê û şiyane bi vê pêşgirê li rayekên karan bar bûye.

2.8.1. Hilbûna ji Cih

Di metnên klasîk da pêşgira “*ra-*”yê hem li rayekên karên dema borî (*rabû*) hem li yê dema niha (*rabin*, *rakit*) zêde dibe. Ji aliyê semantîk ve jî dema ev pêşgir tê pêşîya rayeka karan maneya rabûna li ser pêyan û hîlbûna mirovekî ya ji cih li wan bar dike.

- (26) a. “*Zanî bi te ‘emmul û bi îdrak/ Rabû ji cihê xwe çist û çalak*” (Xanî, 2014: 88).
b. “*Ew jî ji wî halî bû xeberdar/ Rabû ji cihê xwe ew xerezdar*” (Xanî, 2014: 137).
c. “*Fîl hal dibê rabin ji nik/ Şox û şepala sur ji rav*” (Cizîrî, 2019: 148).
d. “*Rakit qiyam wê saetê/ Alem bibit zîr û zeber*” (Cizîrî, 2019: 107).

Di nimûneyên jorîn da, di (26a-b)yê da bi pêşgira “*ra-*”yê kara “*rabûn*”ê hatiye dariştin. Di vir da pêşgira dariştinê li rayeka kara dema borî ya “*bûn*”ê zêde bûye û di maneya wê da guherîn pêk anîye. Di madeyên (26c-d)yê da karên ku bi vê pêşgirê hatine dariştin di metnê da wekî “*rabin*” û “*rakit*” derbas dibin. Ev her du kar di forma dema niha da ne. Dema pêşgira dariştinê û gireyên kesane ji van tînan avêtin rayeka karan wekî “*b*” û “*k*” dimîne. Rayeka van karan a dema borî “*bûn*” û “*kirin*” e. Ji aliyê semantîk ve pêşgira “*ra-*”yê maneya hîlbûna ji cih a ji nişka ve li rayeka van karan bar kiriye.

2.8.2. Bilindkirina Tiştêkî û Belavbûna Deng

Pêşgira dariştinê ya “*ra-*”yê dema li rayeka karan a dema borî zêde dibe ji van rayekan karên nû dadirêje. Di metnên klasîk da karên “*rahiştin*”, “*rabûn*”, “*ragirtin*” û “*rakirin*”ê bi vî awayî hatine dariştin. Di van karan da pêşgira dariştinê ji aliyê semantîk ve maneya bilindbûna tiştêkî yan jî belavbûna deng daye rayeka karan.

- (27) a. “*Şeytan bûwe cintazîyek/ Rahîşt di guh da gazîyek*” (Feqî, 2017: 360).
b. “*Go can ku ji hebsê ten cuda bû/ Feryad û fixan ji şehri rabû*” (Xanî, 2014: 182).

c. “*Ma Melayî ez lebê le’l abê heywan bit nesîb/ Qudsîyan ragirtine destê du’ayê rast û çep*” (Cizîrî, 2019: 62).

d. “*Şahê Erebî ‘elem ku rakir/ Kisrayê ‘Ecem ‘eceb duta kir*” (Xanî, 2014: 13).

e. “*Germiyyetê narê qurbê meqsûd/ Rakir ji wucûdê ‘aşiqan dûd*” (Xanî, 2014: 86).

f. “*Resikîn du ‘eded nihâlê serkeş/ rabûn bi hewa ve her du serxweş*” (Xanî, 2014: 194).

Di nimûneya (27a)yê da ev pêşgir hatiye ber kara “*hiştin*”ê. Li gorî bikaranînê maneyên cuda yên peyva “*hiştin*”ê hene. Ji van maneyan ên sereke ev in: “Terkkirina cihekî yan jî kesekî, neguherîna rewşê, yan jî hilanîna tiştêkî (Farqînî, 2005: 851). Piştî ku pêşgira “*ra-*”yê hatiye ber vê karê maneyên nû lê bar kirine. Ev peyv di metnê da, bi maneya gazîyê yanî deng û bangê hatiye bikaranîn. Herwiha bi vegotina “*rahişt di guh da gazîyek*”ê bangkirina di ber guh da hatiye qesdkirin. Di nimûneya (27b)yê da jî heman mane derdikeve pêş. Di vir da jî ji bo bilindbûn û belavbûna dengê feryad û fixanê kara “*rabûn*”ê hatiye gotin. Rayeka vê karê (bû-) bi serê xwe tê maneya pêkhatin û rûdanê, lê pêşgirê maneya bilindbûnê daye vê karê û bi vî awayî kareke nû dariştîye. Di nimûneya (27c)yê da kara “*ragirtin*”ê ji kara “*girtin*”ê hatiye dariştin. Maneya ferhengî ya karê “*girtin*”ê zeftkirin yan jî zîndankirin (Botî, 2006: 282). Lê bi zêdebûna vê pêşgirê maneya bilindkirinê wergirtiye. Lewra di metnê da ev kar di nav îfadeya “*ragirtine destê du’yê*” da bi maneya bilindkirina destan hatiye bikaranîn. Di nimûneya (27d)yê da kara dariştî “*rakirin*” e. Ev kar jî ji rayeka kara “*kirin*”ê hatiye dariştin. Maneya vê karê ya ferhengî pêkanîna karekî ye (Zaxoyî, 2007: 115), lê bi wergirtina vê pêşgirê maneya bilindbûnê lê zêde bûye. Di vir da kara dariştî di metnê da wekî “*rakir*” derbas dibe û maneya bilindkirina alayê daye metnê. Di nimûneya (27f)yê da ev pêşgir li kara “*bûn*”ê zêde bûye û kara dariştî “*rabû*” saz bûye. Di vir da pêşgirê maneya bilindbûna “*nihalan*” (şaxan) daye beytê.

2.8.3. Razan an jî Hişyarbûna ji Xewê

Pêşgira “*ra-*”yê dema berî rayeka karên “*bûn*” û “*ketin*”ê tê ji van rayekan karên nû saz dike û di maneya wan da guherînê pêk tîne. Rayekên karên ku ev pêşgir li wan

zêde dibe di forma dema borî da ne. Di berhemên klasîk da peyvên “*raket*” û “*rabû*”yê bi vî awayî hatine dariştin.

(28) a. “*Işq agir e ma sar dibî/ Hingî diçû dijwar dibî/ Şêx pê ze’îf û jar dibî/ Çend rojekan ma **raketê***” (Feqî, 2017: 266).

b. “***Rabûn*** ku şevêk siyah û tarî/ Şems û qemeran kirî tewarî” (Xanî, 2014: 50).

Di nimûneya (28a)yê da kara “*raketin*”ê ji morfema “*ra-*” û “*ket*”ê pêk tê. Di vir da pêşgir li rayeka karê ya dema borî “*ket*”ê zede bûye. Vê pêşgirê cureya peyvê neguherandiyê, lê li ser maneya wê tesîr kiriye. Lewra maneya vê karê ketina tiştêkî ji jor ber bi jêr ve ye yanî tevgereke ber bi hêla jêrîn ve ye, lê bi zêdebûna pêşgirê karê maneya razanê wergirtiye. Di nimûneya (28b)yê da peyva ku hatiye dariştin kara “*rabûn*”ê ye, ev peyv jî ji rayeka kara dema borî ya “*bû*”yê hatiye dariştin. “Maneya ferhengî ya kara ‘*bûn*’ê rûdan û qewimîn e” (Botî, 2006: 121, 565), lê di vê mînakê da ‘*rabûn*’ maneya hişyarbûna mirovekî ya ji xewê daye metnê û ev guherîna maneyê bi pêşgirê li karê bar bûye.

2.8.4. Destpêkirina Rûdanekê û Peywirdarkirina Kesekî

Di metnên klasîk da, dema pêşgira “*ra-*”yê li rayeka hin karan zêde dibe maneyên destpêk û rûdana bûyerekê yan jî peywirdarkirina mirovekî ya ji bo kirina karekî li wan bar dike. Rayekên karan ên ku vê pêşgirê werdigirin carinan di forma dema niha da ne carinan jî di forma dema borî da ne. Karên “*rabitin*”, “*rabû*” û “*ragirt*” bi vî awayî hatine dariştin.

(29) a. “*Narê surre peyda bitin/ Bayê mecaz lê **rabitin***” (Feqî, 2017: 280).

b. “*Go padîşehêk zemanê sabîq/ **Rabû** di hukûmeta xwe fa’iq*” (Xanî, 2014: 32).

c. “***Ragirt***-i ji bo xwe dergevanek/ Fettanê zemanê seypisanek” (Xanî, 2014: 93).

Di nimûneya (29a)yê da kara dariştî ya “*rabitin*” di forma dema niha da ye. Lewra dema ji vê kara dariştî pêşgira dariştin û gireya kesê sêyem bê avêtin rayeka karê tenê wekî “*b*”yê dimîne (ra-b-in). Ji aliyê semantîk ve jî pêşgira dariştinê maneya destpêka rûdanê li rayeka karê zêde kiriye. Di nimûneya (29a)yê da kara dariştî “*rabitin*” ji bo

destpêka wezîna bayê hatiye bikaranîn. Di madeyên (29b-c)yê da rayekên karan ên ku ev pêşgir li wan zêde bûye di forma dema borî da ne. Di nimûneya (29d)yê da ev pêşgir li rayeka kara “*bûn*”ê bar bûye û kara dariştî ya “*rabûn*”ê saz bûye. Di vir da kara dariştî maneya destpêka serwerî û desthilatîya padîşahekî ya li welatekî daye metnê. Di nimûneya (29d)yê da pêşgira “*ra-*”yê li kara “*girtin*”ê bar bûye. Di vir da bi vê pêşgirê kara “*wergirtin*”ê saz bûye. Ev kar di metnê da bi wê maneyê hatiye bikaranîn ku peywirdarkirina kesekî û wergirtina wî ya ji bo kar anku tayînkirin wî îfade dike.

2.8.5. Saxbûn û Hatina bi ser Hişê Xwe ve

Dema pêşgira “*ra-*”yê li rayeka karên “*ketin*” û “*bûn*”ê zêde dibe maneyeke nû li wan bar dike. Ev karên ku bi vê pêşgirê tînin dariştin ji aliyê morfolojîk ve carinan di forma dema niha (radibin) û carinan jî di forma dema borî (raket) da ne. Ji aliyê semantîk ve karên ku bi vê pêşgirê saz dibin maneyên vejîna kesekî mirî, başbûn û bidestxistina tenduristîyê û hatina bi ser hişê xwe ve li metnê zêde dikin.

(30) a. “*Yek canî ji dijminan cuda ket/ Ya dî miriyan ji nû ve raket*” (Xanî, 2014: 158).

b. “*Şêx go hekîm Îsa bitin/ Loqman ji qebrê rabin*” (Feqî, 2017: 261).

c. “*Îhsan bike her duwan dewa ke/ Derman ke bi new’ekî tu rake*” (Xanî, 2014: 66).

d. “*Bêhiş dikevin gelek dimînin/ Gava weku radibin di dîn in*” (Xanî, 2014: 62).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (30a-b)yê da karên “*raket*” û “*rake*” bi pêşgira “*ra-*”yê hatine dariştin. Di van nimûneyan da ev kar bi awayê “...*miriyan ji nû ve raket*” û “...*ji qebrê rabin*” derbas dibin û maneya vejîna kesekî mirî daye metnê. Di nimûneya (30c)yê da peyva dariştî ya ku bi vê pêşgirê saz bûye kara “*rake*” ye. Ev kar di vir da, bi maneya başbûn û saxbûna kesekî nexweş yanî bidestxistina tenduristîyê hatiye bikaranîn. Di nimûneya (30d)yê da peyva dariştî “*radibin*” e. Ev peyv di vir da wan kesan îfade dike ku berê bêhiş ketine û paşî hatine ser hişê xwe. Lewra di risteya pêşî ya vê malikê da îfadeya “*Bêhiş dikevin...*” derbas dibe û kara “*rabûn*”ê ji bo van kesan hatiye bikaranîn.

28.6. Xurtkirina Maneyê û Şiyan

Pêşgira “*ra-*”yê carinan dema li rayeka karan zêde dibe maneya wan bi temamî naguherîne, tenê maneya ku di karê da heye xurt dike. Carinan jî ev pêşgir maneya karîn û şiyânê diderayeka karê. Di metnên klasîk da karên dariştî yên “*radihejîn*”, “*radimûsa*” û “*ragirî*”yê vê maneyê li metnê zêde dikin.

(31) a. “*Hubba te ye min radihejîni ku binalim*” (Cizîrî, 2019: 109).

b. “*Evçende pêkve radimûsan/ Nobet nedidane hev li bûsan*” (Xanî, 2014: 89).

c. *Remzek xerîbê fatirî/ Peyda bibit nêv xatirî/ Quwwet tê nînin ragirî/ Xef kî di nêv qelbê xwe da* (Cizîrî, 2019: 107).

Di nimûneyên jorîn da, di madeyên (31a-b)yê da pêşgira dariştinê ya “*ra-*”yê li rayeka karên “*hejîn*” û “*mûsîn/bûsîn*”ê zêde bûye. Ji aliyê morfolojîk ve her du kar ku di forma dema niha da ne; ji aliyê maneyê ve jî pêşgirê maneya van karan xurt kiriye. Kara “*hejîn*”ê tê maneya livandin û lerizandina tiştêkî yan jî kesekî. Herçiqas di kara “*rahejîn*”ê da heman mane hebe jî di vir da pêşgira “*ra-*”yê maneya hejandineke xurttir û dijiwartir daye karê. Di nimûneya (31b)yê da bi vê pêşgirê kara “*radimûsan*”ê hatiye dariştin. “Pêşgira ‘*ra-*’yê dema tê peşîya peyva kurdî ya ‘*mijîn*’, ‘*misîn*’, dibe ‘*ramûsîn*’” (Kerim, 2019: 497). Di vir da guherîna deng pêk hatiye. “Di kurdî da wekî di peyva “*misilman/bisilman*” da xuya dike tîpa b/m bi hev diguherin (Malmîsanij, 2013: 75). Di nimûneya (31c)yê da pêşgira dariştinê hatiye ber kara “*girtin*”ê ya di forma dema niha da. Di vir da peyva dariştî ya “*ragirtinê*”ê di maneya karîn û şiyânê da hatiye bikaranîn. Lewra di vê beytê da vê peyvê maneya têrîkirina qeweta mirovekî ya ji bo pêkanîna kar û tevgerekê daye metnê.

2.9. Rû-

Pêşgira “*rû-*”yê peydabûna li jor an jî tevgereke ber bi jêr ve destnîşan dike (Bedirxan û Lescot, 2004: 283). Herwiha dema tê ber karan têgiha bizaveke ber bi jêr ve dide karên dariştî (Ebdulfettah, 2011: 23). Ev pêşgir wekî morfema serbixwe di wê maneyê da tê ku sûret, sîma yan jî bi giştî beşa tiştêkî ya ku xuya dike îfade dike (Farqînî, 2005: 1617). Lê dema ku wekî pêşgira dariştinê tê bikaranîn ji aliyê semantîk û fonksiyona xwe ve ji peyva rû cuda ye. Ev pêşgir bi awayekî bisînor tenê di çend peyvan da tê bikaranîn. Lewra jî li gorî Muhammed herçiqas wekî pêşlêkeran bê çemandin jî di

nav pêşgirên biguman da cih digire (2016a: 110). Lêbelê hemû karên ku bi vê pêşgirê hatine dariştin taybetîyên morfosentaktîk ên karên dariştî di xwe da dihewînin. Mesela kara “*rûniştin*”ê di dema niha da dibe “*rûdinim*” û di forma fermanî da dibe “*rûne*”. Wekî taybetîyeke morfolojîk a kurdî di dema niha da gireya dariştinê hatiye pêşîya morfema demê (*rûdinim*) û di forma fermanî da ji amraza fermanî ya “*bi*”yê nehatiye bikaranîn (*rûne*). Ev taybetî jî nîşan dide ku morfema “*rû-*”yê bi erka dariştinê rabûye.

Pêşgira “*rû-*”yê wekî pêşgireke dariştinê dikeve pêşîya karê û jê karekî nû saz dike. Di metnên klasîk da ev pêşgir tenê di kara “*rûnişt/rûnin*”ê da tê dîtîn. Ev pêşgir bi erka xwe ya karsazîyê tê pêşîya rayeka kara ya dema borî û ya dema niha. Di her du rewşan da jî ji ber ku ji karê dîsa kar tê dariştin cureya peyvê naguhere, lê ji alîyê maneyê ve hin guherînan di peyvê da pêk tîne.

2.9.1. Tevgera ber bi Jêr ve (Sit)

Her du karên jêrîn, yek jê di forma dema borî da ye û rayeka wê “*nişt*” e ya din jî di forma dema niha da ye û rayeka wê “*n*” ye. Di metnê da pêşgira “*ra-*”yê di her du rayekan da jî maneya ber bi jêr daye.

(32) a. “*Xwusrewê işqê ku rûniştî li ser textê wicûd/ Fetehe’l-qelbe ele’l fewrî we lî’l rûhî melek*” (Cizîrî, 2019: 157).

b. “*Rûniştî ji pêşê wan ve zalek/ Qametçiviyayî reng hilalek*” (Xanî, 2014: 67).

c. *Da çîn û demek di baxî rûnin/ Lewra ku ji rehtiyar zebûn in* (Xanî, 2014: 131).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (32a)yê da morfolojîya kara “*rûnişt*”ê ji pêşgira dariştinê “*rû-*” û rayeka karê ya dema borî “*nişt*”ê pêk hatiye. Di nimûneya (32b)yê da heman kar di forma dema niha da hatiye. Lewra bi rayeka karê ya “*n*”yê û pêşgira dariştinê ya “*rû-*”yê kara dariştî ya “*rûne*” saz bûye. Di her du nimûneyan da jî kara “*rûniştin*”ê maneya bicihbûna li cihekî ya ji bo demeke sînardar yan jî rewşeke demborî ya laşê mirov îfade kiriye. Di nimûneya (32c)yê da rewşeke bi vî awayî heye; lê di vir da, di heman demê da kara “*rûniştin*”ê maneya bêhnvedanê jî daye metnê.

2.9.2. Derbaskirina Demê (Stay)

Kara “*rûniştin*”ê li gorî peywir û peywenda xwe di maneyên cuda da tê bikaranîn. Wekî di nimûneyên jêrîn da jî tê dîtin ev kar di maneyên mayîna li cihekî, sohbetkirin û derbaskirina demê da tê bikaranîn. Kara “*rûniştin*”ê kareke dariştî ye ku ji pêşgira “*rû-*”yê û kara “*niştin*”ê saz bûye.

(33) a. “*Pur yarîyan li hev bikin/ Rûnin li koşa sohbetê*” (Feqî, 2017: 304).

b. “*Çend rojekan ev terz li hal/ Rûniştî xelq li çar kenar*” (Feqî, 2017: 266).

c. *Rûniştine bê mezaq û meşreb/ Winda kirine zeqen di xebxeb* (Xanî, 2014: 55).

d. “*Gavek ji dengê zingilan êmin çi rûnin menzilan/ Hey hey bibînin mehmilan feryad e her qentare çerx*” (Cizîrî, 2019: 92).

Di nimûneya (33a)yê da peyva dariştî ya “*rûniştin*”ê maneya hevpeyvîn û sohbetê daye metnê. Kara “*rûniştinê*” di nimûneyên (33b-c-d)yê da bi maneya rawestîn û mayîna li benda tiştêkîhatiye bikaranîn. Di nimûneyên (33b-d)yê da ev kar hatiye maneya mayîna li cihekî û li benda tiştêkî û di (33c)yê da derbaskirina demê îfade kiriye.

2.10. Ve-

Pêşgira “*ve-*”yê wekî morfemeke bendî bi fonksiyona pêşgira dariştinê tê bikaranîn. Di xebata Bedirxan û Lescot da fonksiyona wê ya sereke wekî vebûn û dubarekirinê tê destnîşankirin (2004: 284). Pêşgira “*ve-*”yê tenê di kurmancîya jorîn da tê bikaranîn. Wekî din karên “*vegirtin*”, “*vexwarin*”, “*vekişan*”, “*vegerîn*” û “*vekirin*”ê da jî xuya dike ev gire û dubarebûna kar û rûdanê nîşan dide. Ji aliyê mane û rola dariştinê ve beramberî vê pêşgirê di kurmancîya jêrîn da pêşgira “*-ewe*”yê heye (Marif, 2000: 74-75). Karên “*kirdinewe*” û “*gerranewe*” di maneya “*vekirin*” û “*vegerîn*”ê da tînin bikaranîn. Mesela kara “*hateewe*”yê tê maneya dîsa hat yanî vegerîya” (Muhammed, 2016: 107).

Pêşgira “*ve-*”yê di metnên klasîk da bi erka karsaziyê li kar e. Ev pêşgir dikeve pêşîya karan û ji rayek û gewdeyê karan kareke nû saz dike. Pêşgira “*ve-*”yê hem tê pêşîya rayeka karê ya dema niha (vedixwim) hem jî ya dema borî (vexwar). Ji xeynî rayeka karan ev pêşgir carinan jî tê ber karên pêkhatî û ji aliyê semantîk ve di van karan da guherînê pêk tîne.

2.10.1. Hilanîna Tişteki ji ser Deverekê

Pêşgira “ve-”yê dema tê ber rayeka hin karan ji wan, karên nû saz dike, ji aliyê maneyê ve di rayeka wan da guherîne pêk tîne û bi vî awayî fonksiyona karsaziyê tîne çih. Bi vê fonksiyona xwe di klasîkên kurmançî da peyvên wekî “vedan”, “vekirin” û “vemalîn”ê hatine dariştin.

(34) a. “Zîn hat û ji pêş ve bû hewale/ Bedrê ku **veda** ji ber xwe hale” (Xanî, 2014: 177).

b. “Ya Reb çî dibit ji ber me koran/ Carek tu **vedî** hîcab û toran” (Xanî, 2014: 177).

c. “Xêlî li ber demê **vekir**/ Tirsî kiçê lê zêde kir” (Feqî, 2017: 368).

d. “Carek ji ser demê **vemal**/ Zulfên li dora cebhetê” (Cizîrî, 2019: 267).

Di nimûneyên (34a-b)yê da ji rayeka kara dema borî ya “dan”ê kara “vedan”ê hatiye dariştin. “Ji xeynî maneyên wê yê mecazî di hemû diyalektên kurdî da rayeka vê karê ‘dan’ e û tê wê maneyê ku mirov tişteki bigihîne kesekî din” (Bozarslan, 2011: 323). Ji vê rayekê kara “vedan”ê hatiye dariştin ku rabûn û hilanîna heyberekê yan jî perdeyekê ji ber tişteki şenber îfade dike. Di nimûneya (34a)yê da kara “vedan”ê maneya hilanîna ji ber tişteki daye metnê. “Bedr ew heyva çardehşevî ye û hale toqa li dor hîvê û seywana dora wê ye” (Erdoğan, 2021: 143). Bi kara dariştî ya “vedanê” maneya hilanîna heyvê ya ji ber haleyê li metnê zêde bûye. Di nimûneyên (34b-c)yê da vê pêşgirê maneya rakirin û hilanîne daye. Bi taybetî di vê peywendê da bi karên dariştî rakirin û paqijkirina ji ser tişteki yan jî ji ber tişteki hatiye qesdkirin. Lewra di van nimûneyan da rakirina hîcab (perde), hale û zulfên ku ketine pêşîya tişteki bi vê karê hatine îfadekirin. Di nimûneya (34d)yê da kara “vemalîn”ê maneya rabûn û hilanîna zulfan a ji ser dêman daye. Kara “malin”ê bi serê xwe tê maneya paqijkirinê, lê pêşgira “ve-”yê maneya wê berfirehtir kiriye û maneya hilanîn û rakirinê jî lê zêde kiriye.

2.10.2. Dûrxistin û Qewirandin

Pêşgira “ve-”yê bi rola dariştinê hatiye ber kara “bûn”ê û ji rayeka vê karê, kara dariştî ya “vebûn”ê saz bûye. Maneya vê karê pir berfireh e û li gorî rewş û peywendê maneyên cuda li hevok (clause) û risteyan (sentence) bar dike. Di klasîkên kurmançî da bi vê rêbazê peyvên “vebûn” û “vedikirin”ê saz bûne.

- (35) a. “*Ya qenc ew e Şêx jê vebî/ Em jê dikin vê şîretê*” (Feqî, 2017: 266).
 b. “*Tirsa Xwedê pir lê hebû/ Ji ‘amû xeyran vebû*” (Feqî, 2017: 341).
 c. “*Min go: me bi tîxan vedî nakin ji derê te/ Go: em ji nebat in we li teb’ê meqes î tu*” (Cizîrî, 2019: 232).

Di metna jorîn da, di nimûneyên (35a-b)yê da pêşgira “ve-”yê hatiye pêşîya rayeka dema borî ya kara “bûn”ê û ji vê rayekê kara “vebûn”ê hatiye dariştin. Pêşgira dariştinê di van nimûneyan da maneya dûrbûn û cudabûnê daye karê. Di van rêzikan da vebûn digel “jêvebûn”ê hatiye maneya dûrketîna ji kesekî û terkkirina wî. Ev mane bi gotina “*şêx jê vebî*” li metnê bar bûye û bi mebesta ku şêx dev jê berde, jê dûr bikeve hatiye gotin. Di nimûneya (35c)yê da bi pêşgira “ve-”yê kara “vedîkirin”ê hatiye dariştin. Di vê kara da jî wekî nimûneyên pêşî maneya dûrkirinê heye. Di peyva “jêvebûn”ê da dûrbûna ji mirovekî tê îfadekirin, lê bi “vedîkirin”ê maneya dûrxistina ji cihekî tê qesdkirin. Lewra di beytê da “*vedîbûna ji dêrê...*” hatiye îfadekirin.

2.10.3. Kolan û Vekirin

Dema ku pêşgira “ve-”yê li karan zêde dibe û maneya wê diguherîne. Di nimûneyên jêrîn da pêşgira “ve-”yê li kara “dan”ê zêde bûye û ji rayeka vê karê kareke nû hatiye dariştin. Di vir da pêşgir li kara “dan”ê zêde bûye. Ev kar têper e, ji aliyê morfolojîk ve peyveke sade ye û di forma dema borî da ye. Ji aliyê semantîk ve jî vê pêşgirê maneya kolana cihekî yan jî vekirina tiştêkî li rayeka karê bar kiriye. Di metnên klasîk da peyva dariştî ku vê maneyê dide kara “vedan”ê ye.

- (36) a. “*Meydan bedûyan kolan bi destkor/ Goya vedidan li dijminan gor*” (Xanî, 2014: 156).
 b. “*Bê xeyme û bargah û eywan/ ‘Ewran vedida li ser wî seywan*” (Xanî, 2014: 14).
 c. “*Peyweste têtin cezr û med/ Seywan li sehrayê veda*” (Cizîrî, 2019: 47).
 d. “*Toqa te li gerdena wî danî/ Dava te veda li qelb û canî*” (Xanî, 2014: 164).
 e. “*Genim û dane temayê/ Çîjekî dav lê vedayê*” (Feqî, 2017: 341).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (36a)yê da bi vê pêşgirê kara “*vedan*”ê hatiye dariştin. Di vir da ev kar bi maneya vekirina erdê yanî kolanê hatiye gotin. Lewra di vir da ji bo kolana gorê îfadeya “*vedidan li dijminan gor*” derbas dibe. Di nimûneyên (36b-c)yê da dîsa heman kar yanî “*vedan*” derbas dibe. Herçiqas di vir da maneya vebûnê hebe jî di vê peywendê da “*vedan*” ji bo vebûna ewran û sîwanê hatiye bikaranîn. Lewra di vir da bêhtir maneya belavbûn û firehbûnê derdikeve pêş. Di nimûneyên (36d-e)yê da vê carê pêşgira “*ve-*”yê hatiye ber kara “*dan*”ê û maneya vekirina dafikê li rayeka karê zêde kiriye.

2.10.4. Peydabûn û Belavbûna Ronîyê

Di nimûneyên jêrîn da pêşgira “*ve-*”yê li rayeka kara “*dan*”ê ya dema borî zêde bûye û kara “*vedan*”ê saz bûye. Di vê kara dariştî da jirayeka karê kareke nû hatiye dariştin û bi vî awayî pêşgira peyv saz a “*ve-*”yê erka karsazîyê anîye cih.

(37) a. “*Yek bi yek şewqê vedabû/ Qesr û eywan û sera ye*” (Cizîrî, 2019: 204).

b. “*Her du ‘uyunan berq veda/ Burca kewanê esweda*” (Feqî, 2017: 300).

c. “*Cebhet keşîftî ji subhê sadiq/ Nûrê ku veda ji ser şebê dac*” (Cizîrî, 2019: 82).

Di nimûneyên jorîn da kara dariştî “*vedan*”ê ji alîyê semantîk ve maneya biriqîn û belavbûna ronîyê daye metnê. Di nimûneya (37a)yê da ev kar ji bo şewqê yanî ronîyê hatiye bikaranîn. Di vir da destpêka bûyera ronîbûnê û belavbûna ronîyê bi kara “*vedan*”ê hatiye îfadekirin. Pêşgira dariştinê ya “*ve-*”yê li rayeka karê ya dema borî zêde bûye û maneya derketin û belavbûna ronîyê lê bar kiriye. Di (37b)yê da heman kar ji bo peydabûna birûskan hatiye gotin. Di vê malikê da kara “*vedan*”ê digel navdêra berqê komepeyva “*berq veda*”yê saz kiriye û ev îfade ji bo destpêka bûyereke sirûştî hatiye bikaranîn. Di malika (37c)yê da jî bi kara dariştî ya “*vedan*”ê maneya destpêk û geşbûna ronîyê li metnê zêde bûye.

2.10.5. Girêdan û Belavbûn

Yek ji peyvên dariştî ku bi pêşgira “*ve-*”yê saz dibe kara “*vebestin*”ê ye. Di vê peyvê da pêşgira “*ve-*”yê bi ser “*bestin*”ê ve bûye û hem maneya wê ya ferhengî xurt kiriye hem jî ji alîyê semantîk ve tê da guherîn pêk anîye. Herwiha pêşgira dariştinê bi

fonksiyona karsazîyê ji karê dîsa kar saz kiriye û ji alîyê semantîk ve jî maneya girêdan û belavbûnê daye karê.

- (38) a. “*Semenbû û dilawîzan/ Bi reyhanan vebestî me*” (Cizîrî, 2019: 301).
- b. “*Devê ku vebestî wan bi tedbîr/ Bizdandî li ber xwe qeyd û zincîr*” (Xanî, 2014: 184).
- c. “*Min ev mîsal lew bo te best/ Zoran bi zulfan dil vebest*” (Cizîrî, 2019: 39).
- d. “*Du emberbo li şimşadê bi mestî/ Vebestin lew hewa bû ‘enberamîz*” (Cizîrî, 2019: 115).

Maneya ferhengî ya peyva “*best*”ê wiha ye: “Beşê tiştêkî zirav û dirêj ê wekî benek yan werîsekî ku ji du alîyan ve di hev ra hatiye derbaskirin û kirara koka ‘*bestin*’ê ye” (Bozarslan, 2011: 249). Herwiha wekî kar tê maneya pêşîlêgirtina tiştêkî û astengkirina wî (Dehxuda, 1962b: 3036) û kara “*bestin*”ê bi maneya nivîsîn û hûnandinê jî tê bikaranîn. Jixwe di beyta (38c)yê da kara “*bestin*”ê bi vê maneyê derbas dibe. Di nimûneya (38a)yê da vebestin maneya dorpêçkirinê û di nimûneyên (38b-c)yê da maneya girêdana tiştêkî ya bi qeyd û zincîran û zulfan daye metnê. Di nimûneya (38d)yê da belavbûna bîna enberê ya di nav hewayê da bi kara vebestinê hatiye îfadekirin. Di nimûneyên pêşî da ev kar di maneya girêdan û pêçanê da ye, lê di vê mînakê da maneya vebestinê ji girêdanê zêdetir ketina nava tiştêkî û belavbûna di navê da ye.

2.10.6. Vekirina Derî, Rê û Sîneyê

Kara “*kirin*”ê kareke têper (transitive) û alîkar e, digihîje hevalnav û hin cînavên pevxistî wekî ‘*jê*’, ‘*lê*’, ‘*pê*’, ‘*tê*’ û bi wan ra karên lêkdayî saz dike (Ebdulfettah, 2011: 52). Dema ku pêşgira “*ve-*”yê tê ber vê karê ji alîyê semantîk ve tesîrê li ser dike û maneya wê diguherîne. Yek ji peyvên ku di klasîkên kurmancî da bi vî awayî hatiye dariştin kara “*vekirin*”ê ye.

- (39) a. “*Şîrê elmasî kîşînit tu ji lami’ deh xeber/ Vekirit huqbeyê yaqût ji gewher meke behs*” (Cizîrî, 2019: 78).
- b. “*Sînê bi destê xwe mûbarek veke/ Te’rîfu kem fî kebîdî min cerah*” (Cizîrî, 2019: 86).

c. “*Ew çend li ser bûyin guherbar/ Ser lê vekirin ji nû ve tkrar*” (Xanî, 2014: 191).

d. “*Mûsa di nêv behra ‘emîq/ Te lê vekir duwazde terîq*” (Feqî, 2017: 408).

Di nimûneya (39a)yê da piştî ku pêşgira “ve-”yê li kara “*kirin*”ê zêde bûye kara “*vekirin*”ê hatiye dariştin û di vir da ev kar hatiye maneya vekirina devika sindoqê. Heman kar di (39b)yê da hatiye maneya vekirina rikiha sînga mirov yanî qefsîngê. Di nimûneya (39c)yê da kara dariştî “*vekirin*”ê maneya kolana gorê daye metnê. Lewra di malika berî vê da behsa bûyera vekirina gora Mem tê kirin û wiha tê gotin: “*Lehda ku Memê meleknezer tê/ Ye ‘nî sedefa ku ew guher tê.*” (Xanî, 2014: 191). Di nimûneya (39d)yê da “*vekirin*” ji bo jîholêrakirina astengîya li pêşberî mirov hatiye bikaranîn.

2.10.7. Vebûna Tiştên Quflekîrî û Hûnandî

Dema pêşgira “ve-”yê li rayeka hin karan zêde dibe maneya vebûna tiştêkî quflekîrî yan jî hûnandî li wan bar dike. Peyvên “*vebûn*”, “*vekirin*”, “*vedan*”, “*veresandin*” û “*verestî*”ê bi vî awayî hatine dariştin. Di van peyvên da gireya dariştinê ji karê dîsa kar saz kiriye. Lewra jî paşgîrê erka cureguherînê neanîye cih, tenê di maneya karan da guherîn pêk anîye.

(40) a. “*Nesîmê Sunbul û sêvan seher da hebs û zindanê/ Vebû qufla me bê mifte ziringînî ji quflê da*” (Cizîrî, 2019: 27).

b. “*Mîr go ku vekin evan xezalan/ Pabende mekin ewan şepalan*” (Xanî, 2014: 131).

c. “*Te divê saf û zexel jêk vedî tecrîbe ke/ Da ‘iyarî bi temamî binûmêtin te mehek*” (Cizîrî, 2019: 153).

d. “*Ez ji biska te verestî me teleb kir lêbê le ‘l/ Lê di çaha zeqenê bê ser û pa çûme helek*” (Cizîrî, 2019: 158).

e. “*Şêran verisandî qeyd û zincîr/ Hersê bi tebayî çûne nik Mîr*” (Xanî, 2014: 141).

Di nimûneyên (40a-b)yê da kara “*vekirin*”ê bi maneya serbestberdana tiştêkî, vekirina ben, qeyd û zincîran hatiye bikaranîn. Lewra di vir da kara dariştî vebûna pabendeyê xezalan, qufle û mifteyan îfade kiriye. Di nimûneya (40c)yê da bi pêşgira “ve-

”yê kara “veda”yê hatiye dariştin. Ev kar di nav komepeyvya “jêkvedanê” da derbas dibe û maneya destnîşankirina cudahîya du tiştan daye beytê. Di nimûneyên (40d-e)yê da bi vê pêşgirê karên “verestin” û “veresandin”ê hatine dariştin. “Maneya resan/risanê xwegihandina cihekî yan jî tiştêkî ye” (Dehxuda, 1962f: 1285), lê bi zêdebûna pêşgira “ve-”yê maneya parçebûn û jêketinê li kar bar bûye. Di nimûneya (40d)yê da kara “verestin”ê ji bo ketina tiştêkî ya ji nav biskan, azadbûn û dûrbûna ji cihekî hatiye bikaranîn. Bi heman awayî di (40e)yê da jî kara “verisand”ê di nav peywenda metnê da parçebûn û jihevvebûna qeyd û zincîran îfade dike.

2.10.8. Berdewamî û Dubarebûn

Yek ji fonksiyonên semantîk ên pêşgira “ve-”yê jî maneya berdewamî û dubarebûnê ye. Dema ku ev pêşgir bi erka xwe ya dariştinê li hin karan zêde dibe maneya berdewamî û dubarebûnê li wan bar dike. Di metnên klasîk da vê pêşgirê di karên dariştî “vejîn”, “vegerîn”, “vehatin”ê da ev mane daye.

(41) a. “Mîr go tu here Memi bibîne/ Ger dê mirî bit ewî **vejîne**” (Xanî, 2014: 174).

b. “Her kesê şêx lê bixwîne/ Nexweşên hal tê nemîne/ Bi du’an daket **vejîne**/ Lê ricu’ ket sihhetê” (Feqî, 2017: 251).

c. “**Vegerîya** û hateve/ Wenda vebû wê saetê” (Feqî, 2017: 377).

d. “Kes dî li lewhê sînê qet/ neqşek **vehatî** bê xelet” (Cizîrî, 2019: 91).

Di nimûneyên (40a-b)yê da karên ku bi vê pêşgirê hatine dariştin maneya vegerîna li ser rewşa xwe ya berê didin. Di (40a)yê da kara vejînê bi maneya zindîbûna mirovekî ya piştî mirinê hatiye bikaranîn. Di (40b)yê da heman kar derbas dibe, lê vê carê ne bi maneya zindîbûna dijberî mirinê hatiye; di vir da bi maneya vegerîna li ser rewşa xwe ya berê yanî bidestxistina tenduristî û sihetê daye metnê. Di nimûneya (40c)yê da vê carê pêşgira “ve-”yê hatiye ber kara “gerîn”ê. Di vê peyvê da jî vê pêşgirê maneya dubarebûnê daye karê. Lewra “gerîn” tevgera di nav cihekî da îfade dike, lê dema dibe “vegerîn” maneya berdewamî û dubarebûna kar û tevgerekê tê qesdkirin. Di malika (40d)yê da pêşgira “ve-”yê ketiye pêşîya kara “hatin”ê û tesîr li ser maneya wê kiriye. Peyva ku nû hatiye dariştin “vehat” e, bi maneya kişandina neqş û xetan hatiye bikaranîn. Wekî nimûneyên jorîn di vir da jî vê pêşgirê maneya dubarebûnê daye û berdewamîya karekî destnîşan kiriye. Jixwe di malika piştî vê da îfadeya “Her dem ji nû yek taze xet

tavête der perkarê çerx ” (Cizîrî, 2019: 91) derbas dibe ku maneya dubarebûnê tê da bêhtir aşkere dibe.

2.10.9. Tefandina Agir û Kuştina Mirovekî

Di nimûneyên jorîn da pêşgira peyvsaz a “ve-”yê hatiye ber rayeka karê û maneyeke nû lê bar kiriye. Di vir da kara sade “*kuştin*” e û piştî zêdebûna pêşgirê kareke nû saz bûye û di vir da vê pêşgirê erka karsazîyê pêk anîye. Peyveke dariştî ku di klasîkên kurmancî da bi vî awayî hatiye saz kirin kara “*vekuştin*”ê ye.

(42) a. “*Zahir meke tu evê înadê/ Carek vekuj agirê fesadê*” (Xanî, 2014: 158).

b. “*Destê xwe bi dil ji canî şuştin/ Goya ku şemal-i bû vekuştin*” (Xanî, 2014: 191).

c. “*Îman ji Bersîs bû cuda/ Şeytên vekuştî zahida*” (Feqî, 2017: 377).

Di nimûneya (40a-b)yê da pêşgira “ve-”yê hatiye ber forma dema niha ya kara “*kuştin*”ê. Bi zêdebûna pêşgirê cureya peyvê neguherandiye û ji karê dîsa karek hatiye dariştin, lê di maneya kar da guherîn çêbûye. Bi taybetî di vir da pêşgirê maneyeke mecazî daye karê; lewra maneya sereke ya kara “*kuştin*”ê dawîlêanîna jîyana candarekê ye, lê di van nimûneyan da bi vê karê tefandina agir an jî mûmê hatiye qesdkirin. Di nimûneya (40c)yê da herçiqas pêşgirê maneyarayeka karê rasterast neguherandibe jî kar ji alîyê maneyê ve xurt kiriye û bi vî awayî li ser semantîka wê tesîr kiriye.

2.10.10. Sekinîn û Amadebûn

Di nimûneyên jêrîn da pêşgira peyvsaz hatiye ber karên “*westan*” û “*man*”ê. Pêşgira dariştinê “ve-”yê cureya karan neguherandiye. Lewra ji karê dîsa kar hatiye dariştin lêbelê maneya sekinîn û amadebûnê daye karê û bi vî awayî li ser maneya van karan tesîrek pêk anîye. Di klasîkên kurmancî da peyvên ku di vê kategorîyê da hatine dariştin “*vewestan*” û “*veman*” in.

(43) a. “*Şem‘ û perwane bi zatê xwe ji halê di dûr in/ Ateşek sirf e ji ‘işqa te vewesta me lebaleb*” (Cizîrî, 2019: 54).

b. “*Can li ser destê nihayî di riya cananî da/ Rûh sef sef ku vewestene di bazarê hudus*” (Cizîrî, 2019: 81).

c. “Her çi te divêtin ji me wer can bi xwe bit/ Cana bike ferwarê **vewestayim** ez” (Cizîrî, 2019: 112).

d. “*Rabûn li teferrucê vewestan/ Wan cumle tebeq di her du destan*” (Xanî, 2014: 83).

e. “*Ev her du demek veman teheyyur / Bû(n) xerqeyê lucceyê tefekkur*” (Xanî, 2014: 46).

Di nimûneya (43a)yê da kara “*vewestan*”ê maneya sekinîn û rawestana li ser lingan a ji bo rûmetgirtinê îfade dike. Di (43b-c)yê da dîsa heman kar bi maneya amadebûna li ber fermana kesekî hatiye bikaranîn. Lewra di malika (43c)yê da bi îfadeya “*Her çi te divêtin ji me wer can bi xwe bit*” tê gotin ku em ji bo bicihanîna hemû ferman û daxwazên te sekinîne û amade ne. Di nimûneya (43d)yê da bi kara “*vewestan*”ê rewşa sekinînê tê îfadekirin, lê rewşa ku di vir da tê destnîşankirin ne hazirbûna li ber fermana kesekî ye belkî sekinîna li hember dîmenekê û temaşekirina wê ye. Di nimûneya (43e)yê da ji rayeka karê ya dema borî “*man*”ê kara “*veman*”ê saz bûye û kara dariştî maneya berdewamîyê daye metnê.

2.10.11. Wergirtina Vexurekan

Di nimûneyên jêrîn da pêşgira peyv saz a “*ve-*”yê erka karsazîyê anîye cih. Di vir da ev pêşgir hatiye dawîya rayeka karê û ji vê karê kareke nû saz kiriye. Di vê karê da pêşgira dariştinê cureya kar neguherandiye, lê ji aliyê semantîk ve li serê tesîr kiriye û ji rayeka kar a forma dema borî kara “*vexwarin*”ê hatiye dariştin.

(44) a. “*Me ji ser çeşmeyê heywan qedehek safî vexwar/ Nagihên lezzet û şewqa me bi sed cildê kitab*” (Cizîrî, 2019: 52).

b. “*Natîqê teb’ê dewarî/ Ê muqîm şorbe vexwarî*” (Feqî, 2017: 358).

c. “*Safî şemirandî vexwarî durdî/ Manendê durê lisanê kurdî*” (Xanî, 2014: 22).

d. “*Roja vedixwun şerabê belwa/ Gava ku dixwun kebab û selwa*” (Xanî, 2014: 97).

e. “*Xwîna dilî bû xida we xwarin/ Hêstir bixwe şerbet û vexwarin*” (Xanî, 2014: 100).

Peyva “*xwarin*”ê wekî kar ji bo wan tiştan tê bikaranîn ku ne rehn in, biring in. Piştî ku ev pêşgir li kar zêde bûye peyva dariştî ya “*vexwarin*” saz bûye ku ev kar ji bo wergirtina tiştên ron tê bikaranîn. Di karên jorîn da, di hemû nimûneyan da ev kar ji bo vexurekan hatiye gotin. Heman kar di nimûneya (44a)yê da wekî vexwarina ava heyatê di (44b)yê da vexwarina şorbeyê, di (44c)yê da vexwarina qehweyê, di (44d)yê da vexwarina şerabê û di (44e)yê da jî wekî vexwarina şerbetê derbas dibe. Jixwe di nimûneya (44d)yê da karên “*xwarin*” û “*vexwarin*”ê li gel hev derbas dibin û di vir da cudahiya her duyan bêhtir aşkere dibe. Lewra di rêzika pêşî da ji ber ku behsa xidayê (*xwarin*)ê hatiye kirin û xida xurekeke biring e ji bo wê kara “*xwarin*”ê hatiye gotin û di rêzika duyem da ji bo ku behsa vexurekeke ron dike di vir da kara “*vexwarin*”ê hatiye bikaranîn.

2.10.12. Destpêkirin

Pêşgira “*ve-*”yê di hin karan da maneya dem û destpêka karekî dide. Di nimûneyên jêrîn da ev pêşgir hatiye ber rayeka karên “*kirin*” û “*bûn*”ê yên di forma dema borî da û ji van karan “*vekirin*” û “*bûn*” ê saz bûne. Di vir da peyv ji aliyê cureyê ve neguheriye; ji ber ku ji karê dîsa kar saz bûye lêbelê ji aliyê semantîk ve di kar da guherîn pêk hatiye.

(45) a. “*Name teyy kir rozeyê îdê vekir fesla meyê/ Lê bi zimzim tên bi awazê neyê fîncan û cam*” (Cizîrî, 2019: 169).

b. “*J’berketa wextê sebayê/ Şêx Ettar mizgîn didayê/ Nû vekir zikrê semayê/ sofîyan coş ve ketê*” (Feqî, 2017: 322).

c. “*Te’yîn bibûye ji bo wî textek / Zahir vedibû ji bo me bextek.*” (Xanî, 2014: 19).

Di nimûneya (45a)yê da kara “*vekirin*”ê ji bo destpêka fesla meyê yanî dem û demsala meyê hatiye bikaranîn û di vir da ev kar maneya hatin û destpêka dem û demsalkê îfade dike. Ev maneya kar bi pêşgira “*ve-*”yê li rayeka karê zêde bûye. Di (45b)yê da bi vê pêşgirê heman kar hatiye dariştin. Kara dariştî di vir da jî ji aliyê semantîk ve maneya destpêkê daye metnê lêbelê di vê mînakê da bereksê (45a)yê tiştê ku dest pê dike ne dem e, karek e. Lewra “*vekirin*” ji bo destpêkirina karê zikra semayê hatiye gotin. Di (45c)yê da ev pêşgir li rayeka kara “*bûn*”ê zêde bûye û kara “*vedibûn*”ê hatiye dariştin. Di vir da vê peyvê maneya destpêka dem û dewranê daye metnê.

2.10.13. Bang û Dawet

Di nimûneyên jorîn da pêşgira “ve-”yê hatiye ber kara “xwendin”ê û ev kar bûye “vexwendin” bi vî awayî ji rayeka karê kareke nû hatiye dariştin. Wekî din di nimûneyên jêrîn da jî xuya dike, pêşgira peyvşaz hem li rayeka dema borî (xwend-) hem jî li ya dema niha (xwîn-) zêde bûye. Herwiha pêşgirê di maneya kar da jî guherîn pêk anîye û bi zêdebûna vê gireyê maneya dawetkirin û bangkirinê li karê “xwendin”ê bar bûye û ji vê rayekê kara dariştî “vexwendin” saz bûye.

- (46) a. “*Bi tolên asitanê ra vexwendim mîr bi dergahî/ Bi vî çavî hebîb dîtîm şukur ev şefqe Mewlê da*” (Cizîrî, 2019: 28).
- b. “*Ew carîye pir lîp û bend e/ Law bi bal mîran vexwende*” (Feqî, 2017: 403).
- c. “*Şefqe kit carek nihîni/ Toleyê astan vexwînî*” (Cizîrî, 2019: 207)
- d. “*Hindî weku tu li textî rûnî/ Her roj tu cindiyan vexûnî*” (Xanî, 2014: 173).
- e. “*Herçî te vexwendî ew ‘ezîz e/ Herçî te nexwandî bêtemîz e*” (Xanî, 2014: 74).

Di nimûneyên (46a-b)yê da pêşgira “ve-”yê maneya dawetkirina cihekî û meqamekî daye karê. Lewra di metnê da dawetkirina mirovekî ya bi bal dergehê mîr ve bi kara “vexwendin”ê hatiye îfadekirin ku ev mane bi xêra pêşgira “ve-”yê li kar bar bûye. Di (46b-c)yê da kara dariştî maneya bangkirinê daye metnê. Ji ber ku di vir da, digel dawetê maneya fermankirinê jî heye. Mesela di (46c)yê da kara “vexwendinê” ji bo gazîkirina kuçikê li ber derî hatiye bikaranîn ji ber vê yekê jî di vir da, di peywenda metnê da bi peyva “vexwendin”ê ji dawetkirinê zêdetir gazîkirina mirovekî ya bi îcbarî hatiye qesdkirin. Di nimûneya (46d)yê da jî ev kara dariştî maneya dawetkirinê dide, lê digel dawetkirinê di vir da maneya destûrdayînê jî derdikeve pêş.

2.11. Wer-

Morfema bendî ya “wer-”ê dema tê ser rayeka karan bi fonksiyona xwe ya karsazîyê peywira dariştinê tîne cih. “Bikaranîna vê pêşgirê di kurmançîya jorîn da kême (Ebdulfettah, 2011: 22). Li gorî Kerim etimolojîya vê pêşgirê digihîje rayeka kara proto-hind-ewropî ya “werg”ê ku tê maneya zivirînê (Kerim, 2019: 430). Dema ev pêşgir li karên sade zêde dibe û karên nû saz dike û bi piranî maneyên zivirîna li dora xwe, pêçan û vajbûna tiştêkî li rayeka karan bar dike (Usman, 2015: 73). Herwiha di karên wekî

“*werbûn*”, “*wergerandin*”, “*werhatinê*” da maneyên zivirîna li dor tişteki yan jî li dora xwe, gindirîna ji jor ber bi jêr ve û dorlêgirtinê li karan zêde dike (Bedirxan û Lescot, 2004: 284). Jixwe wekî ku di peyvên “*wergerîn*” û “*wergerandinê*” da jî xuya dike maneya bingehîn a vê pêşgirê qulipîn û serberjêrbûn e (Muhammed, 2016a: 105). Erkeke din a vê pêşgirê jî ew e ku dema tê pêş peyvê, maneyên guhastin û nûkirinê li wan zêde dike (Tîgrîs, 2011: 28).

Ji ber ku pêşgira “*wer-*”ê wekî morfemeke bendî tê pêşîya karan, ji wan, karên nû saz dike ji aliyê fonksiyona xwe ve erka karsaziyê tîne cih. Di metnên klasîk da ev pêşgir ji aliyê peywirê ve bi erka karsaziyê tê pêşîya karên di forma dema niha û dema borî da. Ji aliyê semantîk ve maneyên avêtina tişteki yan kesekî, têdana dermanan ya li çavan, zivirîna ber bi deverekê ve yan jî guherîna tişteki li karan bar dike.

2.11.1. Avêtin, Ketin û Têdan

Di metnên klasîk da karên ku pêşgira “*wer-*”ê digirin hem di forma dema borî hem jî di forma dema niha da ne. Herwiha ev pêşgir hem hatiye pêşîya karên têper hem jî yê teneper. Ji aliyê semantîk ve jî karên ku hatiye pêşîya wan, maneya wan guherandiye û maneyeke nû li wan bar kiriye.

- (47) a. “*Ew bilbilê wan bişkuwan/ Werbû di tûra ulfetê*” (Feqî, 2017: 369).
 b. “*Xem’lî bi lîbasê hacîyan/ Werbû di dilqê sofîyan*” (Feqî, 2017: 347).
 c. “*Pêçam di Şamê werkirim/ Ebdal di sûka xurbetê*” (Feqî, 2017: 256).
 d. “*Bi şubhê murxê nîmbesmel di hev wertem di xwînê da*” (Cizîrî, 2019: 25).
 e. “*Vêkra weriyan li wî per û bal/ Têkda weşîyan ji wî xet û xal*” (Xanî, 2014: 116).
 f. “*Da di çêşman min werîne xakê her wek tûtîya*” (Cizîrî, 2019: 60).

Di nimûneya (47a)yê da pêşgira “*wer-*”ê hatiye pêşîya rayeka teneper a dema borî ya “*bûn*”ê û ji vê rayekê kara “*werbûn*” dariştiye. Di vir da pêşgirê maneya avêtina cihekî li rayeka karê bar kiriye. Di (47b)yê da jî ev pêşgir li heman peyvê zêde bûye, lê vê carê di îfadeya “*werbû di dilqê sofîyan*” da maneya peyva dariştî ya “*werbûn*”ê guherîna cil û

bergan e û maneya tebdîlî qiyafetê daye metnê. Di (47c)yê da vê carê pêşgira “*wer-*”ê li kara têper ya “*kirin*”ê zêde bûye û maneya avêtina cihekî dûr daye karê. Di nimûneya (47d)yê da pêşgira “*wer-*”ê hatiye pêşîya rayeka dema niha ya kara “*hatin*”ê. Forma dema niha ya vê karê “*hê*” ye. Pêşgira dema niha “*di-*” hatiye pêşîya kar, bûye (dihê) û ji ber guherîna deng bûye (tê). Di vir da bi zêdebûna pêşgira “*wer-*”ê jî kara dariştî “*wertêm*” saz bûye ku di vê malikê da maneya lihevqulibin û perpitînê daye. Zivingî di vê malikê da maneya îfadeya “*di hev wertêm di xwîne da*” wekî gevizîna di nav xwîne da rave kiriye (2013: 125). Di nimûneya (47e)yê da bi vê pêşgirê kara dariştî ya “*werîn*”ê saz bûye. “*Werîn/werandin*” tê maneya mirov tiştêkî bixe deverêkê” (Zaxoyî, 2007: 234) yan jî ketina tiştêkî ya ber bi hêla jêrîn ve ye. Di vê mînakê da peyva dariştî bi maneya ketina ber bi jêr ve hatiye bikaranîn. Lewra ji bo ketina per û balan hatiye gotin. Ji aliyê morfolojîk ve “*wer-*” pêşgira dariştinê ye û “*în*” jî forma dema niha ya rayeka kara “*anîn*”ê ye (biîne). Li gorî Kerim kara “*weranîn/werhanîn/werhênan/werînan*”ê digihîje zimanê proto-hind-ewropî û tê maneya birin û ajotinê (Kerim, 2019: 446). Di nimûneya (47f)yê da jî wekî nimûneya jorîn pêşgir hatiye ber kara “*în*”ê û ji vê pêşgirê, kara “*werîn*”ê hatiye dariştin, lê di vir da ev kar ne bi maneya ketinê bi maneya têdanê hatiye bikaranîn. Wekî Septioğlu jî dibêje di vê malikê da “*werînan/weranîn*” tê maneyê ku mirov dermanekî li çavên xwe bide (2005: 86).

2.11.2. Zivirîn, Nihêrtin û Arastebûn

Pêşgira dariştinê ys “*wer-*”ê dema dikeve pêşîya karên “*ger/gêr*”ê di warê maneyê da li ser wan tesîrê dike. Dema ev pêşgir li karên wekî “*gêrand/gerand/gêrî*”yê zêde dibe ji wan rayekan, karên nû saz dike û maneya zivirîn û arestebûna ber bi cihekî dide wan.

(48) a. “*Mel’ûnî ku dî nebû çu te’sîr/ Ew mes’ele **wergêrande** tezwîr*” (Xanî, 2014: 97).

b. “*Her kinarê pê ve **wergêrî** ‘inanê himmetê/ Zuhre bî peykê te û kêwan rikêbdarê te bî*” (Cizîrî, 2019: 282).

c. “*Ev her du bi sed dilan hebandin/ Rûniştin û her du **wergerandin***” (Xanî, 2014: 49).

d. “*Dûr nekî da wî’j derê xwe/ **wernegêrî** wî’j berê xwe*” (Cizîrî, 2019: 203).

Di nimûneya (48a)yê da ev pêşgir hatiye ber kara “*gêrandin*”ê ji vê karê û kara “*wergêrandin*”ê hatiye dariştin. Di vir da ji aliyê semantîk ve pêşgirê maneyên gulibîn,

zivirîn û guherînê li kara nû zêde kiriye. Lewra di nav peywenda metnê da kara “*wergêrand*”ê ji bo guherîna gotinê yanî tekzîbkirina wê hatiye gotin. Di nimûneya (48b)yê da bi pêşgira “*wer-*”ê kara “*wergêrîn*”ê saz bûye. Di vir da ev kar di nav komepeyva “*pê ve wergêrî*”yê da maneya arastebûna ber bi cih û hêlekê ve daye karê. Di (48c)yê da peyva ku bi vê pêşgirê hatiye dariştin “*wergerandin*” e. Herçiqas maneyên cuda yên vê karê hebin jî bi taybetî di nav peywendê da kara “*wergerandin*”ê nihêrtina bi baldarî û meraqdar daye metnê. Di nimûneya (48d)yê da bi vê pêşgirê kara “*wergêrîn*”ê hatiye dariştin. Di vê mînakê da pêşgira peyvsaz a “*wer-*”ê maneya vegehrîn û zivirîna ji cihekî daye karê. Ji aliyê morfolojîk ve “*wer-*” berî morfema neyînîyê “*ne-*”yê hatiye û peyva dariştî “*wernegêrî*” saz bûye. Ev peyv di nav îfadeya “*wernegêrî wî’j berê xwe*” da hatiye bikaranîn û ev îfade li vir bi qesta “*wî ji cem xwe neqewirîne û wî bi paş ve venegerîne*”yê hatiye gotin.

2.11.3. Lixwekirina Cil û Bergan

Di metnên klasîk da dema pêşgira dariştinê ya “*wer-*”ê tê pêşîya kara “*girtin*”ê bi fonksiyona xwe ya dariştinê ji rayeka karê kareke nû saz dike û ji aliyê semantîk ve jî maneya lixwekirina cil û bergan dide peyva nû.

(49) a. “Ye’ nî ku vekuşt çiraxê zerrîn/ **Wergirtî** ji nû libasê rengîn” (Xanî, 2014: 160).

b. “Her seher destikî ve **wergir**/ ‘Er’erê têk da seraser ke” (Cizîrî, 2019: 213).

Ev pêşgir di nimûneya (49a)yê da hatiye pêşîya kara “*girtin*”ê û kara “*wergirtin*”ê hatiye dariştin. Herçiqas ji aliyê maneyê ve her du kar bişibin hev jî di navbera wan da cudahîyeke semantîk heye. Lewra maneya bingehîn kara “*girtin*”ê zeftkirina bi destan tiştêkî yan jî kesekî ye lêbelê “*wergerîn*” tê maneya standina tiştêkî ji kesekî din û peyda kirina wî ye. Di nimûneya (49b)yê da vê carê pêşgira dariştinê hatiye pêşîya rayeka karê ya dema niha (*gir*) û kara “*wergirîn*”ê hatiye dariştin. Di nav metnê da, di forma raweya fermanî da hatiye bikaranîn. Di vê mînakê da “*wergirîn*” ji bo rahiştin û lixwekirina cil û bergan hatiye bikaranîn. Lewra wekî Zivingî jî dibêje di vê malikê da peyva “*destek*” tê maneya taximek kinc, taximek cil (Zivingî, 2013: 151) û *wergirîn* jî tê maneya lixwekirina wî taximê cilan.

BEŞA SÊYEM

PAŞGIRÊN DARIŞTINÊ

Paşgirên peyvîsaz cureyek ji morfemên bendî (bound morpheme) ne. Morfemên bendî dabeşî du cureyan dibin: morfemên kêşanê û morfemên dariştinê. Paşgirên peyvîsaz dikevin nav koma morfemên dariştinê. Ev morfem di xebatên rêzimanî da wekî gireyên dariştinê jî tên binavkirin. Gireyên dariştinê dema li morfemên serbixwe (free morpheme) zêde dibin ji aliyê mane û asta wan ya cureyî ve tesîrê li wan dikin. Ji ber vê yekê ji bo ku paşgirek wekî paşgira dariştinê bê binavkirin divê dema li morfemeke serbixwe zêde bûn ji aliyê maneyê, cureya peyvê yan jî her du taybetîyan ve guherîna pêk bîne. Herwiha taybetîyeke din ya morfemên dariştinê ew e ku wekî morfemên serbixwe yanî peyv nikarin bîn bikaranîn.

“Di kurmancîyê da hejmara paşgiran zêde ye û bi taybetî jî paşgir di sazkirina hevalnav û navdêran da pir aktîf in bereksê vê, paşgirên ku karan çêdikin gelekî kêma in” (Tan, 2011: 69). Celadet û Lescot paşgir ji aliyê semantîkê ve bi awayê paşgirên raveker, paşgirên amrazî, paşgirên cih, paşgirên razberkirinê û paşgirên rengpîşe dabeş kirine (2004: 285). Wekî li jorê jî hat gotin yek ji taybetîyên sereke yê paşgirên dariştinê ew e ku ew wekî morfemeke serbixwe nikarin bîn bikaranîn; eger bi vî awayî bîn, hingê nabin morfemên dariştinê, dibin morfemên serbixwe yanî peyv. Herwiha herçiqas morfemên serbixwe yê wekî “*pêj*”, “*rêj*”, “*kuj*” û “*bêj*”ê li dawîya peyvên zêde bibin û maneya wan biguherînin jî, ji ber ku ev morfem rayekên karan ên dema niha ne, nakevin nav kategoriya paşgirên dariştinê. Bazidî morfema “*pêj*”ê ya ku peyvên “*nanpêj*”, “*helwapêj*” û “*aşpêş*” pê saz bûne wekî “*lefz*” anku “*peyv*”ê bi nav kirine (2019: 33). Li gorî Kordo jî ev morfem, ew ew peyv in ku bi alîkarîya binyata fêlan (karan) çêbûne (1981: 29).

3.1. -A

Paşgira “-a”yê wekî morfemeke dariştinê tê dawîya peyvên û ji wan, peyvên nû saz dike. “Dema ev gire li rayeka dema niha maneya wesfe ku di tê qalkirin li kesan bar dike” (Baran, 2012: 285). Herwiha ev paşgir tê dawîya hin qewdeyê karan, ên dema niha yan jî borî, da ku merama ku di karê da derdikeve pêş bide naveroka peyvê (Zilan, 2005: 10). Herwiha yek ji fonksiyona vê paşgirê jî ew e ku rewşa huner, hêz û xwedîtîyê dide dîyarkirin (Tîgrîs, 2011: 31). Ji aliyê erk û fonksiyonê ve paşgira “-a”yê hevalnavan saz dike. Dema tê dawîya karan ji van karan hevalnavên nû saz dike. “Ev paşgir di heman

demê da rewşa xwedîfîyê nîşan dide û dema ku tê li ser rayekê hingê maneya karê ya di kesekî yan jî tiştêkî da tê diyarkirin. Bi awayekî maneya ku ji karê hatiye pê li naveroka peyva nû zêde dike” (Delikaya, 2016: 62).

3.1.1. Taybetî û Xislet

Paşgira peyvsaz a “-a”yê dema ku piştî karan tê ji van karan hevalnavên nû saz dike. Di metnên klasîk da ev paşgir piştî karên di forma dema niha da tê û maneya xwedîbûna taybetîyekê li karan bar dike. Anku wî kesî yan wî tiştî nîşan dide ku şîyan û taybetîya ku di karê da tê destnîşankirin di xwe da dihewîne.

(50) a. *“Wî mulhidî şîr wisa seqa kir/ Misrî ji xwe ra wisa bira kir”* (Xanî, 2014: 159).

b. *“Kuştîyê xencerê bira nekirê/ Dilê xem didê ma şa nekirî”* (Cizîrî, 2019: 250).

c. *“Min hespekî mi ’nek divê/ Bezayekî çelenk divê”* (Feqî, 2017: 331).

Di nimûneyên jorîn da peyvên “beza” û “bira” bi vê paşgirê hatine dariştin “bira” ji rayeka karê ya dema niha “bir-”ê û paşgira “-a”yê saz bûye. Di peyva “beza”yê da jî ev paşgira “a”yê li peyva “bez”ê zêde bûye û ev peyv hatiye dariştin. Peyva “bez”ê rayekeke hevpar e. Lewra hem wekî kar (dibeze) hem jî wekî navdêr (beza wî) tê bikaranîn. Di nimûneya (50a)yê da peyva “bira”yê ji kara “birîn”ê hatiye dariştin. Di vir da rayeka karê ya dema niha “bir-” hatiye bikaranîn û ji vê karê hevalnavek saz bûye û ev hevalnav wekî hevalnavekê tamamker (predicate) hatiye bikaranîn. Di (50b)yê da jî vê paşgirê ji kara “birîn”ê navdêra biker saz kiriye û di vir da ev biker bi erka hevalnava raveker (attributive adjective) hatiye bikaranîn. Di nimûneya (50c)yê da paşgir hatiye dawîya koka hevpar “bez/bez-”ê û peyva “beza”yê hatiye dariştin. Peyva dariştî ya “beza”yê di vê mînakê da, di nav beytê da bi peywira navdêrê hatiye bikaranîn.

3.2. -An

Ev paşgir wekî gireyêke dariştinê ji alîyê peywira xwe ve dikeve nav koma paşgirên raveker (Bedirxan û Lescot, 2004: 285). Di rastiyê da ev, paşpirtika pirhejmarîyê ye (Muhammed, 2016a: 92); lê ji ber ku çalakîya vê paşgirê di pêkanîna pirhejmarîyê da xwe nîşan dide bi awayekî çalak hê jî ev forma pirhejmarîyê di kurancî da li kar e lêbelê hêdî hêdî ji bo navê gund, dever, eşîr, malbatan hatiye bikaranîn û peywira gireya

navdêrsazîyê wergirtiye (Delikaya, 2016: 64). Ev morfem bi vê fonksîyona xwe dema li navdêran zêde dibe navê êl û eşîran çêdike. Peyvên wekî “*Celalîyan*”, “*Demenan*”, “*Gewastîyan*”, “*Goyîyan*”, “*Heyderan*”, “*Kîkan*”, “*Mîlan*” û “*Reşkotan*” bi vî awayî hatine dariştin (Baran, 2012: 288).

3.2.1. Cih û War

Morfema “-an”ê dema tê dawîya rayeka navdêrê vê erkê tîne cih û wekî paşgireke peyvsaz ji navdêran navdêran saz dike. “Di navdêrsazîyê da morfema bendî tê dawîya morfemeke serbest û navdêreke nû tê dariştin. Ev morfem wekî morfemên navdêrî (nominal suffix) yan jî navdêrîker (nominalizer) tînin binavkirin” (Hamawand, 2011: 123). Di metnên klasîk da peyva “*Bohtan*”ê bi vê paşgirê hatiye dariştin û di vê navdêrê da paşgirê maneya cih û war daye navdêrê.

(51) a. “*Emma bi neseb ne merdê Bohtan/ Belkî mutewellidê ji buhtan*” (Xanî, 2014: 94).

b. “*Bohtan ji mezin heta biçûkan/ Niswan û keç û benat û bûkan*” (Xanî, 2014: 182).

c. “*Şebçiraxê şebê Kurdistan im/ Gulê baxê îremê Bohtan im*” (Cizîrî, 2019: 249).

Di nimûneyên peyvên dariştî da ku di klasîkan da derbas dibin, paşgira “-an”ê navdêrsazîyê navê cihan saz dike. Wekî ku di nimûneyên jorîn da jî xuya dike ev paşgir li navdêrê zêde bûye û paşgirê ji aliyê maneyê ve di navdêrê da guherîn pêk anîye. Lewra di her sê nimûneyan da navdêra “*Bohtan*”ê ku navê eşîrekê îfade dike ji navdêra “*Boht*”ê hatiye dariştin. Di vir da peyva dariştî cih û war û herwiha navê herêm û welatekî destnîşan dike. Ev mane jî bi paşgira “-an”ê li peyvê zêde bûye. Di nimûneya (51a)yê da peyva dariştî “*Bohtan*” di nava ravekeke navdêrî da hatiye û erka navdêra raveker anîye cih. Di nimûneya (51b)yê da peyva dariştî bi peywira navdêrê û di nimûneya (51c)yê da jî “*Bohtan*” bi peywira pêveberê hatiye bikaranîn.

3.3. -And

Ev paşgir li rayeka karên têneper a dema niha zêde dibe û van karan dike têper (firî-firand, revî-revand, bezî-bezand). Rayekên karan ên ku paşgira “-and”ê li wan zêde

dibe di forma dema niha (fir-and) da ne, lê karên ku bi vê paşgirê hatine dariştin di forma dema borî da ne. Hin kar hene digel ku têper in jî dîsa vê paşgirê werdigirin. Lewra jî navbera karên “*nivîstî*” û “*nivîsand*”ê da ji alîyê semantîk ve tu cudahî nîne û kara “*nivîsîn*”ê jixwe têper e, lê dîsa jî paşgira “-and”ê werdigire. Li gorî Ebdulfettah ev rewş dîyardeyeke awarte û şaşîyeke berbelav e anku xeletîyeke meşhûr e (Ebdulfettah, 2018: 92). Hin peyvên ku ev paşgir li wan bar dibe hem wekî rayekên karan hem jî yên navdêran tên bikaranîn (bez, rev, kola, diz, êş). Li gorî Ebdulfettah ev peyv bi eslê xwe jêderên karan ên dema niha û navên jêderî ne (Ebdulfettah, 2011: 104). Ev peyvên ku paşgira “-and”ê werdigirin û karan saz dikin; ji ber ku hem wekî navdêr hem jî karan tev digerin mirov dikare wan wekî rayekên hevpar bi nav bike.

3.3.1. Têperkirina Karan

Di metnên klasîk da paşgira “-and”ê li karên teneper ên dema niha zêde bûye û ev kar kirine têper.- Karên “*gihandin*”, “*gerandin*”, “*hejandin*”, “*lerizandin*”, “*gevizandin*”ê bi vê paşgirê têper bûne. Wekî rewşeke awarte ev paşgir li kara têper yê “*birandin*”ê jî zêde bûye.

- (52) a. “*Tewfek-du kirin li dewrê beytê/ Perwaneyê per **gihande** zeytê*” (Xanî, 2014: 178).
- b. “*Bayê **gerand** aşê kubar/ ‘Enbersiyah çûne dîyar’*” (Feqî, 2017: 287).
- c. “*Şah bi qesda kuştina min rim **hejand** û bû sebeb/ Dame çeşmê qehr û xeşmê rim li dil da ku edeb*” (Cizîrî, 2019: 56).
- d. “*Wê dilberê dil **lerizand**/ Murşîd di xwînê **gevizand***” (Feqî, 2017: 280).
- e. “*Dirrende dirandibûn bi şîran/ Perrende **birandibûn** bi tîran*” (Xanî, 2014: 119).

Di nimûneya (52a)yê da rayeka karê “*gih-*” e û ev kar di forma dema niha da ye (digihe). Piştî ku paşgira dariştinê lê zêde bûye kar bûye têper. Lewra di kara “*gihîn*”ê da kar venagere ser berkarekê anku berkareke rasterast nagire (Ez digihim malê), lê di kara “*gihandin*”ê da kar û tevger vedigere ser berkarekê û hevok dikare berkara rasterast wergire (Min kurik gihand malê). Di nimûneyên (52b-c-d)yê da jî bi vî awayî paşgira dariştinê li rayekên karan ên teneper zêde bûye û ew kirine têper. Di nimûneya (52e)yê da

ji ber ku paşgira “-and”ê piştî kara “birîn”ê hatiye rewşeke awarte heye. Lewra ev kar jixwe têper e û paşgirê tê da erka têperkirinê neanîye cih. Di vir da ev kar wekî yê “nivîsandin”ê li kareke têper zêde bûye û wekî dîyardeyê awarte tê dîtin.

3.4. -Ane

Paşgira “-ane”yê bi peywira xwe ya dariştinê dema li navdêr û hevalnavan zêde dibe ji wan, peyvên nû saz dike. “Bi taybetî di sazkirina hin peyvên da pir aktîf e ku ji navdêran saz dibin û carinan wekî hevalkar carinan jî wekî navdêr tînan bikaranîn” (Muhammed, 2016a: 111). Dema ku tê ser navdêr û hevalnavan ji wan hevalkar, navdêr û hevalnavan saz dike (Delikaya, 2016: 65). “Xaseten hokerên demî (temporal adverbs) ji navdêrên demî çêdike, lê ew hoker bi guhastinê (conversion) wekî hevalnav jî tînan bikaranîn” (Muhammed, 2016a: 49). Paşgireke çalak e û diçe ser hin navdêrên sade û ji wan, hevalkarên dariştî saz dike û maneya çawanî û çendayetiye li navdêran bar dike (Usman, 2015: 65). Hevalkarên ku bi paşgira “-ane”yê tînan çêkirin maneya “bi awayê, bi rengê, bi tehrê, bi şiklê” didin. Bi taybetî jî bi alîkarîya vê paşgirê navdêr û hevalkarên demê saz dibin (Zîlan, 2005: 10). Dema ku li navdêr û hevalnavan zêde dibe peyvên ku saz dibin hem wekî hevalnav hem jî wekî hevalkar tînan bikaranîn. Dema wekî hevalnavê tê rewş û taybetîya tişteki yan jî kesekî nîşan dide (tevgera zarokane) û dema wekî hevalkarê tê bikaranîn şibandina bi tevgerekê îfade dike (zarokane tev digere).

Ev paşgir di farisî da jî bi heman fonksiyonê tê bikaranîn û dema li navdêr û hevalnavan zêde dibe taybetîya kesan an jî karê ku dikin beyan dike. Peyvên ku bi vê paşgirê saz dibin hem bi peywira hevalnavan hem bi peywira hevalkaran tînan bikaranîn (merdane, aşiqane, dostane) (Keşanî, 1992: 33).

Di metnên klasîk da ev paşgir li navdêr û hevalnavan zêde bûye û peyvên ku pê hatine dariştin bi peywira wesfandina nevdêran wekî hevalnav û bi erka wesfandina kar û tevgerê wekî hevalkar hatine bikaranîn.

3.4.1. Wesfandina Navdêran

Paşgira “-ane”yê dema dikeve ber navdêr û hevalnavan ji alîyê mane û erkê ve tesîrê li wan dike. Peyvên ku bi vî awayî tînan dariştin sazkirina hevalnavan tînan bikaranîn. Ev peyv carinan erka ravekirinê carinan jî ya temamkirinê tînan cih. Di metnên klasîk da paşgira “-ane”yê bi erka wesfandinê li kar e. Peyva ku bi vê paşgirê tê dariştin carinan di

nav raveka hevalnavî da tê bikaranîn û peywira wesfandina navdêrekê tîne cih û dibe hevalnava raveker (attributive adjective). Carinan ev ev peyva dariştî bi peywira hevalnava pêveberî (predicate adjective) tê bikaranîn. Di metnên klasîk da peyvên “*hekîmane*”, “*şahane*” û “*pîrane*”yê bi vê paşgirê hatine dariştin û bi peywira hevalnavan hatine bikaranîn.

- (53) a. “*Saqî û şerab û şem ‘ xwestin/ Dîwaneke **hakimane** bestin*” (Xanî, 2014: 133).
 b. “*Lê xeramî li me mestane kirê/ Cilweyek Mîrî û **şahane** kirê*” (Cizîrî, 2019: 250).
 c. “*Dermande yim heyran te yim/ **pîrane** yîm xoşbende yîm*” (Cizîrî, 2019: 218).

Di nimûneyên jorîn da paşgira “-ane”yê hatiye dawîya peyvên “*hekîm*”, “*şah*” û “*pîr*”ê û vê paşgirê di van peyvên da hem ji aliyê maneyê hem jî erkê ve guherîn pêk anîye. Di (53a)yê da peyva “*hekimane*”yê hatiye dariştin û bi erka hevalnavê di nav raveka hevalnavî (dîwaneke *hekimane*) da hatiye bikaranîn. Di vê mînakê da peyva dariştî fonksiyona wesfandina navdêra “*hekîmane*”yê anîye cih. Di nimûneya (53b)yê da bi heman awayî raveka “*cilweyek şahane*” bi hevalnava dariştî ya “*şahane*”yê çêbûye. Di nimûneya (53c)yê da jî hevalnava “*pîrane*”yê bi vê paşgirê saz bûye, lê di vir da ji ber ku ev hevalnav ne raveker, temamker e fonksiyona temamkirina pêveberê anîye cih. Di her sê nimûneyan da jî ji aliyê semantîk ve, karê ku hatiye kirin tê wesfandin. Bi gotineke din paşgira “-ane”yê maneya “*wekî*”yê daye karê û bi vî awayî bi raveka “*dîwaneke hakimane*” dîwaneke *wekî* ya hakimane, bi “*cilweyek şahane*” *cilweyê* *wekî* ya şahane û bi peyva “*pîrane*”yê jî maneya *wekî* *pîran* hatiye qesdkirin.

3.4.2. Wesfandina Tevgerê

Yek ji erka paşgira “-ane”yê jî sazkirina hevalkaran e. Dema ev paşgir tê dawîya navdêr û hevalnavan ji wan hevalkaran saz dike. Çawa ku hevalnav navdêran ji aliyê çawanî û çendanîyê ve diwesfînin hevalkar jî erka wesfandina kar û rewşê tînin cih. Di metnên klasîk da, peyvên “*mestane*”, “*merdane*”, “*abidane*”yê paşgira dariştinê ya “-ane”yê digirin û karê ku di hevokê tê destnîşankirin rave dikin.

- (54) a.”*Ji hîcabê were der nazik û **mestane** bimeş tu/ Te Cîhan Zîr û zeber kir bi Xude ev çi hîcab e*” (Cizîrî, 2019: 197).

b. “*Mestane govendê dikin/ Reqsê li dor fendê dikin*” (Cizîrî, 2019: 48).

c. “*Merdane dibexşî canî erzan/ Heyfa ku bi mir giran î lerzan*” (Xanî, 2014: 106).

d. “*Rûniştî di wê ve ‘abidane/ Zindan li wî bûye çillexane*” (Xanî, 2014: 145).

Di nimûneyên jorîn da bi vê paşgirê hevalkarên “*mestane*”, “*merdane*”, “*abidane*” hatine dariştin. Di nimûneyên (54a-b)yê da paşgira “-ane”yê li peyva “*mest*”ê zêde bûye û peyva “*mestane*”yê hatiye dariştin û peyva dariştî kar û tevgera kirina govendê û meşînê wesfandine û ji alîyê erk û peywîrê ve wekî hevalkar hatine bikaranîn. Di nimûneyên (54c-d)yê da jî bi vî awayî bi paşgira “-ane”yê peyvên nû “*merdane*” û “*abidane*”yê hatine dariştin. Di van nimûneyan da peyva dariştî “*merdane*” ji peyva “*merd*”ê hatiye dariştin û ji ber ku karê bexşandinê wesfandiye fonksiyona hevalkarîyê anîye cih. Bi heman awayî di nimûneya (54d)yê da jî peyva “*abidane*” ji peyva “*abid*” hatiye dariştin û ji ber ku karê rûniştinê wesfandiye di vir da jî erka hevalkarîyê anîye cih. Di hemû nimûneyan da jî ji ber ku vê paşgirê erka dariştina hevalkaran anîyê cih ji alîyê semantîk ve terz û awayê kirina karekî hatiye destnîşankirin û peyva dariştî maneya “*bi awayekî*” daye metnê.

3.5. -Anî

Paşgira “-anî”yê li navdêr û hevalnavan zêde dibe û ji wan, peyvên nû saz dike. Peyvên ku bi vê paşgirê tên dariştin bi peywîra hevalnav û hevalkaran tên bikaranîn. Yanî ev peyv an bi rola hevalnavê wesf û taybetîya navdêrekê destnîşan dikin an jî awayê pêkhatina kar û tevgerê beyan dikin. Wekî Kurdo jî dibêje bi arîkarîya vê paşpirtikê xeberên wisan çêdibin ku awayê kiirnas karekî destnîşan dikin (1981: 28). Hevalnavên ku bi vê paşgirê saz dibin haletê mirov yê şênber û razber an jî rewş û tevgera tiştêkî rave dikin” (Keşanî, 1992: 33). Herwiha roleke vê paşgirê jî ew e ku ji hevalnavan an jî navdêrên şênber navdêrên razber saz dike. Peyvên wekî “*piranî*”, “*mêranî*”, “*xortanî*” bi vî awayî saz bûne (Bedirxan û Lescot, 2004: 296).

3.5.1. Nîşandana Taybetîyên Şênber

Di metnên klasîk da navdêrên “*ruhanî*” û “*şîranî*”yê bi paşgira “-anî”yê hatine dariştin. Ev her du peyv herçiqas wekî hevalnav û hevalkar bên bikaranîn jî bi rêya

veguhastine di nav metnê da bi peywira navdêr jî tên bikaranîn û ji aliyê semantîk ve jî taybetîyeke şênber nîşan dane.

(55) a. “**Ruhanîyên qudsîmîsal/ Dê bên libasê xet û xal**” (Cizîrî, 2019: 43).

b. “*Sere didin çêşmeyê heywan û bi zimzimdirenê/ Lê çi şîranî ye Ellah te ji wê kuft û kenê*” (Cizîrî, 2019: 262).

c. “*Kes di bi vê şîranîyê/ Der sen’etê Cebbarê xet*” (Cizîrî, 2019: 136).

d. “*Meger şîrîn bi vê şîranîyê bû/ Ela Şemsu’l-Melahet qed tuşarek*” (Cizîrî, 2019: 155).

Di nimûneyên jorîn da bi paşgira peyvîsaz navdêrên “*ruhanî*” û “*şîranî*”yê hatine dariştin. Di nimûneya (55a)yê da peyva “*ruhanî*”yê ji rayeka navdêrî ya “*ruh*”ê hatiye dariştin. Paşgira “*-anî*”yê li vê rayekê zêde bûye û ji aliyê maneyê ve li serê tesîr kiriye. Lewra ruh aliyê mirov ê razber îfade dike, lê peyva dariştî ya “*ruhanî*” ku bi paşgira “*-anî*”yê hatiye dariştin wan heyînan îfade dike ku ne xwedîyê cism û gewdeyekî madî ne û mirov nikare wan bibîne. Di nimûneyên (55b-c-d)yê da ji rayeka navdêra “*şîr*”ê navdêra “*şîranî*”yê hatiye dariştin. Lewra wekî ku Muhammed jî balê dikişîne serê, peyva şîrîn ji peyva “*şîr*”ê saz bûye (Muhammed, 2016b: 392). Ji aliyê semantîk ve jî paşgira “*-anî*”yê maneya şibandin û wekhevbûnê li vê navdêrê zêde kiriye. Lewra ji ber çêja şîr rewşa şîrînbûnê wekî şîr hatiye dîtîn. Herwiha di vê peyvê da fonksiyoneke din a vê paşgirê jî razberkirin e. Lewra peyva şîr peyveke şênber e û bi zêdebûna vê paşgirê bûye peyveke razber.

3.5.2. Ravekirin û Wesfandin

Paşgira “*-anî*”yê dema piştî rayekên navdêran tê ji van navdêran hevalnavan saz dike. Di metnên klasîk da hevalnavên “*mîranî*”, “*nûranî*”, “*ruhanî*”, “*cismanî*” û “*nefsanî*” bi rêya vê paşgirê hatine dariştin. Ev hevalnav hem piştî navdêran tên û wan rave dikin û bi vî awayî wekî hevalnavên raveker tên bikaranîn hem jî piştî pêveberan tên û wekî hevalnavên tamamker tên bikaranîn.

(56) a. “*Mîranî ye ew ji neslê pak e/ Nûranî ye ew ne ab û xak e*” (Xanî, 2014: 43).

b. “*Muşarîk û Muşakeleta Wî ye bi Exlaqêd rûhanî*” (Xanî, 2014: 145).

c. “*Hubbê cismanî du roj in/ Ger çi dil pir pê disojin*” (Cizîrî, 2019: 202).

d. “*Bixwaze gewhera işqê bi terka emrê nefsanî*” (Cizîrî, 2019: 221).

Di nimûneyên jorîn da paşgira “-anî”yê li rayeka navdêran zêde bûye û ji navdêran hevalnav hatine dariştin. Di nimûneya (56a)yê da ev paşgir piştî navdêra “mîr” û “nûr”ê hatiye û ji vê navdêrê hevalnavên “mîranî” û “nûranî”yê saz bûne. Di vir da ev hevalnav bûne pêveber û wekî hevalnavên temamker hatine bikaranîn. Ji alîyê maneyê ve jî hevalnava “mîranî”yê maneya esilzadebûnê û hevalnava “nûranî”yê jî maneya rindbûnê dide metnê. Di nimûneya (56b)yê da ev paşgir piştî navdêra “ruh”ê hatiye û ji vê navdêrê hevalnava “ruhanî” hatiye dariştin û vê hevalnavê navdêra “exlaq”ê rave kiriye. Di raveka “*exlaqêd ruhanî*” da hevalnava dariştî “ruhanî”yê maneya pak û paqijbûnê daye beytê. Di nimûneyên (56c-d)yê da bi paşgira “anî”yê hevalnavên “cismanî” û “nefsanî”yê hatine dariştin. Van hevalnavan jî navdêrên berî xwe rave kirine û wesfandine. Hevalnava “cismanî” ji navdêra “cism” û nefsanî jî ji navdêra “nefs”ê hatiye dariştin û vê paşgirê maneya ravekirin û wesfandinê li navdêrê zêde kiriye. Bi vî awayî paşgirê hem cureya peyvê guherandiye hem jî ji alîyê maneyê ve li serê tesîr kiriye.

3.5.3. Nîşandana Awayê Liv û Tevgerê

Peyvên ku bi paşgira “-anî” tên dariştin bi veguhezîyê ji alîyê fonksiyonê ve wekî hevalkaran tên bikaranîn. Ev hevalkarên dariştî ji rayeka navdêran saz dibin. Paşgira dariştî tê dawîya rayeka navdêrê û ji vê navdêrê peyvên ku bi erka hevalkaran tên bikaranîn saz dike. “Gelek ji hevalnavên kurdî bêyî tu guherandinê, bi guhastinê dibin hoker (zerf, adverb). Ev dîyarde di zimannasiyê da wekî hokerkirinê (adverbialization) tê zanîn” (Muhammed, 2016a: 20). Di metnên klasîk da peyvên keçanî, cilkuranî, dilberanî û şîranî bi vê paşgirê saz bûne û di nav metnê da bi veguhastinê bi erka hevalkarîyê hatine bikaranîn. Di metnên klasîk da, di vê kategorîyê da peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin: “*keçanî, cilkuranî, sergiranî, şîranî*” ne.

(57) a. “*Çawa xemilîne ew keçanî/ Ew jî geriyane cilkuranî*” (Xanî, 2014: 53).

b. “*Poşîde lîbasê dilberanî/ Seyran dikirin bi sergiranî*” (Xanî, 2014: 45).

c. “*Lew bê mehel xweş nîne mey/ Emma bi şîranî Mela*” (Cizîrî, 2019: 33).

Di nimûneyên jêrîn da paşgira “-anî”yê hatiye dawîya navdêran û ji van navdêran peyvên nû hatine dariştin. Ev peyv ji ber ku awa û şeweya kar û tevgerê rave dikin bi

peywira hevalkaran hatine bikaranîn. Di nimûneya (57a)yê da ev paşgir bi rola sazkirina hevalkarê hatiye dawîya navdêra “keç” û “kur”ê û ji van peyvan peyvên dariştî “keçanî” û “kuranî” saz bûne. Di vir da peyva “keçanî”yê kar, tevgera xemilînê û hevalkara “cilkuranî”yê jî karê gerînê rave û şirove dike. Di nimûneya (57b)yê da paşgira “anî”yê li peyva pêkhatî ya “sergiran”ê zêde bûye û di vir da jî ji ber ku peyva dariştî “sergiranî” awayê kirina seyranê dîyar dike û bi fonksiyona hevalkarî hatiye bikaranîn.

3.6. -Ar

Paşgira “-ar”ê tê dawîya rayeka karan û xeysîyet û rengê dide gotinê. Wekî din ev paşgir ji bo çêkirina navên tiştan (destar, guhar), navê kesê ku karekî dike û pê radibe (cotar, xewar), tê bikaranîn (Zîlan, 2005: 11). “Ev paşgir tiştê ku pêk hatiye an jî hatiye kirin dinimîne. Peyvên bi vî rengî bi gelemperî ji koka (niha an jî borî) kar tên bidestxistin û ji rayeka karan û hevalnavan hevalnav, navdêr û hokeran dadirijîne” (Delikaya, 2016: 68). Bi vî awayî ji hevalnavan hevalnaveke nû çêdike (kevnar, jengar) û ji hokeran hokereke nû diafirîne (pêrar) (Zîlan, 2006: 11). Bikaranîna vê paşgirê pir ne berbelav e û bi taybetî bêhtir di sê karên gerguhêz “kuştin”, “gotin/watin” û “kirdin”ê da xwe nîşan dide (Marif, 2000: 122).

Di metnên klasîk da paşgira “-ar”ê li kar û navdêran zêde dibe û hem li ser cureya wan û hem jî li ser maneya wan tesîrê çêdike. Lewra dema tê dawîya karan ji van karan navdêran û ji navdêran jî hevalnavan saz dike.

3.6.1. Wesfandin/Şibandin

Paşgira “-ar”ê bi peywira xwe ya dariştinê dema tê dawîya rayeka karan ji van karan hevalnavan saz dike. Di metnên klasîk da ev paşgir li rayeka kara “mirin”ê ya dema borî zêde bûye û ji vî karê hevalnava “murdar/mirar” hatiye dariştin. Ji aliyê semantîk ve jî kara ku lê zêde bûye maneya wesfandinê lê zêde kiriye.

(58) a. “Werdan bi *murdaran* nedî/ Wan rê di gulzaran nedî” (Cizîrî, 2019: 272).

b. “Havêtine ‘erdê şubhê *murdar*/ Bê newheker û xwedan û xemxwar” (Xanî, 2014: 186).

c. “*Ger dost bî dê bikin te **murdar**/ W’er dijmin î dê bikin birîndar*” (Xanî, 2014: 199).

Di nimûneyên jorîn da bi paşgira peyv saz ya “-ar”ê peyva “*murdar*”ê hatiye dariştin. Di van nimûneyan da ev gire hatiye dawîya kara “*mirin*”ê. Kara ku paşgir lê zêde bûye di forma dema borî da ye. Peyva “*murdar*”ê ku bi vê paşgirê hatiye dariştin di nav metnê da rola ravekirinê anîye cih. Ji ber ku eslê ravekê “*kesê murdar/mirovê murdar*” e. Lewra peyva dariştî di nav ravekê da hêmana duyem e û peyva berî xwe rave dike, lê navdêra ku hatiye ravekirin ketiye û tenê hevalnav maye. Di nimûneyên (58b-c)yê da jî heman peyv bi vê paşgirê hatiye dariştin û peyva dariştî bi erka ravekirina navdêrê hatiye bikaranîn. Ji alîyê semantîk di nav peywenda metnê da bi peyva dariştî “*murdar*”ê qesd ne kesê mirî, lê ew kes/tişt e ku di rewş û dirûvê mirîyan da ye. Ji ber ku zindîyên ku dimirin dikevin rewşeke xerab û lewitî di vir da ji bo destnîşankirina vê rewşê peyva “*murdar*”ê hatiye bikaranîn û bi vî awayî bi paşgira “-ar”ê maneya şibandî li kar zêde bûye.

3.6.2. Navê Amûr û Alavan

Yek ji fonksiyona paşgira “ar”ê jî navdêrsazî ye. Ev paşgir dema li rayeka navdêrê zêde dibe li ser maneya wê tesîrê çêdike û ji vê navdêrê navdêreke nû saz dike. Di metnên klasîk da ev fonksiyon di peyva “*guh*”ê da pêk hatiye. Di vê peyvê da paşgira dariştinê li navdêra “*guh*”ê bar bûye û ji navê endamekî laş navê eşyayekê hatiye dariştin û bi vî awayî paşgirê peywira navdêrsazîyê anîye cih.

(59) a. “*Dest bestî ji pêş ve pêşekaran/ Zerrînkemer û guherguh*” (Xanî, 2014: 82).

b. “*Serxweş ke li gerdenê guharan/ Sersem ke cunûn û dîn û haran*” (Xanî, 2014: 102).

c. “*Nesraniya zerrînguh*” (Feqî, 2017: 278).

Di nimûneyên jorîn da paşgira “-ar”ê piştî rayeka navdêrê (*guh*) hatiye û ji vê navdêrê navdêreke nû (*guh*) hatiye dariştin. Di vir da “*guh*”, morfemeke serbixwe ye û navdêr e. Paşgira “-ar”ê , morfema bendî ya dariştinê ye. Piştî ku ev morfema bendî (-ar) li morfema serbixwe (*guh*) zêde bûye bi rêya dariştinê peyveke nû saz bûye. Piştî ku paşgira dariştinê li navdêrê zêde bûye cureya wê neguherandiye. Lewra ji navdêrê dîsa

navdêr saz bûye, lê ji alîyê maneyê ve di rayeka navdêrê da guherîn pêk anîye; ji ber ku ji peyvya “guh” peyvya “guhhar” saz bûye. Guh navê endamekî laş e, lê “guhhar” navê alav û eşyayekî ye ku bi guh ve dibe. Ev guherîna semantîk a di rayeka navdêrê da bi xêra paşgira “ar”ê çêbûye û di vir da vê paşgirê erka sazkirina navdêran ji navdêran anku navdêrsazîyê anîye cih.

3.7. -Çî

Morfema “-çî”yê bi fonksîyona xwe ya dariştinê li navdêran zêde dibe û peyvên nû ji wan saz dike. “Orijîna vê paşgirê digihe zimanê tirkî û di tirkî da ji alîyê dariştinê ve pir fonksîyonel e” (Güngördü, 2002: 171). Bazidî bi navê “herfa cîmê” behsa vê paşgirê dike û dîyar dike ku di tirkî da wekî“-ci” û di kurdî da wekî “-çî”yê tê bikaranîn û peyvên ku bi vê paşgirê saz bûne wekî navê karan bi nav dike (Bazidî, 2019: 33). “Ev paşgir bi navê tiştan, bi navê ajelan û navê tiştên razber hevalnavan û navdêrên biker saz dike” (Keşanî, 1992: 25). Navdêrên biker ku bi vê paşgirê saz bûne kesekî destnîşan dikin ku kar û tevgerekê wekî pîşe pêk tîne, (Korkmaz, 2009: 41) bi gotineke din wesfê di navdêrê da li kesan bar dike (Baran, 2012: 290). Yek ji fonksîyona semantîk a vê paşgirê jî ew e ku kesekî destnîşan dike ku kar û tevgerek ji xwe ra kiriye xûy û xislet (Egro, 2003: 73). Kurdo vê taybetîya wê wiha tîne ziman: Wekî di peyvên ‘xebatçî’, ‘defçî’, ‘zurneçî’, ‘dikançî’, ‘qaweçî’, ‘daweçî’ û ‘miletçî’ xuya dike bi vê paşgirê xeberên wisa çêdibin ku taybetîyekê yan jî awayê kirina karekî nîşan didin (Kurdo, 1981: 26).

3.7.1. Navdêrên Biker û Pîşe

Paşgira “-çî”yê li navdêran zêde dibe û di maneya wan da guherînê pêk tîne. Navdêrên ku bi vê paşgirê digirin maneya bikerîyê, xwedîtî û pîşeyê werdigirin. Peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin di nav metnê da rewş û tevgereka demborî, pîşe yan jî xûy û xisletekê nîşan dide. Di metnên klasîk da peyvên “qaweçî, qapûçî, qûşçî, talançî, ricaçî”yê bi vê paşgirê hatine dariştin.

(60) a. “Haydîn ji we ra bibin *ricaçî*/ Hindek ji me ra bibin *du‘açî*” (Xanî, 2014: 72).

b. “Di Cenneta baqî bin/ *Mehderçîyê* ‘Feqî’ bin” (Feqî, 2017: 397).

c. “*Du talançî di meşhûr tê/ Ji me’den ‘eynê kafûr tê/ Di têkil zulmet û nûr tê/ Me kufri di di îmanê*” (Cizîrî, 2019: 239).

d. “*Teyrê dil bê tem’ekê nayête dest şehzadeyan/ Qûşçiyê şahîn di destê wî di bêazar-i bit*” (Cizîrî, 2019: 65).

e. “*Daîm li derê wî qapûçî bû/ Qella’ û qellaş û qaweçî bû*” (Xanî, 2014: 93).

Dî nimûneyên jorîn da, di madeyên (60a-b-c)yê da bi paşgira “-çî”yê peyvên “*ricaçî*”, “*du’açî*”, “*mehderçî*” û “*talançî*”yê hatine dariştin. Ev peyv ji navdêran saz bûne û di metnê da wekî navdêrên biker hatine bikaranîn. Yanî kesekî nîşan didin ku bi kar û tevgerê radibe. Peyva “*ricaçî*” û “*mehderçî*” kesê ku karê ricakirinê, peyva “*du’acî*” kesê dia dike û “*talançî*” jî kesê ku kar û tevgera talanê dike nîşan dide. Di madeyên (60d-e)yê da paşgira dariştinê maneya kar û pîşe daye navdêrê. Lewra di vir da peyva dariştî ya “*qûşçiyê*” tê maneya kesê ku çûkan xwedî dike û wan difiroşe (Septioğlu, 2005: 106) û peyva qapûçî jî kesekî destnîşan dike û li ber derî karê nobedarîyê dike.

3.8. -Dar

Paşgira “-dar”ê yek ji morfema bendî ya dariştinê ye. Dema ku ev paşgir li morfemekê zêde dibe li ser cure û maneya wê tesîrê çêdike û ji aliyê semantîk ve li gorî rewş û peywendê di nav metnê da bi fonksiyonên cuda tê bikaranîn. Ji van fonksiyonan a esasî maneya xwedîbûnê ye. Maneya xwedîbûnê ya ku bi vê paşgirê li navdêrê bar dibe carinan taybetîyêke demborî carinan jî taybetîyêke berdewam e. Herwiha ev gire maneya xwedîbûna pîşe û pisporîyê jî li peyva ku bi ser ve bûye zêde dike. Bi vê fonksiyona xwe “-dar” bi peywira dariştinê li navdêran zêde dibe û ji wan navdêran peyvên nû saz dike û bi vî awayî di pêvajoya karê dariştinê da erka xwe ya cureguhêrîyê tîne cih. Di vê pêvajoyê da peywira esasî ya “-dar”ê hevalnavsazî ye lêbelê bi rêbaza veguhastinê hevalnava ku tê dariştin di nav metnê da bi peywira navdêr û navdêra biker (agent nouns) jî tê bikaranîn. Ji aliyê semantîk ve paşgira “-dar”ê çawa ku di peyvên “*birîndar*, *abdar*, *sîlehdar*, *rikêbdar* û *kemandar*”ê da jî xuya dike. Ev paşgir xwedîbûn û peydabûna rewşekê, taybetîyêkê yan jî pisporîyêkê li navdêrê bar dike û maneya ku di van peyvên da derdikeve pêş ne xwedîbûna tiştêkî belkî nîşandan û ravekirina rewş û taybetîyêkê ye.

3.8.1. Rewş û Xwedîbûn

Di peyvên jorîn da paşgira “-dar”ê li rayeka navdêran zêde bûye û ji van navdêran peyvên nû dariştine. Ev peyvên ku hatine dariştin di nav peywenda metnê da, di cihinan da bi fonksiyona hevalnavan û di cihinan da jî bi fonksiyona navdêran hatine bikaranîn. Ji aliyê semantîk ve morfemê maneya nîşandana rewş û taybetîyeke demborî li navdêran bar kiriye. Taybetîya ku di vê kategorîyê da tê nîşandan ne taybetîyeke berdewam e, taybetîyeke demborî ye û ev peyvên dariştî tevgerê nîşan didin ku di demeke sînordar da pêk hatiye. Di metnên klasîk da peyvên “*dildar, birîndar, dawedar, xeberdar, haldar, guhdar û kuldar*”ê bi vê rêbazê hatine dariştin.

- (61) a. “*Qet ‘a qe nema ji van çu asar/ Yek cuz ‘i li nik Memê birîndar.*” (Xanî, 2014: 117)
- b. “*Wan her du firîşteyêd-i kubbar/ Dîtin du melek ziyade dildar*” (Xanî, 2014: 48).
- c. “*Ecem dibê çaryar in/ Lewra di da’wedar in*” (Feqî, 2017: 386).
- d. “*Ne تنها pêşiberê yar in/ Ji emrê ‘kun’ xeberdar in*” (Cizîrî, 2019: 242).
- e. “*Şêx gote wan hûn zakir in / Guhdarê ilmê zahir in*” (Feqî, 2017: 290).
- f. “*Pirsê l’ mihirdarê xwe ke/ Li meczûb û haldarê xwe ke*” (Cizîrî, 2019: 268).
- g. “*Eskerê haldar li ber tê/ Leşkerê mîrî bi ser tê*” (Feqî, 2017: 275).
- h. “*Bi lefz û guftarê xwe ke/ Dermanê kuldarê xwe ke*” (Cizîrî, 2019: 268).

Di nimûneya (61a)yê da bi vê paşgirê peyva “*birîndar*”ê hatiye dariştin. Di vê peyvê da paşgira peyvsaz a “-dar”ê piştî rayeka navdêra “*birîn*”ê hatiye û ji vê peyvê peyva “*birîndar*”ê hatiye dariştin. Ji aliyê semantîk ve herçiqas maneyê xwedîbûnê anku kesê ku xwedîyê birînekê ye di vir da hebe jî maneya wê ya bingehîn nîşandana rewşê ye. Lewra peyva “*birîndar*”ê di nav metnê da, di nav raveka “*Memê birîndar*”ê da hatiye bikaranîn û vê peyvê di vir da bi erka hevalnavîyê rewşa Mem destnîşan kiriye. Di nimûneyên (61b-c-d)yê da bi vê paşgirê peyvên “*dildar*”, “*da’wedar*” û “*xeberdar*”ê hatine dariştin û di nav metnê da ev peyv bûne pêveber û wekî hevalnavên dîyarker hatine bikaranîn. Ji aliyê maneyê ve di peywenda metnê da peyva “*dildar*”ê rewş û taybetîyeke demborî û peyvên “*da’wedar*”, “*xeberdar*”ê taybetîyeke demborî îfade kiriye. Bi taybetî di peyva “*dildar*”ê da ji ber ku rewş û taybetî hatiye destnîşankirin *dildar* nayê maneya kesê xwedîyê dil; ji ber ku di vir da tiştê esas

ne xwedîbûna dil e belkî xwedîbûna rewş û taybetîya evîndarîyê ye û “wî kesî îfade dike ku dil daye kesekî yanî aşiq û evîndar e” (Demir, 2021: 154). Di nimûneya (61e)yê da peyva dariştî “*guhdar*” e. Di vir da peyva “*guhdar*”ê nayê maneya kesê xwedîyê guh. Di vir da jî bi vê peyvê xwedîbûna rewş û karê guhdarîyê hatiye destnîşankirin. Di nimûneyên (61f-g)yê da bi paşgira “-dar”ê peyva “*haldar*” saz bûye. Di van nimûneyan da *haldar* rewşa mirovekî ya di halê cezbeyê da destnîşan dike. Ev peyv di nimûneya (61f)yê da, di nav ravekê (*haldarê xwe*) da bûye raveber û bi peywira navdêrê hatiye bikaranîn, lê di nimûneya (61g)yê da, di nav raveka hevalnavî da (*eskerê haldar*) da bûye hevalnava raveker. Di nimûneya (61h)yê da bi navdêra “*kul*”ê û paşgira “-dar”ê peyva “*kuldar*”ê hatiye dariştin. Ev peyv di nav metnê da, di nav raveka navdêrî (*kuldarê xwe*) da bûye raveber û bi peywira navdêrê hatiye bikaranîn. Bi vî awayî di hemû nimûneyên vê komê da peyvên dariştî ji aliyê semantîk ve maneya xwedîbûna rewşê û taybetîyeke demborî dane metnê.

3.8.2. Nîşandana Taybetîyeke Domdar

Ji aliyê semantîk ve bi paşgira “-dar”ê peyvên “*namdar*”, “*abdar*”, “*cegerdar*”, “*wefadar*” û “*dîndar*”ê hatine dariştin. Ev peyv bi rayeka navdêrekê û paşgira dariştinê saz bûne. Di van nimûneyan da ji aliyê semantîk ve paşgira “-dar”ê maneya xwedîbûna taybetîyeke domdar daye navdêran. Herwiha ev taybetî di peywenda metnê da xûy û xisleteke mirovan an jî rewşa cihekî îfade dike.

- (62) a. “*Tebi ‘iyyetê wan eger çî ‘ar e/ Ew ‘arî li xelqê nam-idar e*” (Xanî, 2014: 20).
 b. “*Gava tu diçîve ey wefadar/ Ev rengê ji min bibêje dildar*” (Xanî, 2014: 69).
 c. “*Dîndarî û dewlet û diyanet/ Serdarî û sewlet û siyanet*” (Xanî, 2014: 33).
 d. “*Ev meywe eger ne ab-idar e/ Kurmancî ye ev qeder li kar e*” (Xanî, 2014: 30).
 e. “*Yan şubhetê Tacdîn di cebbar/ Qettal û dilawer û cegerdar*” (Xanî, 2014: 199).

Di nimûneya (62a)yê da peyva dariştî “*namdar*” e. Ev peyv ji navdêra “*nam/nav*”ê û paşgira “-dar”ê pêk hatiye. Di vê peyvê da paşgira dariştinê maneya xwedîbûna taybetîyê li navdêra xwerû bar kiriye. Di vir da peyva dariştî bi fonksîyona hevalnava raveker û di nav raveka hevalnavî ya “*xelqê namdar*”ê da peyva “*xelq*”ê rave kiriye. Di nimûneya (62b)yê da, di peyva dariştî ya “*wefadar*”ê da jî paşgira “*dar*”ê

xwedîbûna taybetîyê li navdêrê bar kiriye. Di vê peyvê da rewşa ravekirinê heye, lê ji ber ku navdêra ku bi vê peyvê hatiye ravekirin nehatiye gotin ev peyv di peywira navdêrê da ye. Lewra di vir da eslê gotinê “*mirovê wefadar*” e. Di (62c)yê da jî bi navdêra “*dîn*”ê peyva dariştî ya “*dîndar*”ê saz bûye. Piştî ku vê peyvê morfema “*l*”yê wergirtiye bûye “*dîndarî*” û di nav metnê da wekî navdêr hatiye bikaranîn. Di nimûneyên (62d-e)yê da bi paşgira “*-dar*”ê, peyvên “*abdar*” û “*cegerdar*”ê hatine dariştin. Ev peyvên dariştî di nav metnê da wekî pêveber hatine bikaranîn û erka hevalnavên tamamker anîye cih. Ji alîyê semantîk ve jî di peyva “*abdar*”ê da maneya taybetîyeke domdar û di peyva “*cegerdar*”ê da jî xisleteke mirovan derdikeve pêş.

3.8.3. Xwedîbûna Tiştêkî Şênber

Yek ji maneya ku paşgira “*-dar*”ê li peyvan bar dike jî xwedîbûna amûr û alavekê ye. Di metnên klasîk da bi vê paşgirê peyvên wekî “*hissedar*” û “*sîlehdar*” hatine dariştin. Ev peyvên dariştî jî navdêrekê û paşgira dariştinê “*-dar*”ê saz bûne. Bi vê paşgirê maneya xwedîbûna amûr, alav û eşyayekê yanî tiştêkî şênber li navdêrê zêde dibe.

(63) a. “*Ez lêre emîn û destbidar im/ Lêkin di vî milkî **hissedar** im*” (Xanî, 2014: 197).

b. “*Yarê xem û şahiyar Memê jar/ Wî ra bûye sahib û **sîlehdar***” (Xanî, 2014: 88).

Di nimûneyên jorîn da paşgira “*-dar*”ê li navdêrên xwerû yên “*hisse*” û “*sileh*”ê zêde bûne û ji van navdêran peyvên “*hissedar*” û “*sîlehdar*”ê hatine dariştin. Di nimûneya (63a)yê da peyva dariştî ya “*hissedar*”ê tê maneya mirovê xwedîhisse û ev maneya xwedîbûnê bi paşgira “*-dar*”ê li navdêrê bar bûye. Herwiha ev peyva dariştî di nav metnê da wekî pêveber hatiye bikaranîn û bi erka hevalnava tamamker cînava “*ez*”ê rave kiriye. Di nimûneya (63b)yê da bi vê paşgirê jî navdêra xwerû “*sileh*”ê peyva “*sîlehdar*” hatiye dariştin. Di vê peyvê da jî ji alîyê semantîk ve paşgira “*-dar*”ê maneya kesê bisîleh yanî xwedîyê sîleh daye navdêrê.

3.8.4. Pîşe û Pisporî

Yek ji kategorîya din a paşgira “*-dar*”ê ew e ku maneya pîşe û pisporîyê li navdêran bar dike. Di metnên klasîk da peyvên “*dizdar*”, “*emeldar*”, “*kemandar*”,

“newbedar” û “rikêbdar” di vê kategorîyê da saz bûne. Ev peyv di nav peywenda metnê da hem wekî hevalnav hem jî wekî navdêrên biker hatine bikaranîn.

(64) a. “*Bi’l-cumle di qesrekê ‘emeldar/ Ew qesr-i bitûn ji durrê şehwar*” (Xanî, 2014: 196).

b. “*Ew mahirû ma bête der/ Ta bême newbetdarê çerx*” (Cizîrî, 2019: 91).

c. “*Zuhre bê peykê te û keywan rikêbdarê te bî*” (Cizîrî, 2019: 282).

d. “*Li me îro du kemandarê hebeş hatine ceng*” (Cizîrî, 2019: 263).

Di nimûneya (64a)yê da bi paşgira “-dar”ê peyva “emeldar”ê hatiye dariştin. Di vê peyvê da rayeka xwerû ya navdêrê “emel” yanî kar e û piştî ku paşgira dariştinê li vê navdêrê zêde bûye peyva “emeldar”ê hatiye dariştin. Ev peyv di peywenda metnê da tê maneya kesê xebatkar. Di nav metnê da peyva dariştî bi peywira pêveberê hatiye û erka hevalnava tamamker anîye cih. Di nimûneyên (64b-c-d)yê da jî navdêrên “newbet”, “rikêb”, “keman/kevan”ê bi alîkarîya gireya “-dar”ê peyvên “newbetdar”, “rikêbdar” û “kemandar/kevdar” hatine dariştin. Di van peyvan da paşgirê maneyeke nû li navdêrê bar kiriye. Lewra ev peyvên dariştî ji alîyê semantîk ve wan kesan destnîşan dikin ku xwedîyê karekî ne û vî karî bi awayekî pisporî dimeşînin. Ev peyvên ku hatine dariştin jî alîyê erkê ve xwedîyê roleke raveker in, lê di nav peywenda vê metnê da û di nav raveka navdêrî da bi peywira raveberê hatine bikaranîn û bi van peyvan ravekên “newbetdarê çerx”, “rikêbdarê te û kemandarê hebeş” saz bûne.

3.9. -E

Morfema “-e”yê bi fonksîyona paşgira dariştinê li rayek û gewdeyê peyvan zêde dibe û wan diguherîne. “Ev gire bi eslê xwe ji farisî ye û hevrehê ‘-î’ ya kurmancî ye. Di farisîya klasîk da ‘-e’ ye û di farisîya niha ya tehranî da “-ê” ye (Muhammed, 2016a: 54). Ev paşgir hem tê dawîya navdêran û jî wan navdêrên nû saz dike hem jî tê dawîya karan û jî van karan navdêr û hevalnavan saz dike. “Dema ev paşgir tê ser peyvên bi demê ra têkildar maneya ‘*bi wê demê ve girêdayî*’ dide peyvan” (Baran, 2012: 291). Wekî din carinan jî li rengan zêde dibe û maneya şibandinê dide. Wekî nimûne di peyva “sore”yê da paşgirê maneya rengê nêzî sor û di “gewre”yê da jî rengê nêzî gewr dide peyvê (Bedirxan û Lescot, 2004: 286-287).

Paşgira “-e”yê ji alîyê semantîk ve li gorî rewş û peywendê maneyên cuda li peyvan zêde dike. Di metnên klasîk da, di du kategorîyên semantîk da xwe nîşan dide: Li navdêr, hevalnav û karan zêde dibe, rewş û taybetîya wan nîşan dide û carinan jî tê dawîya navdêran maneya cih û navê heyberan li wan bar dike.

3.9.1. Nîşandana Rewş û Taybetîyê

Paşgira “-e”yê bi fonksiyona xwe ya dariştinê dema li kar û navdêran zêde dibe hem li ser cureya wan hem jî li ser maneya wan tesîrê dike. Di metnên klasîk da dema ev paşgir tê dawîya navdêr, hevalnav û karan ji wan, navdêr û hevalnavên nû saz dike û bi vî awayî fonksiyona xwe ya navdêrsazî û hevalnavsazîyê tîne cih. Peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin ji alîyê semantîk ve di nav netnê da maneya rewş û taybetîyê didin. Karên “*pabende*”, “*dusale*”, “*bijare*”, “*bende*”, “*daye*”, “*hemşîre*”yê bi vê rêbazê hatine dariştin.

(65) a. “*Işqa keçê germ kir evîn/ Pabende kir ew har û dîn*” (Feqî, 2017: 265).

b. “*Ah-i ji destê wê sîrrê dil ji meyê hewale kir/ Her çi li min kirî “Mela” camê meya dusale kir*” (Cizîrî, 2019: 102).

c. “*Tovê bijarê bê bê’illet/ Bavêje erdê bê xillet*” (Feqî, 2017: 272).

d. “*Bend û zincîr dê vebin cerhên di kul dê xweş bikit/ Lew ko navê dilberê dermanê derdê bende ye*” (Cizîrî, 2019: 194).

e. “*Evrengehe gote dayeya pîr/ Xalib te nemaye ‘eql û tedbîr*” (Xanî, 2014: 60).

Di nimûneya (65a-b)yê da paşgira “-e”yê li peyvên pêkhatî yên “*pabend*” û “*dusal*”ê zêde bûye û ji van peyvan “*papende*” û “*dusale*” hatine dariştin. Paşgira dariştinê ya “-e”yê ji hevalnava “*pabend*”ê navdêra “*papende*” saz kiriye û vê peyvê, di metnê da rewş nîşan daye. Herwiha ji komepeyva “*dusal*”ê jî hevalnava “*dusale*” hatiye dariştin û ev hevalnav di nav raveka “*meya dusale*” da wekî hevalnava raveker hatiye bikaranîn. Di (65c)yê da paşgira dariştinê li karê “*bijartin*”ê zêde bûye û ji vê karê hevalnava “*bijare*” hatiye dariştin. Di vê mînakê da vê hevalnavê, di nav raveka hevalnavî da navdêra berî xwe (tov) rave kiriye. Di vir da guherîna deng çêbûye. Li gorî sentaksê eslê îfadeyê bi vî awayî ye: “*Tovê bijare ye bêillet*”, lê ji ber ku “*e*”ya dawî jî peyva *bijare* ketiye û morfema veqetandekê “*ê*” bi peyva berî xwe ve hatiye nivîsîn û bûye “*bijarê*”. Di nimûneya (65d)yê da jî navdêra “*bend*”ê navdêra dariştî “*bende*” saz

bûye û di nav raveka navdêrî da wekî navdêra raveker hatiye bikaranîn. Di nimûneya (65e)yê da paşgira “-e”yê li peyva “da”yê zêde bûye û ji navdêrê disa navdêr saz kiriye. Di vê peyvê da paşgira dariştinê ji aliyê semantîk ve jî guherîn çêkiriye. Lewra “da/dayik” ew kes e ku zarok aniye dinyayê, lê “daye” ew kes e ku bi xwedîkirin û guhdana zarokê radibe û vî karî wekî pîşeyekî tîne cih.

3.9.2. Navên Cih û Heyberan

Yek ji fonksiyonên paşgira “-e”yê jî ew e ku dema li navdêran zêde dibe ji van navdêran navdêrên nû saz dike û ji aliyê semantîk ve wan dike navê cih an jî heyberan. Di vê rewşê da peyvên dariştî bi peywira navdêrê tîne bikaranîn. Di metnên klasîk da peyvên dariştî yê “nîşane” û “perwane”yê di vê kategorîyê da ne.

- (66) a. “Birhên ji qewsê qudret **nîşane** kir Nişanî/ Lami’ ji ber dibarin çi yengiyek we perweş” (Cizîrî, 2019: 127).
- b. “Min di mihrabê sucûd bir/ Lê hecer **nîşane** ye” (Cizîrî, 2019: 208).
- c. “Tacdîn û digel Memê te gotî/ **Perwane** ne per li wan me sotî” (Xanî, 2014: 72).
- d. “Nêzikî dêmpêtê biçin/ Ka ji **perwane** çi tê” (Feqî, 2017: 269).

Di nimûneyên (66a-b)yê da bi paşgira “-e”yê peyvên “nîşane” û “perwane”yê hatine dariştin. Peyva “nîşane”yê ji navdêra “nîşan”ê saz bûye. “Maneya ferhengî ya nîşanê îşaret û elametek e” (Zana, 2005: 392). Lê piştî ku paşgira dariştinê bi vê peyvê zêde bûye peyva “nîşane”yê hatiye dariştin û vê peyvê maneya cih û armancê daye metnê. Wekî ku di nimûneyên (66c-d)yê da dîyar dibe ji peyva pêkhatî “perwan”ê peyva “perwane”yê hatiye dariştin. Di vir da jî peyva “perwan”ê tenê tiştekî xwedîper îfade dike, lê bi paşgira “-e”yê ev peyv bûye “perwane”. Ev peyv di metnê da wekî navê cureyeke kêzikên biper hatiye bikaranîn. Bi vî awayî bi xêra vê paşgirê ji hevalnavekê navê ajolekê hatiye dariştin.

3.10. -Ek

Peywira eslî ya vê paşgirê piçûkkirin e, lê wekî di peyvên “badek”, “destek” û “rastek”ê da xuya dike navê amûran jî saz dike. (Bedirxan û Lescot, 2004: 292). Carinan jî “-ek” tê ser jimarnavan û ji wan, hevalnava jimarnav a rêzîn saz dike. Bo nimûne:

“şêşek”, “heftek”, “heşteke”, “dehek” (Delikaya, 2016: 75). Bi arîkarîya “-ek”ê ji navên heyînê û binyada karan du cure peyv çêdibin: Cureyeke peyvên wisa çêdibin ku fikra xeysîyet û kirina tişteki nîşan didin (parsek, virek, tirsek). Cureyeke peyvên din çêdibin ku bi fikra xwe ve her bi tenê navê tiştan îfade dikin (xurek, birek, qelişteke, rûnişteke) û her yek ji van peyvên ji binyada karan saz dibin (Kurdo, 1981: 25).

Herwiha ev paşgir ji endamên laş navên tiştan saz dike (destik, çavik, serik) û di vî warî da paşpirtika herî çalak e (Muhammed, 2016a: 90). Kurdo fonksiyonên paşgira “-ik”ê wiha rave dike: “Ik” li xeberan zêde dibe, fikra wan naguhêze; her bi tenê piçûkbûna tiştên ruhber û neruhber nîşan dike (berxik, darik, jinik, selik) (Kurdo, 1981: 23-24).

3.10.1. Navdêrên Biker û Navê Tiştan

Paşgira dariştinê “-ek” di metnên klasîk da tê dawîya rayeka karê ya dema niha ji van karan hevalnav û navdêrên biker saz dike. Ji aliyê semantîk ve jî vê paşgirê maneya xwedîbûna taybetîyekê daye karên ku li wan zêde bûye. Peyvên livek û xurek bi vî awayî hatine dariştin.

(67) a. “*Min hespekî mi’nek divê/ Bezayekî çelenk divê/ Nejvanîyek livek divê*” (Feqî, 2017: 331).

b. “*Hetta xwurekê seyê şikarî/ Hetta ‘elefê kerêd-i barî*” (Xanî, 2014: 173).

Di nimûneyên jorîn da paşgira “-ek”ê li rayeka karan a forma dema niha zêde bûye. Yek ji van karan “liv” û ya din “xwur” e. Peyva “livek”ê ji kara “liv”ê hatiye dariştin. “Liv” herçiqas bi guhastinê wekî navdêr bê bikaranîn jî rayeka kara dema niha ya “liv-în”ê ye (di-liv-e). Ev peyv di metnê da, di nav raveka hevalnavî da bi peywira hevalnavê hatiye bikaranîn û paşgirê di vir da erka hevalnavsazîyê anîye cih. Di heman mînakê da peyva “xurek”ê jî ji forma kar a dema niha hatiye dariştin. Herçiqas rayeka dema niha ya vê karê wekî “xw”yê (di-xwe) mabe jî eslê wê “xwer” e û dema paşgira “-ek”ê bi ser ve dibe kara “xwerek/xwurek” tê dariştin. Wekî Hirorî jî dibêje rayeka kara “birin”ê ya dema niha “ber” e, lê du dengên dawî ketine û maye “b” (di-ber-im/di-b-im). Çawa ku peyvên “dilber” û “dengbêj”ê ji navdêr û rayeka kara dema niha pêk hatine (2005: 2) bi vî awayî jî peyva “xurek”ê ji rayeka dema niha ya “xwer” û paşgira “-ek”ê hatiye dariştin.

3.11. -Ende

Paşgira “-ende”yê morfemeke dariştinê ya bendî ye û dema bi ser morfemeke serbixwe ve dibe hem li ser cureya wê hem jî li ser maneya wê tesîrê dike. “-Ende” bi rola paşgira peyvsaz li rayeka karan zêde dibe. Karên ku ev paşgir li wan zêde dibe di forma dema niha da ne. Ev paşgir hem tê ber karên têper hem jî yên teneper. “Herwiha ev paşgir tê ser hevalnav, navdêr û rayekên karan û ji wan navdêrên nû çêdike û wesfên hevalnavan li kesan û tiştan bar dike” (Baran, 2012: 293). Di farisî da jî ev paşgir heye û hevalnav û navdêran saz dike. Hevalnav an jî navdêrên ku bi vê paşgirê saz dibin tevgerên demborî (temporary) û domdar (permanent) rave dikin (Keşanî, 1992: 23).

Paşgira “-ende”yê di metnên klasîk da bi ser navdêr û karan ve bûye. Karên ku ev paşgir girtine di forma dema niha da ne û di nav wan da û hem ên têper hene hem jî yên teneper hene. Piştî ku van karan paşgir girtine, bûne navdêrên biker. Herwiha navdêrên ku ev paşgir bi ser wan ve bûye ji aliyê semantîk ve maneya xwedîbûna taybetîyeke domdar û demborî li wan bar bûye.

3.11.1. Bikerê Kar û Tevgerê

Paşgira “-ende”yê dema ku bi ser rayeka karan a forma dema niha ve zêde dibe li ser cure û maneya wan tesîrê dike. Karên di nimûneyên jorîn da “*bînende*, *bexşende* û *dirende*”yê bi vê paşgirê hatine dariştin. Bi xêra paşgira dariştinê ev peyv kes û tiştan destnîşan dikin û bi kar û tevgerê radibin û van peyv bi vî awayî erka bikerîyê anîne cih.

- (68) a. “*Gotê here bêje mîr û axan/ Bînende venakujin çiraxan*” (Xanî, 2014: 156).
b. “*Şahîneşehê mîr û padişahan/ Bexşendeyê tuhmata gunahan*” (Xanî, 2014: 181).
c. “*Dirende û adem û behaîm/ Ferdek qe nema di şehri qaîm*” (Xanî, 2014: 118).

Di nimûneya (68a)yê da bi paşgira “-ende”yê peyva “*bînende*”yê hatiye dariştin. Ev peyv ji kara “*bîn*”ê saz bûye ku forma dema niha ya kara “*dîtin*”ê ye û piştî ku ev paşgir lê zêde bûye kar bûye navdêreke biker. Di nimûneya (68b)yê da bi vê paşgirê peyva “*bexşende*” hatiye dariştin. Di vê peyvê da gireya dariştinê maneya kesê ku karê bexşandinê dike daye peyvê. Di nimûneya (68c)yê da jî paşgir li rayeka kara “*dirîn*”ê

zêde bûye û maneya bikerê ku karê dirandinê dike li karê bar kiriye. Di peywenda metnê da ev peyv bûye navdêra bikerê û di cihê ajelên dirende da hatiye bikaranîn.

3.11.2. Xwedîbûna Taybetîyeke Dondar û Demborî

Paşgira “-ende”yê bi erka dariştinê li navdêran zêde dibe û li ser morfolojî û semantîka wan tesîrê çêdike. Ev paşgir dema tê ser rayeka navdêran maneya xwedîbûnê (*possession*) li wan bar dike. Ev taybetî carinan demborî ye û rewşê nîşan dide carinan jî taybetîyeke dondar e ku xûy û xisleteke tişteki yan jî kesekî destnîşan dike. Karên “nazende”, “sazende”, “perende” û “şermende”yê di vê kategorîyê da ne.

- (69) a. “Dirrende dewende û **perende**/ *Hin kuştî digirtî hin fikende*” (Xanî, 2014: 119).
b. “Çûn zeyn-i bikin Sitî û Zînan/ **Nazende** bikin du nazenînan” (Xanî, 2014: 79).
c. “Herçend ku zahirî heyim ez/ **Sazende** tu yî wekî ney im ez” (Xanî, 2014: 213).
d. “Tirsim kiçê hemlek hebî/ **Bandê** tu jî **şermende** bî” (Feqî, 2017: 370).

Wekî di nimûneyên jorîn da xuya dike ku paşgira dariştinê bi ser rayeka navdêrên “per”, “naz”, “saz” û “şerm”ê ve bûye û ji van navdêran navdêrên nû dariştine. Ji aliyê semantîk ve di hemû nimûneyan da bi paşgira dariştinê maneya xwedîbûna taybetîyekê li navdêran bar bûye, lê li gorî peywenda metnê hin cudahî di navbera wan da hene. Di nimûneya (69a)yê da peyva “perende”yê hatiye dariştin. Di vir da ev peyv ji bo ajelên xwedîper hatiye bikaranîn. Di (69b)yê da paşgira “-ende”yê xwedîbûna taybetîyeke demborî daye navdêra “naz”ê û peyva “nazende”yê di maneya kesa binaz da hatiye gotin. Di nimûneya (69c)yê da peyva dariştî “sazende” ye. Di vir da sazende ne di maneya kesê xwedîsaz da ye belkî wî kesî îfade dike ku di karê lêdana amûreke sazê da xwedîyê qabilîyet e û pispor e. Di (69d)yê da ji navdêra “şerm”ê bi paşgira “-ende”yê peyva “şermende” saz bûye. Di vir da şermende maneya rewşê anku taybetîyeke mirov a demborî daye metnê.

3.12. -Eve/ve

Paşgira “-ve/eve”yê bi erka xwe ya karsazîyê bi rayeka karan ve dibe, maneya wan diguherîne. Carinan wekî “-ve” carinan jî wekî “eve”yê xuya dike. Ev taybetîya wê

bi guherîna dengana ra tşkildar e. Lewra dema ku rayeka karê bi tîpa dengdêr biqede dibe paşgira dariştinê wekî “*ve*”yê li kar zêde dibe (diçîve).

“Di kurmancîya jorîn da jî ev paşgir li herêma Behdînanê bi kar tê û bi mebesta dubarekirina bûyerên karan tê xebitandin” (Ebdulfettah, 2011: 25). Li Hekarîyê jî wekî “*-we/-ewe*”yê xwe nîşan dide û bi sê erkan tê bikaranîn: Maneya “*bi paş ve*”yê dide kara ku lê zêde bûye. Wekî “*birewe*” (paş ve bir), “*çûwe*” (paş ve çû). Wekî din peyvên “*kirewe*” (vekir), “*xareve*” (vexwar) û “*şartewe*” (veşart) xuya dike paşgira “*-eve*”yê bi erka pêşgira “*ve-*” tê bikaranîn. Jixwe paşgira “*-ewe*”yê di kurmancîya jêrîn da bi peywira morfema dariştinê li karan zêde dibe û maneya wan diguherîne. Wekî nimûne karê “*kirdinewe*”yê maneya dubarekirina karê kirinê dide (Şiwani, 2011: 19). Di heman demê da, di vê dîyalektê da ev paşgir karên ku li wan zêde dibe maneyên arastebûnê (helgerawe), daûrandina vexurekan (xwardinewe), serkeftin (birdinewe) û encamdanê karekî (xwêndewe) dide wan (Usman, 2015: 76-77).

3.12.1. Dubarebûna Kar û Tevgerê

Di metnên klasîk da ev paşgir hem bi forma xwe ya “*-ve*” hem jî “*-eve*”yê derbas dibe. Dema ku ev paşgir bi ser karan ve dibe di cureya wan da tu guherînan çênake lêbelê bi fonksiyona karsazîyê tê bikaranîn û maneya dubarebûna kar û tevgerê dide kar û bi vî awayî di maneya rayeka karan da ji aliyê semantîk ve guherîne pêk tîne. Karên “*bîneve*”, “*hateve*”, “*bêmeve*” û “*diçîve*”yê bi vê rêbazê hatine dariştin.

- (70) a. “*B’înave rûha Melê Cizîrî/ Pê heyy bikira ‘Elî Herîrî*” (Xanî, 2014: 23).
b. “*Zinhar eger dibî niğînê/ Zû bîneve bo me dilhezîne*” (Xanî, 2014: 61).
c. “*Nebl hateve nesl-i ma di wê da/ Nesla xwe ji can û dil bi wê da*” (Xanî, 2014: 90).
d. “*Vegeriya û hateve/ Wenda vebû wê sa’etê*” (Feqî, 2017: 377).
e. “*Te ‘cîl-i bikim ji bo sewabê/ Zû bêmeve ez digel cewabê*” (Xanî, 2014: 68).
f. “*Gava tu diçîve ey wefadar/ Ev rengê ji min bibêje dildar*” (Xanî, 2014: 96).

Di nimûneyên jorîn da paşgira “*-ve/eve*”yê bi fonksiyona karsazîyê hatiye bikaranîn. Lewra piştî ku li rayeka karan zêde bûye di maneya wan da guherîn çêkiriye û kareke nû saz kiriye. Ji aliyê morfolojîk ve ev paşgir hem li karên di forma dema niha

hem yên di dema borî zêde dibe. Di nimûneya (70a)yê da paşgira “-ve”yê li kara “îna”yê zêde bûye. Ev kar forma dema niha ya kara “îna/anî”yê ye. Digel amraza fermanî “bi”yê û paşgira dariştinê ya “-ve”yê bûye “biînave”. Ji alîyê semantîk ve paşgirê maneya anîna ji nû ve daye karê. Lewra çawa ku ji metnê jî tê famkirin Xanî dixwaze rihê Cizîrî ji nû ve bîne û bi vî ruhî Herîrî vejîne. Di (70b)yê da jî heman kar hatiye dariştin û di vir da ji ber ku behsa birina nigînê (gustîlê) dike ji bo vegeerîna wê ya li wan jî kara “bîneve”yê hatiye îfadekirin. Di nimûneyên (70c-d)yê da paşgira “-eve”yê bi kara “hatin”ê ve bûye, ev kar di forma dema borî da ye. Piştî ku rayeka karê paşgira dariştinê girtiye bûye “hateve”. Di vê karê da paşgira dariştinê ji alîyê semantîk ve jî maneya vegeerîn û hatina ji nû ve li karê bar kiriye. “Di vê malikê da nebl tê maneya tîrê û nesl jî sertîrik e” (Cîhanî, 2013: 455). Îca bi îfadeya “*Nebl hateve nesl-i ma di wê da*”yê tê gotin ku tîr jê derket, bi paş ve kişîya lê sertîrik tê da ma û bi vî awayî “hateve”yê maneya vegeerînê daye metnê. Di nimûneya (70e)yê da bi vê paşgirê peyva “bêmeve”yê hatiye dariştin. Morfemên vê peyvê ev in: “bi-ê-m-eve”. Di vir da “bi” amraza dema bê ye û ji ber ku hatiye pêşîya peyveke ku bi tîpeke dengdêr dest pê dike tîpa wê ya dengdêr ketiye û tenê “b” maye. Kara “ê-m”ê jî rayeka dema niha ya kara “hatin”ê ye û “eve” jî paşgira dariştinê ye. Ji alîyê semantîk ve vê paşgirê maneya vegeerînê daye karê. Di nimûneya (70f)yê da jî kara “diçîve” bi paşgira “-ve”yê hatiye dariştin û maneya vegeerînê daye kara “çûn”ê.

3.13. -Geh

Di zimanê kurdî da bi paşpirtika “-geh”ê navê cihan (ismê mekan) saz dibin (Amêdî, 2012: 249). Peyvên “*havîngeh*” (cihê ku mirov havînê lê dimîne), “*şergeh*” (cihê ku şer lê tê kirin), “*sêrangeh*” (cihê ger û geştê) bi vê paşgirê saz bûne (Bedirxan û Lescot, 2004: 295). “Ev paşgir têkildarî peyva cih e. Lewra jixwe peyva “*cih*” di zimanê proto-hind-ewropî yê serdema navîn da wekî “*gah*”ê derbas dibe” (Kerim, 2019: 350). Ev morfem bi kurmancî wekî “-gih”, “-ge”, soranî “-ge” û “-ga”, fârisî “-gah”, pehlewî “-gah”, hexamenişi “-gaθ”, avestayî “*gatu*” û bi sanskrîtî wekî “*gatú*” derbas dibe (Muhammed, 2016a: 92). Ev paşgir hem li navdêran (kargeh) hem jî li karan (firoşgeh) zêde dibe. “Karên ku vê paşgirê digirin di forma dema niha da ne (Ebdulfettah, 2011: 108).

Di metnên klasîk da paşgira “-geh”ê li navdêran zêde dibe û li ser maneya wan guherîne pêk tîne. Peyvên ku di klasîkan da bi vê paşgirê hatine dariştin ji alîyê xwe yê semantîk ve di du kategorîyan da ne. Yek jê nîşandana cih û ya din jî nîşandana demê ye.

3.13.1. Destnîşankirina Cih

Fonksiyona sereke ya paşgira “-geh”ê nîşandana cih û mekanê ye. Di metnên klasîk da dema ev paşgir li hin navdêran zêde dibe maneya cih li wan bar dike û jî navdêran navdêrên nû saz dike. Peyvên wekî “*dergeh*”, “*kargeh*”, “*menzilgeh*”, “*texgeh*”, “*temaşegêh*” û “*seyregeh*”ê bi vî awayî hatine dariştin.

- (71) a. “*Şûşeya nûrîn cesed lê/ Dergehê muhra ehed lê*” (Feqî, 2017: 289).
- b. “*Ev kargeha ‘ezîm û dewwar/ Ev bargeha bedî’ û seyyar*” (Xanî, 2014: 5).
- c. “*Dayima menzilgeha sûra te bit birca Şeref/ Tali’ê fêrxunde û bextê se’îd yarê te bî*” (Cizîrî, 2019: 282).
- d. “*Şahînşehê textgehê Medîne/ Mu’ciz ji te ew qedêr me dîne*” (Xanî, 2014: 16).
- e. “*Her yek bi temaşagehê husna te ji her ca/ Teşbihê nigaran bi cemala te di naz in*” (Cizîrî, 2019: 174).
- f. “*Van seyregehan tu lê dikî geşt/ Ez mame ji bo me ra der û deşt*” (Xanî, 2014: 110).

Di hemû nimûneyên jorîn da paşgira dariştinê li navdêran maneya cih zêde kiriye, lê li gorî peywend û bikaranînê di navbera wan da hin nûansên maneyî hene. Di nimûneyên (71a-b-e-f)yê da rasterast destnîşankirina cihê ku kar an tevgerek lê tê kirin heye. “*Dergeh*” navê cihê ketina deverekê ye û “*kargeh*” jî ew cih e ku karek lê tê kirin. “*Temaşegêh*” û “*seyregeh*”cihekî destnîşan dikin ku karê temaşekirinê li wan tê kirin. Di nimûneya (71c)yê da bi vê paşgirê peyva “*menzilgeh*”ê hatiye dariştin. Ev peyv jî navdêra “*menzil*”ê saz bûye. Ji rayeka kara erebî ya “*nezele*”yê tê. Di erebî da peyva “*menzil*”ê jixwe navê cih (îsmê mekan) îfade dike û tê maneya wî cihî ku mirov di dema geşteke da lê radiweste (Parlatır, 2006: 1058) yan jî wî cih û warî îfade dike ku qesda wî hatiye kirin. Lêbelê di metna jorîn da peyva “*menzil*”ê di maneya sekinînê da hatiye û bi paşgira “-geh”ê maneya cihê ku mirov lê disekine lê bar bûye. Di nimûneya (71d)yê da bi vê paşgirê peyva “*textgeh*” hatiye dariştin. “*Textgeh*, payîtext anku ew cih an jî bajar e ku

textê fermanarî û padişahîyê lê ye” (Cîhanî, 2013: 151). Ev maneya cih jî bi paşgira “-geh”ê li navdêra “*text*”ê bar bûye.

3.13.2. Destnîşankirina Demê

Fonksiyona sereke ya paşgira “-geh”ê ew e ku maneya cih û mekanê li peyvên zêde dike. Lêbelê wekî ku di nimûneyên jêrîn da jî xuya dike carinan peyva ku ev paşgir lê zêde bûye di nav peywenda metnê da maneya demê wergirtiye. Di metnên klasîk da peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin “*sehergeh*” û “*subhegeh*” in.

(72) a. “*Sehergeh ‘endelîb mest in/ Ji bihna werd û bişkojan*” (Cizîrî, 2019: 26).

b. “*Tu sehergeh bi temaşa were bazarê hudûs/ Lê te bêfa’ide azar-i nedit xarê hudûs*” (Cizîrî, 2019: 79).

c. “*Heq dizanî di şevan şubhetê avên di rewan/ Me bi dil zarî û kalîn e heta subhegehê*” (Cizîrî, 2019: 244).

Di nimûneya (72a-b)yê da bi paşgira “-geh”ê navdêra “*sehergeh*”ê hatiye dariştin. “Peyva ‘*seher*’ê peyveke erebî ye û tê maneya dema nêzîk a berî sibehê û serdestbûna spîbûnê (ronîyê) li reşayîyê” (Abadî, 2008: 751). Piştî ku paşgira “-geh”ê li rayeka peyvê zêde bûye navdêra “*sehergeh*”ê hatiye dariştin. Di peywenda metna jorîn da “peyva ‘*sehergeh*’ê hatiye maneya serê sibê, biyanîyê û wextê berbangê” (Zivingî, 2013: 128). Herwiha di nimûneya (72c)yê da jî ji navdêra “*subh*”ê anku sibehê bi paşgira “*geh*”ê peyva “*subhegeh*”ê hatiye dariştin.

Peyva “*sehergeh*”ê dikare wekî cihê ku seher lê dest pê dike û “*subhegeh*” jî cihê derketina wê ronahîyê ku ji bo sibehê dibe destpêk. Lêbelê di nimûneyên jorîn da li gorî peywenda metnê ev her du peyv ne di maneya cih belkî di maneya dema pêkhatina karekî da hatine bikaranîn. Lewra di her du nimûneyan (72a-b) da jî peyvên dariştî “*subhegeh*” û “*sehergeh*” di nav beytê da peywira hevalkarîyê anîye cih. Di nimûneya (72a)yê da “*sehergeh*” dema mestbûna endelîban (bilbilan) û di nimûneya (72b)yê da dema zarîn û kalînê îfade dike.

3.14. -Gîn

Paşgira “-gîn”ê bi fonksîyona morfema bendî û bi erka dariştinê dema li navdêr û karan zêde dibe hem di maneya wan da hem di cureya wan diguherîne. “Wekî di peyvên ‘lezgîn’, ‘xwazgîn’ û ‘xemgîn’ê da xuya dike ev paşgir dema li peyvên zêde dibe ji aliyê semantîk ve jî maneya hezkirin û rewşê dide wan” (Tîgrîs, 2011). Bikaranîna vê paşgirê zêde ne berbelav û peyvên ku pê hatine dariştin hindik in. Li gorî Muhammed “ev paşgir ji farisî hatiye wergirtin û di farisî da hevrehê paşgira kurdî ya ‘-în’ê ye” Di farisî da jî bi erka paşgira dariştinê tê bikaranîn û maneya xwedîbûna taybetîyekê yan jî amajebûna bi tiştêkî dide. Dema ev li peyvê zêde dibe kesekî destnîşan dike ku bi kar û tevgerêkê radibe (Dehxuda, 1962c: 1371).

3.14.1. Nîşandana Rewş û Taybetîyê

Dema paşgira “-gîn”ê li navdêr û karan zêde dibe maneya wesfandinê li wan bar dike û peyvên ku vê paşgirê digirin bi peywira hevalnavê tên bikaranîn. Di metnên klasîk da peyvên “*xemgîn*”, “*xwazgîn*”ê bi vê paşgirê hatine dariştin û di metnê da bi peywira navdêr û hevalnavê hatine bikaranîn.

- (73) a. “*Bû qelqeleçek di qelbê xemgîn/Esla nedibû di xanî teskîn*” (Xanî, 2014: 125).
b. “*Zîna ku bi derdê hîcre xemgîn/ Bêsebr û sukûn qerar û temkîn*” (Xanî, 2014: 149).
c. “*Xemgîn bi çî dê bikin tehemmul/ Şahîn bi çî dê bikin tewessul*” (Xanî, 2014: 99).
d. “*Xwazgîn û wesât û wesîle/ Herçî ku ji ba we bîn cemîl e*” (Xanî, 2014: 72).

Di nimûneyên (73a-b-c)yê da paşgira “gîn”ê li navdêra “*xem*”ê zêde bûye û peyva “*xemgîn*”ê hatiye dariştin. Di van her sê nimûneyan da peyva dariştî rola ravekirinê anîyê cih lê li gorî sentaks û peywenda wê erkên cuda anîne cih. Di (73a)yê da, di nav raveka hevalnavî (qelbê xemgîn) da bir erka hevalnava raveker hatiye û navdêra berî xwe rave kiriye. Di (73b)yê da wekî hevalnava temamker hatiye û bûye pêveber. Di (73c)yê da wekî hevalnava raveker hatiye, lê navdêra berî wê ya ku hatiye ravekirin ketiye û hevalnav wekî navdêrê hatiye bikaranîn. Yanî raveka di vir da “*mirovê/kesê xemgîn*”e, lê peyva “*mirov/kes*” nehatiye gotin. Di nimûneya (73d)yê da paşgira “-gîn”ê li rayeka karê

zêde bûye. Ev kar di forma dema niha da ye (*dixwazim*). Paşgira dariştinê ji karê navdêra biker saz kiriye û maneya kesê ku karekî tîne cih daye rayeka kara “*xwestin*”ê.

3.15. -Ik

Paşgira “-ik”ê bi erka xwe ya dariştinê tê dawîya nevdêran û ji wan, peyvên nû saz dike. “Warê bikaranîna vê paşgirê berfireh e û bi vê paşgirê bi hezaran gotin dikarin bîn afirandin. Dema li peyvan zêde dibe maneyên wekî ‘hezkirin’, ‘piçukkirin’, ‘pîskirin’, ‘belengazî’, ‘xizani’, ‘nêzikî’ û ‘ciwantî’yê li peyvan bar dibe” (Tîgrîs, 2011: 55). Ev maneyên ku ev paşgirê dide peyvan li gorî rewş û peywendê diguherin. Yek ji van maneyan jî piçûkkirin e. Di vê rewşê da “-ik” bi erka paşgira piçûkker tê bikaranîn (diminutive suffix) “Piçûkkirin taybetîyeke rewş û bûyerên morfolojîk e û di ziman da diyardeyeke berbelav e” (Stekauer û yd., 2012: 161). Lê ji xeynî piçûkkirinê ev gire bi peywira dariştinê maneyên wekî “*hindikbûn*”, “*hezkirin*” û “*dilpêşewitîn*”ê jî dide peyva ku lê zêde dibe (Miandoab, 2018: 215).

Paşgira “-ik”ê tenê dikare li navdêr (darik) û hevalnavan (*xweşik*) zêde bibe. Morfemên ku bi vî awayî tenê li hin cureyê peyvan zêde dibin, di zimananişyê da wekî morfemên nivfonksiyonî (semi-productive) tên binavkirin (Yıldız, 2023: 176). Li gorî Kurdo paşgira “-ik”ê dema li peyvan zêde dibe, fikra wan naguhêze, lê her bi tenê piçûkbûna tiştên ruhber û neruhber nîşan dike (berxik, darik, jinik, selik) (1981: 23-24). Wekî di peyvên ‘*destik*’, ‘*çavik*’ û ‘*serik*’ê da jî xuya dike ev paşgir ji endamên laş, navên tiştan saz dike û di vî warî da paşpirtikeke çalak e (Muhammed, 2016a: 90).

3.15.1. Nîşandana Taybetîya Tevgerê û Kesan

Di metnên klasîk da paşgira “-ik”ê li navdêr û hevalnavan zêde bûye û ji wan û peyvên nû saz kirine. Peyvên “*nazik*”, “*xweşik*”, “*teyrik*” û “*kurik*”ê bi vî awayî hatine dariştin. Ji alîyê semantîk ve vê paşgirê maneyê peyvê bi temamî neguherandiye, lê li ser hin nuansên maneyî yê peyvê tesîr pêk anîye. Peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin di metnê da bi peywira navdêr, hevalnav û hevalkarê hatine bikaranîn.

(74) a. “*Paşî hereket ke pêş ve çapik/ Siqlet negirî li teb‘ê nazik*” (Xanî, 2014: 111).

b. “*Sîngebyed e xunce li ser/ Nazik ji bircan bêne der*” (Feqî, 2017: 281).

c. “*Teyrik û ‘iqd û şerab û netrik û berg û wereq/ Her bi lerz û cezbeyên yaqûtê tayê rast û çep*” (Cizîrî, 2019: 61).

d. “*Go min du kurik heyin di me’sûm/ Bêbab û yetîm û jar û mehrûm*” (Cizîrî, 2019: 62).

Di nimûneyên jorîn da paşgira “*ik*”ê li gorî peywenda metnê maneyên cuda li peyvan bar kiriye. Di nimûneya (74a-b)yê da ev paşgir li peyva “*naz*”ê zêde bûye û bi vê paşgirê peyva “*nazik*” hatiye dariştin. Di van her du nimûneyan da peyva dariştî ya “*nazik*”ê bi erka hevalnavê hatiye bikaranîn. Di (74a)yê da ev peyv di nav raveka hevalnavî (*teb’ê nazik*) da derbas dibe. Di vê ravekê da peyva “*nazik*”ê navdêra “*teb*”ê rave kiriye û peywira hevalnava raveker anîye cih. Di (74b)yê da herçiqas peyva “*nazik*”ê erka ravekirina navdêrê anîbe cih jî navdêra ku tê ravekirin nehatiye bikaranîn û hevalnava di vir da ketiye dirûvê navdêrê. Lewra ya ku di vir da hatiye qesdkirin “*keçikên nazik*” e, lê navdêr ketiye û hevalnava wê maye. Di nimûneya (74c)yê da paşgira “*-ik*”ê maneya piçûkbûnê daye navdêra “*teyr*”ê, ji navdêrê navdêr hatiye dariştin. Di nimûneya (74d)yê da paşgira “*-ik*”ê li navdêra “*kur*” zêde bûye. Di vir da jî her wekî nimûneyên jorîn paşgirê mane bi temamî neguherandiye, lêbelê maneya hezkirinê li navdêrê zêde kiriye.

3.16. -In

Paşgira “*in*”ê paşgireke radersaz e, dema li rayeka karan zêde dibe wan dike rader. “Rader (infinitive) ew kar e ku neketiye forma kêşanê anku gireyên ku rawe û kesê destnîşan dikin negirtine. Di kurmancîyê da kar di forma raderî da nav in, ji aliyê zayendê ve jî mê ne” (Komîsyon, 2022). Li gorî Ebdulfettah jî rader wekî “*çûn*”, “*hatin*”, “*xwendin*”, “*nivîsîn*” ne kar in çiku bûyer di wan da heye, lê dem nehatiye nîşandan. Bo vê egerê jî ew li ser navan tên jimartin (Ebdulfettah, 2011: 15). Bazidî jî raderan wekî esmayê ef’al anku navên karan bi nav dike (Bazidî, 2019: 23). Di sazûna raderê da pêvajoya navdêrîkirinê (nominalization) pêk tê. Lewra rader dikevin forma navdêran û bi hemû fonksîyon û taybetîyên xwe wekî navdêran tevdigerin (Stekauer û yê din, 2012: 136).

Paşgira radersaz carinan wekî “-n”yê li rayeka karan zêde dibe. Di vê rewşê da tenê guherîna deng heye. Dema paşgira “-in”ê li kareke zêde bibe ku bi tîpa dengdêrê bi dawî dibe “-î”ya wê dikeve û tenê “-n” dimîne (Bilbil û Baran, 2008: 16). Lewra di radêra “*kolan*”ê da rayeka karê ya dema borî “*kola*” ye û “-n” paşgira radersaz e. Ji ber ku kar bi tîpa “a”yê ya dengdêr qedîyaye “-î” jê ketiye û tenê “n” maye (Ciwan, 1992: 93; Ebdulfettah, 2011: 77). Bedirxan û Lescot jî gireyên ku masdaran çêdikin wekî “*in*”, “*în*”, “*an*” û “*ûn*”ê kategorîze kirine û “-iyan”, “-ihan” û “-an” wekî formên “-în”ê destnîşan kirine. Lêbelê ev hemû ji “-in”ê pêk tên. Bilbil jî destnîşan dike ku di kurdî da gireya raderê yek bi tenê ye û ew jî “-in” e (Mîkaîl, 2008: 103).

3.16.1. Sazkirina Raderê

Paşgira “-in”ê bi fonksiyona xwe ya dariştinê dema li rayeka karên dema borî zêde dibe û wan diguherîne. Di metnên klasîk da bi paşgira “-in”ê peyvên raderî “*mirin*”, “*kuştin*”, “*gotin*”ê û bi awayê ketina dengdêra “i”yê jî raderên “*danîn*”, “*çûn*”, “*girîn*”ê saz dibin. Peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin di nav metnê da bi peywira navdêrê hatine bikaranîn.

(75) a. “*Dijmin li me şa ne, dost xemgîn/ Ferz e mirina Çeko û Tacdîn*”
(Xanî, 2014: 156).

b. “*Şah bi qesda kuştina min rim hejandin bêsebeb/ Da me çeşmê qehr û xeşmê rim li dil da ku edeb*” (Cizîrî, 2019: 56).

c. “*Ez lew dibêm vê gotinê/ Ez ‘arif im me’ne binê*” (Feqî, 2017: 305).

d. “*Şîrê hunera me bête danîn/ Qedre qelema me bête zanîn*” (Xanî, 2014: 19).

e. “*Dûr bûm ji wê reft û çûnê/ Wan ‘işweyan guft û kenê*” (Cizîrî, 2019: 279).

f. “*Dilberê berda girînê/Histirê wê nazenînê*” (Feqî, 2017: 325).

Di nimûneyên (75a-b-c)yê da paşgira “-in”ê li rayeka karên dema borî (mir, kuşt, got) zêde bûye û di wan da erka navdêrsazîyê anîye cih,. Lewra peyvên ku hatine dariştin di nav metnê da wekî navdêr hatine bikaranîn. Peyvên “*mirin*” û “*kuştin*”ê bi rola navdêra raveber di nav ravekên navdêrî da (mirina Çeko, kuştina min) derbas dibin. Peyva “*gotin*”ê jî di nav raveka “*vê gotinê*” da di pozîsyona navdêrê da ye û paşgira dîyarîyê ya “-ê”yê wergirtiye. Di nimûneyên (75d-e-f)yê da ji ber ku rayeka karê bi tîpeke dengdêr bi

dawî bûye tîpa “i”yê ji paşgirê ketiye û wekî “-n”yê li kar zêde bûye. Ji ber ku rayeka van karên dema borî “danî”, “çû” û “girî” ye. Di van nimûneyan da jî peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin di nav metnê da bi peywira navdêrê hatine bikaranîn.

3.17. -Istan

Bingeha paşgira “*istan/stan*”ê digihe zimanê proto-hind-ewropî û tê maneya sekinîn û rawestîna li cihekî (Kerim, 2019: 35). Herwiha di farisî û pehlewî da “-*istan*” di hexamenîşî da “-*stane*”, di sanskrîtî da dibe “-*tane*” (Muhammed, 2016a: 92).

Ev paşgir ji aliyê fonksiyonê ve jî li navdêran zêde dibe û ji navdêran navdêrên nû saz dike. “Peyvên ku bi vê paşgirê çêdibin cihekî nîşan didin ku tişt û meriv an jî qewimîn lê hene” (Kurdo, 1981: 27). Wekî din dema li peyvekê zêde dibe pîrbûna navdêra ku lê zêde dibe ya li cihekî (daristan, gulistan) yan jî welat û herêmekê (Hindistan, Bulxaristan, Efxanistan) destnîşan dike (Keşanî, 1992: 40). Wekî ku di peyvên “*goristan*”, “*gulistan*” û “*daristan*”ê da xuya dike ev paşgir maneya cih û şûnê dide, lê carinan jî li hin peyvan maneya demê bar dike. Bo nimûne “*zivistan*” (Zilan, 2006b: 7).

3.17.1. Cih û War

Di metnên klasîk da paşgira “-*istan*”ê li navdêran zêde dibe û ji navdêran, navdêrên nû saz dike anku fonksiyona navdêrsazîyê tîne cih. Ji aliyê semantîk ve jî maneya cih û war li navdêran zêde dike. Di metnên klasîk da peyvên “*gulistan*”, *Ermenistan*”, “*Erebistan*” û “*Kurdistan*”ê bi vê paşgirê saz bûne.

(76) a. “*Mey nenoşî Şeyxê Sen’anî Xelet/ Ew neçû nêv Ermenistanê xelet*” (Cizîrî, 2019: 139).

b. *Te Fereng û ‘Erebistan* û *Mecer têk standin/ Celewê xweş vegerîn hatiye newba ‘Ecemê*” (Cizîrî, 2019: 237).

c. “*Şebçiraxê şebê Kurdistan im/ Gulê baxê Iremê Bohtan im*” (Cizîrî, 2019: 249).

d. “*Sehra hemî bûne sehnê bistan/ Sahil bûye gulşen û gulistan*” (Xanî, 2014: 116).

Di nimûneyên jorîn da, di madeyên (76a-b-c)yê da paşgira dariştinê ya “-istan”ê li navdêrên ku navê neteweyan îfade dikin zêde bûye û ji van navdêran navdêrên nû saz kirine ku cih, war û welatên ku ew netewe lê dijîn destnîşan dike. Peyva “Ermenistan”ê cihê ku “ermen”, ya “Erebistan”ê cihê ku “ereb” û ya “Kurdistan”ê jî cihê ku kurd lê dijîn destnîşan dike.. Di nimûneya (76d)yê da paşgira dariştinê ya “-istan”ê li navdêra “gul”ê bar bûye û navdêra “gulistan”ê hatiye dariştin. Bi paşgira dariştinê maneya cih li navdêrê zêde bûye. Lewra “gulistan” wî cihî îfade dike ku gul lê şîn dibin an jî peyda dibin.

3.18. -Î (yî-hî-wî-tî)

Paşgira “-î”yê bi fonksiyona xwe ya dariştinê li peyvan zêde dibe û di mane û cureya wan da guherîne pêk tîne. Di hin peyvan da tîpên bêdeng tên serê wê û wekî “-yî”, “-hî”, “-wî” û “-tî”yê jî tê bikaranîn (bawî, avayî, germahî, hevaltî). Ji aliyê morfolojîk û morfosemantîk ve gelek fonksiyonên vê paşgirê hene. Wekî cure li navdêr û hevalnavan zêde dibe. Peyvên ku li wan zêde dibe hem bi peywira navdêrî hem hevalnavî û hem jî hevalkarî tên bikaranîn. Yek ji van fonksiyonan sazkirina navê biker an jî berkar e. Ev rewş di ziman da wekî parengê (*participle*) tê zanîn. Di kurmancîyê da, dema piştî gewdeyên karan ên borî, paşgira “-î”yê zêde dibe, forma partîsîp bi dest dikeve. Loma ev “-î” paşgira partîsîp e. Ji ber ku tê ser gewdeyê borî yê karan jî, ew kar dibin partîsîpa borî (past participle) (Bülbul, 2020: 111). Dema ev paşgir li karên teneper zêde dibe navê biker saz dike (ketî, hatî, çuyî, razayî, girîyayî) û dema li karên têper jî zêde dibe navê berkar saz dike (kuştî, avdayî, berdayî, dirûtî, serjêkirî) (Ebdulfettah, 2018: 85). Bazidî jî bi navê îsmê faîl (bikernav) behsa wê kiriye; “ê gotî, ê jimêrî” (Bazidî, 2019: 20).

Paşgira “-î”yê carinan jî bi rola xwe ya dariştinê li navê cihekî zêde dibe kesekî destnîşan dike ku xelkê wî cihî ye (î’ya nisbetê) (Baban, 2014: 19) û wekî di peyvên “kurdi”, “irani”, “midyadi”, “tirkî”, “erebî”, “hertoşî”, “behdînanî”, “bajarî” da xuye dike mensubiyeta kesan bi bal ziman, welat û eşîretan û cihekî ve destnîşan dike (Bedirxan û Lescot, 2004: 287; Kurdo, 1981: 26). Yan jî wekî ku di “îslami”, “mesîhî” da xuya dike navê alîgir û bawermendên dîn û bawerîyan saz dike (Keşanî, 1992: 16). Herwiha ev paşpirtik li navdêran zêde dibe û ji navdêrên şênber (concrete) navdêrên razber (abstract) saz dike (Baban, 2014: 31; Kurdo, 1981: 28). Taybetîyeke din a vê paşgirê jî çêkirina hevalkaran ji hevalnavan e. “Lewra hin hevalnav di kurmancîya

navendî da dikarin bi paşpirtika ‘-î’yê bibin hevalkar. Mîsal: gelek/gelekî, hinek/hinekî, piçek/piçekî” (Muhammed, 2016a: 112-113).

3.18.1. Sazkirina Parengê (Participle)

Di metnên klasîk da yek ji erka paşgira “-î’yê ya morfolojîk û morfo-semantîk sazkirina rewşa parengê anku partîsîpê ye. “Partîsîp ew cureyên peyvên in ku ji karan tîn dariştin û bi peywira hevalnavê tîn bikaranîn” (David, 2008: 351). Partîsîp di gelek cihan da wekî navdêran tîn bikaranîn, erka hevalnavê tînin cih, lê maneya demê jî di nav xwe da diparêzin (Çorbacı, 2012: 41). Di metnên klasîk da jî peyvên “girtî”, “dagirtî”, “gotî”, “hatî” û “kuştî” nimûneyên peyvên dariştî ne ku bi paşgira dariştinê ya partîsîpê saz bûne.

(77) a. “Her kesê ne j’can du’ago û senaxwanê te bit/ **Girtiyê** qeyda te û amancê nûbarê te bî” (Cizîrî, 2019: 284).

b. “Asarê şeca ‘etê wî şahî/ **Dagirtî** ji mah ta bi mahî” (Xanî, 2014: 33).

c. “Tu bi şî’ra ne te **gotî** xwe dikî qed û şeker” (Cizîrî, 2019: 108).

d. “Melekê **hatî** bi xêr hat/ Bi’xizmeta şêxê kubar hat” (Feqî, 2017: 323).

e. “**Kuştîyan** xewn dî liqalib lew bi wê dê xweş bitin” (Cizîrî, 2019: 195).

Di nimûneyên (77a-b)yê da bi vê paşgirê peyvên “girtî” û “dagirtî”yê hatiye dariştin. Yek jê ji kara “girtin”ê û ya din jî ji kara “dagirtin”ê hatiye dariştin. Di (77a)yê da paşgir li rayeka karê zêde bûye, lê di (77b)yê li peyveke dariştî zêde bûye. Ev jî nîşan dide ku paşgira dariştinê ya “-î’yê li peyvên dariştî jî zêde dibe. “Dema morfemeke serbixwe ji yekê zêdetir morfeman bigire ji vê rewşê ra pîrgireyî (multiple affixation) tê gotin” (Plag, 2003: 38). Di peyva “dagirtî”yê da rewşa pîrgireyî heye. Di madeyên (77c-d)yê da ji karên “gotin” û “hatin”ê peyvên “gotî” û “hatî” hatine dariştin. Di vir da ev peyvên dariştî di nav ravekeke hevalnavî da bi erka hevalnava raveker hatine bikaranîn. Di raveka hevalnavî “şî’ra te gotî” da peyva dariştî navdêra “şî’r”ê rave kiriye û di raveka “melekê hatî” da peyva dariştî navdêra “melek”ê rave kiriye. Di nimûneya (77e)yê da ji kara “kuştin”ê peyva “kuştî” hatiye dariştin. Di vê peyvê da paşgira “-î’yê maneya kesê ku hatiye kuştin li rayeka karê bar kiriye.

Di hemû nimûneyan da paşgira “-î’yê bi fonksiyona partîsîpê hatiye bikaranîn. Di rewşa partîsîpê da “peyva nûçêkirî rewşa subjektê dîyar dike gava ew ji kareka teneper

hatibe dariştin û rewşa objektê xuya dike heger eslê wê kareka têper be” (Hirorî, 2005). Di nimûneyên jorîn da jî di madeyên (77a-b-c-e)yê da peyvên dariştî ji karên têper pêk tên. Lewra di pozîsyona berkarê da ne. Di vê peywendê da peyva “girtî”yê wî kesî îfade dike ku hatiye girtin; ne kesê ku karê girtinê pêk anîye. Herwiha “kuştî”jî kesekî destnîşan dike ku hatiye kuştin ne ku karê kuştinê kiriye. Di nimûneya (77d)yê da peyva dariştî ji kareke teneper hatiye dariştin. Di vir da karê “hatin”ê teneper e û peyva “hatî” tê maneya kesê ku hatiye. Lewra jî di pozîsyona navdêra biker da ye.

3.18.2. Nîşandana Taybetîya Razber

Yek ji fonksîyona morfosemantîk a paşgira “-î”yê jî sazkirina navdêrên razber e. Dema ku ev paşgir li hevalnav û navdêrên biker zêde dibe li ser mane û cureya wan tesîrê dike. Di metnên klasîk da peyvên “ciwanî”, “dijewarî”, “dilber”, “perîşanî” û “sextî” bi vê paşgirê hatine dariştin. Van peyvan piştî wergirtina paşgirê maneya razberîyê wergirtiye û di metnê da bi peywira navdêr û hevalkarîyê hatine bikaranîn.

- (78) a. “*Ciwanî û bihar û bax û mehbûb/ Aya di dinê çî maye metlûb*” (Xanî, 2014: 129).
- b. “*Bihî û bû miska nesarî/ Lê dikir pur dijewarî*” (Feqî, 2017: 275).
- c. “*Kifş e mecmû’ û perîşaniyê halê me di dil/ Ji serê zulfa perîşan û ji biska te ye şeng*” (Cizîrî, 2019: 160).
- d. “*Xûbî û dilberî û naz û telettuf bi te şên/ Xusrewa padişehan î we xwidana cebehê*” (Cizîrî, 2019: 145).
- e. “*Li min pirsek bi dildarî/ Dibit hemtayê didarî*” (Cizîrî, 2019: 239).
- f. “*Pur umrê min çû bi sextî/ Lê şukurxwaz im ji bextî*” (Cizîrî, 2019: 250).

Di nimûneyên jorîn da, di madeyên (78a-b-c)yê da peyvên “ciwanî” û “dijewarî/dijwarî” û “perîşanî”yê ji rayekên navdêrên “ciwan” û “dijwar” û “perîşan”ê hatine dariştin. Ev rayek dema di ravekan da cih digirin erka hevalnavîyê tînin cih (*xortê ciwan, rojên dijwar, malbata perîşan*) lêbelê piştî ku van peyvan paşgira “-î”yê wergirtiye wekî navdêrên razber hatine bikaranîn. Di nimûneya (78d)yê da bi vê paşgirê jî peyva “dilber”ê peyva “dilberî”yê hatiye dariştin. Peyva “dilber”ê peyveke pêkhatî ye ku ji du morfemên serbixwe pêk hatiye (dilber) û tê maneya kesê ku dil dibe. Ji ber ku

rayeka dema niha ya kara “*birin*”ê “*ber*” e, lê hin deng jê ketine û tenê dengê “b”yê jê maye (diberim/dibim). Herwiha ev peyv di rola navdêra biker da ye. Lê piştî ku paşgira dariştinê lê zêde bûye maneyeke razber wergirtiye û di metnê da wekî navdêr hatiye bikaranîn. Di nimûneyên (78e-f)yê da jî peyvên dariştî ya “*dildarî*” û “*sextî*”yê bi vê paşgirê saz bûne. Ji ber ku di vir da ev peyv bi alîkarîya daçeka “*bi*”yê kar û tevgerekê rave dikin di nav metnê da erka hevalkarîyê anîne cih.

3.18.3. Şibandin û Jêçêbûn

Paşgira “-î”yê dema li navdêran zêde dibe maneya şibandin û jêçêbûnê dide wan. Di metnên klasîk da peyvên “*elmasî*”, “*yaqûtî*”, “*erxewanî*”, “*enberî*” û “*hîlalî*”yê bi vî awayî hatine dariştin. Van peyvên maneya jêçêbûna ji madenekê û şibandina ji aliyê taybetîyên reng û teşeyî ve daye metnê.

- (79) a. “*Şîrê elmasî kişînit tu ji lami’ da xeber/ Vekirit huqqe’ê yaqût-i ji gewher meke behs*” (Cizîrî, 2019: 78).
- b. “*Neqşê elmasî li elmas-i binê girtiye herf/ Xetê yaqûtî li yaqûtî şikênandiye nerx*” (Cizîrî, 2019: 95).
- c. “*Şahidên gulreng-i saqî belkî nîsrîn in beşer/ Ê di lebsê erxewanî nêrgizên ‘er’erxîram*” (Cizîrî, 2019: 169).
- d. “*Sef bi sef wildan perî bûn/ Bendê zulfa ‘enberî bûn*” (Cizîrî, 2019: 205).
- e. “*Gezmeyên qewsên hîlalî/ Derb li nîva sîne ye*” (Cizîrî, 2019: 209).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (79a)yê da paşgira dariştinê ya “î”yê li navdêra “*elmas*”ê zêde bûye û hem cureya wê hem jî maneya wê guherandiye. Lewra peyva *elmasî* dariştî ye, tiştên wekî *elmas* an jî *elmas* çêbûyî îfade dike. Ji aliyê peywirê ve vê peyvê di nav metnê da di raveka “*şîrê elmasî*” da rola hevalnava raveker anîyê cih. Di nimûneyên (79b-c)yê da vê paşgirê maneya şibandina reng daye. Bi peyva “*yaqûtî*” rengê wekî *yaqûtî* hatiye îfadekirin. Ji ber ku “*yaqut* kevîrekî giranbiha ye, rengên wî yê cuda hebin jî di nav wan da yê herî biqîmet yê sor e (Yeşilbağ, 2019: 706). Di vir da ev peyva dariştî piştî navdêra “*xet*”ê hatiye û bi rola hevalnavîyê ew rave kiriye. Peyva din a ku reng îfade kiriye peyva dariştî ya “*erxewanî*” ye. Ev peyv jî ji rayeka “*erxewan*”ê hatiye dariştin. “*Erxewan* kulîlkeke rengê wê sor e, *erxewanî* jî wan tiştan îfade dike ku

wekî vê kulîlkê xweşik in û di rengê sor ê berqokî da ne (Parlatır, 2006: 409). Di nimûneya (79d)yê da bi paşgira “-î”yê peyva “*ember*”ê hatiye dariştin. Paşgira dariştinê maneya şibandinê daye vê peyvê. Ji ber ku “*erxewanî*” wan tiştan îfade dike ku bîna wan wekî *erxewanê* ye. Peyva din a ku bi vê paşgirê hatiye dariştin peyva “*hîlalî*” ye. Di vê peyvê da paşgira dariştinê li navdêra “*hîlal*”ê zêde bûye, ji aliyê peywirê ve ew kiriye hevalnav û ji aliyê semantîk ve jî maneya şibandinê daye navdêrê. Di vir da şibandin ji aliyê taybetîyeke fîzîkî ve hatiye kirin. Lewra peyva dariştî “*hîlalî*” navdêra qewsê rave kiriye û bi hîlalê hatiye şibandin.

3.18.4. Mensûbîyeta Dîn, Ziman û Devokekê

Paşgira “-î”yê di hin navdêran da maneya aîdbûn û mensûbîyetê dide. Taybetîyên wekî dîn, bawerî yan jî devok û zimanan li navdêran bar dike. Di metnên klasîk da peyvên “*kurdî*”, “*kurmancî*”, “*bohtî*”, “*mehmedî*”, “*silivî*”, “*muhammedî*”, “*îsewî*” û “*sunetî*”yê bi vê paşgirê hatine dariştin.

- (80) a. “*Kurdî ‘Erebî Derî û Tazî/ Terkîb-i kirin bi hezî û bazî*” (Xanî, 2014: 201).
 b. “*Saftî şemirandî vexwarî durdî/ Manendê durê lisanê kurdî*” (Xanî, 2014: 22).
 c. “*Ev meywe eger ne abdar e/ Kurmancî ye ev qeder li kar e*” (Xanî, 2014: 30).
 d. “*Bohtî û mehmedî û silivî/ Hin le’l û hinek ji zêr û zîvî*” (Xanî, 2014: 201).
 e. “*Muhemmedî naxut li min/ Ez îsewî tu sunetî*” (Feqî, 2017: 302).

Di nimûneyên (80a-b-c)yê da bi vê paşgirê navê ziman û zarava hatiye dariştin. Di van beytan da peyvên dariştî yên “*kurdî*”, “*kurmancî*”, “*erebî*”, “*derî*” û “*tazî*”yê her yek navê zimanekî îfade dikin. Di van peyvên da paşgira “-î”yê maneya mensûbîyetê daye û di peywenda metnê da navê ziman destnîşan dikin. Lewra dema peyva “*kurmancî*” tê gotin “*zimanê kurmancî*” anku zimanê aîdê kurmancan tê qesdkirin. Jixwe di nimûneya (80b)yê da navê ziman (80b) wekî “*lisanê kurdî*” yanî “*zimanê kurdî*” hatiye îfadekirin. Herwiha di vir da “*derî*” zimanê farisî û “*tazî*” jî zimanê erebî ye (Dost, 2010: 679). Zimanê tazî li vir li cihê zimanê erebî hatiye bikaranîn, lê di eslê xwe da tazî ew devok e ku qebîleya ereban a bi navê “*Tey*” pê diaxive (Yıldırım, 2014: 404). Di nimûneya (80d)yê da bi vê paşgirê navên devokên “*bohtî*”, “*mehmedî*” û “*silivî*”yê hatine dariştin. Di nimûneya (80e)yê da bi paşgira “-î”yê navên dîn û bawerîyan hatine dariştin û di vê

peywendê da peyvên dariştî “*muhemmedî*”, “*îsewî*” û “*sunetî*”yê saz bûne. Di vir da “*Muhammedî*” û “*Sunetî*” wan kesan destnîşan dikin ku pewrewên pêxemberê dînê Îslamê û kesên li ser şopa wî ne. “*Îsewî*” jî kesên mensûbên dînê xiristîyanîyê destnîşan dike.

3.18.5. Mensûbîyeta Cih û Welat

Yek ji fonksiyonên paşgira “-î”yê ew e ku dema li navdêran zêde dibe maneya mensûbîyeta cih, herêm û welat li wan zêde dike. Bazidî jî balê dikişîne ser vê paşgirê û dîyar dike ku “-î” mensûbîyeta cih û deveran nîşan dide (bajarî, gundî, mîrî, bexdayî) (Bazidî, 2019: 24). Di metnên klasîk da peyvên “*misrî*”, “*miksî*”, “*kurdistanî*”, “*tetarî*” bi vî awayî hatine dariştin û ev peyv di nav metnê da bi peywira hevalnavîyê hatine bikaranîn.

(81) a. “*Şukur bînahiya min hat û Ye’qûb dîde rewşen bû/ Bi boya Yûsifê Misrî li Ken’anî beser pê da*” (Cizîrî, 2019: 27).

b. “*Qewlê di Miksî sabitin/ Heta qiyamet rabitin*” (Feqî, 2017: 342).

c. “*Dastana Beyana Newroza Sultanî Tesemmayê Mewsîmê Surûr û Rusumanî Bi Mersûmê Qedîmê kurdistanî*” (Xanî, 2014: 41).

d. “*Her lehze ji nefeyêd tetarî/ Sed bare ji turreyan dibarî*” (Xanî, 2014: 132).

e. “*Li nûrê miskê tetarî/ Li ser wan xemrîyan barî*” (Cizîrî, 2019: 192).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (81a)yê da peyva “*misrî*” hatiye dariştin. Di vir da paşgira “-î”yê li navdêra “*Misr*”ê zêde bûye û peyva dariştî ya “*misrî*” saz bûye. Vê peyvê di metnê da, di nav raveka “*Yûsivê Misrî*” da cih girtiye û erka hevalnava raveker anîye cih. Ji alîyê maneyê ve jî mensûbîyeta kesekî ya bi bal welatekî ve îfade dike. Di nimûneya (81b)yê da paşgira dariştinê li navê bajarekî (Miks) zêde bûye û peyva ku hatiye dariştin (miksî) mirovekî îfade dike ku ji wî bajarî ye. Di nimûneya (81c)yê da paşgira dariştinê li navê welatekî (Kurdistan) bar bûye peyva “*kurdistanî*” hatiye dariştin. Di vir da peyva dariştî di nav raveka “*mersûmê qedîmê kurdistanî*”yê da bi peywira hevalnava raveker hatiye bikaranîn. Lewra navdêra “*mersûm*”ê rave kiriye. Di nimûneyên (81d-e)yê da bi vê paşgirê ji navdêra “*tetar*”ê peyva “*tetarî*”yê hatiye dariştin. Di vir da ev peyv di nav ravekên “*nefayêd tetarî*” û “*miskê tetarî*”yê da maneya wan nefa û miskên

aîdê gelê tetar û welatê wan îfade dike û bi vî awayî mensûbîyeta wan destnîşan dike û wan rave dike.

3.19. -În

Paşgira “-în”ê bi fonksiyona dariştinê li navdêr, hevalnav, hevalkar û karan zêde dibe û li ser maneya wan tesîrê dike carinan jî cureya peyvê diguherîne. “Bi taybetî bi saya vê paşgirê navên nû dikarin ji binyata navan çêbibin. Mîna peyva îngilîzî ya “golden” (gold-en: zêrîn) ev şewaza çêkirina navan di gelek zimanên hindo-ewropî da jî heye” (Kaval, 2022: 13). “Ev paşgir ji alîyê peywîrê ve jî ji navdêrê hevalnav, (rengîn, bengîn, şermîn) ji navdêrê navdêr (berfîn, rojîn) û ji hevalkarê hevalkarê (pêşîn, paşîn, jorîn)” saz dike (Zilan, 2006b: 7). Erkeke vê paşgirê jî ew e ku dema li navdêran zêde dibe maneya jêçêbûnê dide wan. Lewra ev paşgir dide zanîn ku filan tişt ji filan tiştî çêbûye yan jî taybetîya tiştan û merivan nîşan dide (darîn, zêrîn, cawîn, arîn) (Kurdo, 1981: 28). Ji xeynî navdêr, hevalnav û hevalkaran ev paşgir li rayeka karan jî zêde dibe û ji alîyê avaniyê (voice) ve wan diguherîne. Dema paşgira “-în”ê li rayeka karên teneper zêde dibe ku di forma dema niha da ne, wan karan dike têper (di-fir-în-e). Bi taybetî karên teneper ku paşgira “-and”ê digirin û di dema borî da dibin têper (bez-and) û di dema niha da jî bi vê paşgirê dibin têper (di-bez-în-e). Wekî ku Keşanî bal kişandiye ser, di farisî da jî ev paşgir pir aktîf e û heman maneyê dide. Lewra dema li navdêran zêde dibe wan dike hevalnav û maneya taybetîya cinsê wan (çûpî/darîn, ebrîşimîn/hevrîşimîn) û rengê wan (zerîn, gulîn, sîmîn) nîşan dide, navên razber saz dike û hal û rewşê (şermîn, xemîn) beyan dike û carinan jî di peyvê da astê destnîşan dike (bozorgtirîn, kêmtirîn, bedtirîn) (Keşanî, 1992: 36, 37).

Di metnên klasîk da ev paşgir li navdêr, hevalkar û karan zêde bûye. Ji alîyê peywîrê ve jî navdêran hevalnav, ji hevalkaran hevalkar û ji karan jî kar saz kirine. Ji alîyê semantîk ve jî paşgira “-în”ê maneya şibandin û jêçêbûnê, erka nîşandana rewşê û cih û hêlê û têperbûnê anîye cih.

3.19.1. Şibandin û Jêçêbûn

Paşgira “-în”ê dema li navdêran zêde dibe hem li ser cureya wan hem li ser maneya wan tesîrê dike. Di metnên klasîk da vê paşgirê ji aliyê semantîk ve maneya şibandin û jêçêbûnê li navdêran bar kiriye. Şibandin ji aliyê çêj, bîn û reng, dirûv û statûya malbatî ve hatiye kirin û maneya jêçêbûnê jî bi awayê destnîşankirina madenê ku alavek jê çêbûye hatiye kirin. Peyvên wekî “şîrîn”, “şekirîn”, “enberîn”, “zêrîn”, “dayîn”ê bi vê rêbazê hatine dariştin.

- (82) a. “*Ew şerbet eger şîrîn e xam e/ W’er tehl e û tirş e natemam e*” (Xanî, 2014: 207).
- b. “*Me dizanî ku tu dê ‘aqibeti’l-emrî çi kî/ Lebê le’lê şekirîn ahi ko mexrûr-i kirîn*” (Cizîrî, 2019: 180).
- c. “*Zulfa muselsel ‘enberîn/ Çîn çîn ji Çînê tête bac*” (Cizîrî, 2019: 85).
- d. “*Ev lengeriyêd-i zîv û zêrîn/ Şubhet felekîd-i jor û jêrîn*” (Xanî, 2014: 76).
- e. “*Dayîneke wan hebû zemanî/ Teşbihê belayê asîmanî*” (Xanî, 2014: 55).

Di madeyên (82a-b)yê da bi paşgira “-în”ê peyvên “şîrîn” û “şekirîn”ê hatine dariştin. Di van peyvên da paşgira dariştinê ji aliyê çêjê ve maneya wekîbûnê daye peyvê. Rayeka peyva “şîrîn”ê “şîr” e û “şîrîn” tê maneya wê tiştê wekî şîr yanî çêja wê wekî ya şîr” (Kerim, 2019: 458). Di vir da paşgira dariştinê maneya şibandinê daye navdêrê û peyva dariştî di nav metnê da wekî hevalnaveke dîyarker navdêra şerbetê rave kiriye. Peyva “şekirîn” jî wî tiştî nîşan dide ku çêja wê wekî ya şeker e. Di vê peywendê da ev peyv di nav raveka “le’lê şekirîn” da derbas dibe û maneya lêvên sor ên wekî şeker daye ravekê. Di nimûneya (82c)yê da paşgira “-în”ê maneya şibandina ji aliyê bînê ve daye peyvê. Lewra peyva dariştî “enberîn” tê maneya wê tiştê ku bîna wê wekî enberê yanî miskê ye. Di nimûneya (82d)yê da paşgira dariştinê li navdêra “zêr”ê zêde bûye û ji navdêrê hevalnav saz kiriye. Di vir da peyva dariştî “zêrîn” bi awayê “lengeriyêd zêrîn” di nav raveka hevalnavî da hatiye bikaranîn. Ji aliyê semantîk ve jî paşgirê maneya jêçêbûnê daye navdêrê. Di nimûneya (82e)yê da ji rayeka navdêra “da/dê”yê bi zêdebûna paşgira “-î”yê peyva “dayîn”ê hatiye dariştin. Rayeka peyvê statûyeke malbatî îfade dike, lê bi zêdebûna paşgira dariştinê peyva “dayîn”ê saz bûye ku navê kar û pîşeyekê nîşan dide. Ji aliyê semantîk ve di vê peyvê da paşgirê maneya wekîbûn û şibandinê li navdêrê

zêde kiriye. “Lewra ‘dayîn’ ew jin e ku li dewsa dê, li zaroyan dinihêrê û wan perwerde dike (Demir, 2021: 125).

3.19.2. Nîşandana Taybetîyên Dîtbarî û Rewşê

Paşgira “-î”yê dema li navdêran zêde dibe maneya taybetîyên şênber û razber li wan bar dike. Ev taybetî reng û dirûvê tiştan an jî hal û rewşa wan nîşan dide. Di metnên klasîk da peyvên “*dêmnûrîn*”, “*ateşîn*”, “*şevîn*”, “*rengîn*”, “*şermîn*” û “*çavîn*”ê di vê peywendê da bi vê paşgirê hatine dariştin.

(83) a. “*Me’şûq di surrîrîn dibin/ Mehbûbê demnûrîn dibin*” (Feqî, 2017: 281).

b. “*Gurzê xwe yê ateşîn deranî/ Tîxê xwe yê zerfeşan ku danî*” (Xanî, 2014: 155).

c. “*Şahî cevîn xem jî revîn/ Marê şevîn îsand evîn*” (Xanî, 2014: 225).

d. “*Şeyba sipî rengîn dibû/ Ew reng û hal qet jê netê*” (Feqî, 2017: 255).

e. “*Wan get nezani hal çiyê/ Hem’yan di got çavînî ye*” (Feqî, 2017: 36).

f. “*J’yar û biran şermîn kirim/ Wirdek xiyala min netê*” (Feqî, 2017: 262).

Di nimûneyên (83a-b-c-d)yê da ji navdêran peyvên “*dêmnûrîn*”, “*ateşîn*”, “*şevîn*”, “*rengîn*”ê hatine dariştin û di metnê da bi peywira hevalnavê hatine bikaranîn. Di van peyvên da jî paşgira “-în”ê ji aliyê reng û dirûvê ve maneya wekîbûnê yanî şibandîne daye navdêran. Peyva “*dêmnûrîn*” dêmên wekî nûrê xweşik û birqok, “*ateşîn*” gurzê wekî agir dijwar, “*şevîn*” marê wekî şevê reş û peyva “*rengîn*”ê jî tabûta bireng îfade kiriye. Di nimûneyên (83e-f)yê da peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin taybetîya razber û rewşê nîşan didin. Di peyva “*çavîn*”ê da paşgir “-î”yê li navdêra “*çav*”ê zêde bûye û peyva dariştî “*çavîn*” hatiye dariştin. Vê peyva dariştî piştî ku paşgira dariştinê ya “-î”yê jî wergirtiye di nav metnê da bi peywira navdêrê hatiye bikaranîn. Peyva “*şermîn*”ê ji navdêra “*şerm*”ê hatiye dariştin û paşgira dariştinê rewş û taybetîya mirovekî nîşan dide.

3.19.3. Nîşandana Cih û Hêlê

Yek ji fonksiyona paşgira “-în”ê jî dariştina hevalkaran e. Dema ev paşgir li peyvên wekî jêr, jor, paş, pêş zêde dibe hevalkaran saz dike. Di metnên klasîk da peyvên

“jêrîn”, “pêşîn” û “paşîn” bi vê paşgirê hatine dariştin û di nav metnê da bi erka hevalnav û hevalkarê hatine bikaranîn û ji aliyê maneyê ve jî cih û hêl nîşan dane.

(84) a. “*Ev lengeriyêd-i zîv û zêrîn/ Şubhet felekêd-i jor û jêrîn*” (Xanî, 2014: 76).

b. “*Lebşekera dur di dev e/ Got xebera paşîn ev e*” (Feqî, 2017: 305).

c. “*Mîrim me nego ji bo te pêşîn/ Tacdîn û biran ji xwe meêşîn*” (Xanî, 2014: 157).

Peyvên “jêr”, “pêş”, “paş” di eslê xwe da jixwe cih û hêlê destnîşan dikin. Ev peyv di nav metnê da bi veguhêzîyê bi peywira navdêr, hevalnav, hevalkarê tên bikaranîn. Lewra jî peyva “pêş”ê dema di nav hevoka “*dar li pêşîya malê ye*” da bê di fonksîyona navdêrî da tê. Dema wekî “*roja pêşî min ji te ra got*” be, bi fonksîyona navdêrî û dema wekî “*Pêşî ez hatim*” be bi fonksîyona hevalkarî tê bikaranîn. Yanî wextê ku ev peyv paşgira “-în”ê werdigirin di mane û cureya wan da guherîn pêk tê. Di vê çarçoveyê da, di nimûneya (84a-b)yê da peyva dariştî ya “jêrîn”ê piştî navdêra “felaket”ê hatiye û ew rave kiriye û peyva dariştî ya “paşîn”ê jî piştî navdêra “xeber”ê hatiye, ew rave kiriye. Ji ber vê yekê jî di van nimûneyan da peyvên dariştî peywira hevalnavê aniyê cih. Di nimûneya (84c)yê da peyva dariştî ya “pêşîn” e. Ji ber ku vê peyvê di nav metnê da kar û tevgera ku hatiye kirin (gotin) rave kiriye wekî hevalkar hatiye bikaranîn.

3.19.4. Têperkirina Karan

Yek ji fonksiyonên paşgira “în”ê erka têperkirina karên teneper e. Dema ev paşgir li rayekên teneper ên dema niha zêde dibe wan dike têper. Di metnên klasîk da, di karên “bigihîne”, “bireşîne”, “radihejîne” û “bikişîne”yê da vê paşgirê erka têperkirinê aniyê cih.

(85) a. “*Ey nesîmê seherê ma di mecala sibehê/ Sed selaman bigehîni ji me wê padişehê*” (Cizîrî, 2019: 244).

b. *Qıştên di xwe çîn çîn bide ber misk û zabadê/ Tayên di ‘isabê bireşînin bi gulabê*” (Cizîrî, 2019: 246).

c. “*Hubba te ye min radihejîni ko binalim/ Şeb ta bi seher nale ji rengê ceres im ez*” (Cizîrî, 2019: 109).

d. “*Ma ji dîwanê se’adet seh kirî şubhê Melayî/ Tu bi navê mi gedayî bikişîne qelemê*” (Cizîrî, 2019: 237).

Di nimûneya (85a)yê da paşgira “-în”ê li rayeka kara dema niha ya “*gihan*”ê zêde bûye û ew kiriye têper. Kara “*gihan*”ê bêyî ku paşgira “-în”yê lê zêde bibe têneper e û nikare berkarê rasterast (direct object) bigire (Mirov bi balafirê zûtir *digihe* qonaxa xwe.). Dema ku ev kar paşgira “-în”ê werdigire dibe têper û dikare berkara rasterast bigire (Pilot dikare balafirê bi ewlehî *bigihîne* balafirgehê.). Di nimûneyên din da jî ev paşgir vê fonksiyonê tîne cih. Di (85b)yê da “*bireşîne*” di (85c)yê da “*radihejîne*” û di (85d)yê da kara “*dikişîne*”yê bi vî awayî hatine dariştin.

3.20. -Van/Wan

Koka vê paşgirê digihe peyva “*pane*”yê ku digihe sanskrîtî û avestayî û tê maneya parastin û nobedarîyê. Ev peyv di pehlewî da wekî “*pan*”ê di farisî da “*ban*”ê û di kurmancî da bûye “*wan/van*”(Dehxuda, 1962b: 1979). Peyva “*şivan*”ê ji peyvên hindoeuropayîya paşîn ên “*psu*” (pez) û “*pana*”yê (parêzker) pêk tê û tê maneya kesê ku çavdêrîya pez dike (Şahîn, 2020: 179). Wekî di nimûneya jorîn da xuya dike ev paşgir berê wekî morfemeke serbixwe ye, lê di nav pêvajoya demê da guherîye û bûye morfemeke bendî. Ev paşgir dema ku li navdêran zêde dibe ji van navdêran navdêrên nû çêdike û bi taybetî di dariştina navê pîşeyan da xwedîyê roleke giring e (Emîn, 2011: 45). Peyva ku vê paşgirê digire kesekî destnîşan dike ku ji karekî baş fam dike, ew şixul ji destê wî tê û xwedîyê wî karî ye (nêçîrvan, baxvan, listikvan) yan jî kesê ku ji lêdana alaveke muzîkê fam dike û bi wî kar û hunerî radibe (bilûrvan, zirnevan, tembûrvan) (Zîlan, 2006c: 7). Bazîdî morfema “-wan”ê wekî lezf anku morfema serbixwe bi nav kiriye, lê wî jî di tarîfa wê da bi nimûneyên “*kerwan*” û “*rezwan*” bal kişandîye ser erka wê ya sazkirina navên karan (2019: 32).

3.20.1. Pîşe, Parastin û Pêkanîna Karekî

Di metnên klasîk da paşgira “-wan”ê li rayekên navdêran zêde bûye û ji van navdêran navdêrên nû saz kirine ku ji aliyê maneyê ve kes û tiştekî destnîşan dikin ku karekî pêk tînin, di wî karî da pispor in an jî wekî pîşeyekê wî karî dimeşînin. Peyvên

“*dergevan*”, “*gavan*”, “*aşevan*”, “*rezvan*” û “*seywan*”ê di vê peywendê da bi vê paşgirê hatine dariştin.

(86) a. “*Law bi wî lîpî nizanî/ Bê fikir ew çûye banî/ Derke dada **dergevanî**/ Ev çi bela bû law ketê*” (Feqî, 2017: 402).

b. “*Dam û ded û Ademî û heywan/ Tifl û sebî û **aşevan** û **rezvan***” (Xanî, 2014: 118).

c. “*Şêxê **gavanê** berazan/ Seh fikir wî zikr û sazan*” (Feqî, 2017: 322).

d. “*Wî li ser bejna te ev **seywan** veda/ Wer ne nade roj-i **seywanê** xelet*” (Cizîrî, 2019: 141).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (86a)yê da paşgira dariştinê ya “-van”ê li navdêra “*derge/dergeh*”ê zêde bûye û peyva “*dergevan*” hatiye dariştin. Di vê peyvê da paşgira dariştinê mirovekî destnîşan dike ku li ber derîyekî wezîfedar e. Di nimûneya (86b)yê da bi vê paşgirê peyvên “*aşevan/aşvan*” û “*rezvan*” hatine dariştin. Di vir da peyvên sade “*aş*” û “*rez*” navê cihekî yan jî kargehekê îfade dikin. Lê paşgirê maneya wan guherandiye. Peyva “*aşvan*”ê tê maneya wî kesê ku li aş dixebite yan jî xwedî û rêvebirê wir e û rezvan ew kes e ku li nobedarîya bax û bexçeyekî yan jî hildan û danîna wî dike. Di nimûneya (86c)yê da piştî ku paşgira “van”ê li navdêra “*ga*”yê zêde bûye maneya wê guherandiye. Ji ber ku “*ga*” tê maneya dewarê nêr, lê “*gavan*” ew kes e ku dewêr diçêrîne (Demîrhan, 2007: 127, 128) yan jî wekî pîşeyekê karê parastin û nobedarîya wî dike. Di nimûneya (86d)yê da ji peyva “*sî*”yê peyva “*sîwan*”ê hatiye dariştin. ‘*Sîwan*’ ew ronî û tîrêjên rengîn ên li dora tiştêkî, xeleka ronîyê ya dora hîvê yan jî ew tişt e ku sîyê dide derdorê (Alparslan, 2021: 300). Ev mane bi paşgira dariştinê li rayeka peyvê bar bûne.

3.21. War/Wer

Morfema “-war/wer” bi erka dariştinê li peyvên sade zêde dibe ji wan peyvên nû saz dike. Carinan di hin peyvên da tîpeke dengdêr tê ser vê paşgirê dibe. Di kurmancî da, dema ev paşgir li navdêran zêde dibe ji wan, navdêrên nû çêdike û bêhtir maneya kesê ku bi wî karî radibe (bendewar, bextewar, bîrewer, serwer) dide peyvên” (Baran, 2012: 307). Herwiha paşgira “-wer”ê hevalnavên wiha saz dike ku rewş û taybetîya kesan nîşan dide û wekî ku di peyvên “*umîdwar*”, “*sezawar*” û “*merdwar*” da xuya dike maneya şibandîne

li kar û tevgerê bar dike (Keşanî, 1992: 41, 49). Wekî kurdo jî balê dikişîne ser peyvên ku bi vê paşgirê saz dibin taybetî û kirina karekî yan jî tiştêkî destnîşan dikin û karê ku pêk tê aşkere dikin (berxvan, gavan, dergevan, aşvan, nêçîrvan) (Kurdo, 1981: 26).

Paşgira “-war/-wer”ê di metnên klasîk da li navdêran zêde dibe, ji wan navdêran peyvên nû saz dike. Navdêrên ku vê paşgirê werdigirin ji aliyê peywirê ve wekî navdêr, hevalnav tên bikaranîn û ji aliyê maneyê ve jî yan rewş û taybetîyê yan jî xûy û xisletê destnîşan dikin.

3.21.1. Nîşandana Rewş û Taybetîyê

Paşgira “-war/-wer”ê dema li navdêran zêde dibe maneya wan carinan jî hem maneya wan û hem curaya wan diguherîne. Lewra navdêrên ku vê paşgirê digirin carinan wekî navdêr û carinan jî wekî hevalnav tên bikaranîn. Ev paşgir li navdêrên wekî “kurd”, “seza”, “can”, “sedef” û “ser”ê zêde dibe û digel cureguherînê maneya destnîşankirina rewş û taybetîyê li wan bar dike.

- (87) a. “*Kurmanc im û kûhî û kenarî/ Van çend xeberêd-i Kurdewarî*” (Xanî, 2014: 31).
- b. “*Teqwiyetê wan bibit mededkar/ Teb’iyyetê wan biket sezawar*” (Xanî, 2014: 199).
- c. “*Alem hemî pê bin hesed/ Insan û cin û canewer*” (Cizîrî, 2019: 106).
- d. “*Dîtin ku di sahilê sedefwar/ Ew xerqeyê behrê ‘îşqê xwînxwar*” (Xanî, 2014: 175).
- e. “*Bi zatekî sadiq gihan/ Bi serwerê Xilafetê*” (Feqî, 2017: 313).

Di nimûneyên jorîn da, di nimûneya (87a)yê da paşgira dariştinê wekî “-ewar”ê li navdêra “kurd”ê zêde bûye. Di vê peyvê da paşgira dariştinê hem erka guherîna cureyê hem erka guherîna maneyê pêk anîyê. Lewra peyva sade (kurd) navdêr e, lê peyva ku hatiye dariştin (kurdewar) di nav raveka hevalnavî da (xeberêd kurdewar) erka hevalnava raveker anîye cih û ji aliyê semantîk ve jî maneya destnîşankirina taybetîyê li navdêrê bar kiriye. Di nimûneya (87b)yê da paşgira dariştinê bi awayê “awar” bi navdêra “seza”yê ve bûye û peyva “sezawar” saz bûye. Di vir da peyva dariştî bi peywira hevalnavê hatiye bikaranîn û paşgirê maneya xwedîtîya taybetîyekê li navdêrê bar kiriye. Lewra “seza”

qîmet e û “*sezawar*” wî tiştê xwedîqîmet îfade dike. Di nimûneya (87c-d)yê da bi paşgira dariştinê peyvên “*canewer*” û “*sedefwar*” saz bûne. Di van peyvên da paşgirê maneya xwedîbûna taybetîyekê li navdêrê bar kiriye. Peyva “*caniwer*” kesên xwedîyê can û peyva “*sedefwar*” jî cihê ku sedef lê peyda dibin an cihê wekî sedefan îfade dike. Di nimûneya (87e)yê da paşgira “*-wer*”ê li navdêra “*ser*”ê zêde bûye û ji vê navdêrê navdêra “*serwer*”ê hatiye dariştin. Di vir da ji aliyê peywîrê ve peyva dariştî di nav raveka navdêrî ya “*serwerê xilafetê*” da wekî raveber hatiye bikaranîn. Ji aliyê maneyê ve jî peyva dariştî (serwer) mirovekî îfade dike ku bi rol û peywîra serok û rêberekî radibe û temsîliyeta bîr û bawerîyekê dike.

3.21.2. Nîşandana Xûy û Xisletê

Paşgira dariştinê ya “*war/wer*”ê dema li navdêran zêde dibe maneya xwedîbûna xûy û xisletê dide wan. Di vê peywendê da taybetîya ku tê destnîşankirin rewş û tevgerê domdar e ku bi mirovan ra peyda dibe. Di metnên klasîk da peyvên “*dilawer*”, “*kînewer*” û “*umîdwar*” di vê kategorîya semantîk da hatine dariştin.

(88) a. “*Yan şubhetê Tacdîn di cebbar/ Qettal û dilawer û cegerdar*” (Xanî, 2014: 199).

b. “*Ev kînewerê xebîs û mudbir/ Ye ‘nî Bekirê bi dil muzewwir*” (Xanî, 2014: 95).

c. “*Ger kafîr û ger gunahkar in/ Bi ‘l-cumle ji te umîdwar in*” (Xanî, 2014: 17).

Di nimûneyên jorîn da bi paşgira “*-wer*”ê peyva “*dilawer*”ê saz bûye. “*Ev peyv tê maneya kesê xudandil û cerg*” (Cîhanî, 773) lêbelê di peywenda metnê da ev peyv bi maneya kesê dilêr û egîd hatiye bikaranîn ku ev mane bi paşgira dariştinê li navdêra “*dil*”ê bar bûye. Ji aliyê peywîrê ve jî di metnê da bi erka hevalnava raveker hatiye bikaranîn. Lewra bi vê peyvê taybetîyeke Tacdîn hatiye destnîşankirin. Di nimûneya (88b)yê da ji navdêra “*kîn*”ê peyva “*kînewer*”ê hatiye dariştin. Ev peyv di vê mînakê da, di nav raveka navdêrî da (kînewerê xebîs) bi peywîra navdêrê hatiye bikaranîn û ji aliyê maneyê ve jî xwedîtîya reftar û xisleteke mîrov nîşan dide. Di nimûneya (88c)yê da bi vê paşgirê peyva “*umîdwar*” hatiye dariştin û di metnê da bi peywîra hevalnava temamker hatiye bikaranîn. Ev paşgir ji aliyê semantîk ve jî maneya kesê hêvîdar anku xwedîyê hêvî li navdêrê bar kiriye.

3.22. -Yar

Morfema “yar”ê bi erka dariştinê li navdêr û karan bar dibe û navdêrên biker saz dike. Li gorî Muhammed ev paşgir ne ji peyvva “yar”ê ya ku tê maneya “dost”, “evîndar”, “aşiq”, “maşûq”ê ev morfem, formeke “nermbûyî” ya paşpirtika “-dar”ê ye. Bo nimûne hişyar anku kesê xwedîhiş û xwedîaqil yanî “aqildar” (Muhammed, 2016a: 85). Ev paşgir tê ser navdêran û ji wan, navdêrên nû çêdike. Bêhtir maneya kesê ku bi karekî radibe dide peyvan” (Baran, 2012: 307). Navdêrên ku bi vê paşgirê saz dibin rewş û taybetîya kesekî an jî tiştêkî (cotyar, hişyar, pirsyar, bextyar) destnîşan dikin (Kurdo, 1981: 26). Ev paşgir bêhtir di sazkirina navdêrên biker da aktîf e, lê wekî di peyvva “kiryar” da xuya dike bi awayekî nadir/kêmpeyda û neçalak be jî li hin karan jî zêde dibe (Muhammed, 2016a: 49, 75).

Paşgira “-yar”ê di zimanê farisî da jî bi heman fonksiyona morfolojîk û semantîk li kar e. Lewra wekî ku Keşanî destnîşan dike ev paşgir navdêr biker û hevalnavên ku bi vê paşgirê saz dibin kesekî destnîşan dikin ku di bin fermana mirovekî payebilindtir da karekî dimeşînin (Keşanî, 1992: 63). Di berhemên klasîk da paşgira “-yar”ê li rayeka navdêr û karan zêde bûye û ji wan, navdêrên nû saz kirine. Ji aliyê semantîk ve vê paşgirê maneya xwedîti daye peyvê û rewşa kes û tiştan destnîşan kiriye.

3.22.1. Rewş û Xwedîtî

Di metnên klasîk da paşgira “-yar”ê dema li navdêr û karan zêde bûye ji wan peyvên nû saz kirine. Peyvên ku bi vê paşgirê hatine dariştin di metnê da bi peywira navdêr û hevalnavê hatine bikaranîn. Karên ku ev paşgir li wan zêde bûne ji aliyê morfolojîk ve di forma dema borî da. Ji aliyê semantîk ve jî maneya rewş û xwedîtîyê di van peyvan da derdikeve pêş.

- (89) a. “*Suflewî înam û avêhtim zemîna zulmetê/ Lê ko hişyar im gelo yan xewn e min dîtî bi xwab*” (Cizîrî, 2019: 59).
- b. “*Ey meyxwure hişyar û hey/ Di meclîsa purçeng û ney*” (Feqî, 2017: 309).
- c. “*Min ev mîsal lew bestine/ Hişyar bibin mêr û jin e*” (Feqî, 2017: 357).
- d. “*Zîn dî ku li pencerê dîyar e/ Mihr e li mehê diket nezare*” (Xanî, 2014: 141).
- e. “*Bayê gerand aşê kubar/ Enbersiyah çûne dîyar*” (Feqî, 2017: 287).

f. *“Pirsîyarê li me carek bike şîrîndehenê/ Ku perêhtîne fîraqa te li ser derd û xemê”* (Cizîrî, 2019: 236).

Di nimûneyên (89a-b-c)yê da bi paşgira “-yar”ê peyva “hişyar”ê hatiye dariştin. Di vê peyvê da paşgira dariştinê li navdêra sade ya “hiş”ê zêde bûye. Di van nimûneyan da heman peyv li gorî peywenda metnê bi mane û erkên cuda hatine bikaranîn. Di nimûneya (89a)yê da peyva dariştî bi peywira hevalnava temamker hatiye bikaranîn û maneya kesê nerazayî daye. Di nimûneya (89b)yê da peyva dariştî (hişyar) di nav raveka hevalnavî (meyxurê hişyar) da erka hevalnava raveker anîye cih û maneya kesê li ser hişê xwe daye. Di nimûneya (89c)yê da peyva “hişyar”ê wekî navdêr hatiye bikaranîn û di maneya kesê zana û agahdar da hatiye bikaranîn. Di madeyên (89c-d)yê da bi paşgira “yarê” peyva “dîyar”ê hatiye dariştin. Wekî Raman jî destnîşan dîke peyva “dîyarî”yê têkildarî kara “dîtin”ê ye. (Raman, 2013: 377). Di vir da paşgir li rayeka dema borî ya kar (dî/dît) zêde bûye û peyveke nû saz bûye. “Ji alîyê maneya ferhengî ve peyva ‘dîyar’ê wan kes, lawir an jî tiştan îfade dîke ku xuyayî û li ber çavan in” (Bozarslan, 2011: 764). Di metna jorîn da jî bi vî awayî ev peyv hatiye maneya aşkerebûn û xuyabûnê. Di nimûneya (89f)yê da paşgira dariştinê li rayeka dema borî (pirsî) zêde bûye û peyva “pirsîyar”ê hatiye dariştin. Di vir da peyva dariştî bi peywira navdêrê hatiye bikaranîn û maneya tiştê ku hatiye pirsîn an jî kar û tevgera pirsîn daye metnê.

ENCAM

Ev xebat ji destpêk û sê beşan pêk tê. Di beşa yekem da derheqê teorî, rêbaz û teknîkên zimannasîyê û morfeman da agahî hatine dayîn. Di beşa duyem da pêşgirên dariştinê û di beşa sêyem da paşgirên dariştinê hatine analîzkirin. Di dawîya xebatê da rejeya gireyên dariştinê wekî grafîk hatiye dayîn û listeya hemû peyvên dariştî wekî îndeks li dawîya xebatê hatiye zêdekirin. Peyvên dariştî li gorî fonksiyona morfosemantîk a gireyên dariştinê hatine kategorîzekirin û di her kategorîyê da analîza peyvan a morfolojîk, morfosentaktîk û morfosemantîk hatiye kirin. Di despêka xebatê da digel destnîşankirina hîpoteza tezê hin pirs hatibûn kirin û xebat li ser şopa van pirsan hat kirin. Di encama xebatê da hem di warê peyitandina hîpoteza tezê û hem di warê bersiva van pirsan da ev encam hatin bidestxistin:

- Di metnên xebatê da bi tevahî 284 peyvên ku bi pêşgiran û 536 peyvên ku bi paşgiran saz bûne hatine tesbîtîkirin. Ji aliyê rêjeyê ve hejmara paşgirên dariştinê ji pêşgirên dariştinê zêdetir e. Di nav paşgirên dariştinê da paşgira ku herî zêde peyv saz kirine paşgira “*i/tî*”yê (% 38, 38) û ya ku herî kêr hatiye bikaranîn jî paşgira “*-ek*”ê ye (%0, 13). Ji pêşgirên dariştinê jî ji aliyê rêjeyê ve ya ku herî zêde peyv pê hatine dariştin paşgira “*bê*”yê ye (%41, 34) û ya ku herî kêr peyv pê hatine dariştin paşgira “*ba-*”yê ye (%0, 002).
- Bi tevahî di 11 pêşgirên dariştinê da 49 û di 22 paşgirên dariştinê da 40 kategorîyên semantîk hene. Ev kategorî di hin pêşgiran da hevpar in. Yanî di hin peyvan da heman pêşgir eynî maneyê li morfeman bar dîkin.
- Carinan gireyên cuda li gorî peywenda metnê eynî maneyê didin. Wekî nimûne peyva dariştî ya “*berda*”yê wekî ku di nimûneya “*Dilberê berda girînê/ Hestirê wê nazenînê*” (Feqî, 2017: 325) da derbas dibe maneya destpêkirina kar û bûyerekê daye metnê. Herwiha çawa ku di nimûneya “*Narê Surre peyda bitin/ Bayê mecaz lê rabitin*” (Feqî, 2017: 280) da derbas dibe bi paşgira “*-ra*”yê peyva “*rabûn*”ê hatiye dariştin û di vir da jî pêşgirê maneya destpêkirina kar û

bûyerekê daye metnê. Di malika “*Te’yîn bibûye ji bo wî textek / Zahir vedibû ji bo me bextek*”ê (Xanî, 2014: 19) da jî eynî mane li kara “*bûn*”ê bi pêşgira “*ve-*”yê bar bûye. Wekî di peyvên “*bibirîn*”, “*bêeyb*”, “*kuldar*” û “*şermede*”yê da jî xuya dike carinan eynî gire heman maneyê dide. Mesela di van peyvên da pêşgirên “*bi-*”, “*bê-*” û paşgirên “*-dar*” û “*-ende*”yê maneyên rewş û xwedîtîyê dane peyvê.

- Carinan eynî gire fonksiyonên cuda tîne cih û mirov nikare ji bo wan nirxandinên giştî bike. Wekî nimûne peyva “*kuldar*”ê ku bi paşgira “*-dar*”ê hatiye dariştin hem xwedîtîyê hem rewşê nîşan dide û kesekî destnîşan dike ku kulên wî hene yanî xwedîkul e û di heman demê da jî rewş û taybetîya wî kesî nîşan dide û erka wesfandinê tîne cih. Heman gire di peyva “*sîlehdar*”ê da kesekî destnîşan dike ku sîleha wî heye yanî xwedîsîleh e lêbelê bi awayê giştîkirinê em nikarin bibêjin ku paşgira darê xwedîtîyê li peyvên bar dike. Lewra peyva “*guhdar*”ê nayê maneya kesê ku guhên wî hene; belkî tê maneya kesê ku kar û tevgera guhdarîyê dike. Dîsa paşgira “*-geh*”ê di gelek nimûneyan da maneya cih û war li navdêran bar dike, lê wekî ku di îfadeya “*Tu sehergeh bi temaşa were bazarê hudûs*”ê da (Cizîrî, 2019: 79) derbas dibe carinan maneya demê dide.
- Di morfolojîya dariştinê ya kurmancîya jorîn da pergaleke sistematîk, bi gotineke din matematîkek heye. Di vî warî da tê dîtin ku gireyên dariştinê li kar, navdêr, hevalnav û hevalkaran zêde dibin. Rêjeya paşgirên ku li karan bar dibin ji ya pêşgirên ku li karan bar dibin zêdetir e.. Di metnên xebatê da tenê şeş paşgirên ku li karan zêde dibin hatine tesbitkirin (a, -andin, -eve, -in, -î, -în). Pêşgirên dariştinê yên ku li karan zêde dibin hem tînen ber karên forma dema borî (dagirt, hilgirt, rabû) hem jî tînen ber ên forma dema niha (hildigirî, radibe, rûnin). Herwiha paşgirên dariştinê jî li karên dema borî (kuştî, bira) û dema niha (bigihîne, bêmeve) zêde dibin.

- Pêşgirên dariştinê hem li karên têper hem li yên teneper zêde dibin. Bi heman awayî paşgirên dariştinê jî carinan li karên têper (bînave) û carinan jî li yên teneper (hateve) zêde dibe.
- Gireyên dariştinê hem tên pêşiya peyvên sade (daketa, rabû) hem ên dariştî (vexwendî, nehişyar) hem jî yên pêkhatî (hevdengî, dilşadî).
- Carinan dema ku pêşgira dariştinê li rayeka karan zêde dibe morfema kêşanê ya dema niha (di-) yan jî ya neyînîyê (ne-) dikeve navbera pêşgira dariştinê û rayeka kar (vedida, venema). Yanî wextê ku morfema dariştinê û ya kêşanê di heman peyvê da bi hev ra peyda bibin morfema dariştinê berî ya kêşanê tê.
- Du pêşgirên dariştinê li pey hev nayên lêbelê du paşgirên dariştinê dikarin li heman morfemê zêde bibin (civandin, kurdistanî). Herwiha hem pêşgir hem paşgir dikarin bi hev ra li morfemekê zêde bibin (wergerand, bêgunchî).
- Hin gireyên dariştinê dema ku li peyvekê zêde dibin ji aliyê deng ve diguherin. Ev guherîn bi taybetî di paşgiran da çêdibe. Dema paşgira dariştinê ya “-in”ê li karêkê zêde dibe ku bi dengdêrekê diqede (firî, girî, çû) tîpa “i”yê ji pêşgirê dikeve dimîne “n” (firîn, girîn, çûn). Paşgira dariştinê ya “-î”yê dema li karêkê zêde dibe ku bi tîpeke dengdêr diqede berî xwe tîpeke alîkar digire. Ev tîpa alîkar carinan “y” (cudayî, balayî, riyayî) carinan “h” (bînahî, ronahî) û carinan jî “w” ye (semawî, îsewî). Herwiha di heman rewşê da tîpa alîkar a “y”yê li paşgira dariştinê ya “-e”yê zêde dibe (daye).

Di çarçoveya van encaman da mirov dikare balê bikişîne ser van taybetîyan û ji bo lêkolînên vê qadê van pêşniyazan bike: Gireyên dariştinê yên kurmancîya jorîn ji aliyê semantîk ve ne xwediyê yek fonksiyonê ne. Heman gire li gorî peywendê, maneyên cuda li morfeman bar dikin. Ji ber vê yekê jî divê di xebatên dariştinê da nirxandinên giştî yên wekî: “filan gire filan maneyê dide” neyên kirin û divê analîza gireyan ne bi rêbaza

teşeparêz, bi rêbaza kargîn bê kirin bi vî awayî dê hemû fonksiyonên semantîk ên gireyan baştir bê famkirin.

Ji ber ku ev tez ne bi rêbaza rêziman ya rêzikparêz, bi rêbaza diskriptîf û şayesî hatiye kirin li ser rastbûn û şaşbûna gireyan nîrxandin nehatine kirin û ji bo çêkirina peyvên nû pêşnîyaz nehatine kirin. Di xebatê da tenê gireyên heyî hatine analîzkirin lêbelê ev kategoriyên fonksiyonên gireyan ên ku hatine dayîn dikarin ji bo xebatên nû yên di warê dariştina peyvan da rêyekî vekin. Wekî mînak, di malika “*Ragirt-i ji bo xwe dergevanek/ Fattanê zemanê seypisanek*”ê (Xanî, 2014: 93) da bi pêşgira “-ra”yê peyva” ragirtinê” hatiye dariştin û di vir da vê pêşgirê girtina mirovekî ya ji bo kar û peywirdarkirina wî li peyvê bar kiriye ku ev fonksiyona gireyan dikare ji bo dariştina peyvên nû yên bi vî awayî bê bikaranîn. Di vê çarçoveyê da tê pêşnîyazkirin ku kes yan jî lijneyên ku li ser çêkirina peyvan dixebitin divê berhemên klasîk li ber çavan bigirin. Berî ku bi gireyêke dariştinê peyvek bê çêkirin eger kategoriyên wê gireyê yên morfosemantîk li ber çavan bînin girtin karê dariştina peyvên nû hêsantir û diristir bibe.

Ev xebat li ser metnên sê helbestvanên klasîk hatiye kirin û ji aliyê dem û metnên xebatê ve sînaordar e. Ji ber ku ziman jî wekî hêmaneke zindî ye û di pêvajoya demê da tê da guherîn çêdibin ji bo hemû kategoriyên semantîk ên gireyên dariştinê bînin tesbîtkirin û şayesandina û taybetîya van gireyên ravekirin divê di vî warî da ji xeynî metnên klasîk li ser metnên wan qaden din jî xebat bînin kirin. Di vî warî da tê hêvîkirin ku ev tez li ber xebatên nû yên di vî warî rêyên nû veke.

ÇAVKANÎ

- Abadî, M. B. Y. (2008). *el-Qamûs 'ul-Mûhît*. Qahîre: Dar'ul-Hedîs.
- Açar, Z. (2019). *Tesîra Helwestê li ser Tercîha Ziman di Jiyana Kurdîzanan de (Nimûneya Wanê)*. (Teza Doktorayê). Enstîtûya Zimanên Jîndar, Bîngol.
- Adak, A. (2015). *Despêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. İstanbul: Nûbihar.
- Ahanov, K. (2021). *Dil Bilimin Esasları (Ceritoğlu-vgz, Murat.)*. Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Akbaş, S. (2020). *Analîzek li ser Rêzimana Kurmanciya Hekariyê*. (Teza Mastirê). Zanîngeha Mûş Alparslanê Enstîtuya Zanistên Civakî, Mûş.
<https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezSorguSonucYeni.jsp>.
- Akçataş, A. û Varol, Ç. (2021). Türkiye Türkçesinde İsimden İsim Yapan Eklerin Morfo-Semantik İşlevleri. *Kesit Akademi Dergisi*, 7(26), 410-427.
<https://dergipark.org.tr/tr/pub/kesitakademi/issue/62240/932779>.
- Aksan, D. (1993). Dilbilimde İşlevci-Biçimci Yaklaşım. *Dilbilim Araştırmaları*, (4), 189-200. <http://dad.boun.edu.tr/en/download/article-file/52769>.
- Aksan, D. (2006). *Anlambilim*. Ankara: Engin.
- Aksan, D. (2015a). *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim (C. 1)*. Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Aksan, D. (2015b). *Her Yönüyle Dil Ana Çizgileriyle Dilbilim (C. 3)*. Ankara: Türk Dil Kurumu.
- Alparslan, E. (2021). *Ferhenga Edebîyata Kurdî ya Klasîk*. (Teza Mastirê). Zanîngeha Dicleyê Enstîtuya Zanistên Civakî, Diyarbakır.
- Amêdî, S. B. (2012). *Rêziamana Kurdî Kurmanciya Jorî û Jêrî ya Hevberkirî*. Xalid Sadîni (Amd.). İstanbul: Dîwan.
- Aydın, M. (2014). *Dilbilim El Kitabı*. İstanbul: Akademik Kitaplar.

- Baban, Ş. (2014). *Rêzimanî Awelnewî*. Hewlêr: Kolejî Endazyarî Zankoyî Selahedîn.
- Bakır, A. (2015). *Rêziman û Peyvsaziya Kurmancî*. Amed: Aram.
- Baran, B. (2012). *Rêzimana Kurmancî*. Diyarbakır: Belkî.
- Bauer, L. (2004). *The Function of Word-Formation and the Inflection-Derivation*. Amsterdam: Vrije Universitesi.
https://www.researchgate.net/publication/255617143_The_Function_of_Word-Formation_and_the_Inflection-Derivation_Distinction.
- Bayrav, S. (1998a). *Filojinin Oluşumu*. İstanbul: Multilingual.
- Bayrav, S. (1998b). *Yapısal Dilbilim*. İstanbul: Multilingual.
- Bazidî, M. M. (2019). *Rêzimana Mela Mehmûdê Bazîdîyî Tûhfetul'l-Xîlan Fî Zimanê Kurdan*. Mîkaîl Bilbil û Mistefa Oztirk (Amd.). İstanbul: Weqfa Mezopotamyayê.
- Bedirxan, C. A. û Lescot, R. (2004). *Kürtçe Gramer*. Stenbol: Avesta.
- Bilbil, M. û Baran, B. (2008). *Rêzimana Kurmancî*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Amedê.
- Binkert, P. J. (2004). *A Glossary of Terminology Used in the Study of Language and Linguistics*. Troy Michigan: The Langtech Corporation.
- Bircan, U. (2015). Saussure'de Dil Dilbilim ve Göstergibilim. *Sosyal Bilimler Araştırma Dergisi*, (25), 43-66.
- Bloomfield, L. (1935). *Language*. London: Allen Unwin.
- Botî, K. (2006). *Ferhenga Kamêran (Kurdî-Kurdî)*. Hewlêr: Spîrêz.
- Bozarslan, M. E. (2011). *Ferhenga Kurdî*. İstanbul: Deng.
- Börekçi, M. û Tepeli, Y. (2013). İşlevsel Dilbilim Yaklaşımıyla Türkçede Sözcük Türleri Üzerine. *Dil ve Edebiyat Dergisi*, 2(7), 93-102.
- Braun, M. (2009). *Word-Formation and Creolisation*. Tübingen: Max Niemeyer Verlag.
- Butler, C. S. (2003). *Structure and Function: A Guide to Three Major Structural-Functional Theories I*. W. Abraham û M. Noonan (Ed.). Amsterdam / Philadelphia: John Benjamins Publishing Company.

Bülbül, M. (2020). Rola paşgira partîsîp di çêkirina raweyên ragihandinê, dananî û mercî da. *Folklor û Ziman*, 1(1), 110-126.

Cîhanî, P. (2013). *Şîroveya Mem û Zîna Ehmedê Xanî*. İstanbul: Nûbihar.

Ciwan, M. (1992). *Türkçe Açılmalı Kürtçe Dilbilgisi*. Sweden: Jîna Nû.

Cizîrî, M. (2019). *Dîwan*. Tehsîn Îbrahîm Doskî (Amd.). İstanbul: Nûbihar.

Çorbacı, E. (2012). *Babürnamede Sıfatlar*. (Yüksek Lisans). Adnan Menderes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü.

<https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezSorguSonucYeni.jsp>.

David, C. (2008). *A Dictionary of Linguistics and Phonetics (Sixth Edition)*. Oxford: Blackwell Publishing.

Dehxuda, E. E. (1962a/1341). Luxetnameyê Dehxuda / Ber Esasê Hurufê Elîfba (Herfê A).

Dehxuda, E. E. (1962b/1341). Luxetnameyê Dehxuda / Ber Esasê Hurufê Elîfba (Herfê Be).

Çapa Dijîtal: Merkezê Tehqîqatê Rayaneyê Qaîmeyê Esfehan.
www.Ghaemiyeh.com.

Dehxuda, E. E. (1962c/1341). Luxetnameyê Dehxuda / Ber Esasê Hurufê Elîfba (Herfê Ce).

Çapa Dijîtal: Merkezê Tehqîqatê Rayaneyê Qaîmeyê Esfehan.
www.Ghaemiyeh.com.

Dehxuda, E. E. (1962d/1341). Luxetnameyê Dehxuda / Ber Esasê Hurufê Elîfba (Herfê Ge).

Çapa Dijîtal: Merkezê Tehqîqatê Rayaneyê Qaîmeyê Esfehan.
www.Ghaemiyeh.com.

Dehxuda, E. E. (1962e/1341). Luxetnameyê Dehxuda / Ber Esasê Hurufê Elîfba (Herfê we).

Çapa Dijîtal: Merkezê Tehqîqatê Rayaneyê Qaîmeyê Esfehan.
www.Ghaemiyeh.com.

Dehxuda, E. E. (1962f/1341). *Luxetnameyê Dehxuda /Ber Esasê Hurufê Elîfba (Herfê Re)*.

Çapa Dijîtal: Merkezê Tehqîqatê Rayaneyê Qaîmeyê Esfehan.
www.Ghaemiyeh.com.

Delikaya, Ö. (2016). *Peyvsazî di Kurmancî de: Nêrîneke Giştî*. (Teza Mastirê).

Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Zindî, Bîngol.

<https://tez.yok.gov.tr/UlusalTezMerkezi/tezSorguSonucYeni.jsp>.

Demir, A. (2021). *Ceribînek li Ser Bêjenasîya Kurdî*. Van: Peywend.

Demîr, P. (2015). *Zazakî de Derheqê Awanî û Antişî yê Karî ser Yew Cîgerayîş*. (Tezê Mastirê). Unîversîteya Çewlîg Enstîtuya Ziwanê ke Cuyenî.

Demirci, K. (2008). Dilbilgiselleşme Üzerine Bir İnceleme. *Bilig-Türk Dünyası Sosyal Bilimler Dergisi*, 0(45), 131-146.
<https://app.trdizin.gov.tr/makale/TnpVMk5qRXg>.

Demîrhan, U. (2007). *Ferhenga Destî Kurdî bi Kurdî*. Doğubeyazıt/Ağrı: Sewad.

Dessales, J. L., Picq, P. û Victorri, B. (2018). *Dilin Kökenleri*. Atakan Altınörs (Wer.). İstanbul: Bilge Kültür-Sanat.

Donka, M. (2018). *English word clipping in a diachronic perspective*. Amsterdam: John Benjamins Publishing Company.

Dost, J. (2010). *Mem û Zîn Şirove û Kurdîya Îro*. İstanbul: Avesta.

Ebdilqadir, Ş. M. (2016). *Rolê Gîreka di Polguhêrîna Peyvê da di kurmanciya Serî (Devoka Behdînan) da*. (Teza Mastirê). Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn.

Ebdulfettah, D. (2011). *Kar (Lêker) Di Zimanê Kurdî de (Kurmanciya Jorîn)*. İstanbul: Enstituya Kurdi ya Amedê.

Ebdulfettah, D. (2018). *Mistek ji Hêvî û Arîşeyên Zimanê Kurdî (Kurmancî)*. Ankara:

Lîs.

- Egro, G. A. (2003). *Arnavutçadaki Türkçe Yapım Ekleri ve Bunların Anlamsal Değerleri*.
Türk Dili Araştırma Yıllığı 47 (199).
<https://dergipark.org.tr/tr/pub/belleten/issue/45111/563700>.
- Emîn, W. U. (2011). *Pîtokekanî Zimanewanî*. Hewlêr: Aras.
- Farqînî, Z. (1996). Dahûrîna le ser Parkîtên di Kurmancî de. *Zend*, (1), 62-65.
- Farqînî, Z. (2005). *Ferhenga Kurdî – Tirkî*. İstanbul: Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- Farqînî, Z. (2011). Dariştina Awayên Peyvan. *Zend (Rêzepirtûk)*, (15), 41-47.
- Feqî, T. (2017). *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*. M. Xalid Sadinî (Amd.).
Stenbol: Nûbihar.
- Fischer, S. R. (2010). *Dilin Tarihi*. Muhtesim Güvenç (Wer.). İstanbul: Türkiye İş
Bankası.
- Francis, W. N. (2016). Kelime Yapmak: Yeni Kelimelerin Bazı Kaynakları. Yusuf
Özçoban, İsmail Ulutaş (Wer).. *Dil Araştırmaları Dergisi*, (18), 237-246.
- Fromkin, V., Rodman, R. û Hyams, N. (2011). *An Introduction to Language*. Usa:
Lachina Publishing Services.
- Geyik. (2018). Bikaranîna Rengdêrên Kurmancî di Helbestên Melayê Cizîrî De. *Kadim
Akademi SBD*, 2(1), 81-89.
- Guiraud, P. (1975). *Anlam Bilim*. (B. Vardar(Wrg), Ed.). İstanbul: Gelişim.
- Guzev, V. (2010). Söz Dizimi Birimleri Üzerine. *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı-Belleten*,
56 (2008/2). Türk Dili Araştırmaları Yıllığı - Belleten, 56 (2008/2).
- Günay, V. D. (2004). *Dil ve İletişim*. İstanbul: Multilingual.
- Güneri, A. (2017). *Nomînal Morfolojiya Kurmancî ya Herêma Torê*. (Teza Mastirê).
Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî, Mêrdîn.
- Güngördü, E. (2002). İsimden Fiil Türeten +çı-/+çi- Eki ve Gelişmiş Şekilleri. *G.Ü. Gazi
Eğitim Fakültesi Dergisi*, 22(3), 171-182.

- Güven, A. (2012). Toplumsal Dilbilimin Kapsamı Alanı. *Pamukkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, (13), 55-62.
- Hamawand, Z. (2011). *Morphology in English Word Formation in Cognitive Grammar*. New York: Continuum International Publishing Group.
- Harris, R. (2001). *Linguistics After Saussure*. P. Cobley (Ed.), *The Routledge Companion to Semiotics and Linguistics* (C. 29, ss. 185-208). London and Newyor: Routledge.
- Hassanpour, A. (1997). *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik 1918-1985*. İstanbul: Avesta.
- Hatipoğlu, V. (1974). Türkçedeki Eklerin Kökeni. *Türk Dili Dergisi*, 29 (268), 331-340.
https://tdk.gov.tr/dosyalar/TDD/1974s268/1974s268__12_V_HATIBOGLU.pdf.
- Haugen, E. (2010). Dil Bilimsel Ödünçlemenin Analizi. Caner Kerimoğlu (Wer.). *Dil Araştırmaları dergisi*, (7), 131-157.
- Hayes, B. (2009). *Introductory Phonology*. West Sussex: Wiley-Blackwell.
- Hirorî, N. (2005). Kî şikber e? Malpera Nefelê.
http://nefel.org/articles/article_print.asp?ArticleNr=692.
- Holmes, J. (2013). *An Introduction to Sociolinguistics*. New York: Routledge.
- İmer, K., Kocaman, A. û Özsoy, A. S. (2011). *Dilbilim Sözlüğü*. İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.
- İzoli, D. (1992). *Ferheng (Kurdî-Tirki Tirki-Kurdî)*. İstanbul: Deng.
- Jamet, D. (2009). A morphophonological approach to clipping in English. *Journal in English Lexicology. Electronic version*, 15-31.
<http://journals.openedition.org/lexis/884>.
- Karaağaç, N. D. (2012). İşlevsel Dilbilim. *İstanbul Üniversitesi Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*, 37(37), 35-42. <https://dergipark.org.tr/tr/pub/iutded/issue/17031/178469>.
- Karadeniz, A. (2021). *Feqîyê Teyran (Dîwan)*. İstanbul: Nûbihar.
- Kaval, M. (2022). *Lêker di Zimanê Kurdî de*. Van: Peywend.

- Kerim, A. H. (2019). *Kürtçenin Etimolojik Sözlüğü (Karşılaştırmalı)*. İstanbul: Ar.
- Keskin, A. (2021). Adbilim Odağında Lakaplar ve Lakaplarla Karıştırılan Başlıca Terim ve Kavramlar. *Avrasya Terim Dergisi*, 9(2), 54-62.
- Keşanî, X. (1371/1992). *İştîqaqê Peswend der Zebanê Farisîyê Îmrûz*. Tehran: Merkezê Neşrê Danişgahî.
- Khalid, H. S. (2019). Zimanê Kurdî, Malbat û Zarên Wî. *Kurdiname*, (1), 3–16.
<https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiname/issue/50233/637080>.
- Kıran, Z. (1996). *Dilbilim Akımları*. Ankara: Onur.
- Komîsyon. (2022). *FerhegaTermên Zimaasîyê*. Xebata çapnebûyî. Weqfa Mezopotamyayê.
- Korkmaz, Z. (1992). *Gramer terimkleri Sözlüğü*. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları.
- Korkmaz, Z. (2009). *Türkiye Türkçesi Grameri Şekil Bilgisi*. Ankara: TDK Yayınları.
- König, G. Ç. (1991). Toplumdilbilim Açısından Dil ve Dil Türleri. *Dilbilim Araştırmaları Dergisi*, (2), 59-70. Retrieved from <http://dad.boun.edu.tr/tr/pub/issue/29237/313007>.
- Kuram, K. (2018). Dilbilim ve Evrensel Dilbilgisi. Gönül Erdem Nas (Ed.). *Dil ve Edebiyat Yazıları* (s. 2352). İstanbul: Kültür Sanat.
- Kurdo, Q. (1981). *Zimanê Kurdî-Rêziman (Gramatîk)*. Frankfurt: Komkar.
- Lass, R. (1997). *Historical Linguistics and Language Change*. New York: Cambridge University Press.
- Leech, G. N. (1980). *Explorations in Semantics and Pragmatics*. Herman Parret û Jef Verschueren (Ed.). Amsterdam: John Benjamins B.V.
- Mahmoud, B. (2017). Dengsazî û Fonolojî. Kenan. Subaşî û Resul Geyik (Ed.). *Gotarên Zimannasîyê* (19-37). İstanbul: Nübîhar.
- Malmisanij, M. (2013). *Kürtçede Ses Değişimi*. İstanbul: Vate.
- Malmisanij, M. T. û Mosa, A. X. (2016). Li Gorî Çêbûna Xwe Bêjeyên Kirmnackî

- (Zazakî). *Kovara Zanîngeha Zaxoyê*, 4(1), 1-11.
- Marif, E. H. (2000). *Rêzimanî Kurdî (Wişesazî) Bergî Yekem- Beşê Pêncem*. Silêmanî: Serdem.
- Martinet, A. (1998). *İşlevsel Genel Dilbilim*. (B. Vardar-wer, Ed.). İstanbul: Multilingual.
- Matthews, P. H. (2002). *Morphology*. Cambridge: Cambridge University Press.
- Miandoab, N. Z. (2018). Türk dilinde küçültme kavramı ve küçültme ekleri :(modern Oğuz lehçeleri ile karşılaştırmalı bir inceleme). *Türkoloji Dergisi*, (22), 213-237. *Türkoloji Dergisi*.
- Mihêddîn, B. Y. (2013). *Pêwendiyê Astî Morfolocî be Astî Fonolocî û Sintaksî*. Hewlêr: Mukiryanî.
- Mihemed, S. K. û Birzo, U. B. (2022). Proseyaya Lêkdan û Wişedirustkirdin le Ziman da (Keresteyî Şêwezari Xaneqî be Nimûne). *Kovara Zanistên Mirovayetî ya Zankoya Zaxo*, 10(1), 19-41. <https://doi.org/10.26436/hjuoz.2022.10.1.811>.
- Mîkaîl, B. (2008). Rader (Mesder). *Zend*, (10), 103-104.
- Mistefa, P. U. û Ferhadî, S. E. (2022). Be Berhemî Morfemî Bendî Wişedarêjekan le Şirekanî Şêrko Bêkes da. *Kovara Zanistên Mirovayetî ya Zankoya Zaxo*, 10(4), 989-1004. <https://doi.org/10.26436/hjuoz.2022.10.4.1107>.
